



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**ŞOPÊN REALÎZMA SOSYALÎST DI
ROMANÊN KURDÎ YÊN SOVYETA BERÊ DE
(1935- 1991)**

Betül Çoban

13711002

Şewirmend

Mustafa Aslan

Mêrdîn 2017

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**ŞOPÊN REALÎZMA SOSYALÎST DI
ROMANÊN KURDÎ YÊN SOVYETA BERÊ DE
(1935- 1991)**

Betül Çoban

13711002

Şêwirmend

Mustafa Aslan

Mêrdîn 2017

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Şopên Realîzma Sosyalîst di Romanên Kurdî yên Sovyeta Berê de” adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

08/09/2017

Betül ÇOBAN

JÎ BO RÊVEBERÎYA ENSTITÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYÊYÊ

Ev xebat ji aliyê juriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çandê de wekî Teza Lîsansa Bilind hatiye pejirandin.

Serok: ...Yrd. Doç. Dr. Mustafa ASLAN.....

Endam: ...Yrd. Doç. Dr. Hayreddin KIZIL.....

Endam: ...Yrd. Doç. Dr. Mustafa ASLAN.....

Endam: ...Yrd. Doç. Dr. Shahab Valî.....

Pesendkirin

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn yên endamên hîdekariyê yên navborî ne.

Doç. Dr. Nesîm Doru
Rêveberê Enstitûyê

NAVEROK

NAVEROK	III
LÎSTEYA TABLOYAN	VI
PÊŞGOTÎN	VII
KURTE	VIII
ÖZET	IX
ABSTRACT	X
KURTEBÊJE	XI
DESTPÊK	1
1. Edebiyat û Civak	1
2. Teoriya Li Ser Realîzma Sosyalîst	2
3. Hêmanên Realîzma Sosyalîst	10
3.1. Îdeolojî û Partîzanî	10
3.2. Ked û Kedxwarin/ Îstîsmar	11
3.3. Lehengên Erênî	12
3.4. Romantîzma Şoreşger	15
3.5. Folklor	15
3.6. Dîn	18
3.7. Dîrokîfî	20
3.8. Gelparêzî	20
3.9. Mijarên Aboriyê û Sîstema Kolxoz û Sovxozan:	21
4. Armanc û Çarçove	23
5. Çavkanî û Rêbaz	24

BEŞA YEKEM

KURDÊN SOVYETÊ

1.1. Çarçoveya Dîrokî	27
1.1.1. Kurdên Azerbaycanê û <i>Kurdîstana Sor</i>	35
1.1.2. Kurdên Gurcîstanê	39
1.1.3. Kurdên Ermenîstanê.....	40
1.2. Xebatên Kurdolojiyê yên li Rûsyayê	41

BEŞA DÛYEM

LI SOVYETA BERÊ EDEBIYATA KURDÎ Û TRADÎSYONA ROMANÊ

2.1. Bi Awayekî Giştî Edebiyata Kurdî Ya Sovyeta Berê.....	44
2.1.1. Êwra Yekem: Destpêk (1920-1937)	46
2.1.2. Êwra Duyem: Rawestin (1937-1955)	53
2.1.3. Êwra Sêyem: Hostetî (1955-1991).....	54

BEŞA SÊYEM

ŞOPÊN REALÎZMA SOSYALÎST DI ROMANÊN SOVYETA BERÊ DE

3.1. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romanên Erebe Şemo de	61
3.1.1. Şivanê Kurmanca	61
3.1.2. Berbang	71
3.1.3. Jiyana Bextewar	80
3.1.4. Hopo.....	95
3.1.5. Dimdim	102
3.2. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Şehîdê Îbo de.....	111

3.2.1. Kurdê Rêwî	111
3.3. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Egîdê Xudo de.....	117
3.3.1. Dê û Dêmarî	117
3.4. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romanên Eliyê Evdilrehman de.....	122
3.4.1. Gundê Mêrxasan	122
3.4.2. Xatê Xanim	127
3.4.3. Şer Li Çiya	130
3.5. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Heciyê Cindî de.....	135
3.5.1. Hewarî.....	135
3.6. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Ahmedê Hepo de	144
3.6.1. Bawerî	144
3.7. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Ezîzê Gerdenzerî de	148
3.7.1. Fincana Ferfûrî.....	148
ENCAM	152
ÇAVKANÎ	156

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1: Nifûsa etnîk/nijadî ya Rûsyayê ya serjimariya 1897an..... 42

Tablo 2: Nifûsa kurdan ya li YKSSyê.....45



PÊŞGOTÎN

Edebiyata Kurdî û bi taybetî jî romana Kurdî piştî Sovyetan dirûveke din digire. Kurdên Sovyetê piştî sirgûnên mezin, li Sovyetê ji xwe re derfeteke baş dibînin û ji politikayên Bolşevîkan sûd werdigirin. Tê zanîn ku di wê cografyayê de, di warê edebiyata kurdî de qadeke wala heye û ew jî carekê de bi hewldanên kurdên Sovyetê dest pê dibe û geş dibe. Ev geşedan û tespîteke Haşim Ahmedzade ya derheqê romana kurdî ya Sovyeta berê de, me teşwîqî vê xebatê kir ku em ketin li pey şopa realîzmeke sosyalîst di romanên kurdî ya Sovyeta berê de. Pirsên çî, çima û çawa di hişê me de mezin bûn û ev tez bi van pirsan hat amadekirin.

Xebatên akademîk ên di warê romana kurdî de, li bakurê Kurdistanê dibin mînakên ewilîn. Ji ber wê ye ku di destpêkê de nimûneyên biyanî ji bo rêbazekê bûn rênîşandar. Di nivîsîna vê tezê de û destpêka wê de alikariyên mamoste Remezan Alan (Çeçen) nayên jibîrkirin ku çarçoveya giştî de em ji nêrînên xwe yê hêja bêpar nehiştin. Spasiya wî û hevalên xwe dikim ku di pêvajoya nivîsîna teza min de, aliyê min kirin û xeletiyên min nîşanî min dan. Di beşa teorîk de pêşniyazên Zülküf Ergün asoya min berfireh kir, spasiya wî dikim. Şewirmendê min Mustafa Aslan di vê pêvajoyê de bi xîret û şîretên xwe gelek aliyê min kir, teza min bi xwendina xwe pêş xist. Minetdarê wî me û gelek spas dikim. Her wiha ez dixwazim ji bo xwendinên wan ên bi baldar û eleqedar spasiyên xwe pêşkêşî endamên jûriya xwe Hayreddîn Kızıl û Shahab Valî bikim ku di parastinê de ji her alî ve nîqaş, şîrove û pêşniyazên xwe asoya min berfireh kirin û teza min nixandî.

Herî dawîn ez dixwazim spasiya malbata xwe bikim ku di vê pêvajoyê de ew jî bi qasî min betilîn û bi niyaz û xweşgotinên xwe dilê min şa kirin. Minetdarê wan im.

Betül ÇOBAN

Mêrdîn- 2017

KURTE

Realîzma sosyalîst, şaxeke ji realîzmê ye û geşedana xwe bi edebiyata Sovyetê pêş ve biriye. Realîzma sosyalîst, di 1934 an de li Sovyetê, di Yekemîn Kongreya Yekitiya Nivîskaran de bi awayekî fermî bûye nêrîna hûnerî ya dewletê. Nivîskarên Sovyetê bivê nevē bi regeza vê nêrînê berhemên xwe afirandine. Nivîskarên ku bi vê rêgezê nivîsîne ji aliyê dewletê ve hatine xelatkirin û yên ku red kirine hatine sirgûnkirin.

Li Yekitiya Komarên Sosyalîst yên Sovyetê (YKSS), nivîskarên kurd karîne bi zimanê xwe berhemên binivîsin. Di vê xebatê de romanên ekola Qafqasyayê (Sovyetî Berê) dê bê lêkolînkirin. Armanca vê xebatê ew e ku romanên di navbera 1935- 1991 an de li Sovyetê û bi Kurdî-Kurmancî hatine nivîsîn bi rêbaza ekola realîzma sosyalîst bîn xwendin û hevbeşiyên wan bîn tespîtkirin. Bandora realîzma sosyalîst li ser van romanên de bi çî awayî derdikeve holê dê bê nîşandan. Di tespîtkirina van xalên hevbeş de, metnên navborî dê bîn tehlîlkin; hevbeşiyên wan ên naverokî dê bîn destnîşankirin û rêgezên vê nêrînê li gor edebiyata realîzma sosyalîst dê bê diyarkirin. Dê bê dîtin ku nivîskarên kurd jî ji derfetên Sovyetê bêpar nemane û piraniya wan berhemên xwe li ser şopa realîzma sosyalîst ava kirine. Ev yek jî rê daye ku rêgezên wek îdeolojî, romantîzma şoreşger, lehengên erênî, folklor, dîn, ked û dîrokî di nav berhemên wan de gelekî cih bigire.

Peyvên Sereke: Realîzma Sosyalîst, Edebiyata Kurdan, Romanên Kurdî yên Qafqasyayê, Lehengên Erênî, Lehengên Şoreşger.

ÖZET

Toplumcu gerçekçilik, realizmın devamı olarak görülen ve asıl gelişimini Sovyet edebiyatıyla ön plana çıkaran bir görüştür. Toplumcu gerçekçilik, 1934'te Sovyetlerde yapılan Birinci Yazarlar Birliđi Kongresi'nde devletin resmî sanat politikası olarak görülmüştür. Sovyet yazarları ister istemez bu kuramın etkisinde eserler vermeye başlamışlardır. Bu teori bünyesinde eser verenler ödüllendirilmiş, reddedenler ise sürgüne gönderilerek cezalandırılmışlardır.

Sovyet Sosyalist Cumhuriyetler Birliđi'nde yaşayan kürt yazarlar kendi dilleriyle eserler verebimışlerdir. Bu çalışmada Kafkasya ekolü olarak nitelendirilen, Sovyet Kürt romanı incelenecektir. Bu çalışmanın amacı, 1935- 1991 yılları arasında Sovyetlerde Kürtçenin Kurmancî lehçesiyle yazılan romanları toplumcu gerçekçi kuramın ilkeleri doğrultusunda incelemek ve ortak noktalarını belirlemektir. Toplumcu gerçekçiliğın bu eserlerde hangi suretle yer aldığı gösterilecektir. Bu ortak noktaların belirlenmesinde belirtilen aralıkta yazılan romanlar incelenecek, içerik açısından ortak yönler gösterilecek ve toplumcu gerçekçiliğın ilkeleri doğrultusunda etkileri tespit edilecektir. Görülecektir ki, kürt yazarlar da Sovyet rejiminin sunduđu imkanlardan yararlanmış ve eserlerinin büyük bir çoğunluđunu bu kuram çerçevesinde yazmışlardır. Bu da gösteriyor ki, ideoloji, devrimci romantizm, olumlu kahraman, folklor, emek, sömürü , din ve tarisellik ilkeleri bu eserlerde çokça işlenmiştir.

Anahtar Kelimeler: Toplumcu Gerçekçilik, Kürt Edebiyatı, Kafkas Kürt Romanı, Olumlu Kahramanlar, Devrimci Kahramanlar.

ABSTRACT

Socialist realism is one of the branches of realism and advanced its development (marched forward in time) with the Soviet literature. The theory on socialist realism officially became the artistic view(vision) of the state in the First Congress of Authors' Union, 1934. Soviet authors, whether willingly or not, created their works adhering to the principle of this view. While the authors who wrote in this principle were rewarded by the state, the ones rejected this were exiled.

In the Union of Soviet Socialist Republics(USSR), Kurdish authors could create their works in their language. In this study, the novels of Caucasus école (Former Soviet) will be examined. The aim of this study is to read novels written in Kurdish in 1935 and 1991 with the method of socialist realism école and to identify similar aspects. How the socialist realism effects these novels will be presented. In identifying these common points, the mentioned novels will be analyzed; their contextual aspects will be pointed out and the principles of this theory will be explained according to the literature of socialist realism. It will be seen that the Kurdish authors were not deprived of the opportunites in Soviet and most of them created their work under the influence of Socialist Realism. This paved the way for authors to use much the principles like "ideology, revolutionary romanticism, positive heroes, folklore, religion, labor and historicity" in their works.

Key Words: Socialist Realism, Kurdish Literature, Caucasus' Kurdish Novels, Positive Heroes, Revolutionist Heroes.

KURTEBÊJE

amd.: amadekar

bnr.: binêrin

brh.: berhevkar

c.: cild

ç.: çap

dnd.: di nav...de

hb.: heman berhem

hg.: heman gotar

hm: heman malper

hn: heman nivîs

hr.: heman rûpel

ht.: heman tez

hwd.: her wekî din

j.: jimar

r.: rûpel

rr.: ji rûpela...heta rûpela...

trans.: transkirîpsiyon

wer.: wergêr

weş.; weşan/weşanên

YKSS: Yekîtiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê **YS:** Yekîtiya Sovyetan

YNS: Yekitiya Nivîskarên Sovyetê

DESTPÊK

1. Edebiyat û Civak

Têkiliya edebiyat û civakê ji serdemên ewil heta niha mijareke ber nîqaşê ye. Edebiyateke ji derveyê civakê em nikarin teheyûl bikin. Civakîbûna berhemên edebî jî mimkûn (pêkan) e ku bi sê bingehên esil bê lêkolînkirin: A ewil, “sosyolojiya nivîskarî ye û meseleyeke hebûna nivîskarî ye di nav civakê de. Nivîskarê ku berhemeke edebî diafirîne di nav civakê de radibe û hêvî ew e ku bi çanda xwe re têkildar be. Ev yek jî bivê nevê bandorekê li ser berhemê dike. A diduyan, “naveroka civakî ya di nav berheman de” ye. Nivîskar dikare di nav berhema xwe de cih bide dewra xwe û serboriyên civaka xwe, û her wiha dikare şert û mercên siyasî û civakî yê welatê xwe di nav berhema xwe de bi kar bîne; yanê ev hemû dikarin bibin mijara berhemên wî/wê. A dawî, “bandora edebiyatê li ser civakê” ye. Li vir berhema edebî dikare civakê ber aliyakî ve bibe, şêkil bide wê heta hin felsefe û îdeolojiyan lê bar bike û mifayekî civakî jê wergire.¹

Teoriyên edebî û hunerî di nava civakê de peyda dibin û helbet ji şert û mercên serdemê jî bêpar namînin. Ev yek jî ji bo wergirtina taybetiyên serdema xwe rê li ber van vedike. Lewra tu benîadem nikare xwe ji civaka xwe, ji afirandinên xwe dûr bixe. Teoriyên edebî bi rengvedana bûyer û diyardeyan li ser hunerê derdikevin holê ku ev bûyer û diyarde carinan civakî û siyasî ne û carinan jî felsefî ne û her wiha di nava civakê de cih digirin. Yanê her teoriyeke edebî ji bo hebûn û geşedana xwe hewcedarî binyadeke civakî ne.

¹ René Wellek, Austin Warren, **Edebiyat Teorisi**, Ö. Faruk Huyugüzel (wer.), Dergah, İstanbul 2005, r. 74-89.

2. Teoriya Li Ser Realîzma Sosyalîst

Wekî hemû teoriyên edebî, teoriya li ser realîzma Sosyalîst jî paşxana xwe ji siyaset, aborî û felsefeyê werdigire. Bingeha realîzma sosyalîst/civakî, di navbera 1917-1923 an de ji aliyê pêşeng û teorîsyenên Şoreşa Cotmehê ve hatiye avêtin û armanca wan ew e ku di ciyê edebiyata burjuvayê da edebiyata proleter bînin; ji xwe navê xwe jî ji wir girtine: “proletarskaya kultura”.

Bi Şoreşa Cotmehê ya 1917an re çîna karkeran yanê çîna proleteriyayê êdî xwedî serfiraziyeke mezin e û dîktatoriya xwe ava dike. Şoreş ji bo wan peyveke efsûnî ye. Piştî şoreşê dewlet ji bo xebatên çandî û hûnerî piştgirî dide rêxistinên. Yek ji wan heta ya ewil jî meriv dikare bibêje ku “Proletkult”e. Serokê vê tevgerê jî Bogdanov e. Proletkult, wekî ku ji navê jî diyar e, pêşniyazên edebiyateke nû dike û divê ev edebiyat xizmeta çîna şoreşger bike û hûnerên berê ji binî ve red bike. Di vê mijarê de Kurtulmuş, ku gelek lêkolînên wî li ser vê babetê hene, proletkultê wek “nezirekê”² dibîne ji bo tevgera şoreşger.

Li gorî wan divê nivîskar aliyê partiyê bigire û berhemên xwe jî ji bo vê yekê binivîse. Lenîn di nivîseke xwe de dibêje ku “mafê her hunermendekî heye ku bi awayekî serbixwe berheman biafirîne.” û paşê jî li ser zêde dike: “Bila biqehirin edîbên bêteref! Bila biqehirin mirovên serdest ên edebiyatê! Divê edebiyat bibe vîde û çerxekî biçûk ji bo mekanîzmaya li ber destê karkerên hişmend de...”³

Leon Troçkî jî dibêje ku, “her çîna serdest çanda xwe û pê re jî hûnera xwe diafirîne.”⁴ Bi vê helwestê, proleterya jî xebatên xwe yê çandî û hûnerî ava dike. E.H.Carr nêrînên Bogdanov bi vî awayî destnîşan dike û dibêje ku proleterya bi sê lingan dikare pêş ve biçe. Dezgeha polîtîk Partî ye; dezgehên aboriyê sendîqa ne û dezgeha

² Akif Kurtulmuş, **Politika ve Sanat**, Avesta, İstanbul 1996, r.21

³ Ahmet Oktay, **Toplumcu Gerçekçiliğin Kaynakları Sosyalist Realizm Üzerine Eleştirel Bir Çalışma**, İthakî, İstanbul 2008, r. 89.

⁴ Leon Troçkî, **Edebiyat ve Devrim**, Hüsen Portakal (wer.), weş. Köz, İstanbul 1976, r.12.

çandî jî Proletkult e.⁵ Yanê têkoşîna çandî bi proletkultê dimeşe; ji ber ku ew jî difikirin ku heke çanda burjuvaziyê hebe divê çanda proleteriyê jî hebe. Bi van armancan derdikevin rê û rabirdûyê înkâr dikin.

Bi coşa şoreşê ve hemû mîratên berê red dikin û dixwazin ku edebiyateke Marksîst-Lenînîst biafirînin. Di 1918an de, kovareke bi navê *Dahatûyê* de wiha tê gotin: “Eger kesek xwe ji ber vê înkâr û qutkirinê aciz bike em dikarin ji wan re bibêjin ku bi vî awayî êdî baş e lewra em van zincîran naxwazin û pêwîstî pê nabînin.”⁶ Lê şoreşgeriya wan a yekalî dawîya wan anî, bi hizbperestiyê ve hatin tawanbarkirin û proletkult ji holê rabû.

Di vê xalê de, em dikarin pêşniyaza Berna Moran bi bîr bixin. Bi nêrîna Moran, divê em estetîka Marksîzmê bi du beşan binirxînin.⁷ Ji ber ku piştî têkçûna proletkultê di 1934an de piştî Yekemîn Kongreya Nivîskarên Sovyetê ev teorî bi awayekî din xwe nîşan dide.

Realîzma Sosyalîst, bingeha xwe ji nêrîna materyalîst werdigire û bi felsefe û îdeolojiya Marksîst şêkil dide esasên xwe. Avakarên estetîka marksîst Karl Marx û Engels, mijarên li gor texayyûlên berhemên edebî bi diyardeyên rastîbînîyê/realîzmê sînor kirine. Ev yek jî rê daye ku teorîsyenên Marksîst ên li pey wan ji bo nirxên edebî rastîbînîyê kirine krîtera sereke.

Realîzma Sosyalîst li Rusyayê bi Şoreşa Cotmehê derketiye holê û 1934an de di civîna “Yekemîn Kongreya Yekîtiya Nivîskarên Sovyetê” da wek nêrîna fermî ya dewletê hatiye pejirandin. Realîzma sosyalîst belkî ne tenê rengvedana fikrên Marksîst-Lenînîst e li ser huner û ebebiyatê, lêbelê ji bo pêkhatina vê teorîyê jî tevgera çîna karkeran şertên sereke yên dîrokî didin.

⁵ E.H.Carr, **A History of Soviet Russia, Socialism in One Country 1924-1926**, Macmillan, London 1976, r.60.

⁶ A. Miyasnikov, Neql: Ahmet Oktay, **Toplumcu Gerçekçiliğin Kaynakları Sosyalist Realizm Üzerine Eleştirel Bir Çalışma**, İthakî, İstanbul 2008, r. 75.

⁷ Berna Moran, **Edebiyat Kuramları ve Eleştiri**, İletişim, İstanbul 2005, r. 41.

Marks û Engels derheqê hunerê de berhemek nenivîsîne. Lewra em dikarin bibêjin ku George Plehanov bêtir ser vê mijarê sekiniye û edebiyat û doktrîna hunera Marksîst teorîze kiriye. Marksîzm, felsefeyeke dîrokî ye û sîstema xwe li ser teoriyên ekonomîk ava dike û iddiaya wî ew e ku pêşketina dîrokê li gor hin qanûnan pêk tê. Mirov dikare pirseke wiha bike ka gelo hunera dewrekê bi rastî jî ji hîmên ekonomîk, ji lêkdanên çînî loma jî ji îdeolojiya dewrê diyar dikin ?Bersiva vê pirsê li cem Moran he ye û ew jî îddia dike ku hin Marksîst wiha difikirin. Paşê li ser vê zêde dike: “Zayîna sîstemên felsefî, guherînên dînî li ser baweriyên, rûdana cureyên hunerên nû heta raddeyekê ji encamên cûdayiyên hîmên ekonomîk pêk tên. Hetta îdeolojiya civakê berjewendiyên çînên serdest diparêzin û helwesta wan meşrûkirina van berjewendiyan e.”⁸

Mihail Şolohov derheqê vê de wiha dibêje: “Kesên ku bixwazin bizanin bê ka realîzma Sosyalîst çi ye, bila li berhemên edebiyata Sovyetê yê nîva sedsalekê binêrin û tecrûbeyên wê bişopînin. Dîroka vê edebiyatê, realîzmeke sosyalîst e ku di vegotinên têkoşîna gel de û sûreta lehengan de bi awayekî şênber olan dide.”⁹ Ahmet Oktay jî ji bo vî qasî dibêje ku nivîsa Rusî bi şertên taybet û cureyên derdikeve holê. Lewra, herçiqas bi awayekî dîrokî geşedana wê û ya kapîtalîzmê rastî hev jî bîn, romana Sovyetê ne dişibe romana Îngîlîzan ne jî ya Fransiyan.”¹⁰ Paşê li ser zêde dike û dibêje ku romana Rusî ya klasîk aîdî rejîma Çarîtiyê ye û romana Sovyetê jî aîdî şoreşê ye.

Realîzma Sosyalîst, bawerîya xwe bi beralîkirina civakê ji aliyê hunerê ve piştrast dike û îddiayeke wê heye ku huner dikare civakê biguhere, pêş ve bibe û bikemilîne. Li gor wê nivîskar bi xwe bi hebûna xwe ve kesayetekî civakî ye û divê civaka xwe bigihîne asteke îdeal; cudahîyên çînî yê ku ji esasên ekonomîk derdikeve holê ji binî ve rake; sîstema sosyalîst bîne di cihê pergala civakî ya kapîtalîst de; û divê pênuşa xwe ji bo van armancên sereke bi kar bîne.

Ev teorî herçiqas komeke ji layengirên Bolşevîkan ve jî pêk bê dîsa di nav wan de

⁸ Berna Moran, **hb**, r. 43.

⁹ Seçkin Cılızoğlu, **Sanatta Sosyalist Gerçekçilik**, Yeni Dünya, İstanbul 1976, r.5

¹⁰ Ahmet Oktay, **hb**, r. 51.

dijberên wan jî hebûn û li hember partiyê xwedî sekneke xweser bûn. Di nav tevgerê de pirrdengî hebû û ev rewş heta bi damezirandina Yekitiya Nivîskarên Proleter yê Rus (RAPP) didome. Piştî damezirandina RAPPê çî diqewime ku ew pirrdengiya heyî winda dibe? Li gor RAPPê “hakimiyeta edebiyatê ji bo Partiyê” mecburiyetek e. “Wek mînak, argumanên ku RAPPê şekil didin; têkiliya huner û proleteriyayê, sekneke li hember rêhevalên xwe bi taybetî li hember edebiyata formalîst a kevneşop, û ya girîng hegemonya û pêşengiya proleteriyayê di huner û çandê de ne.”¹¹

Li gor Akîf Kurtulmuş serekên RAPPê bi dijminatîya hevrêyên xwe dest bi pratîkên edebî dikin.¹² Di kovara Na Postê de wek manîfestoya RAPPê nivîsek derdikeve: “Wezîfeya me ne tenê şerê li hember muhafîzên spî û nûnerên wan ên edebî yê serpêl in, di heman demê de şerekî li hember rêxistinên nivîskarên kevneparêz û dijî şoreşê ye ku xwe di bin rûpoşa şoreşê de vedişêrin. Em ji van kesan xeberdar in.”¹³

Di 1934an de Yekemîn Kongreya Nivîskarên Sovyetê dicive û biryarekê digire ku realîzma Sosyalîst ji wê dîrokê pê ve dibe nêrina hunerî ya fermî ji bo Yekitiya Sovyetê. Biryarên berbiçav ên ku di vê kongreyê de hatine girtin esasen rêgezên xwe, çavkaniyên xwe ji nameya Stalîn werdigirin ku ev mektûb 2yê Berfanbara 1930an de ji bo Demjan Bedny hatiye nivîsîn. Li wir Stalîn nivîskaran wek “endezyarên ruhên mirovan” şayesandîye û ev yek jî di kongreyê de ji bo realîzma sosyalîst bûye rêgezeke bingehîn. Li gor vê, divê nivîskara/ê sosyalîst hişê civakê ava bike, civakê bi îdeolojiyê bixemilîne û li hember kapîtalîzm û dagirkeriyê serî hilde, xelkê bi rê bixe. Di kongreyê de ji aliyê sekreterê partiyê yê Lenîngradê Andrey Jdanovve ji bo naverok û nasandina realîzma Sosyalîst pênc maddeyên sereke tên pêşniyazkirin. Bi kurtî:

1. Edebiyata burjuvayê îro êdi nikare tu berhemên mezin biafirîne. Hilweşan û tiraliya civaka burjuvayê xwe di nav edebiyatê de jî nîşan dide. Mistîsîzm, xayîsketina dînê û pornografî bûye karakterîstîka edebiyata burjuvayê. Şexsên gûzîde yê wê edebiyatê diz, dedektîf û sextekar in.

¹¹ Akîf Kurtulmuş, **hb**, r. 67.

¹² Akîf Kurtulmuş behsa vê çendê di nav pirtûka xwe de bi sernava “RAPP û Hegemonyaya Proleteriyayê di Edebiyatê de” dike. Ji bo agahiyên berfireh bnr. Akîf Kurtulmuş, **Politika ve Sanat**, Avesta, İstanbul 1996.

¹³ Akîf Kurtulmuş, **hb**, r. 67.

2. Li welatê me, serlehengên berhemên edebî; karker, karkerên jin, jin û mêrên gundî yên ji bo gelê xwe dixebitin, peywirdarên partiyê, aborînas û endezyar û hwd. in.

3. Nivîskar wekî ku endezyarên ruhên mirovan e, divê jiyanê wek rastiya di nav pêşveçûna şoreşê de îdrak bike. Divê sozdarê rastiye be û girêdayî peywirên xwe be. (Çi ne ev peywir; wek dîrokî şayesandina hunera şênber, wek îdeolojîk teşedana mirovan bi ruhê sosyalîzmê û perwerdekirina xelkê.) Edebiyata Sovyetê ji rexneyên wekî ku dibêjin edebiyata wan yekhêlî ye, natirsin.

4. Ji bo edebiyata sosyalîst/civakî ya ku hişkehişk bi girêdayî materyalîzmê ye ji xeynî romantîzma şoreşger tu romantîzm tine. Romantîzma şoreşger divê wek hêmaneke yekkirî bikeve nav afirandina edebiyatê.

5. Gelek amûrên cûr bi cûr di bin emrê nivîskaran de hene. Nivîskarên Sovyetê divê di nav van amûran de yên xweştir hilbijêre; divê hakimî teknîka edebiyatê û xwediyê mirata edebiyata hemû dewran be.¹⁴

Hunermend û edîbên girêdayî realîzma Sosyalîst, hemû nêrînên realîst yên beriya xwe rexne kirine û ji ber edebiyata wan a kêr û tewizandî gelek aciz bûne. Wisa difikirin ku realîstên berê tu çalakî nîşan nedane li hember guhertina nêrîna realîzmê, ji ber ku realîstên berê tenê hewl dane ku bûyeran wek xwe nîşan bidin û ev yek jî ji bo realîstên sosyalîst rexneya bingehîn e. Li gor realîstên sosyalîst naturalîzm wek neynikekê ye ji bo cîhana derveyî; ancax pîsî, qirêjahî û gemariya jiyanê nîşan dide û tu hewldana wê tune ji bo xilasbûna ji wê rewşê. Lewra mehkûm e ku bi paş de vegere nava wê qirêjahiyê. Ev vegeer jî ji bo vekêşana ferdê ji civakê û ji bo biyanîbûna wê/wî bûye sedemek. Di nav vê sîstemê de ferd/şexs fersendekê nabîne ji bo îfadekirina xwe û ji encamên kar û kirinan yanê ji berhemên dûr dimîne.

Berna Moran di pirtûka xwe de behsa vê çendê dike û ji gotereke G.J. Becker neqil dike: “Belê nivîskar rastiya civakî nîşan dide lê di ber re jî vê yekê rave dike û didarizîne/mehkeme dike.”¹⁵ Di vê xalê de meriv dikare bêje ku ev yek ne tenê bi

¹⁴ İsmail Tunalı, **Marksîst Estetîk**, Altın Kitaplar, İstanbul 1993, r.149-150.

¹⁵ Berna Moran, **hb**, r. 41.

rexneyan çêdibe. Çawa û çima nivîskar rastiyan nîşan dide ev jî girîng e.

Realîzma Sosyalîst ya ku ji aliyê peywirdarên polîtîk ve hatiye fikirîn û rêgezên wê ji aliyê van kesan ve hatine diyarkirin, di serî de hunerê wek amrazêke ragihandina îdeolojiyê dîtiye ji bo xelkê. Ev yek jî gelek caran encamên wisa dane ku tu fikarên estetîk nekirine mebest ji xwe re û rastiyên mîsoger bûne armancên sereke ji bo realîstên civakî. Ev tevger jî wisa rê li ber nivîskaran vekirîye ku berhemên xwe bi vî şiklî biafirînin. Nivîskar ji bo ku berpirsiyariyên xwe bi cih bîne dinivîse û berhemên ku bi van hestan hatine nivîsîn, ji aliyê naverokê ve rengê hev didin. Rêzebûyerên berhemên herçiqas ji hev cuda bin jî hîmên tematîk, dem û mekanên bûyeran û lehengên wan dişibin hev.

Lehengên berhemên realîzma Sosyalîst taybetiyên lehengên erênî nîşan didin. Çi ye lehengê erênî? Bi giştî lehengê endamê çîna karker anku ew ê ku keda wî tê xwarin, kemasiyên civakê derdixe holê, aşkere dike; temsîliyeta kesên li hember kedxwarî û emperyalîzmê dike ku her yek ji wan divê şerê li hember wan de biserketî û serfiraz bin. Derheqê vê yekê de Andrei Siniavskidi pirtûka xwe ya *Sosyalîst Realizm* de behsa vê çendê dike ku: “Berhemên realîstên sosyalîst hêj dest pê nekirî bi encameke, dûmahîkeke dilşad tîn amadekirin. Encam, belkî ji bo lehengê romanê baş nebe ku ji bo serketina komunîzmê di nav şerekî de ketiye nav gelek xetereyan, lê ji bo armanca mezin encameke serfiraz û dilşad e.”¹⁶

L. Troçkî nivîskaran wek dijmin, rêheval û nivîskarên proleter senifandine. Li gor senifandina Troçkî nivîskarên ku daxilî koma dijminan bûne yan terka Rusyayê kirine yan jî herçiqas li welêt bimînin jî wek *tune* hatine hesabandin. Li gor senifandina Troçkiyî gelek nivîskar û helbestvanên jêhatî daxilî koma ‘Popuçîk’ê (hevrê) dibûn.¹⁷

Gorkî, di axaftina xwe ya Yekemîn Kongreya Yekitiya Nivîskaran de, endamên partiyê yên ku di şaxa edebiyatê de dixebitin ne tenê wek mamosteyên îdeolojiya rêxistinê nîşan dide di heman demê de wisa diyar dike ku ev mamosteyên îdeolojiyê divê

¹⁶ Andrei Siniavski, **Sosyalîst Realizm**, S. Türker (wer.), weş. Habora Kitabevî, İstanbul 1967, r. 25

¹⁷ Leyla Tagızade, “Sosyalîst Realizm: Kökeni, Oluşum Süreci ve Kavramı”, **Modern Türklük Araştırmaları Dergisi**, c. 3, j. 4, r. 13.

di nav xwe de hev girtinekê pêk bînin.¹⁸ Oktay vêyekê wiha destnîşan dike û dibêje ku li welatê şoreşê edebiyat, ronîkirin û beralîkirina çîna karker bigire ser xwe û bibe rênîşanderekî.¹⁹

Gorkî dixwaze jiyana ku tê de dijî bê guhertin û dagerandin; ji bo vê jî wisa bawer dike ku pêwistî bi şoreşê heye. Gorkî ji vê nêrînê dest pê dike ku rêgezên realîzma sosyalîst pêk bîne. Ev rêgezên weha di serî de ne bi armanca doktrînen polîtîk hatine çêkirin. Gorkî, ji bo avakirina dahatûyê û guhertina civakê nasnameyêke “rizgarker” ava dike. Gava ku dest pê dike, ji romanên klasîk yê Rusî çend şemayên wek “tawanbar”, “qurban” û “rizgarker” werdigire. Gorkî beriya kongreyê de, di 1930-1933an de, dibêje ku nivîskar berpirsiyara/ê civaka xwe ne. Di nivîseke xwe ya bi navê “Hevpeyvîna Li Ser Karkeriya Hunerê” de Gorkî destnîşan dike ku “Nivîskar xwedî mafê firehkirin û hilberandina mirovî ye, û bi ser de jî ev yek wezîfeyê wî/wê ye. Gava ku nivîskar takekesê teswîr dike, taybetiyên çînî yê takekesê divê ji her du aliyan ve yanê hem aliyên baş hem ên xerab daxilî meseleyê bike.”²⁰ Bi vî şeklî berpirsiyariya çêkirina civakê dike barê nivîskarê.

Piştî 1934an li Sovyetê bi bandora Stalîn jî, di polîtîkayên edebî de hişkbûnekê peyda dibe. Di vê serdemê de Andrey Jdanov mohra xwe li ser sîstemê dixê. Jdanov di heman demê de şewirmendê huner û çandê yê Stalîn e. Wî, realîzma Sosyalîst kiriye amrazê aktuel ya polîtîkaya partiyê. Tehdeyên (zextên) li ser nivîskarên, mehkemeyên 1936an êdî bûye wek terorîzmê bi mirin û mişextiyan.

Em dikarin bibêjin ku pêvajoya guherîna teoriya realîzma Sosyalîst di nav salan de bi vî awayî çêbûye:

“Di salên 1920î de berhemên şoreşî dihatin nivîsîn, salên 1930î de jî berhemên karker û gundiyên komünîst yê ku ji bo komünîzmê destê hev digirtin û mil didan milên hev dihatin nivîsîn. Di vê serdemê de herçiqas hejmara wan kêr jî be berhemên bi mijarên din jî hatine nivîsîn. Realîzma Sosyalîst bandora xwe ya esil piştî 1934an nîşan dide. Di 1934an de bi kongreya Yekitiya Nivîskarên Sovyetê desthilatiya Stalînî xurttir dibe û

¹⁸Maksîm Gorkî, **Sanatta Sosyalist Gerçekçilik**, Feyyaz Şahin (wer.), weş. Parşömen, İstanbul 2011, r.94

¹⁹ Ahmet Oktay, **hb**, r. 87.

²⁰ Ahmet Oktay, **hb**, r. 108.

wek hemû qadan di qada edebiyatê de jî Stalîn dibe otorîteya tek. Bi serketina Sovyetan ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn mezinkirina Stalîn zexmtir dibe û heta êdî wek xweda tê hesabandin. Di salên 1940î û 1950î de di edebiyata Sovyetan de, rejîma sosyalîst dewra xwe ya zêrîn de ye. Piştî şerê ku 1948an de li hember ‘kozmpolîtîzm’ê dest pê kiriye perdeyên hesin hatine danîn. Ev yek di bûyerên aborî, çandî û civakî de çawa ku hevbandoriyan asteng kiribe di heman demê de bandora xwe di qada edebiyatê de jî nîşan daye û têkiliyên bi dewletên din re qut kiriye. Di salên 1950î de teorî forma xwe tam li gorî polîtîkaya dewletê digire. Di edebiyata salên 1960î de nêrînên nû belav dibin û ji derveyî îdeolojiyê berhem tên nivîsîn. Di 1970 û 1980an de berhemên bi vî şiklî zêde dibin. Heke ev berhem bihatana avêtin dê edebiyata Sovyetê ji navê winda bibûya, lewra di salên 80î de ‘realîzma Sosyalîst ya bêsînor’ hat îlan kirin. Teoriya realîzma Sosyalîst mecbûr ma û di maddeya îdeolojiyê de vezelandinek çêkir.”²¹

Li gor çend nivîskaran, damezirînerê esil yê realîzma sosyalîst Gorkî ye. Bi demê re hin guhertin û nermî elbet çêbûne lê meriv dikare bi giştî bibêje ku têgehên wek “romatizma şoreşgerî” û “lehengên erênî” bi Gorkî re wek formuleke edebî di edebiyatê de cih girtine. Ji aliyekî din ve di van berheman de jî wek “çêkirina dahatûyê” meriv dikare behsa çêkirina fikrekê, sazkirina jiyaneke nû bibîne.

Wekî ku Emerson jî dibêje, Andrei Siniavski di nivîsa xwe ya “Çi ye Realîzma Sosyalîst?” destnîşan dike ku ev “geşedanên şoreşgerî” dibe ku piçek ecêb xuya bike ji derva. Lê ev yek ne ewqasî jî ecêb e. Nivîskar ne tenê wekî Çehov û Tolstoy lê bi realîzmeke din dinivîse. Ev nivîskar êdî ji bo dahatûyê dinivîse û ji bo polîtîkayên xwe û ji bo sosyalîzmê dixebite. Sîniavskî dubare îddia dike ku realîzma sosyalîst nêzikî neoklasîsma sedsala hejdehan e.²²

Kengê benîadem hişyar dibin û dizanin ku edebiyat xwedî hêzeke taybet e û dikare nêrînen mirovan biguhere, wî çaxî em dikarin bêjin ku wekî hemû felsefeyan realîzma Sosyalîst jî dibe mijara edebîyat û romanê. Realîzma Sosyalîst wekî hemû berhemên din romanê jî ji bo belavkirina nêrînên xwe û ji bo felsefeya xwe bi kar tîne û edebiyatê wekî amrazekê diemilîne.

²¹ Leyla Tagizade, **hg**, r. 22.

²² Caryl Emerson, **The Cambridge Introduction to Russian Literature**, Cambridge University, USA 2008, r. 199.

3. Hêmanên Realîzma Sosyalîst

Bi rêya taybetiyên realîzma sosyalîst meriv dikare çend rêgezan rêz bike. Ev rêgez; îdeolojî û partîzanî, lehengên erênî, romantîzma şoreşger, ked, folklor, dîn û dîrokîbûn in. Di diyarkirina van rêgezan de berhemên nivîskarên ku li ser realîzma Sosyalîst xebitîne wek çavkanî hatine bikaranîn. Kesên wek Maksîm Gorkî, Moisiçî Kagan, Şuayîp Karakaş, Berna Moran, Ahmet Oktay, A, Miasnikov, Georgi Plehanov, Gennadiy Pospelov, Boris Suçkov, Mustafa Kemal Şan, Leyla Tagızade, Nezir Temur. Ev senifandin jî bi tevahî ne aîdî xwediyê vê tezê ye û gelek xebatên li jorê navborî wek çavkaniyên sereke hatine bikaranîn û teza Cihaner Akçay²³ jî bi vî rengî rêyekê li ber me vekirîye.

3.1. Îdeolojî û Partîzanî

Di realîzma sosyalîst de armanca sereke nîşandayîna rastiyê wek xwe ye, di heman demê de divê ev teorî li gor rastiyên ku partî derxistine holê bi awayekî xurt raberî xelkê bike. Nivîskar rastiyên ku berhemên xwe de tesbît dikin, bi awayekî sosyolojîk şîrove dikin.

Realîstên sosyalîst berhemên bitez dinivîsin û hunera xwe dikin bin emrê doktrînekê an jî îdeolojîyekê. Tespîten xwe ji aliyê sosyalîzmê ve destnîşan dikin û bi awayekî zelal aliyekî digirin û aliyekî jî reş dikin. Gelek ji wan beriya hunerê de, fikara pêkanîna dozekê dikin û ji xeynî nivîsandina romaneke baş armancên dîn datînin ber xwe. Derdên welêt û hetta derdên gundiyan, bi awayekî terefdar carinan bi hezkirinê carinan bi xezebê tînin zimên; carinan tenê bi nêrinekê û carinan jî bi awayekî berfireh li ser disekinin.

Realîstên sosyalîst bûyeran wek encama armancên siyasî şîrove dikin û romanê wek amrazekê dibînin ji bo îdeolojîyên xwe û ji bo pêşvebirina civakê. Li gor kesinan

²³ Cihaner Akçay, “Hannâ Mine’nin Romanlarında Toplumcu Gerçekçilik”, (Teza Doktorayê ya Neçapkirî, Zanîngeha Gaziyê Enstitûya Zanîstên Civakî, Ankara 1998).

hemû mesele xirabî, dizitî, neheqî û nelirêtî ye û divê meriv balê bikişîne ser. Hin kes di pergala civakê de ji aliyê Marksîzmê ve hin guhertinên mayînde hetta şoreş dixwazin. Ji romannivîsekî zêdetir wek rojnamevanekî alîgir û wek siyasetvanan tevdiagerin.

Realîzma Sosyalîst sîstema mulkiyeta şexsî û paşxana wê ya siyasî û hişmendî rexne dike û li aliyekî jî çî li hember civaka sosyalîst be ji binî ve red bike. Ev teorî sîstema kapîtalîzmê û jiyana ku bi vê hişmendiyê ava bûye rexne dike ku bi vê erkê dibe partîzaneke.²⁴

Berhemên ku bi vî rengî hatine nivîsîn, herçiqas ji aliyê cûre û esasên xwe ve heta radeyekê ji hev cuda bin, dîsa jî di bin banê îdeolojiyê hevpar de dicivin. Ev yan pesna komûnîzmê didin yan jî diavêjin canê dijberên komûnîzmê yanê wan rexne dikin. Lewra berhemên edebiyata Sovyetê pincara eynî çiyayî ne.²⁵

Realîzma Sosyalîst ne tenê xwedî qeîdeyên diyarkirî lê belê xwedî nêrîn û bergehên diyarkirî ne. Realîzma Sosyalîst pêşniyaz dike ku bi îdeolojiya Sovyetê li dinyayê û li hemû mirovan bê nêrîn. Armanca wê ew e ku hunerê bike amraza partiyê.

3.2. Ked û Kedxwarin/ Îstîsmar

Di realîzma Sosyalîst de yek ji nîşaneyên sereke em dikarin bêjin ku “ked” e. Lewra Şoreşa Cotmehê bi van helwestan dest pê kir û bi ser ket. Parastina mafên kedkaran li hember kapîtalîzmê, pêşî li hember kedxwariyê girtin û xwedî li karker û kedkaran derketin ji bo şoreşê, ev yek armancên pîroz bûn.

Gorkî ji bo vê wiha dibêje “Cihana kedê, hişyarî pêdiviya şoreşê bû. Peywira edebiyatê çiyekî de piştgirî û mildan e ji bo cihana kedê. Ev piştgirî, herçiqas bihêz be, tiştê “ber xilasbûnê” zûtir têk dibe.”²⁶

Piştî ku îqtidarê girtin destê xwe çîna karkeran guhertinên tund çêkirin. Lewra

²⁴ Cihaner Akçay, **ht**, r.19- 20.

²⁵ Andre Siniavski, **hb**, r. 29- 30.

²⁶Maksim Gorki, **Edebiyat Yaşamım**, Şemsa Yeğin (wer.), Payel, İstanbul 2007, r.171.

salên pêşî yên piştî şoreşê temaya “ked”ê kete nav mijarên hunerê û ji ber nêzikatiya edebiyatê ji bo realîzma Sosyalîst giringiya kedê zêde dibe.

“Gorkî di salên 1920î de dibêje ku “temaya herî girîng a modern, ked e” û deh sal bi şûn de di Yekemîn Kongreya Nivîskaran de behsa vê dike: “Divê em kedê yanê mirovê ku di nav pêvajoya kedê de wek serlehengekî bi kar bînin.”²⁷

Sosyalîzm bi awayekî fikrî herî zêde li hember kapîtalîzmê disekine û meriv bi rehetî dikare bibêje ku kedxwarî jî yek ji wan sedeman e ku şoreş aniye. Kesên serdest dikarin yên bindest îstîsmar bikin. Kedxariya herî mezin di vê qadê de çêdibe.

Keda jinê ji aliyê mêrê wê û zarokên wê ve tê xwarin, keda karkerê ji aliyê serkarê ve tê xwarin, keda gundiyê ji aliyê axayê ve tê xwarin, keda xelkê ji aliyê dewletê ve tê xwarin... Axir meriv dikare van mînakên zêde bike. Hetta gelek caran bi bacên zêde dewlet keda gelî bi zorî dixwe. Serkar karkerê xwe zêde dide xebatê lê pereyekî kêmtir dide. Hetta hinek jî wê da herin, kedxwariyeke din jî kedxwariya zayendî ye. Keda jin û zarokan di vê qadê de zêde tê xwarin.

3.3. Lehengên Erênî

Yek ji hêmanên sereke yên realîzma Sosyalîst jî hêmana lehengê/a erênî ye. Dîroka têgeha lehengên erênî hetta sedsala 19an diçe. Di wê qirnê de lehengên erênî yên romanên Rusî zîrek in, jêhatî ne, hestiyar in; lê reşbîn in, bêkêr in, her tim bi fikreke neyînî li civakê dinêrin, carinan dilpak in carinan nikarin li gor fikrê xwe tevbigerin, her tim bêhêvî ne û dawîya dawî de têk diçin.²⁸

Di edebiyata Rûsan de, beriya serdema Sovyetê, *sûcdar* û *qurban* derdikeve pêş û ev yek jî tawanbarkirina nivîskarî bi xwe ye. Nivîskar her daîm xwe li hember sîstemê *sûcdar* dike. Ev *sûcdarkirin* jî paşê dê hêmayeke din derxîne: *Rizgarker (Mesîh)*... Ji xwe

²⁷Moisici Kagan, **Sanatta Sosyalist Gerçekçilik**, Feyyaz Şahin (wer.), weş. Parşömen, İstanbul 2011, r. 150-151.

²⁸ Berna Moran, **hb**, r. 60.

Gorkî jî vê nasnameya sêyemîn pêşniyaz dike. Ev her sê hêma wekî ku Ahmet Oktay jî destnîşan dike ku “rewşenbîrên Rûs, her tim êşê dikişînin; ew bi xwe jî tê de hemû nirxan red dikin û ji aliyekî ve jî bawer dikin ku dê rojekê kefareta van bên dayîn. Çi doktrîna Xirîstiyânî be çi civakî be, wisa bawer dikin ku dê dinya rojekê rast bibe, neheqîyên wê xilas bibe; û ev xweşbîniya wan piştî şoreşê dê rêgezêkê bine ji bo realîzma Sosyalîst û bingeha *lehengên erênî* ava bike. Ev pêşveçûn xwezayî ye û bimantiq e.”²⁹ Ev xweşbîniya nivîskarên Rûsan, di edebiyatê de, ji bo realîzma Sosyalîst kategoriyeke bingehîn ava dike û ev jî em dikarin bêjin ku wek *lehengên erênî* yanê tîpa erênî dibe diyariya edebiyata Sovyetan û realîzma Sosyalîst.

Divê edebiyata Sovyetê xwe ji vî *lehengê neyînî* xilas bike û *lehengêkî nû* ava bike. Ev *leheng* divê di rewşên tarî û bêhêvî de cesaretê bide mirovan; herçiqas êş bikişîne û tenê bimîne dîsa jî tu carî ji armanca xwe û ji îdeala xwe ya mezin dûr nekeve û dev jê bernede. Divê ev *leheng* xwe bike nezir ji bo wezîfeyên xwe û hakimî nefse xwe be; xwe baş perwerde bike, baş bixwîne û ev yek jî bi hal û tevgerên xwe nişanî mirovan bide; li hember pirsgerêkan hişyar û zîrek be.

Edebiyata Sovyetê piştî ‘Oblomovan’ hewcedarî *lehengêkî* wiha ye; yanê divê ‘xwendevanan re *lehengêkî* wisa bidin ku rêzê li ber bigirin û teqlîdê wî/wê bikin.’ Berna Moran dide zanîn ku Dobrolyubov jî di nivîsa xwe ya “Oblomov Temsiliyeta Çi Dike” de behsa tipên têkçûyî dike û pêdiviya çêkirina *lehengên erênî* dike. Kêm zêde hêviyên ji vî *lehengî* ev in: “Divê wek nûnerêkî tekûz yê fazîleta politikayê wisa bike ku xwendevan rêzê li hemberî wê/wî bigire; mîna keke baş bibe ku xwendevan jî bixwaze wek wê/wî be; di navbera îro û dahatûyê de pêwendiyek çêke û nişan bide ku sosyalîzm dikare ser bikeve.”³⁰

“Di nav romanên de ev tîp, xwe nezrî wezîfeyê xwe kiriye, hakimî nefse xwe ye û bihêz e. Xelk gelek êş kêşandine, lê nikarin bi tena serê xwe rêyeke baş bibînin û xwe jê xilas bikin; hewcedarî perwerdeyê, rênîşanderekî û serkêşekî ne. *Lehengên erênî* astengiyên rastî wan tên ew têk dibin; di nav insanan da herçiqas tenê bimînînin dîsa jî aliyî

²⁹ Ahmet Oktay, **hb**, r. 63.

³⁰ Berna Moran, **hb**, r. 61.

wan dikin.”³¹

Gorkî di nivîsa xwe ya bi navê “Hevpeyvîna Li Ser Karkeriya Hunerê” de behsa lehengên erênî dike û bersiva pirsên lêgerîna lehengekî rave dike, armanca xwe diyar dike:

“Ez dikarim bêjim ku berê her tiştî armanca min bi çêkirina lehengên erênî di edebiyatê de ev bû ku min lehengekê/î ‘bihêz’ û ‘jîr’ dixwest ku bi çavekî rexneyî temaşeyî cîhanê û civakê bike; lê belê heta wê çaxê ez tenê rastî lehengên wek Oblomov û Rudinî dihatim. Rûyê lehengê bi tinazekî qerînedar dihata berevajîkirin; lehengê Pomyalovskîyî Çerevanîn, di rêya xwe de bû.” Piştî van gotinan dîsa bi vî awayî; “fêmkirina hin tiştan bi min zehmet e lewre çima nivîskar rewşenbîran wek tîpên bêşexsîyet, bêrade didin nasîn. Lê ya rast ew bû ku, bi sedan rewşenbîr yan ‘diçûna xelkê’, yan dihatin mehkûmkirin yan jî sirgûn dibûn. Nexwe çima edebiyatê em pê kesên wek ‘Doza 193’ an de dihatin darizandin (li fabrîkayan propaganda çêdikirin, di tevgera Narodnaya Volyayê de kar dikirin) nedihesandin.”³²

Gorkî ji bo lehengên erênî dibêje ku “tiştê ku min ji edebiyatê hevî dikir berê her tiştî, lehengeke/î wisa bû ku ‘hêzdar’ û ‘xwedanê kesayetekî jîr û rexneyî’ bûya.”³³

Lehengên erênî tam li gorî dilê şoreşê bû ji bo dahatûyê. Jdanov jî di axaftina xwe ya kongreyê de li ser disekine û dibêje ku lehengên erênî nîşaneyên xeyalî nînin; lewra ev leheng şexsîyeta dahatûyeke plankirî ne. Leonov jî ji bo lehengên pirtûka xwe dibêje ku ew wisa bilind in ku meriv gava li wan dinêre dahatûyê dibîne.³⁴

³¹ Jr. W. Rufus Mathewson, **The Positive Hero in Russian Literature**, Columbia University, USA 2000, r.290.

³²Maksim Gorki, **hb**, r. 195- 196.

³³Maksim Gorki, **hb**, r. 186.

³⁴ A. A. Jdanov, **Edebiyat Müzik ve Felsefe Üzerine**, Fatmagül Bertay (wer.), weş. Kaynak, İstanbul 1996.

3.4. Romantîzma Şoreşger

Yek ji hêmanên ku Gorkî diyarîyî edebîyatê kiriye “romantîzma şoreşgerî” ye. Realîzma Sosyalîst li hember romantîzmê sekiniye; lê belê dîsa jî di nav berhemên realîst ên sosyalîst de ji lehengên erênî hêviyek heye ji bo dahatûyê. Ev yek li dijî realîzmê ye. Di salên 1930an de ev rewş gelekî hatiye nîqaşkirin û paşê biryar dane ku romantîzma ku berheman de behsê tê kirin dijî realîzmê nîne. Lewra ev romantîzm, romantîzma ku em dizanin nîne; ev “romantîzma şoreşger” e.

Jdanov dibêje ku “divê edebiyata me rûyê xwe ji romantîzmê ba nede; lê divê ev romantîzmeke nû be, romantîzma şoreşgerî. Edebiyata Sovyetê divê bizanibe ka çawa şekil bide lehengên me û li dahatûyê binêre.”³⁵

Romantîzma şoreşger ji aliyê Lukacs ve gelek caran hatiye rexnekirin. Lukacs rewşên derasayî rexne dike ku ev rewş wekî ku tîpîk bin tîpîk nîşandan. Li gorî Lukacs realîzma şoreşger esasen ev e: “Romantîzma şoreşger ji pratîkên xirab yê realîzma Sosyalîst peyda dibe û derdikeve holê; nikare dewlemendî û xweşikiya realîzmê nîşan bide û wekî çareseriyekê ye ji bo ku xwe ji bêtehmiya edebiyata naturalîst bişo.”³⁶

3.5. Folklor

Di rejîma Sovyetê de, Stalînîzma ku behsa dewra Stalîn dike ji têgehên Marksîzm û Lenînîzmê wêdetir çûye. Polîtîkaya dewra Stalîn hewl daye ku nasnameyên YKSSyê (Yekitiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê) bi awayekî sîstematîk di nav xwe de bihelîne û nasnameyêke nû ji bo Sovyetê ava bike ku zimanê wî jî tenê Rusî bibe.

Partiya Komûnîst a Rûsan bi Şoreşa Cotmehê ya 1917an berê xwe dide pirsgerêkên milletên ku ji dewra Rûsyaya Çarîtiyê mayî û hewl dide ku vê meseleyê çareser bike. Ji bona vê jî Komîseriya Netewetî ava dikin û Stalîn jî serokatiya wê dike. Wisa xuya dike ku beriya şoreşê û salên berê yê şoreşê, niyet û peyamên xweşbîn

³⁵ Berna Moran, **hb**, r. 62

³⁶ Berna Moran, **hb**, r. 62

digere; lê bi şûn de Partiya Komûnîst û rêveberên wê bi kirinên xwe ew atmosfera xweşbîn xirab dikin. “Politikaya neteweyan herçiqas di salên 1920î de bi awayekî xweşbîn bimeşin jî, piştî ku navendparêziya Sovyetê kamil dibe ev yek diguhere. *Stalînîzma* ku ji aliyê siyasetzanan ve wek dîktatoriya Stalînî tê binavkirin, bi polîtîka û kirinên xwe ji Marksîzm û Lenînîzmê jî dibore. Girîngtirîn armanca Stalîn jî ew e ku hemû nasnameyên çandî di nav sîstemekê de winda bike û nasnameyeke nû ava bike: Nasnameya Sovyetê...”³⁷

Di dewra Stalîn de hem ji bo Rûsan û hem jî ji bo milletên din heman polîtîka dihat meşandin. Xebatên li ser ziman, edebiyat, arkeolojî, nîjadnasî/etnolojî û folklorê hema hema bi awayekî paralel dihat kirin.

Rusan, her daîm ji bo berdewamiya rejîma komunîst li ser alfabe û zimanî xebitîne û midaxeleyî edebiyata devkî û nivîskî kirine. Ji bo vê yekê jî li ser folklor û çanda milletî jî gelek xebitîne. Lewra Lenîn dixwaze ku ji bo avakirina sîstema rejîmê hêvî û baweriya milletî bi kar bîne. Lenîn giringiya folklorê bi vî awayî dibêje: “Di nav berhemên folklorîk de hêvî û baweriyên gelan hene; divê ji bo çêkirina rejîmê em sûd ji van berhemên folklorîk wergerin.”³⁸

Folklor bi taybetî di dewra Stalînî de –di rejîma tehdekar de- wek amûrekê tê bikaranîn. Sedemên wê em dikarin bi vî şiklî rêz bikin:

a. Cûreyên folklorê hema bêje bi tevahî gelêrî ne, anonîm in.

b. Dikarin bi dilê xwe midaxeleyî van cûreyan û mijarên wan bikin.

c. Berhemên folklorîk ji aliyê hemû kesan ve tên fahmkirin.

d. Sîstema komunîst a ku hêviyek çêkiribû ji bo parastina mafên çînan, bi taybetî jî ji bo çîna proleter, dikariya di fabrîqeyan de, kolxozan de, cotgehan de, zeviyan de û li

³⁷Nezir Temur, “Folklor- İdeoloji Bağlamında Sovyetler Birliği Dönemi Folklor Politikaları Ve Bu Politikaların Kırgız Folkloruma Etkileri”, **Bilig**, j. 53, r. 223

³⁸İsa ÖZKAN, “Sovyetler Birliği Döneminde Türkmenistan’da Folklor Çalışmaları”, **VI. Milletlerarası Türk Halk Kültürü Kongresi**, Son Elli Yılda Türkiye Dışındaki Türk Halk Kültürü Çalışmaları Seksiyon Bildirileri, Ankara, 2002, r. 226.

gundan armancên xwe bi rehetî aşkera bikira.

e. Gelek cûreyên folklorê hene ku bi saya wan dikarin peyamên xwe zûtir belav bikin.

f. Berhemên folklorîk di nav milletê de êdî zû û rehet belav dibin.³⁹

Di Yekitiya Sovyetê de hemû xebatên ku hatine çêkirin ji bo armancekê ne, Sovyetkirina xelkê. Şair û hozanên li gundan hatine teşwiqkirin ku derheqê şoreş û şoreşgeran de helbest û destanan binivîsin. Kesên ku bi vî rengî berhem nivîsîne bi pere, madalya û nişaneyan hatine xelatkirin.

“Wekî mînak, di 1936an de Jambil dawetî Moskowayê dikan û li wir, di sehneyên opera û şanoyan de derheqê Lenîn, partî û xelkê Yekitiya Sovyetan de gelek helbestan dixwîne. Di 1938an de Nişaneyên Lenîn werdigire û di heman salê de li Sovyeta Bilind ya Kazakîstanê de dibe parlementer.”⁴⁰

Di vê serdemê de kesên bi dilê şoreşê berhem dinivîsin tên xelatkirin lê belê li aliyekî din ve jî dijberên rejîmê yan hatine sirgûnkirin yan jî hatine dardakirin. Di 1936an de di binesaziya Komîseriya Gel ya Sovyetê de ji bo karên hunerî komîteyek damezirandine û ligel vê komîteyê jî li cumhuriyetan wek mehelî saziyên hunerî ava kirine. Bi vî awayî berhemên gelan di bin kontrola van saziyan de maye û li ser van berheman sansûreke komûnîst û sosyalîst bi rehetî hatiye kirin.⁴¹

Heta li ser berhemên devkî û nivîskî yê folklorîk mudaxeleyên mezin kirine. Kîlam, stran, çîrçîrok, gotinên pêşîyan û biwêjan ji nû ve şîrove dikan û hewce bike ji nû ve didin nivîsandin. Tenê destan û hinek çîrçîrokan de mudaxele nekirine.

Di geşedanên qada folklorê de divê girîngiya Gorkî li ber çavan be; lewra axaftina

³⁹İhsan Kalenderoğlu, “Sovyetler Birliği Döneminde Bolşevik Rejiminin Türkmen Folkloruna Etkileri”, **Turkbilig**, j. 2008/16, r. 115.

⁴⁰Nezir Temur, **hg**, r. 224

⁴¹Nezir Temur, **hg**, r. 226

Gorkî ya 1934an li kongreya Yekitiya Nivîskaran, ji aliyê folklorê ve zehf girîng e û bandorê li ser gelek kesan kiriye. Di vê axaftinê de Gorkî jî wekî Sokolov tekiliya di navbera çîna karkeran û folklorê de behsa afirandina devkî ya çîna karkeran dike. Gorkî tîne ziman ku têkiliya folklor û edebiyatê gelek xurt e û divê ev çanda heyî bê berhevkerin û lêkolînkirin.

Di vê noqteyê de em dikarin bibêjin ku rejîma Sovyetê, dixwaze ku bîra neteweyî ya milletan winda bike û bi îdeolojiya xwe bîreke nû ya civakî ava bike.

3.6. Dîn

Marksîzm doktrîneke bêxwedayîye. Dîn, li gor Marksîstan ji bo pêşveçûna gelan astengeke mezin e. Gotina Marks ya “Dîn, efyona gelan e.” ji bo nêrîna Marksîstan bûye bingehêke esasî. Ev nêrîn ji aliyekî ve hemû dînan wek amûrekê dibîne ji bo parastina kedxwarinê û serxweşkirina çîna karkeran. Dîn heta radeyekê paşvexwazî ye ji bo wan.

Di dewra Stalînî de, ji bo serketina modela Sovyetê astengek heye û ew jî pirsgirêka dîn e. Lewra dixwazin sîstemeke nû, mirovên nû, jiyaneke nû ava bikin û ligel van jî divê dîn nebe problem. Di vê sîstema nû de ji bo dînî jî alternatîfêk pêwîst e û divê motîvasyonên mirovan biguhere. Lewra di nav Sovyetê de gelek dîn û bawerî hene; ev yek jî nahêle ku yekîtiyek pêk bê.

Îdeolojiya Sovyetê li hember nirxên çandî û dînî têkoşîneke mezin pêk tîne û ciyê wan de jî “ateîzma zanistî” pêşniyaz dike. Wekî alternatîfêkê ciyê Xristiyanî û Îslamiyetê de saziyekê ava dike û wê jî bi navê “ateîzma zanistî” dide nasîn.

Ev yek li Sovyetan diyardeyeke civakî ye ku li hember dînê bisekine û wekî saziyekê xwe biparêze. Li gor teorîsyenên Sovyetê li hember dînê amrazên bingehîn ‘Ateîzma Zanistî’ ye. Bingehên ateîzma zanistî bi nêrînên Marks, Engels û Lenînî hatine amadekirin ku ev nêrîn bi xwe jî esasa îdeolojiya Sovyetê bi xwe ne. Partiya Komûnîst a YKSSyê, di têkoşîna li hember dînê de girîngeyeke taybet daye propagandaya ateîzma zanistî.

Îdeolojiya Sovyetê di nav civakê de li hember dîn û baweriyên alternatîfan çêdike ku sîstema xwe bi dilê xwe belav bike. Wek mînak sazî û rêzikên dînî, perwerdehiya dînî tîst astengkirin û dewsa wan de saziyên ateîzmê (bêxwedayî) û rêzikên wê cih digirin. Propagandaya ateîzmê tê kirin û ciyê cejnên dînî de cejna wê tê pîrozkirin. Nivîs û berhemên Lenîn û Stalîn wek metnên pîroz tîst pêşkêşkirin; gava Lenîn dimire laşê wî yê mûmyakirî jî wekî ziyaretgeha giregirên dînî tê ziyaretkirin.⁴² Cejn û rojên din ên pîroz radikînan û ciyê wan de Cejna Cotmeha Mezin pîroz dikin.

Yekitiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê (YKSS), komûnîzmeke bi modela Rûsan bi kar tîne û em dikarin bibêjin ku ev model jî bi girêdayî îdeolojiya Marksîzm û Lenînîzmê bû. Ev model û pratîkên wê yê dînî wek alternatîfê e di nav Sovyetan de û bi navê ateîzma zanistî belav dibe. Di serdema Sovyetan de ateîzma zanistî li hember dînan tîkoşînan pêk tîne û dixwaze ku ciyê dînan bigire.

Di nav sîstema Sovyetan de, di îdeolojiya Marksîst-Lenînîst de nêrînên ji bo avakirina çîna karkeran, di qada dînê de jî derdikeve pêş û xwe nîşan dide. Lewra dibêjin ku “dîn, di nav civakê de xizmeta çînen serdest dikin. Ji ber vê ye ku hemû dîn ji aliyê nêrînên xwe ve li hember îdeolojiya Sovyetê ne. Ateîzma zanistî, insanan ji dînê xilas dike û bi vî awayî insanan ji evdîtîyê xilas dike. Tenê proleterya dikare insanan ji dînê xilas bike.”⁴³

Ji bo ku ateîzmê di nav gelan de belav bikin û bidin pejirandin, li hember saziyên dînî propagandayan çêdikin; ayîn û baweriyên bi rêya metnên nivîskî û devkî çavê xelkê de reş dikin.

Em dikarin bibêjin ku Yekitiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê (YKSS), herçiqas jî sîstemeke pîreteweyî, pîrzimanî û pîrdînî xuya bike û li gor wan şert û mercan bi keys bike; dîsa jî ji bo demeke dirêj armanca wê ew e ku hemû cudahiyan ji holê rake û bi vî awayî gelê “Sovyet”ê ava bike. Gelê Sovyetê jî em dikarin bi vî rengî pênase bikin:

⁴² Ali Yaman, “Sovyet Siyasi Tarihinde İslam ve Ateizm Mücadelesi: Sovyet Dönemi Kazak, Özbek ve Kırgız Ateizm Literatürünün Analizi”, **II. Uluslararası Sosyal Bilimciler Kongresi**, Bîşkek 2008, r.482; Dilaram Akramova, “Kırgızistan’da Din Eğitimi Sorunları ve Çözüm Arayışları”, **II. Uluslararası Sosyal Bilimciler Kongresi**, Bîşkek 2008, r.495.

⁴³ Ali Yaman, **hg**, r.482.

Zimanê wî “Rûsî”, dînê wî “ateîzma zanistî”, neteweyê wî “Sovyet” e û hemû îmkanên dewletê ji bo avakirina vî gelî ser piyan e.

3.7. Dîrokîfî

Realîzma Sosyalîst ji nivîskaran rastiye dixwaze û divê ew rastî jî girêdayî heqîqetê be. Di vê nêrînê de, kesên ku di nav bûyeran de ne divê bi mekanekê û demekê ava bibin. Dema ku van bûyeran di nava xwe de dihewîne serdemeke dîrokî ye. Berhemên tên nivîsîn herçiqas jî belgeyên dîrokî nebin, dîsa jî taybetiyên serdema xwe di nava xwe da dihewînin. Ev, yek ji esasên realîzmê ye jixwe.

Hêviyên ji nivîskarê ew in ku bûyeran bi dîrokeke şênber bi girêdayî heqîqetekê bide nîşanî xwendekaran. Pospelov jî ji bo vî qasî di pirtûka xwe ya *Zanista Edebiyatê* de wiha dibêje: “Ji bo vegotina rastiyan di nava realîzma Sosyalîst de, divê lehengên berhemê di nav zemanekê diyar de be û derdoreke civakî jî jê ra lazim e.”⁴⁴

3.8. Gelparêzî

Realîzma Sosyalîst, bi pêvajoyeke cuda yanê bi pratîka avakirina civateke sosyalîst û bêçîn derdikeve holê û hewl dide ku valahiya di navbera berjewendiyên şexsî û civakî de bigire. Li aliyekî din jî ji bo pêşveçûna gel dixwaze ku şert û mercên guncav ava bike.

Di realîzma sosyalîst de girseyên mezin hene û wekî afirînerokî di çêkirina bûyeran de roleke girîng dilîzin. Di avakirin û pêşvebirina metodeke nû de, bi tevger û çalakiyên xwe dibin temaya esil ya edebiyata Sovyetan. Lehengên berhemên ne bi tena serê xwe nûnera şexsî xwe bi xwe ne; lê li aliyekî ve jî temsîliyeta gelê xwe ye, bi îdealên nû yên civakî parêzvaniya dengê gelê xwe dike.

⁴⁴Gennadiy Pospelov, **Edebiyat Bilimi**, Yılmaz Onay (wer.), weş. Evrensel, İstanbul 2005, r.508.

Berthold Brecht, derheqê gelparêziyê de wiha dibêje: “Gelparêzi” û “rasteqîni” du hêmanên wekî hev in êdî û li hev digerin. Dixwazin girseyên karker bi rêya edebiyatê wekî rastiyan cihanê dikeve nav hûnerê û ev jî bi kêrî wan tê. Ji ber wê ye ku ev edebiyat divê qethiyên rûyê xwe bizivirîne gelê xwe, ji bo wan berhemdar be û divê ji aliyê wan ve jî bê fêmkirin.⁴⁵

3.9. Mijarên Aboriyê û Sîstema Kolxoz û Sovxozan:

Wekî ku paşê di analîzkirina romanên de jî xuya bike ku hin berhem li ser wan sîsteman ava bûne. Bûyer tevahî li derdorê kolxozan derbas dibin. Lewra ji bo sîstema nû divê kolxoz û sovkoz baş bê fêmkirin. Çi ye ev kolxoz û sovkoz ku mekanên romanên di destê xwe de girtine?

Yekitiya Sovyetê, piştî hilweşîna Rejîma Çarîtiyê, di demên xwe yên ewil de ji aliyê leşkerî ve lawaz bû û hîn jî çek û tank û balafirên rejîma berê dişixulandin. Derfeteke wisa nebû, fabrîqeyên wan tîne bûn ku çek û tankan an jî balafir û amûrên cengî çêkin. Di 1928an de aboriya Sovyetê % 70 bi çandinî û cotkarî pêk dihat. Di serdema Polîtîkayên Aboriyê yên Nû (PAN) de kes mudaxeleya mulkiyeta şexsî nedikir. Dewlet tenê bacên sivik ji hemwelatîyan xwe werdigirt û ew bac jî ji bo geşkirina sektora pîşesaziyê têrî nedikir.⁴⁶

Stalîn di 1928an de serdema PANê xilas kir ku ev sîstem piçek jî be ji bo mulkiyeta şexsî derfet dida xelkê. Lê di serdema dîktatoriya Stalînî de qethiyên mulkiyet û teşebusên şexsî tîne bû. Bi vê armancê, di çandinî û cotkarî de jî sîstema mulkiyetên şexsî rakir û derbasî mulkiyeta giştî bûn. Lewra êdî biryar didin ku hemû gundiyan Sovyetê li cotgeh/çandingehên mezin ên kolektîf de kom bin. Ev çandingehên kolektîf bi navê *kolxoz* tên naskirin û têkde/bi tevahî di bin kontrola dewletê de ne.

⁴⁵Berthold Brecht, neql. Cihaner Akçay, **ht**, r. 31-32.

⁴⁶Burçin Ayık, “**Cengiz Dağcı ve Cengiz Aytmatov’un Bazı Romanlarında Ruslaştırma ve Sömürü Politikası olarak Kolhoz**”, (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Zanîngeha Celal Bayarê Enstîtûya Zanistên Civakî, Manîsa 2015), r. r.22-23.

Bolşevîk bawer dikin ku bi rêya van çandîgehên hevbeş, zêdebûneke mezin dê çêbe di warê çandîniyê de. Ji bo vî qasî jî kesên sozdar û sadîq lazîm in ku van karên kolektîfînê pêk bînin û hem jî girêdayî Stalînê û Partiya Komunîst bin. Bi vî awayî karkeran peyda dikin û dişînin gundan. Ev karker nexwendî ne û derheqê çandîniyê de jî zêde tiştan nizanin. Her yekî re peywira dagerandina kolxozan didin û hêvi dikin ku ev sîstem dê bi awayekî tîkûz bimeşe.

Rêxistina kolxozê ji aliyê mulkiyetê ve xwedî xîmekî cuda ye. Ji xwe erdê kolxozê aîdî dewletê ye û li gorî makezagona YKSSyê, milkên dewletê di heman demê de, qey nebe bi awayekî teorîk, milkê xelkê ye jî. Kolxoz dikarin ji erdê dewletê bêicare sîd wergerin. Amrazên çandîgehê yên ku hilberandinê de tîk bîkaranîn, mulkiyeteke hevpar e û divê herkes lê xwedî derkeve.

YKSS wê demê di teknolojiya çandîniyê de zêde baş nîne û ji bo teknîkên modern û zêdekirina mehsûlên xwe Santrala Traktor û Maşîneyan (Maşîno- Traktornaya Stansiya) ava dike. Bi vî awayî rêxistina navendî dixwaze ku kolxozan bi rêya van santralan kontrol bike; ji ber ku ev STM ji aliyê navendê ve tê avakirin û rêvebirên wê jî ji navendê tîk şandin. Li aliyekî din ve jî ev STM gundan li gorî sosyalîzmê jî nû ve saz dikin.⁴⁷

Di serê her kolxozekê de serokêkî heye û ev serok ji aliyê endamên kolxozê ve tê hilbijartin. Lê dû re Partiya Komûnîst serokên kolxozan bi xwe hildibijêre û serok çî bêje ew dibe. Heta dabeşkirina peywiran jî ev serok çêdike; dawiyê de jî rewşa kolxozê, pêwîstiyên wê Partiya Komûnîst re dibêje û hisaba mehsûlan jî dide wan.

Ji bo polîtîkayên wê dewrê çandîgehên kolektîf yên bi navê *Sovxoz* jî ava dikin. Bi rêya sovxozaan erdê xelkê dikin malê dewletê. Bi giştî sovxozaan tenê qadekê de dibin pispor û tenê wê dextlê diçînin. Ewîl sovxozaan tîk avakirin lê paşê rêvebirî nikare li her derê

⁴⁷ Yerkebulan Zhumashov, “Kazakistan Cumhuriyeti’nde Yerel Yönetim Reformları: Kolhoz ve Sovhoz Sisteminin Çözülmesi ve Yeni Yapılanma”, (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Zanîngeha Ankarayê Enstîtûya Zanîstên Siyasî, Ankara 2010), s.12.^[1]_[5EP]

sovxozaan ava bike û ciyê wan de kolxozaan ava dike.⁴⁸ Kesên ku di sovxozaan de dixebitin cotkar nîn in, karker in û bi meaş karê xwe dikin.

4. Armanc û Çarçove

Di vê tezê de em dixwazin nîşan bidin ku nivîskarên kurd ên Sovyeta berê bi sîstem û xebatên Yekitiya Sovyetê çawa tradîsyona edebiyatekê pêk anîne û herwiha li Sovyetê berhemên xwe afirandine. Dîsa armanc ew e ku, bandora sîstema Sovyetê û realîzma sosyalîst li ser romanên kurdî yê Sovyetê bê destnîşankirin. Bi qasî ku destpêkê de hatiye diyarkirin, bi çend hêmanan ev bandor dê bê analîzkirin. Di van romanên de hişmendiya îdeolojîk û partîzanî çawa hatiye bikaranîn, gelo çi qas ew bi tezekê hatine nivîsîn? Ked û kedxwarina sîstematik di van romanên de çi qas cih girtiye? Lehengên van romanên bi çi awayî tevdigerin, nêrîna wan çi ye? Gelo ew wekî romantîkên berê ne yane bi romantîzmeke şoreşger tevî jiyana û dozê dibin? Folklor û dîn di van romanên de çawa rû dane û bi çi awayî hatine bikaranîn. Gelo bikaranîna van her du hêmanan li gorî projeya Sovyetê ne yan bi awayekî din cih girtine? Dîsa rêgeza dîrokîtiyê çawa hatiye bikaranîn, çi qas bi ser ketiye? Li gor van hêmanan em ê bikevin li pey hin bersivan û wan bişopînin.

Ji bo çarçove û sînorkirina vê tezê me 13 romanên kurdên Sovyeta berê hîlbijartin ku di navbera 1935 û 1991an de hatine nivîsîn. Ev periyod bi yekem romana kurdî dest pê dike û heta hilweşandina YKSSyê berdewam dike. Piştî YKSSyê elbet edebiyata Qafqasyayê dewam dike lê şopandina realîzma sosyalîst wateya xwe wînda dike. Ji ber ku êdî ew sîstema sosyalîst têk diçe, Yekitiya Sovyetê hildiweşe, çend netewe-dewlet tên damezirandin û kurd jî di nava van welatan de belav dibin. Lewra periyoda 1935-1991 ji bo vê xebatê guncav e.

⁴⁸Yusuf Ziya Kınacı, “Kolhozlar, Sovhozlar ve Kibutzlar: Kolektif Örgüt Yapılarının İncelenmesi Üzerine Bir Deneme”, https://www.academia.edu/10079148/Kolhozlar_Sovhozlar_ve_Kibutzlar_Kolektif_Örgüt_Yapılarının_İncelenmesi_Üzerine_Bir_Deneme, 10.02.2017, r.5.

Bi vê armancê me ji 7 romanûsên kurd ên Sovyeta berê 13 roman analîz kirin. Ji bo vê periyodê romanên ku hatine analîzkirin ev in: Ji Erebê Şemo Şivanê Kurmanca (1935), *Dimdim* (1965), *Jiyana Bextewar* (1959), *Berbang* (1958), *Hopo* (1969); ji Sehîdê Îbo Kurdê Rêwî (1979); ji Egîdê Xudo Dê û Dêmarî (1986); ji Eliyê Evdilrehman *Xatê Xanim* (1959), *Gundê Mêrxasan* (1968), *Şer li Çiya* (1989); ji Heciyê Cindî *Hewarî* (1967); ji Ahmedê Hepo *Bawerî* (1990); ji Ezîzê Gerdenzerî *Fîncana Ferfûrî* (1990).

Elbet di nava van berheman de gelek ji wan bi mudaxaleyên weşanxaneyan, ji zimanê xwe yê resen dûr ketine û bi hewldana wan nêzikî standardên Kurdî- Kurmanciya Kurdistana Bakur bûne. Ev yek ji bo xebata me astengî dernaxe, lê divê bê gotin ku hin termînolojiya wan di vê tezê de jî hatiye bikaranîn. Wekî mînak di tevahiya romanên de navê Partiya Komûnîst ya Yekitiya Sovyetan bi navê xwe yê resen nehatiye bikaranîn, di dewsa wê de “Partî” tê gotin ku me jî bi heman kontekstê de vê peyvê gelek caran bi kar aniyê. Wekî din Hikûmeta Sovyetê jî gelek caran bi navê “Dîwan” an jî “Dîwana Sovyetê” hatiye bikaranîn ku heman aqubet ji bo vê peyvê jî derbasdar e.

5. Çavkanî û Rêbaz

Di lêkolînên nîtel de, analîzên daneyan ji bo lêkoleran gelek caran pirsgirêk derdixe û ev merhale bêtir serê wan diêşîne. Lewra di lêkolînên nîtel de rêbazên standart ên analîzkirina daneyan yan pir hindik in yan jî nîn in. Lêkolînên wiha ji bo analîzeke berfireh rêya lêkoleran teng dikin. Lewra her lêkoler û her wiha xwîner, li gorî paşxane û zanînen xwe dinirxîne. Lê ev yek jî ji bo xebateke zanistî pirsgirêkan derdixe.

Lewra me jî hewl da ku bi rêbazên zanistî vê xebatê bi rê ve bibin. Di analîzkirina van berheman de yekemîn çavkaniyên me elbet romanên li ber destê me ne. Di analîzan de me daneyên xwe bi teknîka vesehîkirina belgeyan berhev kir. Bi xwendineke rexneya Marksîst, ku berheman bi teknîkeke dengvedanê analîz dike, me jî da li ser vê rêyê û şîrove û analîzên xwe bi vê rêbazê çêkir. Li gorî rexneya Marksîst berhemên edebî

îdeolojiya serdema xwe didin der. Li vir edebiyat bivênevê xizmeta çîna serdest dike.⁴⁹ Xebata me de jî bi alîkariya rêgezên realîzma sosyalîst îdeolojî, partîzanî, lehengên erênî, romantîzma şoreşger û hwd., romanên kurdî yên Sovyeta berê hatin analîzkirin. Bi vî awayî bandora rejîma Sovyetê û herwiha realîzma sosyalîst jî hat destnîşankirin.

Ev tez, ji destpêk, sê beş û encamê pêk tê. Di destpêkê de têkiliya edebiyat û hûnerê hat diyarkirin û bi vê yekê re teorîya li ser realîzma sosyalîst hat lêkolînkirin ka dîroka wê, derketina wê û bandora wê ya li ser edebiyatê bi çî awayî çêbûye. Ji bo analîzeke berfireh rêgezên wê hat destnîşankirin ku ev jî ji bo beşa sêyemîn dê bibe bingehekê. Armanç û çarçoveya tezê hat diyarkirin û herwiha çavkanî û rêbaz jî hat destnîşankirin.

Di beşa yekem de, em li ser mijara kurdên Sovyetê rawestiyên. Ev pêwistîyek bû ku dîroka kurdan a li Rusya û li Sovyetê bihata dîtin. Bi vê armançê, me bi çarçoveyeke dîrokî hebûna kurdan a li Sovyetê raxist li ber çavan ku ev yek bi belgeyên dîrokî hatin nîşandan. Piştî Şoreşa Cotmehê ya 1917an, li Sovyetê rewşa kurdên Azerbaycan, Gurcîstan û Ermenîstanê bi awayekî dîrokî me behs kir. Bi çarçoveya dîrokî re, me xebatên kurdolojiyê yên li Rusyayê jî bi awayekî kronolojîk nîşan da ku ew dê bibin bingeha kurdolojiya modern.

Di beşa duyem de, edebiyata kurdî ya Sovyetê û tradîsyona ku bi xwe re ava kiriye, bi hûngiliyên xwe ve hat nîşandan. Bi polîtîkayên Sovyetê, hemû geşedanên çandî û zanistî me bi her cûreyên xwe ve diyar kir. Li gorî nêrînên lêkoler û rewşenbîran, edebiyata kurdî ya li Sovyetê bi sê qonaxan hat dabeşkirin û taybetiyên wan hat vegotin. Romana kurdî û geşedana wê hat nîşandan û berhemên wê dewrê bi serencamên xwe ve hatin nîşandan.

Beşa sêyem a tezê ji nirxandina sêzdeh romanên kurdî yên Sovyeta berê pêk tê. *Şivanê Kurmanca, Berbang, Jiyana Bextewar, Hopo, Dimdim, Xatê Xanim, Gundê Mêrxasan, Şer Li Çiya, Kurdê Rêwî, Hewarî, Dê û Dêmarî û Fîncana Ferfûrî û Bawerî* bi hûngiliyên xwe ve bûn mêvanê nirxandin û analîzan. Em di vê beşê de ketin li pey şopên

⁴⁹Ji bo zêdetirîn agahiyên derbarê rexneya marksîst de bnr. Berna Moran, **hb**,r. 87- 98.

realîzma sosyalîst, da ku nîşan bidin ka ev teorî bi çi awayî û heta kîjan astê, di nava van romanên kurdî yên Sovyeta berê de hatine bikaranîn. Di vê beşê de, li gorî rêgezan, me nirxandineke giştî li ser van romanên kir.



BEŞA YEKEM

KURDÊN SOVYETÊ

1.1. Çarçoveya Dîrokî

Di destpêka sedsala 19an de Rûsî, Gurcîstanê, bakurê Azerbaycanê û rojhilata Ermenîstanê dagir dikin. Ev herêma berê di bin desthilatiya farisan de bû û hejmara kurdên kêmîne jî li vir gelekî zehf bû. Di bin tevliheviya guherînên dîrokî de ji serdema Şeddadîyan heta niha, ji xeynî kurdên Azerbaycanê, meriv nikare bi awayekî misoger bibêje ka kurdên vê derê gelo neviyên kurdên Transqafqasyayê ne yan ne. Lê tiştê mîsoger ew e, meriv dikare bibêje ku niştecihên esil yê Kurdistanê sînorên xwe ber bi Transqafqasyayê ve fireh kirine û heta Transqafqasya jî dikeve neva vê firehbûnê. Sedemên vê yekê jî tadeyên aborî, lihevixistinên kuştinî û jiyaneke nîvkoçerî ne.

Şerîf Vanlî destnîşan dîke ku li gorî serjimariya 1897an, ku ev hejmartin li gorî zimanê zîmakî pêk hatiye, serjimara Rûsyayê 125,640,200 e û nêzikî 100.000an jî kurd li wê derê hene.⁵⁰ Vanlî li ser jî zêde dîke û dibêje ku ev hejmarên ku ber destê me ne, meriv nikare zêde baweriya xwe pê bîne. Ji ber ku paşê di îstatîstîkên Sovyetê de jî em ê bibînin ku ji ber siyaseta xwe, Rûsyaya Sovyetan, dê hejmara kêmîneyên xwe tu carî bi zelalî eşkere neke, bi taybetî jî yê kurdan.

Gelek zanyar qebûl dikin ku di nîveka sedsala 20an de di komarên Sovyetê yê Transqafqasya û Asyaya Navîn de hejmareke girîng ya kêmîneyên kurd hene. Bi sedan salan hin civatên kurd li wan deran jiyane. Li gorî Vlademîr Mînorskyê, ji çaxên berê ve

⁵⁰İsmet Şerîf Vanlî, "The Kurds in the Soviet Union", *The Kurds^[1]A Contemporary Overview*, (152-173), Taylor & Francis e-Library, UK 2005.

Kurd li Transqafqasyayê dijîn. Etnografa Rûs Tatiana Aristova jî dide zanîn ku piştî zayîne sedsala 10an de li derdorê Naxçivan, Azerbaycan, Qerebaxê Çiyayî (Nagorny Karabach) û gundên li ser sînora Ermenîstanê rêçen kurdan hene.⁵¹

Li gorî A. Bennigsenê, li Sovyetê kêmnîya ku herî hindik tê zanîn Kurmancîaxêvên Xorasanê ne. Şah Abbas wan ji Azerbaycanê sirgûnî Xorasanê dike ku bakurê rojhilata Farisan (Îranê) ji Ozbekan biparêzin. Û angaşteke wî jî heye, dibêje ku bi îxtîmaleke mezin di dawiya sedsala 19an de, kurdên Tirkmenyayê ji aliyê hejmarê ve ji Transqafkasyayê zêdetir in.⁵²

Tablo1: Nifûsa etnîk/nijadî ya Rûsyayê ya serjimariya 1897an

Grûpên Etnîk	Hejmarên wan
Rûs. Ukrayna û Belarûsî	89,933,600
Ermenî (li temamî Rûsyayê)	1,173,100
Gurcî	824,000
Tacîk	350,400
Turkoman	281,400
Osetî	171,700
Kurd	99,900
Kabardin (bi zimanê Kafkasî diaxivin)	98,600
Tatî (bi zimanê Îranî diaxivin)	95,100
Abxaz (bi zimanê Kafkasî diaxivin)	72,100
Çerkes (bi zimanê Kafkasî diaxivin)	46,300
Farsî	31,700
Afgan	500
Cihû	5,063,200
Ën din	27,398,600
Yekûn	125,640,200

Çavkanî: Processus ethniques en URSS. Versiyona Fransî ji aliyê Emery, Larînova û Rygalov ve tê wergerandin. Moskova, 1982, r. 35

Li gorî vê tabloyê Şerîf Vanlı dibêje ku heke koka nifûsa kurdên Ermenîstana Sovyetê ya wan rojan were rojevê bêguman meriv dikare bibêje ku hejmara kurdan li

⁵¹ Khanna Omarkhali, “The Kurds in the Former Soviet States from the Historical and Cultural Perspectives”, *The Copernicus Journal of Political Studies*, j. 2, 2013, r. 131.

⁵² A. Bennigsen, neql: Şerîf Vanlı , **hb**, r. 152.

gorî serjimariya 1897an êdî kê m e. Ji ber ku kurdên wê derê Şerê Cihanê ya Yekem de tèn qetlîkirin yan jî 1918-1920 an de, Komara Ermenîstana Taşnakê de tèn kuştin. Kurdên Ermenîstanê di Şerê Cihanê ya Duyem de ji nû ve tèn bicihkirin û Şerîf Vanlî bi xwe vê yekê di salên 90î de ji kurdên Ermenîstanê pesend dîke.⁵³

Heke em dîsa vegerin dawîya sedsala 19an, di 1878an de şerê Rûs-Osmanîyan de Osmanî têk diçin û bi Rûsan re Peymana San Stefanosê (Ayestefanos) îmze dikin. Rûs ji Osmaniyan reformên giran dixwazin. Di nava van de bajarên rojhilata Osmaniyan hene ku Ermenî tê de dijîn û li hember kurdan ji tirkan temînat dixwazin. Bi vî şiklî dewletên mezin bi hinceta “6 vîlayetan” êdî rehet dikarin midaxeleyê Osmaniyan bikin.

Li aliyekî ve ev bûyer diqewimin û li aliyekî din jî Kurd ji bo serbixwebûnê serî hil didin. Şêx Ubeydillaxê Nehrî bi danezana “Kurd miletekî cuda ne” derdikeve qada şerê û bi dewletên mezin dide zanîn ku dê kêmineyên xristîyan li Kurdistanê bi awayekî ewle bijîn. Dewletên mezin bi taybetî jî Rûsya, wekî Tirk û Farisan naxwaze ku kurd serbixwe bibin. Olson ji bo vî qasî dibêje ku di dawîya yekemîn merheleya nasyonîzma kurdan de, hemû hêzên Ewropî , wekî ku peymana Berlînê de derbas dibe li hember serbixwebûna kurdan in. Bi taybetî Rûsya ne dixwaze ku li rojhilata Tirkîyê cîyên ku hêzekê bi dest xistibû wînda bike, ne jî dixwaze ku li ser sînorên Qafqasyayê dewleteke kurd (li ser hîmên Neqşebendî) ava bibe.⁵⁴ Serhildana Şêx Ubeydillaxê Nehrî di 1881 an de têk diçe û Nehrî tê desteserkirin û sirgûnê Mekkeyê dibe.

Di 1891an de Siltan Ebdilhemîd (siltanê Osmaniyan) hêzeke leşkerî ya bi navê Alayên Hamîdîyeyê ava dîke. Pîraniya leşkerên vê alayê ji eşîrên kurdan pêk dihat û tenê kurdên Sunnî dihat wergirtin. Ev yek jî di navbera kurdên Sunnî û Elewî de dibû pirsgerêkeke mezin. Alayên Hamîdîyeyê nêzikî 57 alayan pêk tî û rasterast girêdayî Siltanê ne. Siltan Ebdilhemîd kurdan li hember Rûs û Ermeniyan wek hêzeke parastinê dibîne û bi vî awayî dixwaze kurdan bi misilmanîyê bi Osmaniyan ve girê bide. Her wekî

⁵³ Ji bo agahiyên berfireh hûn dikarin li pirtûka İsmet Şerîf Vanlî, “The Kurds in the Soviet Union”, **The Kurds**, **A Contemporary Overview**, (152-173), binêrin.

⁵⁴ Olson, neql: Şerîf Vanlî , **hb**, r. 152.

tê zanîn ku komkujiya Ermenîyan de jî rola van alayan têra xwe xurt e lê ev yek durî mijara me ye. Tenê rastîhevhatinên bi vî şeklî têkiliyên wan nîşanî me dide.

Kurd hem di Şoreşa Oktoberê de û hem jî Şerê Navxweyî ya Rûsan de cih girtine. 1918an de jî şerê di navbera Tirk û Ermenîyan de bi hezaran kurdên êzidî li gel ermenîyan şer kirine û ew parastine. Wê demê serokê êla *Zuqirîyayê* Cangir Axa ye û ew di vê şerê Serdarabadê de roleke girîng dileyîze.⁵⁵

Di 1917an de gava ku Bolşevîk bi Şoreşa Cotmehê li Petrogradê⁵⁶ dibin desthilat, Rûsya hêja jî şerê Cîhanê de mittefiqê Osmaniyan e. Ji ber bêistiqrariyê Rûsya nikare desthilatiya xwe fireh bike û hin herêm di wê pêvajoyê de serbixwebûna xwe didin zanîn. Piştî ku Bolşevîkan kontrolê destê xwe de girtine Meclîsa Transqafqasyayê hatiye damezirandin. Di nava wan de gelek parlementerên ji neteweyên cuda hene. Gurcîyên ji partîya Menşevîkan; Ermenîyên ji tevgera Taşnakê ya nasyonalîst; Tatarên ji Musavatê mihafezekar û kêma kesên kurd jî tevî vê meclîsê dibin.

Di 22ê Nîsana 1918an de Komara Federal a Transqafqasyayê tê damezirandin lê ji ber ku ji gelek neteweyên cihê pêk tê piştî mehekê ew jî tîk diçe. Di wê navberê de berê Gurcîstan bi saya Elmanyayê û pişt re jî Azerbaycan bi saya Tirkîyeyê serbixwebûna xwe didin zanîn. Piştî van her du miletan, Ermenî jî Hikûmeta Taşnakê ya Ermenîyan ava dikin. Hêzên Osmaniyan li Alexandropolê êrişî Ermenîyan dikin. Piştî ku Aram Manoukyan dibe dîktator, bi leşkerên Ermenî, yên ku di artêşa Rûsan de perwerdehî dîtine, êrişî ser gundên Azerî û Kurdan dikin. Di encamê de, bi hin bûyeran Ermenîstan û Azerbaycan dibin komarên Sovyetê. Di vê navberê de li gorî çavkaniyan, hejmarên kurdan li van deran zêde dibin û êdî ne kêma ne û piraniya kurdên wan cotkar û esnafên bajarî ne û herwiha sunnî ne.⁵⁷

⁵⁵Iraklii Chikhladze, Giga Chikhladze, “The Yezidi Kurds and Assyrians of Georgia^[SEP]The Problem of Diasporas and Integration into Contemporary Society”, **Journal of the Central Asia & the Caucasus** j. 3/21, Sweden 2003.

⁵⁶ Piştî Şoreşa Cotmehê navê bajarê dibe Lenîngrad û piştî hilweşîna Sovyetê careke din tê guhertin û navê xwe yê îro distîne û dibe St. Petersburg.

⁵⁷ Ji bo agahiyên berfireh hun dikarin lê binêrin: Şerîf Vanlı , **hb**, r. 152-157

Piştî Şoreşa Cotmehê ya 1917an, di 1922an de Yekitiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê (YKSS) ava dibe û serokê hikûmetê jî V. Îlyîç Lenîn dibe. Di nava van komarên Bolşevîk de hejmara kurdan çiqas e ne diyar e, lê li gorî hin lêkolêr û dîroknasan hejmara kurdên Sovyetê nêzîkî 500.000an e û hejmarên li gorî herêman/komaran jî li jêrê Tablo 2yê de tê dîtin⁵⁸:

Tablo 2: Nifûsa kurdan ya li YKSSyê

Komar/Herêmên ku Kurd lê dijîn	Hejmarên wan
Azerbaycan	200,000
Ermenîstan	75,000
Gurcîstan	40,000
Tirkmenîstan	50,000
Kazakîstan	30,000
Kîrgîzîstan	20,000
Ozbekîstan	10,000
Tacîkîstan	3,000
Sîbîrya	35,000 (30.000an li Vladîvostokê)
Kirasnedar	30,000
Yên din	12,000

Ev hejmar li gorî pênasekirina kurdan diguhere û dibe maijara tezeke din. Mesela wekî ku McDowall jî destnîşan dike, piraniya kurdên Ermenîstanê Ezîdî ne û ji dêvla nasnameya kurd gelek ciyan de wek civateke olî derbas dibin.⁵⁹

Bi hikûmeta YKSSyê re wekî kêmîneyên din, Kurdên Sovyetan jî wekî her neteweyekê, ji polîtîkayên Bolşevîkan sûd wergirtin. Destpêka sedsala bîstan de ji kurdên Tîrkiye, Iraq û Îranê zêdetir qadeke berhemdar dîtin ji xwe re. Şakiro X. Mihoyî ji bo vê meseleyê dibêje ku Şêx Mehmûd Berzencî, li hember emperyalîzma Îngîltereyê ji Lenînî re nameyekê dişîne û jê alîkarî dixwaze ji bo “pirsgirêka neteweya kurd”. Şêx Mehmûd Berzencî nameya xwe de dixwaze ku bala hêzên navneteweyî bikêşe û girîngiya

⁵⁸ Ji bo tabloyê me ji pirtûka Davîd McDowall sûd wergirt. Derheqê kurdên Sovyetê de ji bo agahiyên berfireh hûn dikarin lê binêrin: David McDowall, **Modern Kürt Tarihi**, weş. Doruk, İstanbul, 2004, r. 641

⁵⁹ David McDowall, **Modern Kürt Tarihi**, weş. Doruk, İstanbul, 2004, r. 642.

meseleyê bide nîşanî wan. Dîsa tê gotin ku haja Lenîn ji mijarê heye û alîkarî şandiye ji bo kurdan. Ş.X. Mihoyî di heman nivîsê de dibêje ku Lenîn ji N. Narîmanovê re nameyekê dişîne û nameya xwe de dibêje ku “...Ji birçiyên Povolciyê û Kurdistanê re 40 milyon rûble arîkarî bidin.”⁶⁰ Müller jî di nivîsa xwe ya li ser kurdên Azerbaycanê de Lenînê wek xwedawendê kurdan terîf dike û behsa heman alîkarîyê tîne rojevê.⁶¹

Di 1922an de J. Stalîn dibe Sekreterê Giştî yê Partiya Komûnîst a Yekitiya Sovyetan û polîtîkayên wan diguhere. Di 1937an de li temamî YKSSyê sirgûneke mezin dest pê dike û bi sed hezaran siyasetvan, rewşenbîr, nivîskar û helbestvan wekî “dijminên gelan” tîrêj kirin, desteserkirin û dawiyê de jî sirgûnî Sîbiryayê dibin û gelek ji wan jî tîrêj kirin.⁶² Bi hezaran mîlet jî cî û warên xwe sirgûn dibin û ber bi welatên din ve diçin.

Piştî Brejnev, Yurî Andropov dibe sekreterê giştî yê Partîyê⁶³ û axaftina xwe ya ewil ya Mijdara 1982an de bi taybetî behsa mafên kurdan dike. Li gor wî mafên kurdan bi awayekî adil nehatiye rojevê û dû re dibêje ku divê Kurdistanek ava bibe û divê piraniya hemwelatîyên wê jî kurd bin.⁶⁴

Di 1988an de cara ewil delegasyona ji Azerbaycanê li Yêrîvanê tevî protestoyên Qerebaxa Çiyayî (Nagorny Karabakh) dibin. Piştî wê 20ê Gulanê 1989an de li Moskavayê, li Meydana Puşkînê vê carê kurd ji bo mafên xwe protestoyeke mezin dirust dikin û heta bi Parka Îsmaîlovskiyê dimeşin. Bavê Nazê ji Moskavayê dide zanîn ku wê rojê televîzyona Sovyetê jî li cihê meşê bûye û dengê kurdan ragihandiye hemû Sovyetistanê. Paşê behs dike ku kurdan ji hikûmeta Sovyetê ev xwestine:

1. Parastina jiyana kurdan

⁶⁰Ş.X. Mixoyî, “Rewşa Kurdan Li Azerbêcana Sovyetê”, Bavê Nazê (wer.), **Berbang**, j. 59, 1989, r. 5-6. [L1]

⁶¹Daniel Müller, “The Kurds of Soviet Azerbaijan 1920-91”, **Central Asian Survey**, c. 19:1, r. 47-48.

⁶² Hejarê Şamil, **Diyaspora Kürtleri**, weş. Pêrî, İstanbul 2005, r. 121.

⁶³ Ji Partiyê qesta me Partiya Komûnîst a Yekitiya Sovyetan e.

⁶⁴ Şerif Vanlı, **hb**, r. 167.

2. Bicihkirina Kurdan li herêma wan a ku sala 1923an de hatibû avakirin, an jî komkirina wan li cihekî wek navça Kirasnedarê.⁶⁵

Di vê meş û civînê de gelek kurdên Sovyetê yên bi navûdeng hazir in. Nadir Nadîrov, Eliyê Ebdilrehman û Tosinê Reşîd hin ji wan in. Li ser navê kurdan Dr. Nasîhe Xefûr dipeyive û paşê Gurçeka Mihemed behsa jinên kurd û jiyana dijwar a kurdên Qafqasyayê dike. Dawiyê de dibêje ku kurd wekî “dijminê gelan” tên dît in lê kurd vê yekê heq nekirine.

Tê dît in ku numayîşker û çalakvanên kurd ne tenê ji bo parastina mafên jiyana rojane, lê ji bo restorasyona herêma xweser a Azerbaycanê jî daxwazên xwe diqîrin. Hin delege ji bo herêma Kirasnedarê Kurdistaneke serbixwe pêşniyaz dikin lê delegeyên din vê yekê qebûl nakin. Hinceta wan jî ew e ku ev tişt ji bo Rûsyayê baş nîn e. Hikûmeta Bakûyê jî ne li heman herêmê lê ji bo Kurdistaneke xweser restorasyon pêşniyaz dikin. Pêşniyaza nû ya ji bo Kurdistanê herêmeke nîveçol e li Jeyranê, lê ev yek ji aliyê kurdan ve nayê qebûl kirin.⁶⁶

Piştî du mehan Sovyeta Bilind (Supreme Soviet), kesên ku dema Stalîn de hatine sirgunkirin bi daxuyaniyekê, bi hemû mafên xwe yên ewil paş ve gazî dikin. Ev yek ji bo kurdan baş nîn e ji ber ku welatê wan ê ewil ji aliyê Rûs û Azeriyan ve hatiye dagir kirin.

Piştî van buyeran Eliyê Ebdilrehman (ji aliyê polîtîbûroyê ve ji bo neteweyan wek berpirsiyar tê tayînkirin) û Chebrîkov pêşniyaz dikin ku kurd bi rêxistinekê ve bînin temsîl kirin. Bi vê mebestê Yekbûnê damezirandin û M. Suleyman Babayevê pisporê çandiniyê dibe serokê ewil. Di komîteyê de Nadir Nadîrov (akademîsyen), Prof. Şakiro Mihoyî, Eliyê Ebdilrehman, endezyarekî û ji milîsan Mîralay (Colonel) Wekîl cih digirin. Di navbera Komîteya Navendî ya Partiya Komûnîst û Yekbûnê de lihevhatinek çêdibe û biryar didin ku konferanseke giştî bê çekirin û heft kes ji bo komîteyê tînin hilbijartin ku çar ji wan jî kurd in. Navê konferansê jî: “Kurdên Yekitiya Sovyetê ji Do heta Îro” ye.

⁶⁵Ş.X. Mixoyî, **hg**, r.4.

⁶⁶Şerif Vanlı, **hb**, r. 169.

Di serî de kurdên ji derveyî Sovyetê nayên gazîkirin lê paşê Partî û Yekbûn li hev tîn û heşt nav ji her parçeyê Kurdistanê û ji diyasporayê tîn pêşniyazkirin. Di nava wan de Dr. Kemal Fuad li ser navê Celal Talabanî, Dr. M.Salih Guma li ser navê Mesud Barzanî, Mihemmed Ezîz li ser navê kurdên Iraqê, sekreterê giştî ya Partiya Komûnîst a Iraqê Samî Abdulrehman, Dr. Mahmûd Osman ji Partiya Sosyalîst a Kurdan, ji Îranê Dr. Saîd Şerefkendî, û Salih Bedreddîn ji Surîyeyê hene. Her wiha li ser navê Enstituya Kurdî ya Parisê Kendal Nezan jî tê gazîkirin.

Konferans li Enstitûya Marksîst-Lenînîstê tê çêkirin û nêzikî şeş sed kes li wir hazir in. Piraniya wan kurd in û li ser navê neh komarên Sovyetê û ji her qadên civakê (karker, gundî, rewşenbîr û entelijansiya) tîn. Kurdên Sovyetê du roj li ser navê civata xwe diaxivin, gotarên xwe yên zanistî dixwînin û daxwazên xwe yên siyasî vedibêjin. Hin karker û gundîyên kurd radibin behsa azadiya xwe û hêza xwe dikin; heta gundiyeke hinek jî heddê derbas dibe û dibêje ku ne çand û ne mekteb xema wî nîn e û ew tenê debara xwe û ji bo jiyana zarokên xwe şans dixwaze. Şerîf Vanlı derheqê konferansê de dibêje ku xweştirîn dîmen belkî lihevhatin û hembêzkirina muftiyê Kazakistanê, serokê kurdên misilman ê Kazakîstanê û serokê Êzidiyên Gurcîstanê ye; û li ser zêde dike ku serokê Yekbûnê Mihemmed Babayev û akademîsyen N.Nadirov hemû cudahiyan di navbera xwe de ji bîr dikin û hev himbêz dikin.⁶⁷

Di dawiya konferansê de daxuyaniyekê dixwînin ji bo medyayê û nameyekê dişînin ji bo Gorbaçevê. Komîteya konferansê di dawiyê de wek encam bang dike ku li Moskovayê Komelaya Federal a Kurdan bê vekirin ku hemû kurdên komarên Sovyetê li wir bê temsîlkirin û tê de Navenda Çanda Kurdan û pêre jî avahiyeke çapkirinê divê hebe û ew komele derdoreke guncav de jî pêşengiya Kurdîstana otonom bike.⁶⁸

Kurdên ku li Sovyeta berê dijîn, meriv dikare ji aliyê dirokî ve bi çar şaxan ve dabeş bike: Kurdên Tirkmenyayê; Kurdên Ermenîstan, Nahcivan û Gurcîstanê; Kurdên

⁶⁷ Şerif Vanlı, **hb**, r. 170.

⁶⁸ Ji bo agahiyên berfireh derbarê konferansa Moskovayê de hûn dikarin binêrin: Îsmet Şerîf Vanlı, **hb**, r.170 û Ş.X.Mixoyî, **hg**, r. 5-7.

Azerbaycanê; û Kurdên ku ji koçên navxweyî yê di nava Yekitiya Sovyetê û Civata Dewletên Serbixwe de belav bûne: Rûsya, Ukrayna, Belarûs, Moldovya û her wiha Kazakistan û Asyaya navîn.⁶⁹ Lê ji ber ku piraniya wan li Azerbaycan, Ermenîstan û Gurcîstanê ne, em ê girîngî bidin van deveran.

1.1.1. Kurdên Azerbaycanê û *Kurdistana Sor*

Kurdên ku li *Kurdistana Sor* a ewil, li komara Azerbaycanê û komara Naxcivan a xweser de dijîn bi navê Kurdên Azerbaycanê tên nasîn.

Li Transqasfqasyayê di salên 1920 û 1930î de piraniya niştecihên kurdan li Azerbaycan û Ermenîstanê ne. Yê herî kêr jî li Gurcîstanê ne.⁷⁰ Piraniya kurdên Azerbaycanê misilman in û yê Ermenîstan û Gurcîstanê jî Êzîdî ne û hejmareke kêr ya kurdên sunnî jî hene. Wekî tê zanîn ku ji Xanedana Şeddadiyan vir ve li Qafqasyayê hebûna kurdan eşkere ye û dawîya sedsala 16an de jî li zozanên Qerebaxê çend eşîrên kurd ji aliyê diroknanan ve hatine qeydkirin.⁷¹ Pê re jî piraniya kurdên Azerbaycanê di sedsala 19an de ji Iranê koç kirine û hatine vir. Zimanê wan Kurmancî ye û xwe wek “Kurmanc” didin nasîn.⁷² Hema hema tevahiya kurdên Azerbaycanê nêzikî herêma Qerebaxê dijîn.

Herêma Qerebaxê beriya 1917an bi heft bajarokên Misilman, çar bajarokên Kurd û sê bajarokên Azerîyan dabeş dibe, herêma Ermenîyên Xrîstîyan ên Qerebaxa Çiyayî (Nagorny Karabakh) bi kêrnîyên wekî Kurd û Tataran ve di nav xwe de tê îzolekirin. Li vir Ter Minassian balê dikişîne ser ku majorîteya Ermenî ya Qerebaxa Çiyayî tê bihêzkerin.⁷³ Di van herêman de meseleyên mezîniyê çêdibin û wisa dixwiyê ku hebûna nifûseke mezîniyê ya kurdan li van herêman meseleyan mezintir dike.

⁶⁹ Hejarê Şamil, **hb**; Herman Taels, **Eski Sovyetler Birliği'nde Kürtler**, weş. Pêrî, Nadîre Işık(wer.), İstanbul 2001, r. 46.

⁷⁰ Iraklii Chikhladze, Giga Chikhladze, **hg**, r.3-5

⁷¹ Viladimir Minorsky, **Kürtler**, E. Karahan, H. Akkuş, N. Uğurlu (wer.), weş. Örgün, İstanbul, 2008, r. 12.

⁷² Şerif Vanlı, **hb**, 160.

⁷³ Ter Minassian, neql: Şerif Vanlı, **hb**, r. 159.

4ê Tîrmehê yê sala 1923 an de, Moskowa biryar dide ku herêma kurdan, a ku paytexta wê Laçîn e, bi Qerebaxa Çiyayî re bibe parçeyeke Azerbaycanê û statûya wê ji *uyezdê* mezintir dibe û bi navê Kurdistana Sor dibe herêmeke otonom. Di 16ê Tîrmeha 1923an de, komîsyoneke taybet bi serokatiya S.Kîrov komîteyekê ava dibe û ew komîte biryar dide ku Kurdistaneke cuda ava bibe û Qubatlî jî tevî vê herêmê bibe. Dû re G. Gajiev, yê ku berê jî di rêvebiriyê Qubatlî de cih girtiye, dibe serokê Komîteya Rêvebiriyê ya Uyezda Kurdistanê.⁷⁴ Ev herêm di navbera salên 1923 û 1929an de wek Uyezda Kurdistanê tê binavkirin û bi awayî kurt *Kurduezd* û Kurdistan jî tê zanîn. Her wiha bi navên Kurdistana Sovyetê, Kurdistana Azerbaycanê û Kurdistana Sor (*Krasnyi*) jî tê zanîn. Bajarên vê herêma otonom Laçîn, Kelbecer, Qubatlî û Zengilan in.

Havîna 1924an de etnograf G. Chursîn derdikeve rewîtiyeke etnografîk ji Tiflîsê heta bi Uyezda Kurdistanê û çavdêriyên xwe paşê di pirtûkekê de çap dike. Li gorî Chursînê, li vê uyezdê 35.000 kurd hene û ev jî dibe %80,7ê nifûsê.⁷⁵

Kurdistana Sor heta bi Serhildana Şêx Seîd ya 1925 an, nêzikî du salan bi awayekî dijwar ser piyan dimîne. Di vê navberê de ji bo rêvebiriyê rêxistin pêk hatin, mektebên kurdan û kolejên ji bo perwerdekirina mamosteyan ava bûn. Pirtûkên kurdî hatin çapkirin û kovareke demkî ya bi navê *Sovyet Kurdistan*” hat weşandin.

1929an de Bakû statûya Kurdistana Sor diguherîne û dike *okrug* (yanê piçûktirîn rêxistina herêmî ji bo *non-Sovyetan*). Ş.X. Mihoyî ji bo vî qasî behsa nerazîbûna xwe dike û dibêje ku bi vî awayî dixwazin ku îdareya kurdan ‘sivik’ bikin û bi vî rengî kurdan ‘bi darê kotekê’ asîmile bikin.⁷⁶

Di 1988-1989an de krîza Qerebaxê deng veda û Azerbaycan û Tirkiye deriyên sînorên xwe girtin û pirsgirêka elektrîk û germbûnê derket. Piraniya nifûsa Ermenîstanê bajarî ne

⁷⁴ Daniel Müller, **hg**, r. 49.

⁷⁵ Daniel Müller, **hg**, r. 50.

⁷⁶ Ş.X. Mihoyî, “Rewşa Kurdan Li Azerbêcana Sovyetê” **Kovara Berbang**, Bavê Nazê (wer.), j. 59, 1989, r.5-6.

ji xeynê Kurd û Azeriyan û ev yek jî pirsgirêkên mezin derxist holê li hember rejîmê.⁷⁷ Di Gulana 1992an de hêzên Ermeniyan Laçînê dagir dikin û Nîsana 1993an de jî Kelbecerê distînin. Ji wir pê ve Kurdistana Sor a ewil tamamî dikeve bin kontrola Ermeniyan. Bi hezaran kurd û misilman tên kuştin an jî sirgûnî Azerbaycan û Îranê dibin. Yên ku diçin Azerbaycanê jî ji wê rojê ve tên asîmîlekirin.⁷⁸

Dawiya salên 1920î de li Azerbaycanê sîyaseta li gel kurdan dest bi guherîne dike. Helbet di vê siyasetê de bandora Tirkiyayê û polîtîkayên Kemalîstan jî heye.⁷⁹ Herçiqas jî di destpêka salên 1920î de rejîma Sovyetê, rêveberiya Azerbaycanê ji bo karên modernîzasyonê wek model dîtibe ji bo Iran û Tirkiyeyê⁸⁰, di dawî de ev yek ji ber têkiliyên siyasî yên di navbera Tirkiye, Rûsya û Azerbaycanê de diguhere.

Rêveberiya Azerbaycanê ji bo xebatên modernîzasyonê ne tenê piraniya gel lê belê kêmineyên xwe yên wekî Kurdan jî daxilî kampanyayên xwendin û perwerdeyê dike. Tê zanîn ku rêveberiya Azerbaycanê bi piştgiriya kêmineyên di nav xwe de xwestiye ku nasyonâlîzma Tirkan biparêze û rê li ber dijminatîyê bigire. Ji ber ku rêveberî dibîne bê ka li Iraq, Iran û Tirkiyeyê çî diqewimin û li wan her sê welatan de jî kêmineyên herî zêde Kurd in û hejmarên wan gelek in.

Azerbaycan ji bo asîmîlasyona kurdan misilmantîyê bi kar tîne; hejmara kurdan manîpûle dike, mîletên din li warê kurdan bi cih dike; weşanên kurdan tune dike, kurdi qedexe dike û mezinên kurdan, mîrên wan, nivîskar û alimên wan wek mînak Şerefxanê mîrê Bedlîsê, Ahmedê Xanîyê helbestvanê Mem û Zînê û Şeddadî û Şikakan wek ‘azerî’ bi nav dike. Di 1988an de 10.000 kurdên ‘winda’ pasaportên xwe dişînin Moskowayê da ku pasaportên Azerî wergerînin ser Kurdî. Kesên ku ser pasaportên xwe çiyê ‘azerî’ de

⁷⁷Anna Matveeva, **The South Caucasus Nationalism Conflict and Minorities**, Minority Rights Group International, UK 2002, r. 10-11.

⁷⁸ Martin van Bruinessen, “Behind the Iron Curtain”, **Kurdistan in the Shadow of History**, (r. 214) Chicago-London, 1997.

⁷⁹ Ş.X. Mixoyî, **hg.**, r. 6.

⁸⁰Harun Yılmaz, “The Rise of Red Kurdistan” dnd. **Iranian Studies**, Vol. 47, No. 5, (799-822), 2014, r. 802-803.^[1]

‘kurd’ didin nivîsandin, nahêlin karekî baş de bixebitin. Herçiqaş li Ermenîstan, Lenîngrad û Moskowayê xebatên kurdî berdewam bin jî, li Bakûyê dawiya 1960an de li Enstîtûya Şarqiyatê beşa kurdî tê girtin. Ecêb e, *Sovyet Kurdistan* nayê girtin lê piştî 1930an weşana xwe bi kurdî nake, bi zaravayeke tirkî dewam dike û mijarên wê jî bi kurdan re eleqedar nîn e.⁸¹

Hejmareke mezin ya kurdan li Azerbaycanê dijîn û perçeya vê diyasporayê bi sedan salan mexdurî asîmîlasyoneke bêhempa dibin ku bîra wan a neteweyî têk diçe û bav û kalên xwe û zimanê xwe ji bîr dikin. Serboriya kurdên Azerbaycan û Tirkmenyayê ya bi vî şiklî wek ‘jenosîda spî/ white genocide’ tê binavkirin.

Bi rastî dîn, ol di parastina ziman û çandê de roleke girîng di hundirîne. Lewra tê dîtin ku kurdên sinnî yê misilman di nav Azerîyan de asîmîle bûne û zimanê xwe ji bîr kirine. Li hember vî qasî kurdên êzîdî pratîkên dînî bi zimanê xwe yê Kurdî pêk anîne û metnên dînî bi zaravayê xwe yê Kurmancî xwendine û gotine; bi kurdên êzîdî re zewicîne û hem hemwelatîbûna xwe û hem jî ziman û çanda xwe parastine.

Li Sovyeta berê texmînkirina hejmara kurdan zehmet e ji ber ku binavkirina wan li her welatî cuda cuda ye. Li Azerbaycanê kurd bi nasnameya azerî tên binavkirin. Sala 1979an de li ber navê hemwelatîyekî Azerbaycanê Adilê Cemîl “Azerbaycanî” tê nivîsîn lê ew qebûl nake. Li gel 200 mirovan berê xwe didin Bakûyê û doz dikin ku navê netewa kurd li wan bê kirin.⁸² Wek mînameke din jî Xanna Omerxalî dibêje ku li Ermenîstanê piraniya kurdên wir Êzîdî ne û axlebî ciyê nasnameya ‘Kurd’ de etnîsîteya xwe ya etnîk tercîh dikin.⁸³

Prof. Şakiro X. Mihoyî di salên 90î de hejmara kurdên Azerbaycana Sovyetê nêzîkî 250.000 an hesab dike. Etnograf Mamo Xalit Derwîşyan vê hejmarê derdixe 400.000an. Di 1988an de Derwîşyan ji Gorbaçovî re nameyekê dişîne û dibêje ku

⁸¹ Ş.X. Mixoyî, *hg.*, r.5-6,

⁸² Ş.X. Mixoyî, *hg.*, r. 4.

⁸³ Khanna Omarkhali, “The Kurds In The Former Soviet States From The Historical And Cultural Perspectives”, *The Copernicus Journal Of Political Studies*, c. 2/4, r. 130

otorîteyên herêmî nahêlin ku li Laçînê lêkolînan çêkin. 1988an de şerê di navbera Azerî û Ermenîyan de kurdên Kurdîstana Sor careke din dibin penaberê nav welatê xwe.

1.1.2. Kurdên Gurcîstanê

Kurd di 1937an ji Nahcivan û Ermenîstanê sirgûnî Kazaxistan û Kirgîzîstanê; di 1944an de jî ji Gurcîstanê sirgûnî Kazaxistan, Kirgîzîstan û Ozbekîstanê dibin. Li gorî Knyaz Mirzoyev, payîza 1937an de 2000 malbatên kurd ji Qafqasyayê sirgûnî Kazaxîstanê kirine.⁸⁴ Her du sirgûnên mezin ji bo kurdan tecrûbeyên giran in û bi zorî û tadeyî pêk hatine û ‘hincet’ a van her du bûyeran jî heman tişt e: “parastina sînorên Sovyetan”. H.Şamil ji bo vê yekê dibêje ku ya 1944an sirgûneke ‘taybet’ e ji ber ku li her gundî herî zêde deh malbat bi cih dikin û çûn-hatina malbatan di navbera gundan de qedexe ye û ancax bi îznên taybet dikarin hev bibînin.⁸⁵

Kurdên ku 1944an de ji Gurcîstanê nehatine koçkirin li devera Tiflîsê bi cih bûne û wê demê hejmara wan nêzikî 34.000an e. Kûrdên Tiflîsê exlebî êzîdî ne û li wan deran dibistanên xwe ava kirine, navenda çandê vekirine ku ev navend bi Kurdî, Rûsî û Gurcîkî xebatên xwe didomînin.

Kurdên Gurcîstanê ji bo xebatên xwe yê kulturî komeke şanoyê ava dikin û bi polîtîkayên lîberalîzasyonê teşebûsên taybet dest pê dikin. Kurdên Êzîdî yê Gurcîstanê di 1988an de saziyeke bi navê Ronayî ava dikin û ew jî 1998an tê girtin. Paşê Komeleya Niştecihên Kurd yê Gurcîstanê ava dikin û ew jî dibe 1998an de Yekitiya Êzîdiyên Gurcîstanê. Heta bi 2002an, li vê Gurcîstanê gelek saziyên kurdan/êzidiyan tên vekirin. Di 2003an de, bi piştigiriya partiyekê, Yekitiya Êzîdiyan li vir rojnameyeke bi navê *Gelawêj* derdixin.

⁸⁴ Hejarê Şamil, **hb**, r.122.

⁸⁵ Hejarê Şamil, **hb**, r.120-122.

Gava ku Gurcîstan serbixwe dibe hejmara kurdên wir kêmtir dibe û li gorî çavkaniyan, rêjeya koça kurdan di nav diyasporayên din de xwedî pileyeke mezin e.⁸⁶ Kurdên vê derê exlebî koçî Ruyayê, rojavayê Ewropayê û bakurê Amerîkayê dikan. Li gorî serjimariya 1989an ya Sovyetê hejmara kurdan nêzikî 33,331 ye; lê piştî sêzdeh salan di 2002an de li Gurcîstanê 18,329 kes xwe wek Êzîdî û 2,514 kes jî xwe wek kurd didin zanîn.⁸⁷

1.1.3. Kurdên Ermenîstanê

Kurd li Ermenîstan û Gurcîstanê bi du rêyan xuya dikan. Niştecihên ewil yê kurd hemwelatîyên wê derê tên qebûlkin; yê din jî di dema şerê Rûs-Farisan de dest pê dikan û heta Şerê Cîhanê yê Yekemê nezikî sed salan didome. Ji bo vê yekê gelek agahiyên dîrokî ber dest in ku di sedsala 18an de çend eşîrên kurd li derdorê Ermenîstanê jiyane. Heta di *Şerefnameya Şerefxanê Bedlîsî* de jî tê gotin ku hin eşîrên kurdan li Qafqasyayê û li bakurê Xorasanê jiyane.⁸⁸

Piraniya kurdên Ermenîstan û Gurcîstanê Êzîdî ne ku bav û kalên wan di dawîya sedsala 19an û destpêka sedsala 20an de ji ber zilmên Osmanîyan reviyane.⁸⁹ Helbet her du sirgûnên mezin yê 1937 û 1944an jî bûye sedema belavbûna kurdan ku li her derê Sovyet û Qafqasyayê bûne penaber.

Piştî polîtîkayên Stalînî Ermenîstan ji bo kurdan dibe stargehekê û ji qismên Sovyet tenê Ermenîstan xebatên çandî yê kurdî diparêze û dihêle ku kurd karên xwe pêk bînin. Ji ber ku kurdên Ermenîstanê dikarin ji xeynî mijarên fennî/zanistî bi zimanê xwe perwerde bibînin, piraniya rewşenbîrên kurd yê Sovyetê ji Ermenîstanê ne. Di Yekîtiya

⁸⁶Iraklii Chikhladze, Giga Chikhladze, **hg**, r.3.

⁸⁷David Szakonyi, "Ethnic Mobilization in Post-Soviet Georgia: The Case of the Yezidi-Kurds", **Jemie-European Centre for Minority Issues**, c. 6, h. 2, r.7.

⁸⁸ Ji bo agahiyên berfireh hûn dikarin li *Şerefnameyê* binêrin.

⁸⁹Ji bo rewşên kêmineyên din jî hun dikarin binêrin: Anna Matveeva **South Caucasus: Nationalism, Conflict And Minorities**, UK 2002.

Nivîskarên Ermaniyan de beşeke kurdî heye; û di Akademîya Zanistî ya Ermaniyan de, di bin beşa Enstîtûya Lêkolînên Rojhilatî de fakûlteyek heye ku bi xebatên kurdî ve mijûl in û bi Ermenîkî- Kurdî ye. Pirtûkên dersan, berhemên zanistî û edebî û wergerên pirtûkên biyaniyan bi kurdî çap dibin. Kurd di partiyên Ermaniyan de bi awayekî polîtîk tîn temsîlkin. Radyoya Ermaniyan nûçe, mûzîk û bernameyên din jî bi kurdî diweşînin. Rojnameya kurdî ya bi navê *Ria Teze* weşana xwe dike û ji bo parastina çanda kurdan ciyekî wê yê girîng heye.

1.2. Xebatên Kurdolojiyê yê li Rûsyayê

Rûsya herçiqas jî bi awayekî polîtîk li hember serxwebûna kurdan bibe, St. Petersburg di sedsala 19an de bûye navenda xebatên kurdî û heta niha jî ev yek berdewam e. Em dikarin mîsyoner û keşîş Garzonî wekî pêşengê vî karî qebûl bikin. Maurizio Garzonî xebata xwe ya bi navê *Grammatica e Vocabolario della Lingua Kurda* li Romayê, di sala 1787an de çap dike. Ev berhem gelek girîng e di tarîxa kurdan de ji ber ku yekem tasdîqa reseniya zimanê kurdî ye di warê zanistî de. Bi vê berhemê Maurizio Garzoni, nasnavên “bavê kurdînasîyê” û “pêşengê rêzimana kurdî” wergirtine. Ferhenga ku di navbera 1764 û 1770yan de hatiye berhevkirin nêzîkî 4600 peyvan dihewîne û teqdîmnameya wê 74 rûpel in ku ji bo elementên rêzimana kurdî hatine veqetandin. Nivîskar di destnîşankirina fonetika peyvan de jî têra xwe jêhatî ye.

Bi vê xebatê re di heman salê de Pallas jî ferhengekê çap dike. Ev ferheng di dewra Katerînyaya II de tê weşandin û di hundirê xwe de bi sedan peyvên kurdî dihewîne û ji bo xebatên pêy xwe bûye bingehê eslî.

Piraniya van weşanan di bin hîmayeya Akademiya Zanistî ya Împaratorîyê de derdikevin holê. Yek ji wan jî A.D.Jaba ye ku balyozê Rûsyayê ye li Erziromê. Jaba li ser adet, çîrok û edebiyata kurdan lekolîn çêkirine û ew di sala 1860an de bi navê *Recueil des notices et extraits kurdes* çap kirine. Jaba di van xebatan de gelek sûd ji Mele Mehmûdê Bazîdî û zanyarên kurd wergirtiye. Jaba di heman demê de ferhengeke kurdî- fransî

amade kiriye; ferhengeke axaftinê berhev kiriye û ferhengeke Fransî-Rûsî-Kurdî nivîsiye ku hêja jî nehatiye çapkirin. Zanyarê Elmanî Peter Lerch, di sala 1857an de li St. Petersburgê bijarteyeke bi navê *Forschungen über die Kirden* diweşîne ku ji metnên kurdî pêk tê. Ev metin bi berhevokên kurdî pêk tê û ji girtiyên Kurd ên ku di şerê Kirimê de dîl ketî hatine girtin. Ferdinand Justî di sala 1880 an de *Kurdische Grammatik* çap dike û ji bilî van E. Prym û Albert Socin jî di 1890an de xebateke *Kurdische Sammlungen* çap dikin ku ji xebat û materyalên kurdî pêk tên.

Belkî jî girîngtirîn berhema ku li St. Petersburgê çap bûye *Şerefname* ye ku di sala 1596an de ji aliyê Şerefxanê mîrê Bedlîsê ve hatiye nivîsîn. Şerefname li ser dîroka kurdan lê bi farisî hatiye nivîsîn. Pirtûka bi destnivîsa Şerefxan û înzaya 1599an ser de heyî, di 1828 an de piştî şerê Farisan ji Pirtûkxaneya Kraliyeta Safevîyan dibin St. Petersburgê. Teksta bi farisî, bi pêşgotineke fransî ji aliyê akademîsyenê Rûs V.Veliaminov Zernov ve di 1860an de bi sernavê *Scheref-nameh ou histoire de kourdes* tê çapkirin. Paşê çar cildên wê bi edîsyoneke Fransî li St. Petersburgê di 1869-1875an de bi sernavê *Sheref-nameh ou Fastes de la Nation kourde*(Şerefname-Îhtîşama Neteweya Kurd) û bi destpêk û edîsyon-krîtîka François Charmoy tê weşandin.

BEŞA DÛYEM

LI SOVYETA BERÊ EDEBIYATA KURDÎ Û TRADÎSYONA ROMANÊ

Xebatên kurdî bi taybetî jî edebiyata kurdî piştî Sovyetan dirûveke din digire. Kurdên Sovyetê jî wekî her neteweyekê, ji polîtîkayên Bolşevîkan sûd wergirtin. Destpêka sedsala bîstan de ji kurdên Tîrkiye, Iraq û Îranê zêdetir qadeke berhemdar dîtî ji xwe re. Bi vî awayî, ji bo pêşveçûneke çandî û zanistî dest pê kirin û xebitîn. Elbet ev jî bi saya polîtîkayên Bolşevîkan pêk hat ku hewl didan ku hemû neteweyan bi zimanê wan perwerde bikin. Ev polîtîka rê da ku bi zimanê xwe yê kurdî perwerde bibin, pirtûkên xwe bi zimanê xwe binivîsin, kovaran biweşînin û xebatên çandî û zanistî bikin. Nivîskar û zanyarên kurd ji bo vê yekê xwe gelek pê êşandin.

Di sedsala 20an de “cemaatên xeyalî”⁹⁰ yên B. Andersonê li gerdûna kurdan konê xwe vedide û destpêka edebiyatekê gul ve dide. Li gorî Anderson her neteweyek cemaateke siyasî ya xeyalî ye. Ev gotin ji bo kurdan tam ciyê xwe digire ji ber ku welatekî wan ê sînorkirî tune. Kurd jî çawa ku çend welatên cuda cuda bi cih bûne û diyasporayeke mezin jî li Sovyetê û Qafqasyayê ava kirine, li van her parçeyan jî edebiyateke serbixwe ava kirine bêyî ku haja wan ji hev hebin. Helbet ev yek bi dîroka wan û bi siyasî ve girêdayî ye ku gelek caran kurdên ji parçeyên din ji hev bê xeber in û serboriya wan jî bi hin nûansan ji hev cuda ne. Lewra edebiyata van her parçeyan jî bi bandora wan welatan ava dibe û geş dibe.

Li gelek welatên cîhanê avabûn û geşedana edebiyatê bi pêkerên aborî, civakî, çandî û felsefî ve girêdayî ne. Gava ku em bîst li ser miletê kurd, ev wêne piçek diguhere. Kurd heta niha di bin desthilatiya dewletên din de rastî polîtîkayên cur bi cur hatine.

⁹⁰ Benedict Anderson, **Hayali Cemaatler**, İskender Savaşır (wer.), Metis, İstanbul 2011.

Gelek caran ev dewlet bi awayekî çewsîner ji xeynî nasnameyên xwe yên fermî nasnameyên din nepejirandine û rê nedane ku yeka din derkeve pêş. Lewra di cîhana edebiyata kurdan de pêkerên siyasî û polîtîk jî roleke mezin dilîze. Ev yek jî dibe sedema wêneyeke hevnegirtî ji bo cîhana edebiyata kurdî. Meseleya kurdan li welatên ku tê de dijîn, ji hev cuda li ser tê sekinîn û ev yek jî li ser geşedana edebiyata kurdan bandorên cuda dike.

Ji bo despêka edebiyata kurdî ya Sovyetê û geşedana wê me wêneyekî dîrokî berê dabû. Di nava wî wêneyê dîrokî de meriv bi siyaset û polîtîkayên Sovyetê dihesê û dikare di nava wê çarçoveyê de edebiyata kurdî bi cih bike. Meriv bizane ka pêkerên wê serdemê çi ne, dikare bi awayekî çêtir berhemên wê demê binirxîne.

2.1. BiAwayekîGiştî Edebiyata Kurdî ya Sovyeta Berê

Edebiyata kurdî û bi taybetî jî romana kurdî geşedana xwe ya mezin û bibandor li dîyasporayê⁹¹ derdixê holê. Êdî dîyaspora ji bo romana kurdî dibe *welatê eslî*.⁹² Kurdên ku ji welatê xwe sirgûn bûne û çûne dîyasporayê, nostaljiyên xwe û wezîfeyên xwe yên neteweyî bi nivîsandinê xwestine telafî bikin. Bi vî awayî xwestine ku çanda xwe biparêzin û ji bo dahatûya gelê xwe bixebitin. Ev yek kurdên Sovyetê de bi rehetî tê kifşkirin. Lord Acton jî li ser vê rewşa nostaljik gelek tişt nivîsîne û vê yekê bi têgeha “kreşa neteweyî” şîrove kiriye.⁹³

Diyasporaya Sovyetê (ku êdî bûye wekî welatekî) ji bo kurdan bi taybetî jî ji kurdên Kurmanc dibe qada ronesansê.⁹⁴ Bi awayekî şênber qedera kurdên Sovyetê diguhere. Piştî Şoreşa Cotmehê serkeftinên çandî û edebî xwe nîşan dide.

⁹¹ Derheqê diyasporayê de ji bo agahiyên berfireh hun dikarin li pirtûka “Diyaspora Mekanları” ya Mino Alinia binêrin. Peyva diyasporayê bêtir Ewropa tîne bîra me lê em qebûl bikin nekin diyasporaya herî mezin ya kurdan li Qafqasyayê ye.

⁹² H. Ahmedzade, **Ulus ve Roman**, weş. Pêrî, İstanbul, 2004, r. 195.

⁹³ Benedict Anderson, **hb**, r.59

⁹⁴ Her çiqas peyva dîyasporayê di bîngeha xwe de fikrên neyînî bîne bîra me jî, hin lêkoler û nivîskar hemberî vî qasî ne. Dîyasporayê wekî qadekê dibînin: qada hişmendiyê. Yek ji wan jî Khaled Khayatî ye. Li

Di hişyarbûyînên neteweyî de meseleya herî girîng ziman e û berhemên van hişyarbûyînan jî her tim xwe dispêrin zimanê zikmakî. Şaristaniyên Qirna Navîn de edebiyata Ereb, Latîn û Yewnaniyan malên hevpar bûn ji bo hemû miletan. Dû re bi tevgerên neteweperwerî her millet xwest ku edebiyata xwe bi zimanê xwe ava bike û bi vî awayî bivê nevê klasîkên dinyayê wergerandin li ser zimanên xwe. Piştî sedsala 17an Fransa, Îngilîstan, Almanya, Rûsya û miletên din ên rojavayî gava ku ronensanên xwe pêk dianîtin ji bo wergerên van klasîkan gelekî xebat dikirin. Di dewra Osmaniyan de karê wergeran herçiqas paş de bimîne jî, di sedsala 19an de tirk jî girîngiya wergerê ferq dikin û dest bi vî karî dikin.⁹⁵ Lewra di dîroka modernbûna van miletan de rolên wergeran gelek muhîm in. Edebiyata wan jî girêdayî vê tevgera modernbûnê pêş dikeve û mînakên cureyên edebî yên nû derdikeve holê.

Ev rewş ji bo kurdan bi awayakî cuda dimeşe. Edebiyata kurdan bi rêya edebiyata tirk, ereb û farisan van wergeran û berhemên rojavayî nas dikin. Nebûna perwerdeya bi zimanê zikmakî vê rewşê derdixe holê. Kurdên Sovyetê jî bi rêya edebiyata Rûsî hay ji edebiyata modern dibin. Ji her aliyê ve ew jî hewl didin ku bi zimanê xwe van cureyên nû biceribînin.

Jiyana edebî û çandî ya kurdên Sovyeta berê, nêzîkî heftê salî ye. Em dikarin vê çand û edebiyatê bi sê êwran vekolînin.⁹⁶ Herçiqas ji bo edebiyata kurdî ya giştî parvekirinek mimkûn nebe û wêneyeke hevgirtî meriv nikaribe çêke jî, ji bo edebiyata Sovyeta berê ev yek mimkûn e. Ev parvekirina li êwran, hem ji bo lêkolînanan rêgezan dide ber destê lêkolanan û hem jî nîşaneyê pêşveçûyîna çand û edebiyatekê dide ber

gorî Werbner jî dîaspora qada hişmendiyê ye, piraniya wargehan jî bi vî re eleqeder e. Homî K. Bhabha dibêje ku *“dîaspora, ji bo estetîka post-kolonyalê çavkaniyek e.”* Ji bo agahiyên berfireh hûn dikarin binêrin: Khaled Khayatî, **Mağdur Diyasporadan Sınır-ötesi Vatandaşlığa mı?**, Avesta, İstanbul, 2009.

⁹⁵ Derheqê wergeran de i bo agahiyên berfireh hûn dikarin binêrin: Hilmi Ziya Ülken, **Uyanış Devirlerinde Tercümenin Rolü**, weş. Ülken, İstanbul 1997.

⁹⁶Di mijara parvekirina li êwran me ji Eskerê Boyik, Tosinê Reşîd û Têmûrê Xelîl sûd wergirtiye. Bnr. Eskerê Boyik, **Çanda Kurdên Sovyetê**, r. 25-26; Tosinê Reşîd, *“Sovyetler Birliği’nde Kürt Edebiyatı”*, dnd. (brh.) Vecdi Erbay, **İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat**, r. 202-212 û Têmûrê Xelîl, **Antolojiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê**, r. 12-23.

çavan.⁹⁷ Êwra yekem (1920- 1937) di salên 1920î de bi xebatên perwerde û alfabezan dest pê dibe û nivîskar û rewşenbîrên wê dewrê hewl didin ku bingehê çêkin ji bo zimanê edebiyateke nivîskî. Di salên 1930î de bi rêya edebiyata rûs û ermeniyên gelek wergerên bi kurdî tî amadekirin. Bi ceribandînan her cure berhemên, edebiyata kurdî ya Sovyetê bi “destpêk”ekê xwe nîşan dide. Êwra duyem (1937-1955), bi desthilatdariya Stalîn û qedexeyên wê demê tê pênasekirin. Êwra duyem jî dikare weke êwra “rawestîna”ê bê binavkirin. Di êwra sêyem (1955-1991) de, edebiyata kurdî ya Sovyeta berê, bi hewldanên mezin û piştrast careke din radibe li ser piyan û li hember rawestîna hijdeh salan bi awayekî tecrûbedar disekine. Lewra hêjayî gotinê ku wekî êwra “hostetî”yê bê binavkirin.

2.1.1. Êwra Yekem: Destpêk (1920-1937)

Di destpêka salên 1920î de rayedarên Sovyetê biryar didin ku piştgirî bidin ji bo kêmbûnê xwe yê kurd ku zimanê wan bibe zimanê fermî. Lê ji bo vî qasî çiyê zimanê alim û nivîskar û helbestvanan de, kurdiya rojane ya Transqafqasyayê hildibijêrin. Li ser vî zimanê herêmî dixebitin û ji bo modernîzasyonê gelek peyvên Rusî li ser ferhenga kurdî zêde dikin.

Li Azerbaycanê, di salên 1920î de ceribandînan xweseriyê li aliyekî ve dimeşin û li aliyekî din jî li ser folklor û zimanê kurdên Azerbaycanê gelek xebat tî çêkirin. Bi talîmatên Komîteya Navendî, li Azerbaycanê çî berhemên edebî hatibin nivîsîn teqez behsa realîzma civakî û çelengiyên kolxoz û sovxoza kirine, pesna Lenîn û Stalîn dane;

⁹⁷ Parvekirina edebiyata kurdî ji bo hin lêkolanan hêja jî ne mimkûn e. Ferhat Shakely bi xwe jî, ku bi iddiyekê derdikeve dibêje ku ew hemû herêmên kurdan ber çav girtiye û ji bo edebiyata kurdî berhevkirineke giştî kiriye, wê yekê tam nekariye pêk bîne. Lewra edebiyata Sovyetan derveyî xebata xwe hiştiye û iddia kiriye ku romana kurdî di salên 1960î derketiye holê. Lê ji bîr kiriye ku romana yekem di salên 1930î de li Sovyetê hatiye nivîsîn û çap bûye. Ferhad Shakely, **Modern Kürt Ökü Sanatı**, Rohat Alakom (wer.), Avesta, İstanbul 1998.

pêşbazîyên kedkarên sosyalîst û serketina teknîkî û zanistî jî ji xwe re kirine mijarên sereke.⁹⁸

Li Azerbaycanê heta 1931an dibistaneke bi zimanê kurdî venabe. Piştî 1931an li gorî Mullerî, li Kelbecer û Laçînê nêzikî 15 dibistanên kurdî hene û pêre jî li Mînkendê di 1932an de dibistaneke navîn tê vekirin.⁹⁹ Endamên mamosteyan ên kurdên Naxcivanê dişînin Koleja Pedagojîk a Kurdî, a ku 1931an de li Yerêvanê hatibû vekirin. Kurdên ku bi zaravayeke din diaxivin, berê li vê kolejê havînan kursên kurdî digirin û paşê ji bo perwerdeyeke daîmî diçin departmana Kurdî ya Koleja Pedagojîyê ya Şuşayê. Ji 1920an pê ve kurdên Ermenîstan û Gurcîstanê ji bo xwendinê diçin Lenîngradê û çend kesên ji wan jî dibin kurdolog, lê li Azerbaycanê rewşeke wiha nayê dîtin.

Bi polîtîkaya neteweyîfî ya Sovyetê, kampanyayekê amade dikin bi navê *korenizatsiia* yê hewl didin ku civateke xwenda ava bikin. Bi vê armancê kesên cîgeyî di warên teknîkî, akademîk û îdarî de perwerde dikin û pê re jî karên rêvebirî û hilberîyê bi zimanê cîgeyî pêk tînin.¹⁰⁰ Ev kampanyayên perwedehî û *korenizatsiia*yê ne tenê ji bo neteweyên eslî yên Sovyetê ne. Bolşevîk ji xwe re kirine armanc ku li her komarê çî neteweyên kêmine hebin, ji wan kadroyên wesfdar ava bikin û mafên çandî bidin wan. Perwerdekirina neteweyên kêmineyan meseleyeke heyatî û muhîm e li Sovyetan. Di 1920an de li Azerbaycana Sovyetê Komîseriya Rewşenbîriyê biryar dide ku ziman û edebiyata kêmineyan li ser sîstema xwe ya perwerdeyê zêde bikin. Bi kurtî, rejîma Sovyetê pêwîstî pê dibîne ku kêmineyên xwe yên neteweyî bi zimanên xwe yên zikmakî perwerde bike. Bi vî awayî li komarên Sovyetê, di salên 1920î de perwerdeya bi zimanê zikmakî pêş ve diçe û ev polîtîka dimeşe.

⁹⁸ Gönül Aliyeva, “**Sscb Döneminde Azerbaycan Dil Planlaması**”, (Teza Doktorayê ya Neçapkirî, Zanîngeha Ankarayê Enstîtûya Zanistên Siyasî, Ankara 2005), s.12.

⁹⁹The Kurds of Soviet Azerbaijan, 1920-91 Daniel Müller , Central Asian Survey, 19:1, 41-77; r. 57

¹⁰⁰ Ji bo polîtîkayên zimên li Sovyetan hûn dikarin binêrin: L.A.Grenoble, **Language Policy in Soviet Union**, Dodrecht, 2003 r.124.

Gava ku Azerbaycan tevî Sovyetê dibe, rayedarên *Az-Narkomprosê*, dibin berpirsyarê perwerdeya hemû nifûsê, neteweyên kêmine jî tê de.¹⁰¹ Herêmên ku neteweyên kêmine lê dijîn, zimanê perwerdeyê li gorî daxwazên malbatê û zimanê wan ê rojane tê diyarkirin.¹⁰² Lê kengî *okruga* Kurdistanê li hemû Yekitiya Sovyetê ji holê radibe, li Azerbaycanê pirtûkeke Kurdî li meydanê namîne ji xeynî dibistanan.

Di nav hemû komarên Sovyetê de, ji bo xebatên kurdî û edebiyata kurdî, yê herî serketî kurdên Ermenîstanê ne. Temûrê Xelîl sedema vê yekê bi du tiştan ve girê dide. Ya berê, dibêje ku piraniya van kurdan taze ji navçeyên Kurdistanê Tirkiyê koçberî Ermenîstanê bûne û hêja jî bi kurdîtiyê ve girêdayî ne. Yanê ji pêlên asîmîlasyonê para xwe negirtine. Ya duduyan jî wiha şîrove dike ku di dema Şerê Cihanê ya Yekemîn de gelek zarokên kurdan bêxwedî mane û ew zarok birine sêwîxaneyên Ermenîstanê yê ku Amarîkayê li wir vekiribûn.¹⁰³ Beşek ji rewşenbîrên kurd ên yekemîn, ku pişt re bûn damezrînerên edebiyata kurdî li Ermenîstanê û Sovyetê, ji van sêwîxanan derketin. Wan li wir xwendinên xwe yê pêşîn kiribûn. Lewra edebiyata kurdî ya Sovyeta berê bi navê “edebiyata sêwîyan” jî tê nasîn.

Di destpêka salên 1920î de kurd gelek konferans, civîn û kongreyan li dar dixin. Mijarên bingeîn yê van konferans û civînanjiholêrakirina nezanî û şûndemayîna kurdan, her wiha pêşxistina wan a bi her alî bû. Yekemîn konferansa kurdên Sovyetê di 1925an de li Xecîxelîlê pêk tê.¹⁰⁴ Di vê konferansa yekemîn de kurd ji hikûmetên Ermenîstan, Gurcîstan û Azerbaycanê daxwaz dikin ku elfabeyeke nû ya bi kurdî-latînî bê amadekirin. Di wan civînan de kesên wekî Erebe Şemo, Nurê Polatbêkova û Şemo Têmûrov hazir in. Di 1928an de civîneke din tê lidarxistin ku di wê civînê de Îsahak Maragulov jî heye, li wir biryara amadekirina elfabeyeke kurdî-latînî tê girtin.¹⁰⁵ Bi spartina hikûmeta komara Ermenîstanê, di dawiya sala 1928an de Î. Marogulov û Erebe

¹⁰¹ L.A.Grenoble, **Language Policy in Soviet Union**, Dodrecht, 2003 r.38.

¹⁰² Harun Yılmaz, **hb**, r. 810.

¹⁰³ Temûrê Xelîl, **Antologiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê**, weş. Na, Îzmîr 2014, r.17.

¹⁰⁴ Hêjarê Şamil, **hb**, r. 94.

¹⁰⁵ Özkan Öztaş, **Sovyetler Birliğinde Kürt Sanatı**, weş. Yazılama, İstanbul, 2016, r.53.

Şemo elfabeya kurdî bi tîpên latînî amade dikin.¹⁰⁶ Di heman salê de pirtûkeke perwerdeyê ya ya bi navê ‘*Xo-xo Hînbûna Xwendina Nivîsîna Kurmancî*’ tê çapkirin. Ev pirtûk yekem pirtûka kurdî ya bi tîpên latînî ye û bi wêneyan hatiye nexşandin.¹⁰⁷

Hikûmeta Ermenîstanê di 23 Avrêl 1921an de biryarekê digire û li gor vê biryarê, divê di hemû dibistanan de (polên yekemîn û duyemîn de) her xwendekar bi zimanê xwe yê zikmakî ders bibîne. Ev yek jî rê dide ku di dibistanên gundên kurdan de dersên kurdî dest pê bikin. Bi vê mebestê, ji aliyê Hakob Xazaryan (Lazo) ve elfabeya kurdî ya bi tîpên ermenî tê amadekirin. Ji bo hînkirinê jî, di 1921ê de pirtûkeke elfabeyê bi navê ‘*Şems*’ dîsa ji aliyê Lazo ve tê weşandin. Di nava çend salan de, li Ermenîstanê di gundê kurdan de dibistanên kurdî tên vekirin. Di 1922an de, bi destê Ahmedê Mîrazî û Lazo li Tîflîsê dibistanek tê vekirin. Ev dibistan, weke “Dibistana 103an” tê naskirin û bi şev perwerde dide. Rewşenbîrên wekî Qanadê Kurdo, Çerkezê Beko, Semend Siyabendov, Tîtal Mûradov û wekî din di wê dibistanê de perwerde dîtine.¹⁰⁸ Di destpêka salên 1920î de kurd zarokên xwe dişînin mekteban. Li gor çavkanîyan, di destpêka salên 1930î de piraniya kurdan xwenda ne û dawiya salên 1930î de li Sovyetan nêzikî 40 mektebên kurdan û pê re jî nêzikî 2000an xwendekar û 70 mamosteyên kurd hene. Ji bo

¹⁰⁶ Li vir divê meriv behsa Erebe Şemo û elfabeya kurdî bike ku hema hema di hemû çavkaniyan de navê wî wekî amadekarê elfabeya kurdî derbas dibe. Lê Gulana 2013an de pirtûka Î. Seydo Aydoğan a bi navê Guman çap dibe û di wê pirtûkê de beşa “Efsaneyên li ser Elfebeya Kurdî û Erebe Şemo” bala me kişand. Di wê nivîsê de Aydoğan behsa dîroka elfabeya kurdî dike û tê li ser xebatên elfabeya kurdî ya li Sovyetê. Bi vê nivîsê û hevpeyvîna bi Celîlê Celîlî re gumanekê peyda dibe. Ji ber ku C. Celîl jî wekî diroknasekî dibêje ku sedî sed meriv nikare bêje ku Erebe Şemo jî di nav vî karî de cih girtiye. Li gorî nivîsê, wexta ku Î. Marogulov li ser elfabeyê kar kiriye, gelek caran berê xwe daye Erebe Şemo û di warê fonetîka kurdî de pirs ji wî kirine. Dîsa di nivîsê de tê gotin ku Erebe Şemo û Î. Marogulov ji bo pirtûkên dersên kurdî bi hev re xebitîne û ji bo elfabeyê divê dokumanteke din hebe ku meriv bêje ku Erebe Şemo jî çêkirina vê elfabeyê de cih girtiye. Ji bo agahiyên berfireh hûn dikarin binêrin: Îbrahîm Seydo Aydoğan, **Guman-1**, Ankara 2013, r. 285-304.

¹⁰⁷ Ev pirtûk bi qapaxa xwe jî be rewşa wê dewrê û nerîneke giştî nîşanî me dide. Li ser berga ewil kurdekî gundî rojname dixwîne ku ev rojname bi îxtîmaleke mezin Riya Teze ye. Ji nav kolanan xwendekar derbas dibin û destên wan de ala artêşa sor hene. Jineke navsere bi cil û bergên xwe yên kurdewar destê keça xwe girtiye û ew keçika biçûk jî bi cilên modern xuya dike. Ev jî peywendîya do û îro dide ber çavan. Avahiya mektebê û kooperatîfê li ba hev in. Dûr ve çiyayê Elegezê û di quntara wî de jî konên kurdan dixuyê û şivanekî jî bi karên xwe yên adetî ve mijûl e.

¹⁰⁸ Hejarê Şamil, **hb**, r. 93.

mamosteyan saziyek tê vekirin û di 1932an de di bin banê Yekitiya Nivîskarên Ermenîyan de şaxekê ji bo nivîskarên kurd tê damezirandin.¹⁰⁹

Di sala 1931ê de ji bo perwerdekirina mamosteyên ziman û edebiyata kurdî, li Yêrêvanê Akademiya Perwerdeyê ya Transqafqasyayê tê vekirin. Dîsa di 1930an de rojnameya ‘*Rya Teze*’ li Yêrêvanê, bi tîpên latînî dest bi xebatên xwe yên kurdî dike. Ev rojnameya kurdî ya herî temendirêj dibe bingeha çêkirina zimanê kurdî ya edebî li Ermenîstanê. Nivîskarên kurd, berhemên xwe yên ewilîn di rojnameya ‘*Rya Teze*’ de weşandin û bi rêya rojnameyê bûn xwedî xwendekar.¹¹⁰

Di 1926an de li Ermenîstana Sovyetê, yekem filma kurdî tê kêşandin. *Zerê* filmeke bédeng e, reş û spî ye; ji aliyê Armenfilm ve û bi derhêneriya Beg Nazarov hatiye amadekirin. Fîlm behsa kurdên êzîdî yên koçer dike ku 1915an de li ser sînorên Yekitiya Sovyetan çî hatiye serê wan. Piştî *Zerê* gelek filmên kurdî jî tên kişandin.

Heta salên 1930î di warê edebiyatê de pêşveçûnên berbiçav çênabin. Ji bo weşandina pirtûkên kurdî, li weşanxaneya dewletê ya Ermenîstanê beşeke ji bo weşanên kurdî tê vekirin.¹¹¹ Cara ewil, di 1931ê de pirtûkeke edebî ya Lazo ya bi navê *Serhatiya Casim* li Ermenîstanê tê weşandin. Dîsa di 1931ê de Erebe Şemo bi navê *Koçekê Derewîn* yekem pirtûka piyêsê çap dike.¹¹²

Wekî ku berê jî hatibû diyarkirin ku kurdên Sovyetê bi rêya zimanê rûs û ermenîyan haja edebiyateke modern dibin û berhemên xwe diafirînin. Ji xwe meriv dikare bibêje ku bingeha edebiyata kurdî ya Sovyetê bi van wergeran hatiye avakirin. Di salên destpêkê de gelek pirtûkên nivîskarên rûsî û ermenî yên li ser jiyana kurdan hatine wergerandin. Nêzîki 15 pirtûkên wergerê hatiye çapkirin. Wergêrên van pirtûkan, Heciyê

¹⁰⁹ Martin Van Bruinessen, **hg**, r. 220.

¹¹⁰ Tosinê Reşîd, “Sovyetler Birliği’nde Kürt Edebiyatı”, **İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat**,(203- 213), Ayrıntı, İstanbul 2012.

¹¹¹ Eskerê Boyîk, **hb**, r.14.

¹¹² Tosinê Reşîd, **hb**, r. 204.

Cindî, Emînê Evdal, Casimê Celîl, Rûbên Drampyan û Qaçaxê Mirad bûn.¹¹³ Hêjayî gotinêye ku di salên 1930î de, Rûbên Drampyan û Hovakîm Margaryanê ermenî; Îsahak Marogûlovê asûrî jî bi kurdî pirtûkan nivîsîne.¹¹⁴ Di sala 1936an de mînakên zargotina kurdan ji aliyê helbestvan û nivîskarên ermenî ve ji bo zimanê ermeniyî hat wergerandin û bi navê ‘*Nivîskarên Kurd yê Sovyêtiyê*’ hat çap kirin. Bi vî awayî edebiyata kurdî ya wergerandî jî dest pê kir û derkete qada edebiyatê.¹¹⁵

Di sala 1932an de Emînê Evdal cara ewil bi navê ‘*Efrandina Ewlîn*’ berhevoka berhemên nivîskarên kurddiweşîne. Di vê berhemê de bi helbest û kurteçîrokên xwe Heciyê Cindî, Emînê Evdal û Etarê Şero derdikevin pêş. Di nava vê berhevokê de wergerên ji zimanê ermenî jî cih digirin. Helbestên di vê berhevokê de, piranî pesnê pergela sosyalîst didan û bi gotinên xwe artêşa sor mezin dikirin û orf û edetên berê rexne dikirin.¹¹⁶ Berhevoka duyemîn, di 1934an de bi navê ‘*Efrandina Duda*’ tê weşandin. Di vê berhevokê de li gel helbestvanan, nivîskarên çîrokên jî bi hejmareke zêde cih digirin. Navên ku derdikevin pêş ev in: Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncî, Emînê Evdal, Casimê Celîl û Ahmedê Mîrazî. Di 1935an de berhevoka sêyemîn bi navê ‘*Nivîskarê Kurmanca Şêwirî: Efrandina Sisiya*’ li Yêrêvanê tê weşandin. Ev berhevoka sisiyan ji aliyê naverok û pêşketina nivîskaran ve ji berhemên berê cuda dibe. Di vê berhevokê de Erebe Şemo, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî, Heciyê Cindî, Ahmedê Mîrazî, Wezîrê Nadîrî, Etarê Şero, Casimê Celîl bi nivîsên xwe rihê edebiyata kurdî ya Sovyetê geş dikin. Di vê berhovêke de hin nav jî hene ku paşê dev ji nivîsînê berdane. Nivîskarên van berhevokan dê paşê bibin bingehdarên edebiyata kurdî li Sovyetê.

Ji xeynî van xebatan nivîskarên kurd yê vê dewrê bi pirtûkên cuda jî derketine qada edebiyatê. Di 1932an de, Heciyê Cindî şanoya xwe ya bi navê *Qutiya Du Dermana* çap dike. Di 1935an de Ahmedê Mîrazî şanoya xwe ya *Zemanê Çûyî* çap dike. Di heman demê de Wezîrê Nadîrî jî şanoya xwe ya *Reva Jinê* dide çapkirin. Dîsa Etarê Şero berhevoka helbestên xwe yê bi navê *Biriqandina Ewlîn* û Wezîrê Nadîrî jî berhevoka helbestên xwe yê bi navê *Nûbar* didin çapkirin. Di 1935an de yekem romana kurdî ya Erebe Şemo ya bi navê *Şivanê Kurd* û paşê di 1936an de romana wî ya *Kurmancêd Elegezê* tê çapkirin. Heciyê Cindî û Emînê Evdal pirtûkên xwe yê bi navê *Folklor Kurmanca* çap dikin. Ev pirtûk ji berhevokên zargotinê pêk tê û di 1936an de

¹¹³ Martin Van Bruinessen, **hg**, r. 220,

¹¹⁴ Tosinê Reşîd, **hg**, r. 205.^[1]_[SEP]

¹¹⁵ Têmûrê Xelîl, **hb**, r. 20.^[1]_[SEP]

¹¹⁶ Bnr. Têmûrê Xelîl, **hb**, r. 19; Tosinê Reşîd, **hg**, r. 204 ; Özkan Öztaş **hb**, r. 56-57.

derdikeve pêş xwendekarên xwe. Herwiha Temûrê Xelîl jî derheqê vê pirtûkê de pesnan dide û neqil dike ku gava serokê Komara Kurdistanê (Mehabad) Qadî Mihemed vê pirtûkê dibîne û dibêje ku “Ev e Qurana me!”.¹¹⁷

Di 1934an de ji bo nivîskarên kurd li Yêrêvanê konferansê tê çêkirin û di vê konferansê de nivîsîna bi zimanê kurdî, edebîyata kurdî, pêşxistina terminolojiya kurdî û gelek pirsgirêkên aktûel tên nîqaşkirin ku hîn jî ev pirsgirêkên han û girîngiya wan berdewam in. Ev konferans ji bo xebatên kurdên Sovyetê ciyekî taybet digire. Lewra cara yekem bi navê “Kurdoloji”yê civîneke akademîk pêk dihat.¹¹⁸ Di vê konferansê de Heciyê Cindî behsa xebatên kurdî yên li Enstîtûya Dîroka Çandî de dike. Erebê Şemo jî li wê konferansê hazir e û li ser rewşa civakî ya kurdan li beriya Şoreşê de diaxive. Qanatê Kurdo derheqê zimanê kurdî de diaxive û Emînê Evdal jî behsa ortografiya kurdî û çend guherînên tîpan dike. Ji xeynî wan L. Arisyan, E. Sêvak, A. Xaçaturyan, I. Tsukerman û V. Pêtoyan jî li ser kurdan diaxivin.

Piştî Şoreşa 1917an nivîskarên kurdên Sovyetê tevî tevgerên sosyo-polîtîk dibin û zimanê xwe wek amrazekê bi kar tînin ji bo perwerdekirina komûnîzmê. Yanê zimanê xwe ji bo belavkirina ramana komûnîzmê dişixulînin. Erebê Şemo û nivîskarên din jî di wan salan de ji rûsî bo kurdî wergerên pirtûkên siyasî dikin. Kurd herçiqas ji welatê xwe yê eslî dûr bin jî pirtûkên xwe bi zimanê xwe dinivîsin û pêş ve dibin. Li gorî Öztaşî sedema vê serkeftinê girêdayî rewşenbîr û nivîskarên nifşa ewil e. Lewra ji polîtîkayên Sovyetê dûr nemane û di nava saziyên wan de cih girtine.¹¹⁹

Bi xêr û gunehên xwe ve nivîskar, rewşenbîr û helbestvanên kurd ên Sovyetê bi awayekî kedkar mil dane û xwestine ku bi zimanê xwe çand û edebiyata xwe rakin li ser piyan û ji bo vê jî gelek xebitîne. Damezrînerên vê nifşê ewil piraniya wan sêwî bûn û di sêwîxaneyên Sovyetê de û di bin sîstema wan de mezin bûne. Di bin sîwana perwerdeya wan de bi zimanê xwe çanda wan perwerde dibin û kurdiya xwe ji bîr dikin. Heciyê Cindî, Îsivê Beko, Emînê Evdal, Cerdoyê Gêncî, Casimê Celîl hin ji wan in. Eskerê Boyîk bi

¹¹⁷ Temûrê Xelîl, **hb**, r. 19-20

¹¹⁸ Michiel Leezenberg, “A People Forgotten by History”: Soviet Studies of the Kurds”, **Iranian Studies**, c. 48:5, r. 758.

¹¹⁹ Özkan Öztaş, **hb**, r. 68.

taybetî behsa H. Cindî û Emînê Evdal dike û dibêje ku ew diçin gundê kurdan (Qundesaz û Elegez), li wir hem zimanê xwe hîn dibin û hem jî ders didin zarokên kurdan.

2.1.2. Êwra Duyem: Rawestî (1937-1955)

Êwra duyem an jî ‘dema dudan’ di 1937an de dest pê dike û heta 1955an navbereke mezin dide. Bi awayekî din meriv dikare vê rewşa ‘Rawestî’ê û bedengiyê bi polîtîkayên Stalînî ve girê bide. Di wê demê de pêşveçûna ziman û çanda kurdî tê sekinandin. Di dibistanan de perwerdeya bi kurdî tê qedexekirin û hemû dibistanên kurdan û akademiya perwerdehiyê tên girtin. Piştî 1940an di dibistanên kurdan de perwerdeya bi zimanê ermenîkî dest pê dike û heta pola 8an xwendekarên kurd tenê heftiyê 2-4 seet dikarin dersa kurdî bibînin.

Gelek rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên kurd ji kar tên avêtin, tên girtin û sirgûnkirin. Erebe Şemo sirgûnî Sibiryayê dikin; Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncî, Ahmedê Mîrazî, Cangîr Axa û Şamil Têmuûr desteser dikin û dixin girtîgehê.

Elfabeya kurdî-latînî bi hinceta ‘elfabeya emperyalîstan’ tê qedexekirin. Di vê navberê de nivîskarên wekî Casimê Celîl û Emînê Evdal pirtûkên xwe bi wergerên wan ên ermenîkî diweşînin. Ji ber qedexekirina elfabeya kurdî-latînî, hikûmeta Ermenîstanê di 1941an de biryara elfabeyê nû dide û ev alfabe divê bi hîmên kirîlî bê amadekirin. Amadekirina vî karî dispêrin Heciyê Cindî. Ew di demeke kin de alfabeke kurdî bi tîpên kirîlî amade dike û ev xebat 1944an de tê çapkirin. Ev elfabe heta hilweşandina Sovyetê tê bikaranîn. Elfabeya nû ya bi kirîlî encama polîtîkayên stalînîst e; lewra bi vî awayî dixwazin ku milletên Sovyetê nêzikî hev bibin. Lê di paşxaneyê xwe de armanceke din di hundirîne ku pêwendiyên kêmbûnê xwe bi perçeyên din re bibirin û wan îzole bikin. Ji ber vê ye ku xebatên kurdên Sovyetê demeke dirêj negihîştin kurdên parçeyên mayîn.

Ji 1938an vir ve xebatên çandî û zimanî ya bi kurdî sist dibin û hema bêje qet namînin; weşanên radyoyan yên bi kurdî tên qedexekirin û rojnameya *Riya Teze* tê girtin û çapkirina pirtûkên kurdî tê sekinandin. Di vê navbera dirêj da du berhevokên nivîskarên kurd (1948- 1954) tên weşandin. Di 1947an de Heciyê Cindî berhevoka çîrokên xwe bi navê *Siba Teze* diweşîne û çend xebatên xwe yên zanistî yên derheqê folklorê de çap dike.

Li hember van qedexekirinan xebateke din piçek ronayî dide vê serdemê. Di 1937an de li gundê Elegezê *Şanoya Dewletê ya Elegezê* tê vekirin. Lîstikvanên ewil ji nav keç û xortên wê herêmê tên bijartin. Kar û barên şanoyê ji aliyê dewletê ve tê finansekirin û şanogerên ermenî ciwanên kurd perwerde dikin. Nivîskar û şanonivîsên ermenî li ser hîmên zargotin û jiyana kurdan gelek şanoyan dinivîsin. *Mem û Zînê* S.Taronsî; *Ker û Kulik*, *Siyabend û Xecê*, *Keça Mîrikê* û *Gur Heso* yên S. Gensoyanî hin ji van in. Wekî din berhemên Rûs, Ermenî Gurcî û Azeriyan derxistin li ser dîkê. Herwiha berhamên Celatê Koto *Lur de Lur*, Heciyê Cindî *Miraz* û Cerdoyê Gêncî *Cuşka Doxdiryê û Bira* jî li van şanoyan tên lîstin. Ev şano di 1947an de tê girtin lê dîsa jî di demeke kin de nêzikî 30 pîyesan ve çandeke mezin ava dike û ji bo dahatûyê kadroyên baş perwerde dike.

2.1.3. Êwra Sêyem: Hostetî (1955-1991)

Kengî desthilatiya Stalîn û giraniya Stalînîzmê tederîcî paş dikeve xebatên kurdî yên çandî jî ji nû ve geş dibin. Nexasim li Ermenîstana Sovyetê hikûmet piştgirî dide van xebatan, di 1955an de "*Riya Teze*" ji nû ve derdikeve, pirtûkên kurdî tên çapkirin û li Akademiya Zanistî ya Ermenîyan dersên "Xebatên Kurdî" dest pê dikin.

Di dîroka xebatên kurdî ya li Sovyetan de, Joseph Abgarovich Orbelî xwedî cihêkî taybet e. Bi peyan û hewldanên Orbelî, di 1959an de li Lenîngradê (St. Petersburg) di Enstîtûya Xebatên Rojhilatî de şaxeke ji bo xebatên kurdî vedibe û ev yek jî li

seranserê cîhanê yekemîn navend e ji bo xebatên kurdî.¹²⁰ Di vê komê de gelek kurdnasên navdar hene û bi awayekî aktîf li ser zimanê Kurdî û zaravayên wê dixebitin û gelek monograf di vê qadê de diweşînin. Di vê komê de dîroknasa navdar E.Î. Vasîlyeva jî he ye û wê jî gelek xebatên hêja kiriye li ser dîroka kurdan ku yek ji wan jî wergera *Şerefnameyê Şerefxan e. Vasîlyeva* vê pirtûkê ji Farisî wergerandiye ser Rûsî. Li Moskovayê beşeke xebatên Kurdî heye û serokatiya wê jî Profesor Olga Îvanovna Zhîgalîna dike. Şakiro X. Mihoyî û M. Lazarev jî li wê beşê xebatên xwe dikin.

Ermenîstan jî tevî St. Petersburg û Moskovayê dibe navenda kurdolojiyê. Di 1959an de li Akademiya Zanistan a Komara Ermenîstanê, di warê Zanistên Rojhilatnasiyê de beşa kurdolojiyê vedibe. Di vê beşê de, li ser dîrok û folklor û edebiyata kurdan xebatên zanistî dest pê dikin û herwiha lêkolînên li ser zimanê kurdî jî çiyekî taybet digire. Di 1968an de, ji bo gihandina qadroyên kurdolojiyê, di Fakulteya Zanistên Rojhilatî ya Zanîngeha Yêrêvanê de beşa kurdolojiyê vedibe. Zanista kurdolojiyê îro bi bingeha van xebatên ve li ser piyan dimîne; lewra kî bixwaze dîroka xebatên li ser kurdan bixwîne û bizane yekser destê xwe dirêjî van xebatên Sovyetê dike. Ev yek jî bi saya serê Qanatê Kurdo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Çerkez Bakoyêv, Şekroyê Xudo, Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl, Î. Farîzov, Xalt Çetoyêv, Meksîmê Xemî, Şerefê Eşîr, Kinyaz Mîrzooyêv, Karlênê Çaçanî, Çerkezê Reş, Nûra Cewarî, Mamoyê Xalit û Cemîla Celîl pêk tê.

Di navbera salên 1960 û 1970î de, di Zanistên Rojhilatnasiyê ya Akademiya Zanistan a Azerbaycanê de beşa kurdolojiyê vedibe. Li vir kesên wekî Elî Gelawêj, Rehîm Qazî, Husêyîn Kurdoxlî, Şamîl Eskerov, Zumrûd Şefiyêva, Mehemed Şemsî bi kurdolojiyê ve mijûl dibin. Di 1959an de, bi helbest û wergerên kurd û azeriyan berhevokeke bi navê *Desteya Wêjeya Kurdî* tê weşandin.

Bi piştgiriya Yekitiya Sovyetê ‘pirsgirêka kurdan’ di Yekitiya Miletan de tê rojevê. Bi şoreşa Kurdistana Başur, di nava kurdên Sovyetê de ‘hişyarbûyîneke netewî’

¹²⁰ Khanna Omerkhali, *hg*, r. 137.

pêk tê¹²¹ û pê re jî hest û ramanên neteweyî dikeve nav mijarên kurdên Sovyetê. Tosinê Reşîd ji bo vê yekê îddîa dike ku cara ewil e ku Kurdên Sovyetê xwe parçeyekî gelê kurd dibînin.¹²² Ev hişyarbûna netewî bi gavên jixwebawer berdewam dike û xwendekarên kurd li Yêrêvanê saziya ‘Şêwra Xwendekarên Kurd’ ava dikin. Bi vî awayî mijarên yekitî û netewîtî di edebiyata kurdên Sovyetê de şax dide.

Di destpêka salên 1960î de, Radyoya Yerêvanê dest bi weşanên kurdî dike ku ev program li gelek perçeyên Kurdistanê tê guhdarîkirin. Wekî ku M. Van Bruinessen jî dibêje “Meriv dikare texmîn bike ka bandora vê yekem weşana kurdî li ser kurdên Tirkîye, Iran, û Iraqê bi çî awayî çêbûye ku hay ji xwe û ji kurdên perçeyên din bûne.”¹²³ Di 1978ande li radyoya Gurcîstanê ya dewletê de programa axaftinên kurdî tê destpêkirin. Berpisiyarê vê programê Keremê Anqosî ye û heftî carekê 10 deqe tenê dimeşe.

Li Gurcîstanê, di salên 1970î û 1980î de ji bo xebatên kurdî eleqeyeke mezin peyda dibe û Tiflîs demeke kurt de dibe navenda xebatên kurdî yê çandî. Li dibistanan polên kurdî vedibin; tiyatroyeke bi kurdî û grubên mûzîkê ava dibin; programên radyoyê yê heftane dest pê dikin û herwiha çapkirina pirtûkên kurdî jî di rewacê de ye. Dîsa di Yekitiya Nivîskarên Gurcîstanê de şaxeke bi kurdî jî vedibe.

Gav bi gav ew rawestina hijdeh salan paş de dimîne û kurdên Sovyetê bi awayekî jixwebawer heyfa salên borî hil didin. Bi rêya enstîtûyan hejmara kurdên xwenda zêde dibin û ev yek jî rê li ber geşedana edebiyatekê vedike. Di vê serdemê de li rex rewşenbîrên salane nifşeke nû jî ava dibe û ev nifşa ha jî êdî xwedî tecrûbe ne, xwenda ne û haja wan ji edebiyata cîhanê heye (bi rêya edebiyata rûsî û ermenîyan). Edebiyata kurdî ya Sovyetê êdî bi berhemên xwe yê cur bi cur dibe xwedî tradîsyonekê.

Helbesta kurdî ya Sovyetê di vê dewra hostetiyê de bi gulvedaneke gumreh pêş dikeve û dixwaze ku xwe ji bandora edebiyata rûsî û ermenî dûr bixe. Di vê serdemê de

¹²¹ Têmûrê Xelîl, **hb**, r. 22.

¹²² Tosinê Reşîd, **hb**, r. 209.

¹²³ Martin Van Bruinessen, **hg**, r. 214.

mijarên helbestên wan pesn û bilindkirina hikûmeta komûnîst û dewra Sovyetê ye yan jî nalet û nifir û recimandina dewrana derbasbûyîye. Ji zargotinên gelêrî ji xwe re paşxaneyekê ava dikin û dikevin pê naveroka destanan da ku ji bo fikrên xwe yên siyasî bingehê veçêkin û tê de ronahiya sosyalîzmê bibînin.¹²⁴ Helbestvanên ku piştî salên 1950î dikevin ‘govenda’ helbesta kurdî ya Sovyetê ev in: Fêrikê Ûsiv, Şikoyê Hesên, Sehîdê Îbo, Simoyê Şemo, Baxçoyê Îsko, Ezîzê Îsko, Cerdoyê Esed, Rizaliyê Reşîd, Şerefê Eşîr, Şemsî, Eskerê Boyîk, Şamil Eskerov, Tosinê Reşîd, Çerkezê Reş, Korda Mad, Ezîzê Gerdenzerî, Egîdê Ahmed, Vanîkê Elîxan, Torinê Ozman, Bariyê Bala, Paşayê Erfût, Mecîdê Silêman, Cemalê Ûsiv, Svêtlana Silêman, Zîna Emer û wekî din. Ji van navan Fêrikê Ûsiv, Şikoyê Hesên, Mîkayîlê Reşîd, Qaçaxê Mirad, Simoyê Şemo, Eskerê Boyîk, Şemsî û Rizaliyê Reşîd.¹²⁵ Di 1961ê de helbestên Şikoyê Hesên bi berhevokeke bi navê *Qulçîçek* tê weşandin. Di heman demê de helbestên Fêrikê Ûsiv jî bi çend pirtûkan tên weşandin: *Gula Elegezê(1954)*, *Lîrîka(1967)*, *Usivê Nebya (1973)*, *Narê (1977)*, *Hisretdefter (1984)* û *Dinya Delal (1987)*. Qaçaxê Mirad, Şikoyê Hesên û Fêrikê Usiv berê xwe didin helbesta klasîk û dixwazin ku bi modernîzasyona wan rêyekê vekin ji bo helbesta nûjen. Mîkaelê Reşîd forma helbesta Ewropayî tîne dixwe ‘kirasa’ helbesta kurdî. Di destpêka salên 1960î de li hember van pêşketinan, helbesta Fêrikê Ûsiv û Şikoyê Hesên li ser bingehê xwe dide pejiwandin.¹²⁶

Meriv dikare bêje ku di nava edebiyata kurdî ya Sovyetê de, di warê pexşanê de pêşketînen mezin çêdibin. Di destpêkê de ji xeynî *Şivanê Kurmanca(1935)* ya Erebe Şemo hema bêje qet nimûneyên romanê peyda nabe û herwiha yên çîrokê jî. Lê ev rewş di vê serdemê de diguhere. Li gel Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal û Ahmedê Mîrazî; navên wek Eliyê Evdilrehman, Sehîdê Îbo, Egîdê Xudo, Ahmedê Hepo, Nadoyê Xudo Maxmûdov, Emerîkê Serdar, Sîma Semend, Wezîrê Eşo, Prîskê Mihoyî, Xelîl Mûradov (Xelîlê Çaçan), Mîroyê Esed, Tosinê Reşîd, Çerkezê Reş, Casimê Celîl, Ahmedê Gogê, Elîxanê Memê, Hamoyê Rizgo, Babayê Keleş û Vanîkê Elîxan bejn û bala xwe di warê pexşanê de nîşan didin.

¹²⁴ Eskerê Boyîk, **hb**, r. 35-36.

¹²⁵ Têmûrê Xelîl, **hb**, r. 23.; H. Şamil, **hb**, r. 101- 102; Eskerê Boyîk, **hb**, r. 35-36.

¹²⁶ Tosinê Reşîd, **hb**, r. 209.

Erebê Şemo gava ku ji sirgûniyê vedigere, nivîsên xwe yê salên 1930î careke din di ber çavan re derbas dike. Di 1959an de romana xwe ya *Berbang* diweşîne. Ev roman wekî dubare û dewama *Şivanê Kurmanca ye*. Paşê E. Şemo romanên xwe yê *Jiyana Bextewar* (1965), *Hopo* (1969), romana xwe ya dîrokî (ya ku li ser destanekê ava kiriye) *Dimdim* (1965) diweşîne. Di 1969an de her sê pirtûkên E. Şemo (*Berbang*, *Jiyana Bextewar*, *Hopo*) di nava berhevokên berhemên wî de careke din tîr weşandin. Eliyê Evdilrehman, romanên xwe yê *Gundê Mêrxasa* (1968), *Xatê Xanim* (1969) û *Şer Çiya De* (1989) diweşîne. Heciyê Cindî, bi xebatên xwe yê zargotinî, zimanzanî û lêkolînî re gelek helbest û kurteçîrok jî dinivîse. H. Cindî ji zimanên biyanî gelek wergeran dike û di 1967an de romana xwe ya dîrokî-folklorîk *Hewarî* diweşîne. Sehîdê Îbo romana *Kurdê Rêwî* (1979), û Egîdê Xudo romana *Dê û Dêmarî* (1986) û Ezîzê Gerdenzerî romana *Fîncana Ferfûrî* (1990) dinivîsin. Herwiha Ahmedê Hepo jî romana xwe ya *Bawerî* di 1990an de dide ber çapê.

Bi pêşketina romanê re, çîroknivîsîna kurdî jî ji wê kêmtir namîne û bi çîroknûsên serkeftî nimûneyên baş dide. Sehîdê Îbo, Eskerê Boyîk, Emerîkê Serdar, Sîma Semend, Ahmedê Hepo, Wezîrê Eşo, Xelîl Mûradov û Babayê Keleş serkêşên vê cureyê ne. E. Serdar kurteçîrokan xwe di nava berhevokên xwe de diweşîne: *Destê da* (1974), *Edî Dereng Bû* (1979) û *Dengê Dil* (1985). Nivîskara jin Sîma Semend kurteçîrokan xwe di 1963an de bi pirtûka *Xezalê* diweşîne. Sehîdê Îbo jî kurteçîrokan xwe di 1966an de bi navê xwe yê *Duryan* diweşîne.

Şanoya kurdan, bi alîkariya nivîskar û şanonivîsên ermeniyên dest bi jiyana xwe dike. Şanogerên ermenî hem ciwanên kurdan perwerde dikin û hem jî aliyê teknîkî bi rê ve dibin. Dû rê bi saya hin nivîskarên kurd çend piyesên kurdî jî tîr nivîsîn. Piyesên ku ji bo van şanoyan hatin nivîsîn ev in: *Zewaca Bê Dil* a Îsmayîlê Dûko, *Sinco Qîza Xwe Dide Mêr* û *Mem û Zîn* a Eskerê Boyîk, *Siyabend* û *Xecê* ya Tosinê Reşîd.

Di nava kurdên Sovyetê de çanda rexneyê zêde pêş ve naçe û berhemên bi vî rengî qet nehatine nivîsîn. Rexnegir Terry Eagleton ji bo rexneyê dibêje ku hewildana

têgihîştina zimanê edebî ye û her tim li kêleka edebiyatê hebûna xwe parastiye.¹²⁷ Yanê ji bo rûniştina çanda rexneyê divê tradîsyona edebiyatekê hebe û şert û mercên bi vî awayî ji bo edebiyata kurdên Sovyetê hêj pêk nehate. Di warê rexneyê de Emerîkê Serdar li Ermenîstanê gelek xebat kirine ê û piraniya nivîsên wî yên rexneyê di rojnameya *Riya Teze* de hatine weşandin. Di salên dawî de çend nivîsên Çerkezê Reşên derheqê rexneyê de, di *Riya Teze* de tê weşandin.

Ev edebiyata ‘bi şiklê xwe neteweyî, bi naveroka xwe çînî’ ji bo hin lêkolêr û nivîskarên bûye mijajara nîqaşan. Nivîskarê binavûdeng Mehmet Uzun dibêje ku tespîta Octavio Paz a derheqê nivîskarên Latîn Amerîkayî (yên ku bi Îspanyolî dinivîsin) de, ji bo kurdên Sovyetê jî rast in: “Peyv û gotinên ku ji kokên xwe hatine jêkirin li welatekî din reh û rêçên xwe bera axê didin. Sirgûnî kok dide, gul vedide.”¹²⁸ Li gorî wî edebiyata Sovyetê bi temamî ne edebiyata sirgûnê be jî, ji welêt û pêwendiyên germ bi dûr gul vedide û şax dide.

Kurdzanê fransî Pêre Thomas Bois jî serboriya edebiyata kurdî dinivîse û di 1955an de bi navê *Coup d’oeil sur la Littérature Kurde* çap dike. Bois dibêje ku ji aliyê teknîkî ve berhem û nivîsên kurdên Sovyetê bi qasî nivîskarên kurd yên Surîye û Tirkiyeyê (Celadet Elî Bedirxan, Kamuran Bedirxan, Osman Sebrî, Cegerxwîn, Nûredîn Zaza, Mehmet Uzun û Mahmut Baksî û hwd...) serketî nîn e. Ev nêrîn îro çî kêr çî zêde qebûlekê dibîne lê sedema wê em dikarin bibêjin ku hinek siyasî ye.¹²⁹ Bois dîsa îddîa dike ku nivîsên kurdên Sovyetê her çiqas bi kurdî bin jî hest û ramanekê neteweyî nade nivîskarên derweyî Sovyetê. Ji bo nivîskarên kurd ên Sovyetê welat gundê wan e, geliyê wan e, Ermenîstan yan jî Sovyetîstan e lê ne Kurdistan e.¹³⁰ Meriv nikare bibêje ka ev yek tercîheke şexsî ye yan jî polîtîka û empozeya Sovyetê ye. Ev yek ne diyar e lê Pêre Bois dibêje ku wî di nav kurdên Sovyetê de, derheqê Kurdistanê de coş û kelecaniyek hest nekiriye.

¹²⁷Terry Eagleton, *Eleştiri ve İdeoloji- Marksist Edebiyat Teorisi Üzerine Bir Çalışma*, İletişim, İstanbul 2009, r. 11.

¹²⁸ Mehmed Uzun, *Antolojiya Edebiyata Kurdî*, weş. Aram, İstanbul 2003, r. 48.

¹²⁹ Şerif Vanli, *hb*, r. 166.

¹³⁰Thomas Bois, “Folklor ve Edebiyat”, *Kürt Milliyetçiliği*, (r. 182-207), weş. Örgün, İstanbul 2008.

Wekî tê dîtin ku edebiyata kurdên Sovyetê li ser tradîsyonekê berdewam nake; ew bi xêr û gunehên xwe ve, bi kêmasiyên xwe ve li ser qadeke vala, ji welatê xwe dûr bê peywendiyekê ava dibe. Divê ev yek jî di lêkolînen de bibe ciyê nîqaşan. Destpêka edebiyata kurdên Sovyetê dibe bingehê dewlemend ji bo tradîsyonekê.



BEŞA SÊYEM

ŞOPÊN REALÎZMA SOSYALÎST DI ROMANÊN KURDÎ YA SOVYETA BERÊ DE

Di vê beşê de em ê li ser serkeftina teknîkî yên romanên kurdî yên Sovyetê nesekinin. Bêtir em ê bala xwe bidine mijarên naverokî bê ka rêgezên realîzma sosyalîst di nava van berheman de bi çi awayî hatine bi kar anîn. Ji ber vê yekê, di lêkolîna vê beşê de çi ku perspektîfa nivîskêr a realîst- sosyalîst bide me, em ê bi wan bergehane xebata xwe bimeşînin. Ev yek jî wekî ku me di destpêkê de diyar kiribû; îdeolojî û partîzanî, lehengên erênî, romantîzma şoreşger, ked, folklor, dîn û dîrokîbûn, gelparêzî û her wiha sîstema sovhoz û kolxoz in.

Di vê beşê de ji ber van sernavan zêdetir elbet şîrovevên li ser realîzma sosyalîst wê bê kirin. Lewma em ê yek bi yek bi sernavên realîzma sosyalîst bi kar neyînin. Di dewsa wê de di tevahiya romanê de ev yek çawa xwe der didin em ê wan nîşan bidin.

3.1. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romanên Erebe Şemo de

3.1.1. Şivanê Kurmanca

Yekemîn romana Erebe Şemo ya bi navê *Şivanê Kurmanca*¹³¹ her wiha yekemîn romana kurdî ye û bi zimanê kurdî cara ewildî 1935 an de, li Yêrêvanê hatiye weşandin. Bi weşandina vê berhemê Erebe Şemo wekî nivîskarekî kurd “bi şoret tê naskirin û nav û

¹³¹ Erebe Şemo, *Şivanê Kurmanca*, weş. Lîs, İstanbul 2015.

dengê wî çawa li welatê Sovyetê wisan jî li nava rewşenbîrên kurd ên wê demê de belav dibe”¹³² û wekî “bavê romana kurdî” tê pejirandin.

Şivanê Kurmanca her wekî tê dîtin ku serpêhatiya jiyana nivîskarî bi xwe ye. Yanê ji romanê wêdetir dişibe berhemêke otobîyografîk.¹³³ Di nava berhemê de jî carinan xwe şaş dîke û xwe dide dest: “Çend zar ketne destê diya min. Xûşkê min Çîçek, Gogê û ez, Erebb.” (r.14) Behsa zarokatî û xortaniya xwe dîke û paşxaneyê berhema xwe bi vî awayî ava dîke. Di emrê xwe de çî nerastî û dijwariyan dîtibe, ji ber neheqî û zordestiya milkdaran de çî kişandibe bi awayekî honandî vedibêje.

Şivanê Kurmanca ji aliyê şayesandina kesan û cihan ve qels maye. Heta em dikarin bêjin ku nimûneyên wan qet tune ye. Lehengên romanê meriv dikare bêje ku tenê vegêr (Ereb) bi xwe ye. Lewra kesên kû di romanê de derbas dibin ne wekî lehengên romanekê lê wekî sîlûtekê ne ji nav serboriyên wî derbas dibin diçin. A girîng serboriyên wî ne. Bi vî tihêrî em dibînin ku ji aliyê psîkolojîk ve jî tu şîrove an jî vegotinek tune. Roman bi devê kesê yekem ve bi şewazeke rast û bi flashback hatiye vegotin.¹³⁴ Ji xwe ji terzê vegotina wî ya rojane meriv tê digihêje ku çawa yekî kalemêr li civata şebihêrkekê de runiştibe, şevên dirêj û sar yê zivistanê de behsa serboriyên xwe bike. Wekî mînak: “Bihar hat, ez bûme golikvanê gund. Xûşka min a Gogê -ya ku niha saxe, li Tîblîsê ser fabrîka tutunê dixebite,- alî min dikir: dihat golik ji gund dûr dixist, vedigeriya dihate mal.” (r.36)

Şivanê Kurmanca ji 21 beşan pêk tê û beşa ewil bi ‘Kulfetê Me. Zarotiya Min’ê hatiye binavkirin. Vegêr di vî beşê de berî behsa bavê xwe yê Şemo dîke ku ew yekî kesîb û hêjar e û ji êla Hesena (Hesiniya) ye. Li qezayê Surmeliyê diçe ber dewarê xelkê. Gava ku jina Şemo dimire ew her du kurên xwe digire û diçe ‘gundê huruma’, Azatê ku

¹³² Eskerê Boyîk, “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî Erebbê Şemo (1897-1978)”, *Kovara W*, j 15, İstanbul 2007, r. 21.

¹³³ Christine Allison ji bo vî yekê dibêje ku di pêwenda kurdî de jihev cudakirina roman û otobîyografiyê gelek dijwar e. Ji bo pêwenda kurdî, jihev cudakirineke zelal ya herduyan bisînor e; wekî cudahiya navbeyna otobîyografi û serpêhatiyê, ev jî tevlihev e. Ji bo agahiyên berfireh: Christine Allison, “Otobîyografi, Serborî û Romana Kurdî: Erebbê Şemo û Peyrewên Wî”, *Wêje û Rexne*, j.2, Gulan-Hezîran- Tîrmeh- Tebax, Diyarbekir 2014.

¹³⁴ Christine Allison, *hg*, r. 141

girêdayî welatê Qersê ye. Şemo û her du kurên wî Biro û Dewrêş rêda gelek ‘çetînî’ dibînin. Li Azatê, Şemo bi jineke kurmanc re dizewice û sê zarokên wî jî dikevin destê wî: Çîçek, Gogê û Ereb.

Li wî gundî diya wî diçe malan da dixebite û babê wî jî li mala Todorê hurum de rênçberî dike. Lê dîsa jî nikarin debara xwe pê bikin. Gelek caran zikbirçî dimînin. Gava ku bihar tê Ereb jî bi bavê xwe re diçe ber pêz. Di beşa ‘Merkeba me. Rênçberiya nava “Melegana” de malbata Şemo pere serhev didin û kerekî distînin ji xwe re. Paşê gundî êdî karê rênçberiyê nade Şemo û ew jî bar dikin diçin Alêksandrovskê (Komesorê) ku niştecihên wî melegan in. Melegan dewlemend in û ji xeynî heywanan, karê çandiniyê jî dikin. Ji aliyê baweriyê ve jî du ‘tayîfe’ ne, dêrê wan û keşîşê wan ji hev cuda ne.

Di beşa ‘Xwendina ewlin. Mêtrîka min’ de, li gundê Ereb mamosteyeke jin heye û diçe ji bavê Ereb destûra kurê wî dixwaze ku ew bibe berdestiyê mektebê. Ereb li wir baş dixebite û mamosteya wî dixwaze ku wî wekî xwendekar bigire li ba xwe. Bavê wî qebûl nake ku ew bixwîne lê Ereb bê bavê xwe bi dizîkava dest bi xwendinê dike û bi dil û can hînîxwendinê dibe. Mamosteya wî û keça mamosteyê Marûsiyê ji wî û xîreta wî re ecêb dimînin. Ereb bi xwe jî çend caran dibêje ku ji xwendinê pirr hez dike. “Eşqa xwendinê ussa dilê minda hebû, wekî gav sihet fikra min ew bû.” (r.48) Havînan gava ku mekteb tê girtin, Ereb şivantî û gavantî dike lê êdî di torbeyê wî de ji xeynî nê, pirtûkên wî hene. Li vir gelek behsa xwendina xwe, hezkirina xwe û serkeftina xwe dike û dide zanîn ku ev yek ji bo wî derfeteke mezin e û bextewarî ye. Em jî ji van gotinan fêhm dikin ku Ereb bi rastî jî ji xwendinê û perwerdehiyê gelek hez dike û giringiya wî jî dide ber çav. Lewra li gorkurdênêzidî xwendin û nivîsîn qedexa ye û tenê pîrên wan dikarin kitêba wan a pîroz ‘*Mishefa Reş*’ bixwînin.

Ji bo nivîskarên girêdayî realîzma sosyalîst armanca sereke bilindkirina îdeolojiya Partiyê û doza wan a pîroz e. Ev jî di romanên wan de bi awayekî eşkere xuya dike. Fikara pêkanîna dozêkê bi hemû lehengên xwe yê şoreşger re xwe dide der. Em dikarin nûveyên vê jî di romana *Şivanê Kurmanca* de bi awayekî zelal bibînin. Di beşa “Li şherda. Şerê împerîalîsta” de Ereb û malbata xwe êdî nereka Teco derdikevin û diçin Şûmê- Korê. Piştî zivistanê reş (ji ber ku birayê wî yê Dewrêş dimire) êdî li wir cî dibin. Ereb gava ku bi cîranên xwe re ji bo kerekî diçe Qersê. Wê demê ev bajar di destê

Ûrisan de ye. Li wir Ereb li xanekê ji xwe re cî digire û ji xwe re karekî digere. Ew jî dizane ku bi gavantî û şivantiyê nikarin xwe ji birçîtî û belengaziyê xilas bikin. Hevalê wî Îvanê kurê Sêmyon jê re li zavodekî (kargeh) kar peyda dike û Ereb dest bi xebatê dike. Li vir du sal dixebite û salix dide ku wê demê ‘şerê împerîalîsta’ diqewime. Li wir rastî leşkerên qazax tê û ew dibînin ku Ereb bi çend zimanan dizane, wî jî li gel xwe dibin ku ji wan re ‘dîlbendîtî’ (wergêr) bike. Ereb bi vî awayî aliyekî şerê, tevgerênleşkeran dibîne û poşman dibe.

Di beşa “Li firqêda” cara ewil Ereb behsa Bolşevîkan û Partiyê dike. Ereb li Sarîqamîşê wekî pale (karker) dixebite. Li wir Klîmînov (hîmdarekî Sovyetê), Mîxaîlov û Popov nas dike ku ew endamên Partiya Bolşevîkê ne. Ereb jî wan dide nasîn ku ew ji partiyê ne: “Ev heval tev, xên ji Şûrka Kornêv, uzvê sosîal demokrata firqa bolşevîka bûn.” (r. 101). Bi saya van hevalan Ereb carinan diçe dîwana wan, dizane ka ‘firqe’ çi ye, xebata ‘înglabkar’ an çi ye. Li wir çi hîn dibe diçe paleyên kurmanc û tirkan re vedibêje. Pale jî bi gotin û hişyarkirinên wî radibin doza xebata xwe dikin û heqê xwe dixwazin. Ereb êdî bi rehetî diçe nav civata karkeran; çi bidin wî distîne, dixwîne û ji vê jî şa dibe: “Bi piştî wan, komekîya wan, her ro diçûme civata wan. Idî êpêce çavê min jev vebûn û min xebateke dil û can dibir nava pala, şer dikir ber bûrjûazîyê.” (r. 102). Li vir Ereb dide zanîn ku hingî ew çûye nav karkeran, behsa heq û hiqûqê, dozê dikeve nava wan. Ereb bi dilekî saf û kelecane çî derheqê partiyê de bibîne dixwîne, tiştên ku fêmanake dipirse. Carekê li ser nîqaşên di navbera bolşevîk û menşevîkan de difikire û fêmanake ka ev her dû alî çima li hember hev şer dikin. Li gor wî divê hemê ‘înglabkar’ yanê şoreşger bibin yek, ‘padşahê’ yanê çarê ji textê wî bavêjin û xebatkarên ji zilma kapîtalîzmê xilas bikin. Fîkr û ramanên xwe yê bi vî awayî ji hevalên xwe re şîrove dike. Hevalê wî Klîmov jê re behsa cudatiya wan dike û ew jî êdî baştir dizane ka mesele çi ye.

Gava ku çar ji textê tê avêtin hikûmeteke miweqetî (demkî) tê damezirandin û ew hikûmet jî dixwaze ku herkes here şerê li hember Rom û Gêrmaniyan. Lê Ereb dibêje ku bolşevîk li hember vî şerî ne: “Firqa me, bolşevîka daw dikir kutta kin şêr, erd bidne gundîya, zavod û fabrîk palara.” (r.102).

Ereb roj bi roj dikeve nav xebatên partiyê, ew çî peywîr bidin wî bi eşqekî tîne

cih. Behsa xwe û xebatên xwe bi van hevokan tîne zimên: “Tu carî eşqeke ussa dilê mida tunne bû. Ne zarotîyêda, ne cahiltîyê, wextê destê min dar diqefiland, ez bûme rênçber. Çimku halê gavanê kurmanca ussa pîsse fikira wî her ser wêderêye, çika kengê zikekî têr nan bixwe. Lê bihara 1917-da, îdî ew parîyê nan nebû fikra mine eseyî, min fikir dikir çewa xebatê rind bibin. Ez ketme firqê, bûme uzvê wê yî eseyî. Ez îdî merîkî ji tarîyê derkeve bê ber ronkayê.” (r. 105). Ev yek tam fikra romantîzma şoreşger bime dide zanîn ku şoreşgerên partiyê bi romantîzmeke din girêdayî doza xwe ne.

Ji bo yekê gulanê xebatên mezin dikin, li Sarîqamişê mîtîngeke mezin pêk tînin. Erebb jî di vê mîtîngê de diaxive û derheqê partî de pesnan dide. Bi kurmancî dibêje ku “Gerekê em dîwana miweqetî qir kin. Diwanê têne destê şewra pala û gundîya. Gerekê em neçine şêr. Gerekê em dewlemenda tevî qir kin bê xeberdan.” (r. 106). Ji ber vê yekê ji aliyê leşkerên Diwanê ve tê desteserkirin û du meh dimîne girtî. Gava ku ji wir derdikeve diçe gundê xwe yê Sûsîz, ji ber ku ew êdî ji aliyê Diwanê ve tê nasîn. Li wir dibîne ku hêja jî ew zilm û zoriya axayan û neçelîkan (şefê bajêr) berdewan dike. Erebb ji wan re rewşa dawî şîrove dike û ji gundiyan re behsa partiyê dike: “Min Susizîya serwext kirin, wekî niha îdî patşa tunne, neçelik û prîstav tev ji quluxê derxistine, niha dîwaneke teze rûniştiye, ew jî mîna dîwanê patşê ye. Gerekê em herin, prîstava, neçelika derxin, dîwan têkeve destê wekîlê pala, esker û gundîyê xebatçî.” (r.109). Êdî hin gundî jî hînî van gotinan dibin û di civînan de radibin doza xwe dikin: “Em naxwazin tu dîwanê miweqetî, em dixazin dîwana wekîlê pala, esker û gundîyê xebatçî.” (r. 110). Erebb êdî li her derê tê nasîn lewra nikare li wan deran bimîne. Çendekî li cem hevalên xwe, xwe wedişere û biryara xwe dide ku here Êrîsetê (Rûsyayê). Li Êrîsetê bi hemalî debara xwe dibîne. Rojekê di nav bajêr de rastî mitîngekê tê û axaftinên bolşevîkan bi şabûn û kêfxweşiyê guhdarî dike. Dû re diçe yekê ji wan re diaxive û salix dide ku ew jî bolşevîk e. Qewl datînin ku rojekê hev bibînin lê ji şabûnan şev nikare raze.

Di beşa “Înglaba Oktyabrê” de êdî Erebb li cem bolşevîkên Êrîsetê ‘gvardiya sor’ digire ku ew nîşaneyê bolşevîkî ye û êdî dikare bibe xwedî tifîngekê. Tevî xebatên xwe yê partiyê xeber dide ku êdî şoreş pêk hatiye û ser ketiye. “Meha çirîyê pêş şer bibû. Rokê cab hat, wekî li Pêtrogradê û Moskovê dîwan ketiye destê şewra pala, esker û depûtatê gundiya. Me jî virda dest pê kir.” (r.125). Gava ku karekî ji bo partiyê didin wî

bi dil û can karê xwe pêk tîne û dibêje ku “bona qedandina înglabê” (r. 126) hatiye van deran. Erebi li vir diçe eniya şêr û ji bo şoreşê şer dike. Gava ku behsa şêr dike bi dilxweşî û serbilindî demên xwe yên eniyê tîne bîra xwe: “A bi vî tihêrî eşq û dil em diçûnê şêr.” (r. 137), “Ken ser lêva me nedîçû, meriv tirê em diçûne dawetê.” (r. 138).

Di pirtûkê de çî millet be bila be Erebi Şemo balê dikişîne ser statûya wan. Yanê ji bo wî milletê wan ne, çîna wan e ya muhîm. Lewra gava ku behsa şerê Grajdaniyê dike (r.141) dibêje ku burjuvaziya Ewropayê ya Îngilîz, Gêrmanya, Fransa û Japonyayê diçin hewara burjuvaziya Ûrisetê lê ‘proletariyatê’ heman welatan jî radibin piştgirî didin karkerên partiyê re.

Piştî ku şer dikede Erebi jî bi gotina Partiyê vedigere nav gundê kurmancan û li wir dest bi xebatên xwe dike. Li vir bi gotinên vegêr(Erebi) em fêhm dikin ku hikûmeta ku nû hatiye heqê kesîb û feqîran, mafên gelên bindestan diparêzin. “Dîwana şewrê xweyê me, kesîb- kûsîba hat, em aza kirin ji destê van xûnxura, ji destê van zalima...” (r.148). “Me dixwast dîwaneke dinê, eynî ew dîwan ya ku her-ro êrmeniya ji me ra digot, dîwana Sovêt.” (r. 154).

Di vê pirtûkê de lehengên ji xeynê Erebi, wekî ku çîroka wî û armanca wî ya vegotinê bixemilînin, di nava romanê de tîn û derbas dibin. Wekî ku em bêjin di vê romanê de, lehengê erênî û şoreşgerê romantîk Erebi bi xwe ye. Lewra çî zilm û zorî dibîne, dîsa jî dev ji xebata xwe bernade û bi awayekî jixwebawer karê xwe yê partiyê dimeşîne. Ne desteserkirin û girtina wî ne jî kotekên leşkeran nehiştiye ku karê xwe nivî bihêle.

Erebi Şemo qîmeta kedê ya çandî û dîrokî ji zarokatiya xwe de dizane û fêhm dike. Pê re jî pirtûkan dixwîne, di nav xebatên Partiyê de cih digire û dixebite. Ev yek jî gelek bandor li ser hişyarbûna wî de dike. Erebi pê dihese ku azadiya fikr û ramanan ancax bi serbestbûna kedê pêk tê û ev jî di nava şert û mercên sîstema kapîtalîzmê de çênabe. Ew dixwaze nîşan bide ku ev azadî tenê di sîstema sosyalîst dikare xwe pêş bixe.

Li gorî Maksîm Gorkî divê herkes hîn bibe ku kedê wekî hunereke afirandî bibîne

û di nav pirtûkên xwe de bike mijara sereke.¹³⁵ Êrebê Şemo jî li pê şîreta Gorkî diçe û di pirtûkên xwe de vê mijarê gelek bi kar tîne. Gava ku behsa kedkaran dike li hemberê wê çîna serdestan, dewlemandan, axa û began jî dide û teswîrên xwe de hestên xwe, fikr û ramanên xwe eşkere dike. Di romanên xwe de her daîm wan dide ber hev. Dewlemendan, serdestan, axa û began bi tenbelî tawanbar dike û wan bîçuk dixê. Erebe gava ku bi bavê xwe re diçe ber pezan û şivantî dike û dû re bi xwe jî dibe şivan, dibîne ku axa û beg her daîm tehdeyî li wan, li kesîban dikin. Keda wan îstîsmar dikin û heqê wan ê xebatê kêr didin yan jî bi hincetên biçûk qet nadin. Gelek caran ciyê heqê xwe de ‘kutan û qamçî’ dixwin û tîne cezakirin. “Gelle merîyêd kesîb diçûne olama bega, axa, şixulê wan dikirin, çewa rieta bega ew xebat tev bê pere dikir. Xulamêd bega nava êla ketibûn, olam derdixistin; yê ku nedîçûne olama bega, ew merî dihatne kutanê, bi qamçîyê û cirm dikirin.” (r. 59) “Her maleke dewletî sê-çar malê kesîb xwera bê heq dida xebatê; pez diçêrandin, jina hirî dirêst, dişûşt, şedikir, kincê wan dişûştin, dew dikilan, pesarî û qirş bona ardû top dikirin.” (r.59). “A bi vî tiherî beg axalera, şêxa û mella xûna wan belangaza dimêt, dixwar.” (r. 60). Li vir hêjayî gotinê ye ku Erebe berteka xwe di pirtûkê de nîşan daye, bêdeng nemaye. Diya Erebe û her du xwişkên wî jî li mala axayî bêpere dixebitin. Erebe ji bo vî qasî aciz dibe û dibêje “Bavo! Çima evana tev bê pere dixebitin, seva çi naçin, heqê xwe jê nastînin, bira herin şikîyat kin.” (r.60). Bawe wî jî bersiva wî dide dibêje ku “Lao -! Kî kare ber bega, axa yan şêxa, mella şikîyat ke? Diwane dest wan de ne, erd-erdê wane, war jî yê kal bavê wane...Emê çawa herin şikîyat, li kê şikîyat kin.” (r.60). Wekî bavê Erebe jî dibêje di wê sîstemê de kî ji kê re bêjin; lewra her tişt di destê wan de ne. Ew jî dizanin ku gava herin giliyan bikin, saleke din nikarin êdî li ba wan axayan bixebitin. Yanê bi her awayî zerarê de ne.

Di vê xalê de tiştêkî balkêş heye ku di tevahiya pirtûkê de Erebe bê tirs behsa mela û şexan dike û wan jî bi serdest û dewlemandan re rexne dike. Li gorî wî şêx û mela jî bi rêya dîne gelê xwe dixapînin û heqê wan dixwin: “Wana jî alîkî pê ketibûn, xelq dixapandin, komekî didane bega û daşnaka. Hemî kesîb dixapandin, xêr top dikirin, bê hesab bû. Ah û zarê xebatçiya dima bê pirs, yekî lê nedipirsî.”(r. 147). Ev yek ne tenê ji bo şêx û melayên kurdan lê ji bo keşîşên rûs û ermeniyên jî wisa ne. Meleganên kulak

¹³⁵ Maksîm Gorkî, **Sanatta Sosyalist Gerçekçilik**, Feyyaz Şahin (wer.), weş. Parşömen, İstanbul 2011, r.94.

xwe “xwedênas” û “sofi” hesab dikin lê bi ya Erebi ew gotin tev derew in. Lewra, ew hem gavanên wekî Erebi û hem jî kesîb û hêjarên meleganên gundî sibê hetta êvarê badilhewa didine xebatê. “Em, rênçberê xwe, ussa dikutan, danîne halê kuştinê.” (r.22) Ji xeynî dewlemendên gund, keşîşên dewlemend jî ‘xûna kesîba dixwar’ û wisa meriv ‘dikutan’ ku yek ji destê wan sax nedima. Heta tê gotin ku keşîşê dewlemend Matvêyî gavanekî kesîb ew ê ermeniyê “kaxdegan” avêtiye pêçkê û ew saxesax şewitandiyê. (r.22).

Ereb li gundê Camûşvanê rastî hevalê bavê xwe tê ku ew camêr di biçûkatiya Erebi de her gav diçe mala wan û navê wî jî Pîr Cewo ye. Gava ku bi hev re diaxivin Cewo behsa xwe û çetiniya jiyana xwe dike, heta digirî û dibêje ku “Xwezila ewa dîwana wexta eme kesîbbûnêda bûn û çetiniyêda bûn, wî çaxî bihata, min ê çîqa kûlak¹³⁶ hebûna bi destê xwe qir kirana.” (r.24) Li wir jî bi devê Cewo, vegêr dixwaze nîşanî me bide ka kesên kesîb û hêjar çiqas ji dewlemendan û çîna wan hez nakin û ji wan nefret dikin. Heta derfet bikeve destê wan dikarin dewlemendan bikujin jî. Li vir wisa xwiya dike ku çî ermenî be çî kurd be, ya girîng ew e ku dewlemend bi zordarî li ser hêjaran hikum dikin û gelek tehdeyî li wan dikin. Yanê nasnameyê netewî ne, lê nasnameya çînî derdikeve pêş.

Kedxwarin û îstîsmara wan serdestan li tevahiya pirtûkê berdewam dike û bi her buyêre re vegêr careke din dibêje ku “A bi vî tîherî bega kesîb, belengaz dişelandin, kar xwera didîtin.” (r.68). Erebi û malbata wî çend sal ji gundê xwe dûr mane û ‘bilêta’ bavê wî kuta dibe. Bavê wî derdikeve diçe Sînekê (ciyê xwe yê berê) û dixwaze ku bilêta xwe teze bike. Lê Êsîb Begê Hesenaxa jê pêşkêşî dixwaze. (Pêşkêşî yanê wekî diyariyekê ji bo axa û began). “Îsal çend sale tu çûyî, ji êlê dûr ketî, te pêşkêşa begtiya min nedaye min, tu gerekê niha bidî, ez îzna te nadim, hetta tu nedî. ” (r.68). Bi vî awayî bi her hincetê gundiyan dişelînin û wan perîşan dikin. Lê ew jî çî çax derfet bibîne giliyên xwe tîne zimên: “Ewana berê de hînî xûna me bûne, dixun, çîka kengê wê çavê wanra bê!” (r.73).

¹³⁶ Kûlak ji bo axayên dewra ûris ên xwedi erd û mal tê gotin.

Ereb gelek caran di pirtûkê de bi gotinên “bi qeydê kurmanca”, “bi qeydê eşîran” dest pê dîke û derheqê çand û folklorê kurdan de agahiyan dide. Van agahiyan carinan bi şêweyeke dîdaktîk dide, carinan jî bi devê lehengên xwe dide zanîn. Di van gotinan de em dikarin hema bêje her cûreyên hêmanên folklorîk bibînin. Kevneşopiya kurdan, edetên bav û kalan, taybetmendiyên sosyolojîk yê civaka kurdan; keçxwestina wan, qelenxwestina ji bo keçan, dawet û şingirtina wan; baweriyên wan ên wekî dara mirazan an jî remildarî; mêrkuştin û xwîndariya wan an jî mêrxasî û jinxasiya wan; edetên wekî beranberdanê, jiyana koçeriyê; jiyana wan a aboriyê, rewşa kon û avahiyên wan; her cûreyên edebiyata devkî wekî gotinên pêşyan, biwêj, sond, dua û nifirên wan, kilamên dengbêjî, stran û helbestan bibînin. Hin nimûneyên folklorîk ev in:

“Her maleke dewletî, sê çar malê kesîb xwera bê heq dida xebatê; pez diçêrandin, jina hirî dirêst, dişûşt, şedikir, kincê wan dişûştin, dew dikilan, pesarî û qirş bona ardû top dikirin. Çend mêra sibê hetta êvarê xwe hûr dikir bona pêz, ancax pêra digîhand; hinek diçûne karvîn, hinek miqatî hespêd kihêl dibûn. Her yekî xebatek dikir. Hetta zarê hûr jî bê xebat nediman.” (r.59-60)

Di nava van hevokan de hem ked û xabata wan gudiyan xuya dîke û hem jî jiyana rojane ya kurdan xwe nîşan dide.

“Kengê te qelen daye min? Kanê şahidê te? Kengê xwezgînîyê te hatne qîza min, nîşan kirine û qelen jî kifş kirine?” (r. 87) Li vir edeta keçxwastin û qelenên civata kurdan xwe dide eyan.

“Wextê me lava ji Egîd begê kir, wekî malê me ji me nestîne. Me kulfetê lape sere ji nava êlê anî, wekî xwe bavê ser dest pîya yan laçika xwe ber veke, bavê ser pîya, çewa qeydê me eşîraye, lê tu lava dîlekî ber Egîd begê ber tişteki nedihate hesabê...” (r.153) Li vir jî em dibînin ku hem zilm û tehdeya began xilas nabe. Bi awayekî din jî folklorê kurdan li vir tê dîtin. Lewra gava ku di nav kurdan de bûyereke mezin bibe jinên wan ji bo saffikirina meseleyê laçikên xwe derdixin û davêjin ber piyê mêran. Qesta wan jî ev e ku eger mesele safî nebe divê mêr wê laçikê bide serê xwe.

“Lazekê şûnda Îvanov derket, hat û dikene:^[1]_[SEP]Ezê te bigrim, lê tu heqî peretî

nadme te. Nanê te, xwarina te stu min. Ezî razî bûm, wekî min nanoziko bigrin.” (r. 32)

“Egît begê qamçîyê xwe hejand û digot: Kî neyne ezê çermê pişta wî rakim, tijî xwê bikim.” (r.153)

“Qeydê Kurmanca ew bû, wekî em dihatne dolga û wexta serê pêz diketê, her Kurmancekî zadê serê pezê xwe çê dikir; mirtoxe, kuloç, pez şerjêdikirin. Gazî cînara, şivana dikirin, nanê serê pêz didan. Malxwê mala û kulfetê wan dihatin, ser mêvana ra disekinîn, lava dikirin, wekî mêvan şerme nekin, nan bixun. Pey nan xwarinê ra cahilên wan û şivanan govend digirtin, dilîstin, kilam digotin; ji kilama tevî rindtir kilama serê pêz bû. Xorta dor bi dor, qîza lê vedigerand û dilîstin. Gelle kêf, henek, laqirdî dikirin, hetta dibû êvar.” (r. 54)

“Roja çûyna zozana, sibê-şebeqê teva karê xwe dikir. Xorta, qîz û bûka kincê xwe teze xwe kiribûn. Reng rengî xwe xemilandibûn. Ew ê ku dewletî bûn qîz û bûkê wan xizem kerefil dikirne pozê xwe, şirikê qerefilê wan dihatin, ser piştê wan e xemilandî da diketin. Hineka jî kimberêd zîv zêr kildayî didane pişta xwe... Rojêd ussa ezîze rind dibûn her salê du cara. Carekê, wextê pêz teze diçe zozana, carekê jî paizê- derengî, wextê koçer ji zozana vedigerin, têne malê xwe.” (r. 56-57) “Qîre- qir, zare- zareke ussa ketibû nava şeher, dê ewladê xwe davît.” (r.128).

Nivîskarên sosyalîst-realîst gava ku berhemên xwe diafirînin, gelên xwe yên bindest jî difikirin û bi wî awayî, bi zimanê wan dinivîsin. Bûyeran li gorî berjewendiya civakên proleter û girêdayî rastiyê didin. Yanê divê nivîskarên galparêz hewl bidin ku ji aliyê girseyên mezin ve bînin fêmkirin; şeweyên vegotina gelan bi kar bînin û wan şeweyan dewlemendtir bikin. Divê gelê xwe hişyar bikin, girêdayî kevneşopîya xwe bibin û wê kevneşopiyê pêş ve bibin.¹³⁷ Bi vê armancê Erebe Şemo jî pişta xwe daye gelên bindest, karker û gundiyan, jiyana wan a rojane wek mijar hîlbijartiyê û nivîsiye.

Di vê romanê de buyerên dîrokî ji nav rupelên tarîxê derdikeve û ji bo honandina çîrokê an jî otobiyografîyê dibe paşxanayekê. Herçiqas bi awayekî xort nebe jî, dîroka sosyalîzmê, şoreşa Cotmehê, hilweşana Çarîtiyê di nav hevokên romanê de xwe nîşan

¹³⁷ Bertolt Brecht, **Sosyalist Gerçekçilik ve Toplum**, Ahmet Cemal, Kayahan Güven (wer.), Altın Kitaplar, İstanbul 1980, r. 91- 94.

didin. Eger em behsa jiyana aboriyê bikin, piraniya kurdan bi gavantî û şivantiyê debara xwe dibînin. Hin ji wan jî li ser axa dewlemandan cotkarî dikin û jinên wan jî li mala axa û began karê malê dikin. Li aliyekî din ve jî pirtûk piştî şoreşê diqede. Yanê hêja sîstema nû ya aboriyê nerûniştiye; lewra wekî mekan kolxoz û sovxoz qet derbas nabin.

3.1.2. Berbang

Erebê Şemo di 1937an de li Lenîngradê (Petrograda ewil) tê desteserkirin û sirgûnê Sîbîryayê dibe. Di vê navbera dirêj de tu berhemên wî dernakeve pêş lê piştî mirina Stalîn vedigere tê Yêrêvanê nav miletê xwe û dest bi xebatên xwe dike. Di dewra Stalîn de bi polîtîkayên hişk re rûbirû dimîne û gava ku 1956an de ji sirgûniyê azad dibe, dîsa bi heman îştîyaq û hewesê behsa polîtîkayên parêzvanê xwe dike. Ev yek pirseke mezin bi xwendevanan re çêdike. Lewra Stalîn êdî tune û polîtîkayên wî jî bi awayekî tedricî nerm dibe. Lê dîsa jî Erebe Şemo bi heman meyl û baldariyê berdewam dike û berhemên xwe yê esil û afirîner piştî vê sirgûnê dinivîse. Li gorî nivîs û hevpeyvînên wî Erebe Şemo komûnîsteke bawermend e, realîst û sosyalîst e.¹³⁸ Remezan Alan jî vê yekê tîne zimên û dibêje ku E. Şemo sirgûniya xwe ya 19 salan wekî kiryareke şexsî dibîne û piştî mirina Stalîn ji xwe ew sedem ji holê radibe; lewra ev navbereke bêdil e.¹³⁹ Ji ber vê bawermendiya berhemên wî yê serdema duyem ji aliyê îdeolojiya partiyê ve êdî hişk in.

Erebê Şemo piştî sirgûnê, di 1958an de romana xwe ya *Berbangê*¹⁴⁰ dinivîse û li Yêrêvanê diweşîne. Ev berhem paşê di 1969an de, di nava guldesteyêke bi navê *Berevok* de bi *Jiyana Bextewar* û *Hopo* re, ji aliyê Neşîreta Hayastan ve bi tîpên kirilî çap dibe. Gava ku em *Şivanê Kurmanca* û *Berbangê* didin ber hev, dibînin ku ev berhema duyemîn bi awayekî zelal versiyoneke berfirehkirî ya *Şivanê Kurmanca* ye. Christine Allison jî ji bo *Berbangê* dibêje ku "...ne pirtûkeke cuda ,lê venivîseke Şivanê Kurmancayê."¹⁴¹ Bi sernav û naverokê ve ev yek xwe nîşan dide. Lê em nikarin bêjin ku

¹³⁸ Erebe Şemo, **Hopo**, weş. Lîs, İstanbul 2007, r. 7.

¹³⁹ Ji bo şîroveyeke berfirehtir derheqê vê sirgûna Erebe Şemo û encamên wî de bnr. Remezan Alan, **Bendname Li Ser Ruhê Edebiyatekê**, weş. Avesta, İstanbul 2009, r.198-200.^[1]^[2]

¹⁴⁰ Erebe Şemo, **Berbang**, Rêber Dilşêr (Trans.), weş. Kurdistan, Stockholm 1988.

¹⁴¹ Christine Allison, **hg**, r. 145.

yekbiyek wekî hev in. Ji ber ku di *Berbangê* de îdolojiya E. Şemo êdî xurt xwe eşkere dike û bi beşa “Partiyêda (Firqêda)” re behsa hûrgiliyên xebatên xwe yên partiyê jî dike. Di beşên dawiyê de zêdetir behsa ‘şerê hember burjuvazî’ tê kirin. Ev jî motîvasyona wî ya salane dide ber çavan ku ji bawermendiya xwe tiştêkî winda nekiriye.

Di vê romanê de tiştêkî balkêş jî ew e ku Erebe Şemo çend ciyan de xwe ji bîr ve bike û bi xwendevanan re diaxive. Ev yek wek teknîkî qelsbûna romanê dide der:

“Lê tu were binihêre, xwendevanêd mine ezîz, ew gilgotin tev derew bûn...”(r. 37).

“Ev besta Kaspiyê, çawa min wera şirove kir, nizam çend sed kîlomêtrê dikişand.” (r. 105).

“Li wê derê rûniştibûn gelê hevalêd me û Mîxayîl, ê ku çawa weva eyane, teze gihîştibû me.” (r.107).

“Çawa weva idî eyane, xwendevanêd mine ezîz, pîr Abas merikî zef tima bû.”(r. 130).

Em ji teknîka pirtûkan zêdetir bala xwe didin naveroka wan a sosyalîst- realîst lê divê ev jî bihatana diyarkirin; lewra ev romana otobiyografîk bi van nûansan jî xwe eşkere dike ku bi destê nivîskêr, jiyana wî hatiye vegotin.

Di *Berbangê* de, ji beşa ewil “Kulfetê me, zarotiya min” heta beşa şeşan “Hukum” serborî û jiyana Erebe wekî *Şivanê Kurmanca* hatiye nivîsîn. Beşa heftan de em rastî lêzedekirinekê tên ku ew jî bi navê “Nama ji Amêrikayê” hatiye nivîsîn. Di vê beşê de, Erebe pêşî behsa xwe û gundê meleganan dike ka li wir çawa bûye xulamê Vasîliy Gûrev û cara ewil navê welatê Amerikayê bihîstiye. Îvan Gûrevê birayê Vasîliy bi birayê xwe re dişewire û dixwaze ku biçê Amerikayê. Li gor gotinan Amerîka mînanî bihuştê ye, li wî welatî meriv dikare zêran hema li kûçeyan berhev bike û nava salekê de dikare bibe dewlemend. (r. 36-38) Birayê wî jî îzna wî dide û Îvan her tiştê xwe difiroşe û bi jin zarê xwe re derdikeve diçe. Piştî salan ji Îvan nameyekê tê û tê de behsa jiyana dijwar a Amerikayê tê vegotin. Nameya Îvan di sala 1920an de tê digehe ber destê birayê wî. Bi gotineke din êdî sê sal in ku li welatê ûrisan şoreşa mezin pêk hatiye. E. Şemo di vê beşê de bi devê Îvan behsa nebaşbûna Amerikayê û pergala wan dike. Miletê wan qet ne baş in

û ji belengazan hez nakin. “Vira welatekî zefî bêrehme û bêînsafe. Meriyê vira ne mînanî meriyê mene, wekî kesîbek, yanê belengazek bê ber derî, her kes qedagerîna mala xwe kerî nan bide te; li vira wekî merî li kûça, ber derî birçîna bimre, kesek parî nan nadine destê wî merî, wekî ew merî nemire.” (r. 41).

Beşa heftan ya “Nava Kurmanca da. Biharê li dolgê.” ya *Şivanê Kurmanca* di *Berbangê* de diguhere dibe “Nava Kurda, Biharê li Dolgê”. Erebb heta niha di nava meleganan de xebitiye û çanda wan a rênçberiyê baş dizane; lê gava ku bi malbata xwe re diçe nava kurmanca, li Axdaşiyê (gundekî Qersê) li wir cara ewil qeyd û qanûnên kurdan ya rênçberiyê û beranberdanê dibîne. “Nav kurmanca qeyde û qanûn lape başqe bûn. Rênçberiya nava kurmancada jî ji rênçberiya melegana hêsatir bû û firqîtir bû.” (r. 45) Di vê beşê de vegêr (Ereb) behsa çand û edeta kurdan jî dike ka çawa keç û xortên kurdan li biharan derdikevin zozanan, pincar berhev dikin; ciwanên dilketî çawa hev dibînin û soz didin hev; çawa diçin bindarûkan, govendan digirin, stranan dibêjin û dilîzin. Li vir tişteki balkêş heye ku Erebb behsa çand û edeta ecem û tirkan jî dike û dibêje ku kurd wisa girtî û îzole nîn in: “Havîne rojêd usa ezîz gele cara dibûn û cahilêd kurmanca zef kêf dikirin, çimku qîzê me kurmanca serçava nagirin, çarşeva xwe nakin, mînanî ecema û tirka.” (r. 46).

E. Şemo di vê pirtûkê de jî, gelek caran bi gotina “bi qeydê eşîra” dest pê dike û derheqê çand û folklorê kurdan de agahiyan dide.

“Bi qeydê eşîra, wextê kurd tene dolga û wextê serê pêz dikeve, her yek zadê pêz çêdike; goştî, kade, kiloç, mirtoxe, gazî xelqê dikin û nan didin. Mêvan nan dixwin , dibên:

- Mala we timê tijîbe, pez, dewarê we zêdebin, kevanî, destê te jî eyarê rûn dernekeve û gelek gilî-gotin dibêjin, diçin. Wê rojê gele xwarin didine şivana...” (r.46)

Derheqê beranberdanê de: “Şayêd usa diqewimîn salê sê cara: carekê wextê diçûne dolga, carekê wextê diçûne zozana û cara din jî wextê ‘dagerê’. Idî ji zozana dadigeriyan, dihatine mal: ‘beranberdanê’.” (r. 47-48).

“Rastî jî, wê rojê beran teve biskkirîbûn, cûre-cûre biskêd sor, kesk, qîçîk, gewr û êd mayîn ser berana dihatin-diçûn. Biskêd rengkirî, zengilêd rind û darikê ‘teayê’ kawîkê rind didan berana...” (r.54).

Di şahiya beranberdanê de “ Qîzêd cahil temeziyê xwe vedikirin, li stuyê berana girêdidan, xort dihatin ew temezî vedikirin dibirin. Lê ê ku temeziyê vedikin dibin, xwe kifş dikin, wekî wê qîzê wê bistînin. Dê û bavê qîza dûrva, bin çavava pak texmîn dikin, çika kîjan xortî temeziya qîza wan vekir bir, çika xortî hêjaye, çika dewletiyê, wekî qelenekî rind bistînin.” (r. 54). Behsa vê çandê dike û li ser de jî agahiyên zêdetir dide: “Temezîvekirin jî wa dibe: Xort û qîzik hevdu berhîngê dibînin, qewl-qirar didine hevdu, wekî wê hevdu bistînin, lema jî xort wê rojê temeziyê vedike, dibe: hinek xort jî hene, ê ku soz dane hevdu, wekî xûşkê xwe wê hevra têne berdêlî. Ew jî tèn temeziya vedikin dibin.” (r. 54).

Edeteke din jî çanda ‘kose-geldî’ ye. Kosegeldî, listikeke rîtûelî ya Kurdan e ku di navbera 20- 30yê Gulanê de tê pîroz kirin.^[1]Ereb bi vî awayî behsa vê rîtûelê dike:

“Wî çaxî ‘kose-geldî’ dixemilînin û nava mala digerînin, ew jî wa çêdikin:

Xortekî tînin, ji biska berana jêra rû û simêla çêdikin, paçeke spî tînin didine dora kolosê wî, dibe mînanî pîra- mella, ebake gewr tînin lê dikin, her kê olecax bû, eba tunebû, tereke ga didirûn, mînanî ebê davêne ser milê wî. Paşê xortekî jî tînin, dixemilînin mînanî jina, ew jî dibe jina ‘Kose’ û nava mala digerînin, rûn, penêr û pera berev dikin.” (r. 55).

Li hember van kêfxweşîyan, Erebe behsa edetên nexweş jî her carî tîne zimên û wan rexne dike û bi rêya lehengên xwe acizîya xwe nîşan dide. Meseleya qelenê yek ji wan e; lewra herçiqas ev rewş di civakê de cih girtibe jî, bi taybetî civan ji vê yekê aciz in:

“Lao, qelen şerîetêda maye, hetta pêxembera jî qelen da ye, çewa ez bê qelen bidme mêr? Karê digot:

- Na bavo, qelen dê û bavan derxistîye bona kara xwe, me notila pêz xwera difroşin.” (r. 68)

Erebê Şemo di romanên xwe de gelek caran cih dide xwarin vexwarina kurdan û çanda wan jî nîşanî xwendekaran dide; û herwiha belengaziya gundiyan jî bi vê rewşê re şîrove dike:

“Ewlê biharê me pincara xwarina xwe tenê berev dikir; lê wextê çayir gur bûn, hêşnayî êpêce bor bû, dîya me dîsa mera çend roja hate çolê û em hînî pincarne mayîn kirin, yê ku têne kelandinê dikne nav xwarinê. Ew pincar spîka, gulik, mendik û yê dinê bûn. Ew pincar me li çolê diçinî, dikire torbê xwe û danî mal. Dîya me jî tev temîz dikir, dikire gewlaz, hişk dikir, hildida bona zivistanê. Her yêkê me zarêd çolê gerekê para xwe banîya.” (r. 10)

Gava ku Erebe şivantî dike carinan rastî bûyerên nexweş jî tê û bi edetê mezinan jî wan rewşan xwe xilas dike. Zarokatiya xwe de gava ku diçe ber pezan, rojekê gur diavêjin ser keriyê pezan û Erebe nizane çi bike. Gur bizinekê bi sê ciyan birîndar dikin û ew jî bizina birîndar ser jê dike û dil û hinavê wê dide seyê xwe, lewra ew edeta şivantiyê ye. “Ez vegeyriyam ser cendekê bizinê. Min bihîstibû, gerekê dil-hinavê peza gura xwarî bidana sa, min usa jî kir. Bi kêra xwe zikê bizinê qelaşt û tev derxist, avête ber Qavreş.” (r. 18-19).

Erebê Şemo di romanên xwe de gelek caran stran û kilamên kurdan jî bi kar tîne, bi taybetî jî di nava beşeke serbixwe de behsa çîroka Siyabendê Silivî û Xeca Zer dike. Gava ku eşîra wan jî gundê Burnubilaxê derbas dibin û nêzikî çiyayê Sîpanê Xelatê dibin, Erebe dibêje ku “Derheqa wî çiyayê Sîpanê-Xelatê kurda kilameke rind digotin û şiro dikirin.” (r. 74).

Di beşa ‘Mijuliyêd me’ de behsa şivantiya xwe dike ka çawa berxvan û şivan bi hev re dilîzin, govend digirin û stranan dibêjin. Bi vî awayî çend stranên gelêrî jî di nav rûpelên romana xwe de parve dike:

“Carna jî me govend digirt, xwera dilîst. Yekî dest pê dikir distira, ê din jî lê vedigerand:

Deb lo, lo, lo, lo şivano,
Deb lo, lo, lo, lo, lo şivano,
Tilîzêro lo bilûrvano,
Tilîzêro lo bilûrvano.
Dayê, şivan pêz naçêrîne,

Bavo, şivan pêz naçêrîne.

....” (r. 49)

Nivîskarê romanê bi rêya serpêhatiyên xwe îstîsmar û kedxwarina dewlemendan dide ber çavan û li hember çewisandina belengazan disekine. Ji bo wî mirov du beş in: kesên dewlemend (axa û beg û yên din...) û kesên feqîr û belengaz. Ji ber vê ye ku gava behsa yekê xirab bike, ev kes miheqeq yekê dewlemend e. Çi kurd be, çi tirk yan jî ermenî be; çi axa û beg be, yan jî şêx û mela û keşîş be. Tu ferqa wan ji bo Erebb tune, dewlemendbûna wan ji bo wî mesele ye. Li hember vê rewşê kesên feqîr û belengaz jî her daîm ji bo wî baş in, ji mirovahiyê dizanin û hwd... Bûyeran yan jî kesan bi çaveke neteweyî ne lê bi awayekî çînî dinirxîne û nîşan dide û her tim danberhevekê çêdike di navbera kesîb(feqîr) û dewletiyên de:

“Konê dewletiya konê mezin bûn, bi çîtperde bûn, konê wanda hebû ciyê mêvana, kulîn û ciyê navmalê. Hineke dewletî, xênji wan konêd wane mezin, hebûn çadirêd wan. Li hineke kesîb konêd wane biçûke kevn hebûn, hinek jî qe konê wan tunebûn, xwera holik çêdikirin, holikada diman heta dagerê.” (r.48).

“Halê me rênçbera mînanî halê gavanê melegana bû. Vira, serê çiyaya, kurmancêd me: beg, axa, şêx û kûlaka dîsa em didane xebatê û (êstêsmar) dikirin. Eme dîsa wî halê belengaziyêda bûn.” (r. 49). Bi van gotinan bi awayekî eşkere dide zanîn ku di bin zilm û tehdeya dewlemendan de mane û keda wan hatiye xwarin û ew hatine îstîsmarkirin.

Dîsa taybetiyeke din a realîzma sosyalîst jî di nav romanên Erebbê Şemo de xwe raberî me dike. Kesên ji çîna bindest herçiqas gundî bin, yan jî belengaz, kesîb bin, dîsa jî bi awayekî xweşik û erênî tên şayesandin:

“Kelhan merîkî kesîb û êtîm bû. Kesekî wî tunebû... Kelhan emirva jî me teva mestir bû, lê me tevara çûktî dikir, komek dida me teva... Bejneke zirave kawe li Kelhan bû. Berê simêla teze xwîdabûn. Çavne reşe gire lê bûn, buru-bijangê wî sixe reşe dirêj bûn, te digot bi kilê Sibhanê kildane. Enîke fire mêranî lê bû, pozê wî qalînî ne dirêj bû. Wextê Kelhan devê xwe vedikir, diranê wî mînanî sedefa dibiriqîn, te digot ew diran meqesa birrîne, weke hev kirine.” (r. 51)

“Gerekê ez bêjim, meriyê mînanî Siloyê Horê kêmbûn nav meda. Mêrîkî xerîbdost bû, dilovan bû, gelê kurmancêd mînanî me belengaz Silo xwey dikir, bi nan, av dikir.” (r.44) Li hember vî jî gava ku behsa dewlemendan dibe gotin her tûj dibe: “Ewana berêda hînî xûname bûne, dixwin, çika kengê wê wanra bê.” (r. 59) “Dîsa mînanî berê neçelnîk¹⁴² mînanî ‘ezrahîlê ruhîstîn’ qezêda mezinatî dikir. Oronîk dîsa usa meriyê belengaz dikutan, ruşwet dixwarin...” (r. 88)

Di vê romanê de, pesna Lenîn û komûnîzmê, pesna partî û îdeolojiya wî bi awayekî berbiçav xwe nîşan dide. Lenîn ji bo wî û ji bo kesîb û hêjaran ‘rizgarker’ e; dîwana ku ew aniye ji bo çîna bîndest hêviyeke mezin e. Heta gelek tiştan jî bi navê wî gazî dikin û bi nav dikin. Navê bajarê Petrogradê tê guhertin dibe Lenîngrad û hwd... Kurd jî wekî din gelek tiştan bi navê wî nas dikin: “Li malê vêdikeve êlektrîk -lempa Îlyîç- lempa Lenîn. (r. 45)

Dîsa behsa xwe û Bolşevîkan dike û tîne zimên ku ew jî çawa bi wan re xwendîye, hînî sîstema wan bûye û li Sarîqamişê dest bi xebata bolşevîkî kiriye. Li wê derê çend karkerên ûris wekî Klîmov, Mîxaylov, Popov û Alêksandir Kopnêv nas kiriye. Bi rêya wan ketiye nava van xebatan: “Ew heval gişk uzvê partiya sosyaldemokratê palê Ûrisetê (bolşevîka) bûn. Wana bere bere ez nêzikî xwe kirim, kitêbêd rêvolyûsiyon didane min, min dixwend. Wan kitêba çavê min vekirin, çawa mêrîkî jî cîkî tarî derxin ronkayê.” (r.81).

“Wan kitêbada ez pê hesiyam seva çi eva şerê Ûris û Romê dibe, çawa selmiyandar-kapîtalîst, bûrjûwaziya karê dibîne. Çawa meriyê belengaze- kesîbe mînanî me didine xebatê sibê-şebeqê heta êvarê û xwera karê distînin.” (r. 82). Ereba van tiştan dixwîne û dibîne ka axa, beg û dewlemendan çawa wan didin xebatê, wan dikutin û ji xwe re kêf dikin. Dîsa rojekê pirtûka Lenîn ya “Razvitiyê Kapîtalîzma v Rossîi” (r.82) dixwîne û ew pirtûk li wî zehf xweş tê û dibîne ku bûyerên ku tê de derbas dibin wekî serboriyên wî ne. “Bi komekiya wan bolşevîka, bi komekiya wan palê ûris, ez herro diçûme civata wan, idî êpêce çavê min vebûn û min xebateke dil û eşq dibir nava pala, şer dikir ber bûrjûwa.” (r. 83) “Bi vî teherî xebata firqê li min xweş hat, ez ketime partiya bolşevîka.” (r.83).

¹⁴² qeymeqam

Di vê romanê de lehengê sereke yê şoreşger dîsa Erebi bi xwe ye; lewra ev pirtûk jî wekî otobîyografîyêkê hatiye nivîsîn û lehengên din wekî sîlûetan di nav rûpelên romanê de diherikin û diçin. Lehengê pirtûkê (yanê Erebi) ji bo partiyê bi dil û can dixebite. Mîfînga yekê Gulanê de axaftineke şoreşger dike û pesna partiyê û xebatên wê dide. Di serî de nahêlin ku ew derkeve ser dîkê û bi axive lê ew bersiva wan bi vî awayî dide: “ Ez bolşevîkim, min jî dixwast xeberda.” (r.87). Ji ber vê axaftinê êdî li cem hikûmetê tê nasîn û tê girtin. Piştî çar mehan tê berdan, gava ku diçe gundê xwe dibîne ku gundî nizanin ku şoreş pêk hatiye û ‘padşa’ ji text hatiye avêtin. Ew bi gundiyan re dicive û ji wan re behsa ‘rêvolyûsyayê’ dike, dide zanîn ku êdî dem dema partiyê ye û kesîb û belengaz û bindestan e. Dixwaze wan qaneh bike ku Bolşevîkan li Petrogradê doza partiyê dikin; Lenîn hatiye û xwedî li dozê derdikeve, wê erd bidin gundiyan, zavod¹⁴³ û fabrîqeyan bidin karkeran:

- Erebi, tu dibêjî, wekî erd ê meye.
- Erê, min gotê.
- Ê tu dibêjî wî erdê gerekê em ji milkedara bistînin.
- Erê, em gerekê ji wan bistînin.
- Lê ka dîwan dide me?
- Emê dîwana xwe bibijêrin, dîwanê ji meve.” (r.90).

Bi vî awayî yek bi yek ji wan re zelal dike. Qet natirse û hemû karên xwe bi hewesekê pêk tîne. Gava ku gundî cara ewil ji devê Strajnik peyva ‘huriyat’ê seh dikin nizanin bê ka çî ye, ji hev dipirsin dibêjin qey xerçekî nû ye. Diçin li cem Qubatê Emo û ji wî dipirsin ka ‘huriyat’ çî ye. Qubat bersiva wan dide û pê re jî pesna Erebi dide ku ew ji zû ve behsa van tiştan dike: “Huriyat, dêmek azabûn, azalixiye. Ne eva çend care Erebiê kurê şêx Şemo, kurê golikvanê gundê me, wera dibêje, lê hinek ji me bawer nakin...”(r. 92). “Cindiyê Êso û Morofê Emo jî gotin, wekî ew giliyê Erebi mera anîne, ew gilî her bavê meriv kare wê xêrxwaziye mêrivra bixwaze. Me hînî talîmê dike, sîliha agirkirinê dike, mera dibê azaye û erdê milkedara jî ê me ye.” (r. 92).

¹⁴³ kargeh

Piştî dîwana miweqetî ya Kêrênskî şerê ‘bajarvaniyê’ dest pê dike. Ereb jî di vê şerê de cih digire û di beşên dawî de behsa vî şerî dike. Leşkerên ‘givardiya spî’ (leşkerê burjuvaziyê) zora wan dibin. Ereb li wê nexweş dikeve û wî dibin bajarê Vladîkavkazê. Di nexweşxaneyê de dîsa leşkerên qazax jê nasekinin ‘u Ereb ji wir bi halekî nexweş derdikeve diçe. Li bajarê Qizlerê seh dike ku partîzan xwe nêzîkî bajêr veşartine bi wî halî derdikeve diçe li cem wan. “ Ew du meh bûn, ezî idî partîzan bûm, kîderê qumandarê me partîzana ez bişandame, min dil û şad diqedand.... A bi vî teherî ez bûme partîzan, a bi vî teherî min idî dilê xweda qiriar kiribû, wekî serîke ev oxire, ez gerekî şerkim: wekî azabin pale û gundiye kesîb.” (r. 105). Bi van hestan, herçiqas rojên çetîn bibînin jî baweriya xwe ji partiyê nabirin û dizanin ku wê dijminên xwe ‘alt bikin’. Di rêya partiyê de çiqas peywirên giran bigire li ser milê xwe jî, bi awayekî bawermend û şoreşger wan tîne cih û dikare serê xwe jî ji bo wê bide. Di nava partîzanan de rojekê fermandarê wan Lopatîn gazî Ereb dike û nameyekê teslîmî wî dike û dibêje ku divê vê nameyê bibe Astraxanê û bide Kîrovî. Piştî gelek serpêhatiyan diçe li cem leşkerên partiyê. Bi zorî dixwazin ku nameyê jê bistînin lê Erebê şoreşger bi vî awayî bersiva wan dide: “Qumandarê min gotiye min, wekî ez namê bidime destê hevalê Kîrov, tu serê min jî jêkî, ez name nadime te.” (r. 112).

Di vê romanê de jî xeynî çend rexneyan, mijara dînê nakeve rojeva Ereb. Ev rexne jî tenê xapandina şêx û melayan e û zilm û tehdeya keşîşên ermenî ne. Lê dîsa jî dîn wekî mijareke sereke nakeve nava rûpelên romanê. Tevî ku Ereb bi xwe kurdekî êzîdî ye, em zêde rastî nîşaneyên êzdîtî nayên, referansên dînî gelekî qels mane. Ev yek dibe ku ji ber hesaba wî ya berfireh be. Lewra li wir ne tenê kurdên êzîdî, lê belê kurdên misilman jî hene û ji ber wê jî Erebê Şemo xwe bi zanebûn ji nîqaşên dînî dûr xistiye.¹⁴⁴

Wekî dubarekirina *Şivanê Kurmanca*, Erebê Şemo vê pirtûkê de jî piştî xwe daye gelên bindest, karker û gundiyan, jiyana wan a rojane wek mijar hîlbijartiyê û nivîsiyê. Ew xwe ji kesên belengaz dûr nexistiye û hêja jî mekanên wî gund in, eniya şêr in û herwiha kûçeyên bajêr in. Rastiyên dîrokî jî bûye paşxaneyekê ji bo bûyer û qewimandinan û Ereb jî girêdayî wan maye.

¹⁴⁴Christine Allison, *hg*, r. 145

3.1.3. Jiyana Bextewar

Romana sêyem a Erebe Şemo *Jiyana Bextewar*¹⁴⁵ cara ewil di sala 1959an de li Yêrêvanê çap dibe. Ev berhem jî paşê di 1969an de, di nava guldesteyeke bi navê *Berevok* de bi *Berbang* û *Hopo* re, ji aliyê Neşireta Hayastan ve bi tîpên kirîlî çap dibe. Dû re ji aliyê Roja Nû ve di 1990an de careke din tê weşandin.

Di ‘Pêşxeber’ a vê romanê de xaleke balkêş heye ku, Erebe Şemo diyar dike bê ka vê berhemê çawa nivîsiye. Li gorî vê pêşgotinê ev ceribandineke ewil e ji bo romannivîsînê.¹⁴⁶ Çar sal ji bo nivîsandina vê romanê xebitiye û dîsa bi xwe eşkere dike ku “ Di vê nivîsara xwe de ez xebitîm ku bidim kifşê qebîleke Kurmancan, çawa çawa di bin bandora padşayan, began û axalera de li welatê Romê dijî. Çawa belengazî û zelûliyê li wê derê dibîne û çawa ew xwe li welatê Êris digire, direve tê.” (r. 7).

Piştî sirgûnê ev berhema duyemîn e ku li ser şopa *Şivanê Kurmanca* diçe. Rasterast em nikarin bibêjin ka ev jî wekî her du romanên berê otobiyografiya Erebe Şemo ye, ji ber ku ew bi xwe jî diyar kiriye. Lê dîsa jî li hin deran bi awayekî teknîkî dikeve hin nakokiyên û xwe dide dest ku Misto -yek ji lehengên romanê- Erebe Şemo bi xwe ye. “Xortekî ji kurdan, navê wî Misto bû. Wî pak bi zimanê Êris û Ermenîyan zanîbû û bûbû uzvê Partîya Bolşevîkan û çî qirarîen partiyê hebû bi destê wî Mistoyî teşkîlata Bolşevîkan bi dizîka ve derbas dikir li nava Kurdan, Ermenîyan û paleyêd mayîn...” (r. 102)

“Misto jî gilî dikir li nav Kurdan, Ermenîyan û Tirkan, wekî padşa ji ser text avêtine.” (r.106).

Nivîskar gava ku behsa Misto dike li derekê xwe dide dest ku ew Erebe bi xwe ye: “ Wexta ez dûr ketim, ew vegeriya kir gazî, got...” (r. 109).

“Lê Misto kaxêz gişk kuta kiribûn, ew êdî ber bi jor de hildikişîya ber bi çadirê xwe ve diçû. Bi vî teherî Partîya Bolşevîkan îdêya Marx û Lenîn li nav esker û xebatçiyên belav dikir.” (r. 112).

Bi van nîşaneyan ve gelek caran serboriyên Erebe û Misto li hev tînin û ev yek jî bala xwendevanan dikişîne. Misto jî wekî Erebe di nav leşkerên Qazax de navbeynkariyê dike, ji ber ku çend zimanan dizane. Bi Bolşevîkan re kar dike û ‘kaxez’ên partiyê di

¹⁴⁵Ereb Şemo, **Jiyana Bextewar**, weş. Lîs, Diyarbakır, 2015.

¹⁴⁶Ereb Şemo, **hb**, r. 7.

nava gundiyan, rênçberan û karkeran de belav dike. Di mîtfînga yekê Gulanê de li ser xebatên partiyê diaxive û pesna Bolşevîkan dide û ji ber wê jî tê girtin.

Dîsa bi awayekî teknîkî kêmasiyêke xwe nîşan dide ku vegêr bi xwendevanan re diaxive: “Xwendevanêd delal, ew Xezala ku wextekê çûbû bindarûkê, êdî mezin bûbû.” (r. 28).

“Gerek e em çend gilîyan bibêjin der heqa Mîrza Beg, wekî xwendevanên ezîz zanibin kî ye ev beg?” (r.53).

“Gerek ê em bibêjine xwendevanên xwe, Emerîk mervekî kesîb bû...” (r. 76).

“Xwendevanêd delal, bi rastî jî Xwedêda hêjayî wan pesinan bû.” (r. 83).

Roman li gundê Entabê dest pê dike. Entab gundekî kurdan e, di nava çar çiyayan de bi cih bûye û nêzikî Agiriyê ye. Li wê derê ji êla Sipkan nêzikî panzdeh- bîst gundên wan hene û ew êl jî girêdayî eşîra Ziliyan e. Nivîskar bi rêya Emerîkê ji Entabê behsa rewşa kurdên wê derê dike ka bi çi awayî di bin zilmê Dîwana Romê (Împaratoriya Osmaniyan) de dimînin. Di beşa “Milazimê Padşê” de axayekî kurd, qeymaqam û milazimekî tirk diçin mala Emerîkê û dixwazin ku ji gundiyan bertîl berhev bikin. Silêman Beg hatina milazimî xeber dide wan ku ew ji bo bertîl û xercan hatiye: “Hûn gerekê zanibin, milazim efendî ji Sitenbolê hatiye, ji cem padşayê me. Niha dewleta Romê şer dike. Jê re lazim e zexîre; nan û goşt. Em gerekê bidine dewleta xwe, ji eşîra min wê bidin pêncî hezar pez û deh hezar bar genim.” (r.30). Gundî tev xwestekên milazim û Silêman Beg tînin cih lê dizanin ku bi dawî nabe ev rewş. Emerîk tîne bîra xwe ku gava Êrisan welatê wan zefî dikan, şîr ji malan dibirin lê perê xwe didan; lê wexta ew dikêşin diçin, leşker û zabitên Romê tînin bi zorî dikevin mala wan û talan dikan.

Di beşa “Rev”ê de giregirên êla Sipkan dicivin, li hev dişewirin û biryar didin ku birevin, biçin li welatê Êrisetê. Kîrakosê ermenî di vê rewîtiyê de dê rênîşanderî bike ji bo wan. Şevêkê hemû mal bar dikan û dikevin rêyan. Di rê de gelek tişt diqewimin lê dîsa jî bi silamet diçin digehin Qaqizmanê, welatê Êrisetê. Li wir qumandanê Êris dizane ku hêsîrên Kurdan in û ji ber zilma Dîwana Romê direvin, li wan xwedî derdikeve, nan û xwarin belav dike. Ew qumandan têlekê dişîne Petersbûrgê, gava ku bersiv tê êla Sipkan dibin li nehîyeya Nexcîvanê, di şanzdeh gundan de bi cih dikan. Bi vî awayî bûyerên

romanê hem li welatê Romê û hem li Êrisêtê derbas dibe. Em jî bi van her du mekanên sereke dikarin guherînên di nav romanê de şîrove bikin.

Di vê romanê de tirk û welatê Romê û padişahê wan, ecem û dewleta wan hertim bi awayekî neyînî tên nîşandan. Ew zilmkar in, her gav bertîl û rişwetan berhev dikin. Li hember vê jî Êris birehm in, qenc in û aliyê kesîban dikin:

“Xwedê textê Sultan Hemîd wergerîne, wekî wî koka Kurdên belengaz anî, em talankirin. Mexlûqatê Êris pak e û birehm e, Xwedê neke em dîsa têkevin destê qaymeqaymê Romê, zabitêd wan û milazimêd wan. Ew zilmkar in.” (r. 98)

“Bila şûrê Êris bira be, bila wîda bibe sultanê Romê yê zilmkar.” (r.98)

“Casûsê Romê bi destê ruhanîya dîndijminî dikirin orta Kurmancan, digotin: ‘Ev Êzdî ne, ev Misilman in.’ Ê berî hev didan. Daşnakan jî digot:

-Em gerek ê Kurdan qir bikin, welatê xwe temîz bikin, paşê şer bikin bi Romê re, welatê xwe ji destê Romê aza bikin. Ev gilîyên ku mîletî û dîndijminî wan dikirin nava mexlûqet, mexlûqet berî hev didan, mexlûqet koka hev dianî...” (r.137).

Gelek caran jî bi casûsên xwe mîletan dixin nav hev û dibin sedema qirkirina wan. Lê li Sovyetê mîlet hev du hez dikin, cudatî navbera wan de tune:

“A bi vî teherî padşayê Romêbi destên casûsên xwe bi destê bêbext û xayînên mîna Teyo Beg, eşîr û êlên Kurmancan berî hev didan.” (r.154)

“...gilîyê mîletçîtîyê wisa kûr di ferasetê wan de rûniştibû, wekî Kurdan, Ermenîyan, an jî Eceman gelek caran cîyê belasebeb hevdu qir dikirin.” (r.140).

“Di mala kurê Ereba de rûniştibûn merivîne dereke, kesî nizanibû ew kî ne, ji kî derê ne? ...Axirîyê eyan bû, wekî ew meriv casûsên Romê bûn, wan mîletî û dîndijminî dikirin nava mexlûqetên Kurd û Ermenî...” (r. 144)

“Li welatê Sovyetê firqîya nav miletan tune ye. Gişk mîna bira û mîna kurên malekê dixebitin; kesek nabêje ev Kurd e, ev Ermenî ye, ev Ecem e, ev Asorî ev Êzbek, ev Kırğîz, hemûyan dest didan hev du dixebitîn...” (r. 209).

Xaleke din ya balkêş jî ew e ku nivîskar bi rêya lehengan bi me dide zanîn ku Romî û Ecem hertim dubendî û dijminatî dixin nava kurdan û wan bi hev didin kuştin, naxwazin ku kurd bibin yek:

“Wê çaxê padşa û Şah timî eşîrêd Kurdan berî hev didan, dubendî dikirin orta wan, wisa dikirin, wekî ew hev du negirin, digotin: ‘Ev Zaza ne, ev Êzdî ne, ev Şîhî ne, ev Elî-alahî ne, ev Sunî ne... Sîleh didan destê wan eşîrêd Kurdan û berî hev didan. Wan hev du qir dikirin, lê padşa û şahan kêf dikirin.’” (r. 208-209).

Di vê romanê de jî xaleke girîng ya berbiçav jî kedxwarin û îstîsmar e. Gundî yan jî kesîb herçiqas ked bidin ji bo xebatekê, dîsa jî berdêlka xwe nikarin bistînin. Axa û begên ‘zalim’ yan bi hincetekê wan bêpere didin xebatê yan jî bi çend tiştên biçûk wan dixapînin. Lê ewên kesîb nikarin li hember vê yekê derkevin; ji ber ku axa jî ew in, dîwan jî ew in. Nivîskarê romanê ji bo kedxwarin û îstîsmarê ne tenê axa û began lê şêx û mela û keşîşan, dîwanan û dewletan jî wek nimûne bi kar tîne. Ji bo nivîskêr keda karker û xebatçiyar ji aliyê serkarê ve tê xwarin, keda gundiyan ji aliyê axa û began tê xwarin heta keda xelkê ji aliyê dewletê ve tê xwarin.

“Hela tu lê binêre, wekî merîk bimre, nîvê mîrata wî mirî digihîje beg. Wekî yek qîza xwe bide mêr, ji qelendê wê qîzê para Silêman begê tê da heye. Yê qîzê dixwaze, ew jî pêşkêşê dide wî.” (r.26).

“Mîrza Begê Xwêtî begekî zilmkar bû, wî gundên Kurmancan û ê Ermenîyan talan dikir. Wekî beranekî rind, nêrîyekî rind, an çek û sîleheke rind li cem kê bidîta, erhede xulam dişand jê distand.” (r. 53).

“Gava ku ji ber derîyê Resûl Axa bîna nanê petî û qelîyê ket nava gund, çend kesîb, jin û zarên birçî temûl nekirin, hatin ber mala wî. Cîyê qelî diqelandin ji dûr ve sekinîbûn, stûyê xwe xwar kiribûn lê dinêrîn.” (r. 59)

“Hûn beg, axa, dewletî, bêyol in, hûn me dişêlînin, niha jî hûn kêf dikin li ser cinyazên me, li ser miriyên me...” (r.63).

“Tu niheq î ya rebilalemîn, te ev yeka han çêkiriye, wekî hinek bibînin kêfê û sefayê, lê hinek jî birêjin xwêdanê, bikişînin cefayê.” (r.166)

Nivîskarê romanê gelek caran di vê pirtûkê xwe de jî bi gotinên “bi qeydê kurmanca”, “bi qeydê eşîran” dest pê dîke û derheqê çand û folklorê kurdan de agahiyan dide. Van agahiyan carinan bi şeweyeke dîdaktîk dide, carinan jî bi devê lehengên xwe dide zanîn. Di van gotinan de em dikarin her cûreyên hêmanên folklorîk bibînin. Kevneşopiya kurdan, edetên bav û kalan, taybetmendiyên sosyolojîk yên civaka kurdan; dawet û şingirtina wan; edetên wekî beranberdanê, jiyana koçeriyê; jiyana wan a aboriyê; her cureyên edebiyata devkî wekî gotinên pêşîyan, biwêj, sond, dua û nifirên wan, kilamên dengbêjî, stran û helbestan bibînin. Hin nimûneyên folklorîk yên vê romanê jî ev in:

“Pêş malê kanîyeke mezin bû, ava çemekê ji wê kanîyê dikişîya. Kê ku ava wê kanîyê vedixwar, digot: ‘Eva ava, welleh avilheyat e.’ Çîrokê me Kurmanca dibên: Heya avilheyatê, kê vexwe wê avê, idî namire.” (r.11). Di nava kurdan de ev bawerî gelekî berbelav e.

Kurd, çok didin li erdê nan dixwin: “Apê Emerîk, kerem ke tev me nan bixwe. Emerîk bi qeydê dê û bava, qeydê eşîrê, çok da erdê, parî nan hilda û xwarin xwar.” (r. 20)

Gava ku yekî/ê bimire kurd li ser wan bi vî awayî şî digirin: “... wekî merivek dimir, gundî tev top dibûn, şî dikirin, kotel girê didan, digerlandin, mêran û jinan reş girê didan, kilamên şî digotin, dilûbandin.” (r. 58)

Qelenxwestina ji bo keçan jî di nava kurdan de edetê kevnare ye. “Tu jî qelenê qîza xwe bêje, kivş ke, çika em jî bizanbin. Qelenê qîza min sed pêncî mîyê bijare- xas, du ga, hespeke zînkirî, tivingek, sê xelat.” (r. 63). “Qeyde û edetê wê eşîrê wa bû: Kê dewet bikira, wextê bavê bûkê, cab (cewab, bersiv) bida wana wekî îro sîyarê bûkê wê bên. Wî merî ra dibên rûvî. Ew mêrî gerekê usa here, wekî kesek wî nebîne, têkeve mala bavê bûkê, lê wekî “rûvî” ber dêrî bivînin, derva bivînin, avê serda bikin, sebetê dikine sêrî, davêne nava herîyê, yanê cêr dikine piştê meriya didine ser, çawa qerawil (nobedar) dişînin ji kanîyê cêre av bînin. Lema wî mêrî ra dibên rûvî. Ew mêrî gerekê usa derk û

fesal here, wekî kesek wî derva nebîne, lê hema ku rûvî lingê xwe avîte pişt şemikê, idî heqê kesekê tune jê xeberde, cahil û jin top dibin, laqirdîya dikin, pêşkêşa wî didinê da.” (r.67). “Bi qayde û edetê Kurda, şivan yan gavan yan jî maçgir, gakî yanê berxekê dibê pêşîya bûkê, pêşkêşê dixwazin. Serdewet pêşkêşa wan dida. Golikvanê gundê Evdila begê ku dît bûk tînin, ewî golikeke rind bijart, anî ser rîya bûkê.” (r. 71).

Cejna beranberdanê her daîm bûye ciyê kêfxweşiyê û seyranê ji bo kurdan: “Wê rojê gundîyan bi qeydê eşîrên Kurmancan zadê berenberdanê çêkiribûn; kade, mirtoxe, hewle, malêd dewletî pez ser jê kiribûn, ew roj rojeke ezîz tê hesab di nava Kurmancan de.” (r. 78)

Keçên kurdan ji bo xemilandinê gelek caran pozê xwe qul dikin û xizêman bi kar tînin. Ev jî edetê berbelav e di nava jinên kurdan de: “Pozê wê teze qul kiribûn bona qerefîla û xizêma.” (r.81)

“Sinco xortekî êtîm bû, pîredîya wî ew mezin kiribû, dest teng bû, ewî xwişka xwe kiribû berdêlî. Gerekê xwişka xwe bida Heboyê Ûsib, xwişka wî jî xwe ra banîya. Çimku herdu kesîb bûn, malê wan tune bû, wekî qelen bidana, jin xwe ra banîna. Mirina Xudêda daweta wan herdu xorta ew du sal bûn paşda xistibû. Rokê herdu xorta bi qaydê edetê eşîra, berxek hildan, çûne mala Sibhanê, dilê wan kirin, îzin xwestin. Sibhanê îzna wan da wekî ew herin deweta xwe bikin. Herda soz da hevdu, wekî roja îne sîyarê Sinco bên dergistîya wî bivin. Sîyarê Hebo jî bên dergistîya wî bivin. Usa jî kirin. Roja îne mala herdu xorta da ringînîya def û zurnê bû.” (r.84).

Bi vî awayî diçin ji xweyî şîne îzna xwe xwe dixwazin û dilê wan dikirin.

“Mexlûqet wê darê ra digotin ‘dara miraza’. Gilî dikirin, wekî kê qurbanê bîne ber wê darê şerjêke, çî bixwaze mirazê wan wê biqede. Ew dara ji serî heta binî cûre-cûre kincika da xemilî bû. Hebûn pîne sor, sipî, qîçik, kesk û rengêd mayîn. Merîyê ji gundêd dûr, bihara û havîna dihatne ber darê, lê roke meha gulanê hebû, wekî wê rojê ji hemû gunda dihatin ber wê darê, qurban şerjê dikirin û mirazê xwe jê dixwestin.” (150-151).

Ev edeta kevin jî ji bo daxwazan û ji bo hasilbûna mirazan girîng e.

“Heyran ev gilî temam rast in, berêva mesela me Kurda dibê: Ya dest dike, dê û bav nake.” (r. 127) “Ew ku hate mal, wê êvarê kurê wî mir. Lê ew cînarê ji bêbextîya Salih begê zîrar dîtibûn, digotin: Misteheq wî ra usa lazim e, me geleka hêsir barandine ji şer û şiltaqê (bêbextî, îftîra) wî, bira ew jî hêsira bibarîne. Hineka jî digotin;- Neke serê kesê kesa, bira neyê serê pîsê pîsa...” (r.153). Nimûneyên bi vî rengî jî di romanê gelek cih digirin.

Di vê romanê de jî nivîskar gelek caran bi axa û beg û dewlemendan re, şêx û mela û keşîşan jî rexne dike. Li gorî wî ew hertim ji bo berjewendiyên xwe û dewlemendan dîn û baweriyên bi kar tînin û miletê dixapînin.

“Top li mala wan keve, ew me dixapînin, bi xwe jî diziyê dikin.” (r.101)

“Keşîşê zane li Encîla Îsa nêrîye, wekî xezeba merivan wê bi destê sultanê Romê be, lazim e mexlûqet bibe yek, bi Romê re têkine şer.” (r.143).

“Wê van rojan derkeve sincaqî şerîf, em gerek ê koka xaçparêzan bînin, çimku ew kafir dixwezîn koka Îslamê bînin.” (r.144). Bi rêya dîne dixwazîn miletê bişînin şer.

Dîsa bi rêya dîn û baweriyên miletê dixapînin ku neçin mekteban, nexwînin. Li gorî nivîskarê vê romanê şêx û mela ji miletên xwenda ditirsînin. Kesên xwenda bawerîya xwe bi wan nayînin û dizanînin ku ew bi van bewariyan tirs û qurifandîna xelkê destê xwe de digirin.

“Bi rê ve Şehîd digote hevalan:

- Hûn zanin, şêxê me dibêjin xwendin ji me re guneh e?
- Em zanin, çima nizanin, -heval got- lê ew gişk derew e. Di gundê me de Şêx Şemo hebû , golikvanê gundê me bû, kurê wî zimanê Êrisî rind xwendibû, çima ew xwendin ji şêx re ne guneh e, hema ji me re guneh e? Ew gilî derew in.” (r. 207)

Nivîskar di vê romanê de cara ewil evqasî zêde li ser dîn û baweriyên, li ser wekhevîya kurdan disekine. Di beşa “Bindarûk”ê de gava ku Ebdilmecîtê ji êla Sîpkan tê

nava xortên gund, nivîskar bi me dide zanîn ku bavê Ebdilmecît êzdî ye lê ji zû ve bûye misilman. Bi rêya bîranînên Ebdilmecît em dibînin ku di zaroktiya xwe de ji ber êzidîtiya bavê xwe zarokên gund gelek caran qerf û hekan pê dikan û dibêjin ku “Tu kurê bavê Êzdîyan î!” (r. 14). Ebdilmecît hercarê bi girîna xwe ve tê ji diya xwe û bavê xwe pirs dike ka êzdî kî ne. Nivîskar bi rêya bersiva bavê Ebdilmecît nêrînên xwe jî eşkere dike:

“Lawo, Êzdî jî Kurmancên mîna me ne, ew jî dîsa ji eşîra me Zilan in, her dîne wan cuda ye. Em ji wan qetiyane hatine ser dîne Mihemed, ser dîne Îslamê.” Diya Ebdilmecît gava ku ji bavê wî hez dike û pê re dizewice, difikire ku “Ew jî Kurmanc, em jî Kurmanc. Merivên dîwanê dihatin, ew ji wan re jî dibêjin Kurd, ji me re jî dibêjin Kurd. Şêxên wan hene, şêxên me jî hene. Ne di xebirdanê de, ne di kincan de, qet di tiştêkî de wê fîrîqî nedidît.” (r.14)

Nivîskar, wekî her du romanên xwe yê berê di vê romanê de jî di beşa “Şerê Împeryalîstîyê, Sala 1914an” de behsa şerê dike û heta sala 1917an tê. Şerê Cîhanê yê Yekem bi vî rengî dibe paşxaneyekê ji bo vê romanê. Li vir dîsa lehengê romanê Misto derdikeve holê. Misto bi Partiya Bolşevîkan dixebite û tevî wan propagandaya komûnîzmê dike, xebatan dibe nava karkeran û leşkeran. Li hember burjuvaziyê xebatên wisa bi dil û can dike ku hevalên wî yê partiyê timî pesna Misto didin.

Propagandaya Lenîn û bolşevîkan di vê romanê de jî dibe mijarên sereke ji bo nivîskarê sosyalîst. Romanê ji bo îdeolojiyên xwe dike amrazekê û ji vê yekê jî lehengên xwe bi kar tîne û bi rêya wan fikr û romanên xwe empoze dike. Mîxaylovê komûnîst gelek caran bi hevalên xwe yê partiyê re diaxive û dibêje ku: “Gerekê em wisa bikin, wekî eskerên me berê tivingên xwe biguhêzin ber bi dîwana padşê ve, ber bi bûrjûvaziyê ve bikin, çimku ev şer wan dest pê kir ji bo kara xwe. Pale û gundî xwîna xwe dirêjin, lê bûrjûvazî, milkedar cêba xwe tijî dikan.” (r.104). Komûnîstên bolşevîk hertim tînin zimên ku Lenîn dibêje ku divê rastîyê bêjin ji leşkeran re; lewra ev şer ne ji bo gundî û karkeran e, ji bo dewlemendan, padîşahan û ji bo bûrjûvaziyê ye.

Yekê Gulanê ji bo karker û gundiyan rojeke girîng e û ev yek jî wekî her du romanên berê, di vê berhemê de jî hatiye behskirin. *Teşkilata Partiya Paleyên Sosyaldemokratîyê a Ûrisêtê(a Bolşevîkan)* xebateke gumreh ji bo vê rojê dikan. *Lozung*

dinivîsin, parçeyên sor amade dikin. Wê çaxê cara ewil e ku ewqas miletên Qafqasê di bin destê Partiya Bolşevîkan de dixebitin, wekî birayan karê *Eyda Yekê Gulanê* dikin û kes ji yekê din re bi çavekî nijadperest nanêre. (r.110).

Misto jî di vê mîtûnga mezin de radibe ser dîkê diaxive, li gorî *lozungan* çî tê bîra wî behs dike û pesna şoreşê dide. Ji ber vê axaftinê jî ji aliyê *diwanê* ve tê girtin. Bi rêya bîranînên Misto yên li girtîgehê de, em dizanin ku ew pirtûka Lenîn a “Pêşdeçûyîna Kapîtalîzmê li Ûrisêtê” dixwîne û êdî dibe bolşevîk. Misto gava ji kelê derdikeve diçe gundê xwe nav miletê xwe û li wir jî xebatên xwe yên propagandayê didomîne. Gava ku ku gundiyan re diaxive hertim tîne zimên ku “ ev gilîyê Lenîn, gilîyê Partîya Bolşevîkan, azabûna pale û gundîyan e.”

Baweriya kurdan bi Lenînê heye û wisa bawer dikin ku ew rizgarkerê wan e. Emerîkê ji Entabê gava ku behsa dîwana nû dike dibêje ku “Lenîn piştta me ye, êdî hûn ji çî ditirsin?” (r. 122). “Ne şikir wê xwediyê me kesîban êdî heye, dibêjin navê wî Lenîn e...” (r. 125). “Erê weleh xwediyê me kesîban Lenîn e, Partîya Bolşevîkan e, em gerekê îro gişk li Dîgorê bibêjin, dixwazin dîwana pale û gundîyan.”(r. 126) Lewra baweriya xwe bi dîwana Daşnakan û Gurcîyan nayînin û dibêjin ku ew jî wekî dîwanên berê ne.

Di vê romanê de jî şayesandina lehengan li gorî çîna wan tê guhertin. Kesên rênçber, gundiyan belengaz, karkerên ‘xebatçî’ yan jî partîzanên şoreşger hertim bi awayekî erênî hatine teswîrkirin. Ew ji aliyê xisletên xwe ve bêbêqisur in, ji dinyayê fêhm dikin, rabûn-rûniştina wan her gav li gorî edetên bav û kalan e, ji bo heqiyê dixebitin û gava ku derfet dibînin tevî xebatên partiyê dibin û ji bo bindestan dixebitin. Teswîra wan a fîzîkî jî bi peyvên xweşik tê xuyakirin. Emerîkê yek ji lehengên romanê wisa tê şayesandin ku meriv dibêje qey “wekî keleyê ye.” (r.10). Ewqasî nefsbîçûk û dîlnizm e ku ji gotinên “Emer Axa” hez nake û qet xema wî nîn e.(r.11)

Sertîbê neviyê Emerîk jî wekî lehengekî baş hatiye şayesandin. Sertîb “Yekî bejnorte bû, temoriyeke reş î kurişk lê bû. Simbêlekî teze derketibû, mîna qeytanekî reş li ber bêvilê bû. Wexta Sertîb dikeniya, her du hinarên sûretê wî sor dibûn, mîna sûretê qîzan. Ji kincan wî çî li xwe nekira, gişk li bejna wî dihat... Xên ji wê, Sertîb him di xebatê de, him jî di mêraniyê de, di wî gundî de angorî wî kesek tune bû.” (r. 28).

Yek ji lehengên romanê Sûrên Hovsêpyanê ermenî ye. Sûrên di nava şoreşgeran de xwedî asteke bilind e. Ew dersên partîzanî û şoreşgeriyê dide hevalên xwe û derheqa “Tezêd Lenîn ên Nîsanê” de şîroveyan dibe nava karker û leşkeran. (r. 110). Pêwendiya vî şoreşgerê zana û wêrek bi serekên Partiyê re heye û rêxistina partiyê ya Sariqamişê di bin berpirsiyariya wî de ye.

Li hember wê jî şayesandina çîna serdest hertim bi awayekî nexweş xuya dike. Dewlemendên romanê, axa û beg, qeymaqamên dewletê hergav wekî kesên neyînî tên şayesandin. Ew zilm û tedeyî li bekengazan dikin, xwîna wan dimêjin, bertîl û xeracan distînin. Wekî lehengên erênî, lehengên neyînî yên romanê jî ji aliyê fîzîkî ve tên şayesandin û ev yek jî di nava kontekseke xirab de xuya dike.

Qeymaqamê bajêr (yek ji lehengên neyînî yên romanê, ji ber ku dewlêta kapîtalîst temsîl dike) tu carî silavên kurdan nagire. Hergav ji gundiyan “xerc perac, bertîl, rişwet û pêşkêş” (r. 22) dixwaze û tu caran çavê wî têr nabe. Wekî began gundiyan dişelîne. Nivîskar vî lehengî bi awayekî neyînî teswîr dike:

“Qeymeqam merivekî hûrpiz î tijî bû, zikê wî wisa mezin bû, gava ku bi rêve diçû, te digot kulfeteke li ser roj bi rojan e... Serîyekî mezin lê bû, meriv digot dewsa serî eyarekî toraqê yî tijî dewisandine dane ser milên wî. Sere wî ew qas mezin bû, wekî fîno nedîçû sêrî, ew fîno himangî li ser tepika wî disekinî. Destên wî zaf î dirêj bûn, bipirç bûn, te digot lepên hirçan in.” (r.24)

Silêman Begê dewlemend jî para xwe ji teswîrên nexweş yên nivîskêr digire. Ew jî wekî dewlemendên din ji gundiyan xerc û bertîl berhev dike. Ji bo her hincetekê ji gundiyan kesîb û belengaz pêşkêşî dixwaze:

“Silêman Beg merivekî xar î telaş î dirêj bû. Te digot ev meriv têr nanê zikê xwe naxwe...Sîmbêlekî qalîn î palikî lê bû. Wî palikê sîmbêlan dianî di pişt guhê xwe re derbas dikir. Merivekî çawa Kurmanc dibêjin, rovî bû, her gav dikenîya ji çavên wî kiviş bû, wekî di wî kenî de gelek delk û dolavên vî merivî hene.” (r.25)

Di romanê de yekê dewlemend jî Qelender e. Ew ne beg ê ne jî axa ye lê ji wan hemûyan dewlemendtir e; hesabê perê xwe nizane lê merivekî zehf tima ye û pariyekî nan nade tu kesî. “Qelender merivekî zaf î mezin î bêhûde bû. Seriyekî mezin lê bû, te digot kûpekî tirşînê ye dane ser milê wî...Pozekî mezin î pelişî lê bû, te digot hedadan bi gestan bi çakûçan dewixandine... Destên wî mîna lepên hirçan bûn.

Mîrav Hamazasp jî begekî ermenî ye. “ Merivekî xwînxwirî bêînsaf bû, meriv dikutan, rişwet dixwar, kesekî newêrîbû li ber xeber bida.” (r. 95).

Wekî tê dîtîn şayesandina lehengan mînanî reş û spî ye. Lehengên baş baş in, bi her awayî qenc in; lehengên xirab jî hertim xirab in, qenciya wan tune. Ev yek remzeke realîzma sosyalîst e. Ji ber ku şayesandina lehengan de hurgiliyên psîkolojîk tune; tenê çîna wan, serdestî yan jî bindestiya wan girîng in. Rewşa wan a li hember partiyê, li hember burjuvaziyê wan dide dest ka baş in yan xirab in; şoreşger in yan kapîtalîst in. Ji bo nivîskarê romanê neteweyê lehengên wî ne lê çîna wan girîng e. Axa û beg çî kurd bin wekî Silêman Beg çî ermenî bin wekî Mîrav Beg, ew yek ne mesele ye; lê tiştê girîng ew e ku her du axa û begên ji neteweyên cuda serdest in û neheqiyê li milletê xwe dikin. Pê re jî lehengên baş jî ji her neteweyê hene di romanê de; leşkerên baş ên ûris, Kîrakosê ermenî, Sehîdê kurd, Mistoyê kurd û hwd...

Di beşa “Xwendin Guneh e” de Emerîk bi kurê xwe yê Sehîd re ji bo xebatê diçe Tîblîsê. Sehîd jî bi bavê xwe re dixebite û ji aboriya malbata xwe aliyê wî dike. Hevalê bavê wî Emoyê Şişman gava ku tê mala wan hertim ji wan re çîrokan û kilaman dibêje. Sehîd di nava wan herî zêde ji “Aşiq Qerîb” hez dike û hergav ji Emo rica dike ku careke din bêje. Sehîd bi xwe hezkirina vê çîrokê wiha şîrove dike: “Ez ji vê çîrokê lewma hez dikim, wekî ew jî kesîb bû, bi dengbêjîyê îdareya xwe dikir, a duduyan, wekî wî ji wetenê xwe hez dikir, a din jî wî çî armanc da pêşîya xwe, tev qedandin.” (r.200). Bi vî awayî em pê dihesin ku Sehîd bi hin armancan derdikeve ser sehneya romanê û ev jî di cih de diyar e. Sehîd jî kesîb e, ji welatê xwe hez dike û armancên wî hene. Sehîd dixwaze ku bixwîne, hîni xwendinê bibe lê nizane ka çawa bike. Gava zarokan li kolanan dibîne ku rojname dixwînin û difiroşin xwezîya xwe bi wan tîne ku ew dikarin bixwînin. Vê xwesteka xwe ji axayê xwe yê gurcî re dibêje lê ew bertekeke mezin dide û dibêje ku kurd hemû hemal, xulam yan jî dergevan in, çî karê wan bi xwendinê heye. Ev gotinên

axayê wî li Sehîd giran tê lê nikare tiştêkî bike, ji ber ku ji bo xwendinê pere lazim e û 'tereqên' wan, şêxên wan jî dibêjin ku xwendin heram e ji bo wan. Li vir gotinên Emerîk hêjayî nimandinê ye ku wekî berê jî me gotibû, nivîskar bi devê lehengên xwe fikr û ramanên xwe vedibêje:

“Lawo, xwendin tiştêkî zaf pak e, lê em nikarin ew qas pere bi dest bixin, bidin heqê xwendinê. Tereqên me jî dibêjin xwendin ji me re guneh e. Nizanim çima ji hemû miletan re ne guneh e, her ji me re guneh e? Bi aqilê min ê ku xwendin ji me re kirîye qedexe, ew dijminê me ye. Wî çima ew tiştê pak kirîye qedexe?...” (r. 201).

Ev gotinên bavê Sehîd jê re maqûl tê lê dîsa jî nikare xwendinê ji fikra xwe derxwe. Wan çaxan xeber ji Axbaranê tê ku Dîwana Daşnakan êdî rabûye û gel li wê derê Dîwana Sovyetê teşkîl kiriye. Êdî li gundan ketxuda tune ne, ji kesîban milet tèn hîlbijartin ji bo rêvebiriya gundan. Ji aliyê kurdan jî Karapêtê Cano dikeve nava xebatê û bi dil û can dixebite. Dîsa di vê beşê de nivîskar dide zanîn ku gava Dîwana Sovyetê li Gurcîstanê teşkîl dibe ji bo zarokên hemû miletan û ji bo kurdan jî mekteb vedikin. Sehîd jî gava ku seh dike ji bo zarokên kurdan jî mekteb vekirine ji şabûnan nizane çi bike û bi hevalên xwe re diçe navê xwe dide nivîsîn. Li vir tiştêkî din bala me dikêşe ku midûrê mektebê ermenî ye û navê wî jî Lazo ye. Nivîskar li vir bi serpêhatiya Sehîd behsa serencama perwerdeya kurdî û pirtûkên kurdî yên ewil jî dike. Wekî tê zanîn ku piştî vekirina dibistanên kurdî ji bo amadekirina pirtûkên kurdî Hakob Xazaryan (Lazo) tê wezîfekirin. Ew jî elfabeya kurdî ya bi tîpên ermenî amade dike û ji bo hînîkirinê jî di 1921ê de pirtûkeke elfabeyê bi navê ‘Şems’ diweşîne. Ev yek jî di romanê de bi xwendekariya Sehîd tê vegotin. Lazo, midûrê mektebê, dibîne ku Sehîd û zarokên din şerm dikin biçin hundir, wan gazî dike dibe dibistanê û qeyda wan a dersê çêdike. Nivîskar bi vî awayî malavayîya Lazo dike û di nava romanê xwe de behsa wî dike:

“Dîwana Sovyetê û Partîya Bolşevîkan li kê derê diqesidî, di dest xwe de li wê derê ji hemû miletan re mekteb vedikirin. Wexta Kafkazêû bajarê Tbilîsê Dîwana Sovyetîyê teşkîl bû, Dîwana Sovyetîyê nizanibû çawa bikin, çimku xwendin bi zimanê kurdî tunebû, wê çaxê yekî Ermenî Xazaryan Hakob (Lazo), hilda herfên Ermenîyan, wergerand sewtên Kurdî, bi wan herfên Ermenîyan bi ser zimanê Kurdî de kitêba ewilî nivîsî ‘Elîfba’ navê wê danîn ‘Şems’ û bi wê kitêbê zarêd Kurdan hînî xwendinê dikir.” (r.209)

Gava ku em bala xwe didin serpêhatiya Sehîd, xebatên wî, jiyana wî, xwendina wî û şoreşgeriya wî di cih de Erebe Şemo tê bîra me. Lewra ew jî ji belengaziyê tê, malbata wî kesîb e û cara ewil ku derfet dibîne ji bo xwendinê, bil dil û eşq dixebite, dixwîne, havînan li ber pêz dersên xwe çêdike û her gav bi xendinê ve mijûl e. Sehîd jî wekî wî şev û roj dixebite û dixwîne. Gava ku bavê wî bi şev ji xew radibe, dibîne ku Sehîd hîn jî nerazaye dixwîne. Ew rewş gelek caran diqewime û Emerîk ji kurê xwe re dibêje ku tu kesî nedîtiye ku wekî Sehîd bixebite. Sehîd jî bi vî avayî bersiva bavê xwe dide: “Bavo, em û zarên bajarvanîyan nabin yek, ew her yek ji nivîsarê, an jî ji hesaban fam nekin, dê û bavên wan xwendî ne, komekê didin wan, lê em. Em gerekê gişkî xwe bi xwe jiber bikin, hîn bibin, lewma jî ez ji wan zaftir dixwînim.” (r.209). Ev gotin jî rewşa kurdên Sovyetê, yê ku cara ewil bi zimanê xwe perwerde dibin, dide ber çavan. Lewra armanceke wan a mezin heye. Hertim ji bo wî dixebitin, dixwazin ku xwe û gelê xwe pêş ve bibin. Ji bo wê jî her daîm spasdarê Dîwana Sovyetê ne û dizanin ku “her bi saya Lenîn û bi saya Partîya Bolşevîkan” (r.208) van derfetan bi dest xistine.

Li vir Misto (êdî em dizanin ku ew Erebe Şemo bi xwe ye) dîsa derdikeve sehneya romanê û nivîskar dide zanîn ku Misto hatiye Rewanê û ji bo kurdan dixebite. Yê ku vê xeberê tîne Karapêtê Cano ye. Berê jî behsa Karapêt hatibû kirin ku ew di Dîwana Sovyetê de li ser navê partiyê dixebite. Karapêt derheqê Misto de dibêje ku ew ji 1917an ve destebirakê wî ye û li welatê Qersê Misto wî hînî gotinên Lenîn û Partiya Bolşevîkan kiriye. Li vir tişteki balkêş jî ew e ku nivîskarê romanê gelek caran tîne zimên ku Misto bolşevîk e, şoreşgerê partiyê ye û her ji bo Dîwana Sovyetê û ji bo kurdan dixebite. Ev fikar hertim di nava romanê de rastî me tê. Ji ber ku Erebe Şemo piştî sirgûniya xwe her dixwaze ku bîne zimên ku ew komûnîst e û sosyalîst e.¹⁴⁷ Di beşa “Nameya Akadêmîk Orbêlî” de êdî Misto wek nivîskar û rewşenbîr derdikeve pêşberî me. Ew êdî leşkerekê şoreşger ne lê wekî zanayekî şoreşger tevdigere. Misto li Yêrêvanê li ser elîfbaya Kurdî dixebite û dixwaze ku bi tîpên latînî alfabeyeke nû çêke û ji bo vê jî “diçû cem profesor Açaryan û Qapansyan, bi wan re şêwr dikir, wekî bi çî teherî herfên Kurmancan çê bike.” (r.214). Armanca wî ew e ku wekî milletên din ew jî bi zimanê xwe bixwînin, ‘gazete û

¹⁴⁷ Pêşgotina Hopo.

kitêban neşir bikin', û mekteban de bidin xwendin. Lê xebatên wî zanînên wî têra vê yekê nake. Profesor Açıryan û Qapansyan jê re dibêjin ku ew jî ne kurdzan in û wî haydar dikin ku li Lenîngradê kurdzanekî mezin heye û ew bi salan li ser kurdzaniyê xebitiye. Ew profesor akadêmîk Hovsêp Orbêlî ye. Wekî tê zanîn ku H. Orbêlî di dîroka xebatên kurdî yê Sovyetê de kesekî navdar e û derheqê kurdolojiyê de xwedî agahiyên bêhempa ye. Misto jî bi vê yekê diçe Lenîngradê li cem Orbêlî û bi alîkariya wî hem dixwaze elfabeya kurdî amade bike û hem jî ji bo perwerdeya zarokên kurd agahî bistîne. Heta bi dû re Orbêlî xwendekareke xwe dişîne li cem Misto ku ew keçik baş bikare kurdî hîn bibe.

Li gundên kurdan, bi serkariya Partiya Bolşevîkan û dewleta Sovyetê êdî jiyaneke nû ava dibe. Emerîk êdî her bihar diçe gundê xwe, ji ber ku Dîwana Sovyetê erd daye wan û ew jî ji xwe re nan diçînin, gîha didirûn. Emerîk her ku diçe gund, ji bajêr ji wan re xeberên nû tîne. Li gundan 'Komîteya Komekîya Gundîyan' teşkîl dibe, li bajaran 'Banka Gundîyan' tê vekirin. Ew kesîbên ku gayê wan tune dîwan pere dide ku ji xwe re ga bistînin ku belengaz nebin; yê ku toximê wan tune be pere didin wan ku toxim bistînin û hwd. Xebatên di nava kurdan de 'rind, bi dil û can û komunîstî' derbas dibe, lê kesên ku dixebitin nexwendî ne, nikarin gotinên Lenîn û Partiya Bolşevîkan bi zanebûna Marksîzmê- Lenînîzmê bibin nava kurdan. Pêwîstiya kurdan bi kadroyên xwenda hene lê hîn jî ew kadro amade nîn in. Di 1927an de Misto diçe Moskovayê li cem 'hevalê Stalîn' û behsa rewşa gundên kurdan dike. (r.221). Komîteya Merkezî ya Partiya Bolşevîkan vê karê dispêre Mixayîl Îvanoviç Kalînîn û li Yêrêvanê ji bo kurdan teknîkûma pedagojîyê û li Lenîngradê li Înstîtûta Mexlûqetên Şîmalê, Fakulteta Karkeran (paşê ev fakulte dibe Înstîtûta Miletêd Biçûk a Sovyetîyê) vedikin. Misto jî li wir dibe dersdar û ciwanên kurdan dişîne wan enstîtûyan ku perwerde bibînin, vegerin karê miletê xwe bikin û ji bo Partiyê bixebitin. Sehîd jî di vê enstîtûyê de dest bi xwendinê dike. Ew wisa baş dixwîne û hîn dibe ku "ji bo Katibê Cabdarî ê Teşkilata Komsomolan li Înstîtûtê tê bijartin, bû ûzvê buroya komîteya partîyê." (r.222). Di havîna sala 1932an de Sehîd bi awayekî serkeftî xwendina xwe diqedîne û rojê de bilêta xwe distîne û vedigere gundê xwe. Di rê de yekî xerîb ji wî dipirse ka ew ji kîjan miletî ye. Gava ku Sehîd bersiva wî dide û dibêje ku ew kurd e, ew mêrik ji wî bawer nake. Ew ecêb dimîne ku berê yekî kurd bi cil û

bergên rind, bi axaftineke xweşik û xwenda nedîtiye. Nivîskar bi vî awayî nîşanî xwendevanan dide ku êdî kurd jî bi xwendina xwe, bi xebatên xwe û bi tevgerên xwe di nava civata Sovyetê de cihdigirin. Bi lehengê xwe yê Sehîd jî vê yekê tîne zimên: “Erê gelek bawer nedikirin, wekî Kurd jî bêne Lenîngradê, lê bi saya Partîya Komûnîst û dewleta Sovyetê niha kurd jî tîne vî bajarê mezin.” (r.225) û dixwînin.

Di vê romanê de edî Dîwana Sovyetê teşkîl bûye û bi her awayî sîstemên xwe ava dike. Yek ji wan jî sîstema kolxozêye ku bi vegera Sehîd em pê dizanin ku li gundê wan, li Sengerê jî kolxoz hatiye teşkîl kirin. Salên 1930î de kolxoz li her derê û li gundên kurdan de jî tê çêkirin. Lê kulak ji bo vê şer dikirin ku kolxoz neyên vekirin. Di kolxozan de hiyerarşîya civakî tune, herkes wekî hev e, milkedar tune ne ku zilm li gundiyan bikin. Lê dîsa jî ‘xebatçiyên’ partiyê gundiyan hişyar dikirin ku axa û begên ewil naxwazin ku kolxoz bîne vekirin û pîrsgirêka çînê ji holê rabe. “Hûn gerekê zanibin hêli gundan şerê sinifan xilas nebûye, hingê kolxoz hatine teşkîl kirin, ew şer diha zêde dibe.” (r. 237). Di van kolxozan de gundî, keç û xort, civan û kalemêr, kesîb û yên ‘orte’ herkes bi dilekî eşq mil didin hev û dixebitin. Emerîkê bavê Sehîd jî bi nexweşîya xwe diçe ser xebatê û dibêje ku “Rojêd wiha rojêd mirin û jiyînê ne, heqê kesekî tune ye nexweş bikeve.” (r. 230).

Li gundê Sengerê sedrê kolxozê Biro ye û gava ku Sehîd tê ew jî dibe dîrektorê mektebê gund û li gundekî ermenîyan jî dîrsa rûsî dide. Sehîd bi hatina xwe ve dest diavêje hemû karan û bi dil û can dixebite. Hem dîrsa zarokan dide, hem li kolxozê aliyê gundiyan dike û hem jî xebat û gotinên Partiyê di nav gundiyan de belav dike. Bi van xebatên xwe yê qenc Sehîd bala Partiyê dikêşe, wî gazî dikin dibin nehiyeyê, berê dibe *telîmatçî (înstrûktor)* û paşê jî wekî katibê komnehîyeya Axbaranê tê hilbijartin.

Romana *Jiyana Bextewar* li gundekî, li Entabê bi xwînxwarî û zilma Romê dest pê dike û paşê mekana romanê dibe welatê Sovyetê. Kurd herçiqas jiyanê zehmet bikêşin jî, bi saya Dîwana Sovyetan, li Sovyetê dibin xwedî erd, dixebitin; zarokên wan diçin mektebên kurdan, perwerde dibin û ji bo gelê xwe û ji bo dîwanê dixebitin. Yanê jiyana wan a zehmetkêş û giran ber bi *jiyanê bextewar* ve diguhere. Roman bi ‘Şerê

Wetanîyê ê mezin' dawî dibe. Li vir êdî lehengên romanê li hember împeryalîzmê şer dikin û “welatê zehmetkêşan xweyî dikin.” (r.262).

3.1.4. Hopo

Romana *Hopo*¹⁴⁸ya Erebê Şemo di sala 1969an de piştî *Jiyana Bextewar* hatiye nivîsîn. Bi leheng û bûyerên xwe ve gava ku bi baldarî bê xwendin, tê dîtin ku ev romana çaremîn wekî berdewama *Jiyana Bextewar* e. Lewra Sehîdê ku em ji berê ve nas dikin, di vê romanê de jî derdikeve pêş. Sehîd cara dawî di *Şerê Weteniyê* de, mebest jê Şerê Cîhanê yê Duyemîn e, derdikeve sehneya romanê û bi vî awayî roman bi dawî dibe. Di *Hopo* de jî lehengên wekî Sehîd ên nas hene. Emerîkê bavê Sehîd, Sertîb, Xezala jina Sertîb û keça wan a Cemîle û herwiha Cimoyê hezkiriyê wê. Wekî ji lehengan jî diyar e ku êdî sal derbas bûne, yên ku çûne şerê vegehiyane hatine. Jiyanêke nû ava bûye û êdî kurdên ku ji welatê xwe revîyane hatine xwe li vir, li welatê Sovyetê girtine û hêwirîne. Welatê Êrîsêtê ji bo wan bûye sitargehekê, bêtir Yêrêvanê Ermenîstanê. Di *Hopo* de ji xeynî van lehengên nas, yên nû jî derdikevin û ev jî dê bergehê veke li ber me û bibe palpiştekekê ji bo jîyana nû ya avakirî.

Di destpêka romanê de hevpeyvîneke Bavê Nazê bi Erebê Şemo re heye û li wir nivîskarê *Hopoyê* dide zanîn ku ew “riyalîst û sosyalîst” e. Di tevna vê romanê de jî bi hemû berjengên xwe ve xuya ye ku heman îdeolojî û bawerî hatiye bikaranîn. Di tevahiya romanê de ev sîstema sosyalîst û bilindkirina wê xwe dide der. Kurdên ku ji jiyaneke bextreş û bêxwedî hatine li Sovyêtê bi cih bûne, êdî dibin xwedî jiyaneke bextewar û bi dilekî xweş û minetdar dijîn.

Roman bi vegeha Cimo ya bajêr dest pê dike. Cimo şofêrê kolxozê ye, ji bo malzemeyên xaniçêkirinê çûye û şeveke sar a zivistanê dizivire tê. Di rê de ji ber berfê

¹⁴⁸Erebê Şemo, **Hopo**, weş. Lîs, İstanbul 2007.

otomobîlek nikare bimeşe û Cimo disekine û aliyê wî dike. Ew Rizgoyê kurê Salih e. Salih ji Pampa Kurmancan e, li Lenîngradê Înstîtûta Zimanzaniyê xilas dike û vedigere Axbaranê û di serkariya Para Ronahiya Nehiyê de dixebite. Di sala 1943an de Cimo, Sehîd û Salih bi hev re diçin şêr. Bi vê bîranînê re, nivîskar dest pê dike û behsa *Şerê Weteniyê* dike. Di şerê li hember *împeryalîzmê û bûrjûvazîyê* de gelek mirovên dilovan, şoreşgerên xebatkar “serê xwe datînin ji bo oxira weten.” (r. 16). Salih jî yek ji wan e ku di rêya wetenê xwe de li hember *emparyalîzmê* şer kiriye û venegeriyaye. Di wê şerê de sekina jinên kurd jî ji bo nivîskarê romanê gelek girîng e. Lewra ew jinên şoreşger mêrê xwe bi şayî redikin ji bo şêr û wekî jinên din naqîrin, serçavê xwe venadirûn. Cemîleya jina Cimo jî jineke şoreşger e û gava şer dest pê dike ji mêrê xwe re dibêje ku “Ji çi re nahêlin ez jî bi te re bêm? Wê çi qas pak bibûya?” (r.18).

Lehengên vê romanê ji bo avakirina jiyana nû bi xîreteke nedîtî dixebitin. Hemû jiyana xwe ji bo pêşvebirina civata xwe, ji bo bilindkirina Partiyê û Dîwana Sovyetê derbas dikin. Gava ku karekî wan hebe kêr xew dikin, şev û roj xem û xeyalên wan qedandina karên kolxozê ne. Ji bo civata sosyalîs û komûnîst çi ji destên wan bê dikin. Gava ku dest bi karekî xirab bikin, Partî û komsomoliya wan tê bîra wan, şerm dikin, dev ji wî karî berdidin. Wekî nimûne Egîtê komsomol¹⁴⁹, ji Zînê hez dike, lê Zînê destgirtiya Hesênê agronom e. Hesênê difikire ku Zînê birevîne bibe gundekî din û êdî qet venegere. Lê bi dû re difikire ku ev ji bo komûnîstiya wî fikreke ne baş e, jê poşman dibe: “Ê gelo wisa dibe? Ne ez komûnîst im? Tiştê wiha ji zû de ye di nava me de qe neqewimiye.” (r.246).

Hopo yek ji lehengên vê romanê yê navsere ye. Hopo mirovekî bêdeng û xebathez e. Navê wî yê esil Ûsiv e. Gava ku dê û bavê wî ji nexweşiyekê dimirin pîrekek wî dibe xweyî dike. Lê gava ku ew pîrek jî dimire Qadir Begê dewlemend wî dibe mala xwe û bêheq dide xebatê. Ji wî çaxê ve wekî Hopo gazî wî dikin û navê wî jî wisa dimîne. Yanê serboriya wî dişibe serboriya hemû kurdan. Lewra gava ku di kolxozê de wek nobedar peywîr digire, êdî wateya jiyana wî dibe parastina lodên kolxozê. Kêr radize, kêr xwarin dixwe heta jiyana xwe jî carinan dixwe xetereyê.

¹⁴⁹ Xort û ciwanên endamên Partiya Komûnîst.

Sehîdê kurê Emerîk em ji berê de nas dikin; emrekî biçûk de dest bi xebatê dike, gava ku dibistanên kurdan vedibin diçe xwe qeyd dike û paşê li Lenîngradê dixwîne. Piştî xwendina xwe ya baş vedigere û dibe dîrektorê dibistana gundê xwe. Li pey Şerê Weteniyê dibe katibê Komnehiya Axbaranê ya Partiyê. (r.25). Sehîd jî wekî lehengên din hertim pey karê xwe tê û diçe. Her karê xwe bi fikara partîzanî dimeşîne.

Di vê romanê de nivîskar, di nava jiyana nû de lehengên şoreşger yê jin jî diafirîne. Lehengên jin jî bi qasî yê jin şoreşger in, partîzan in, di nava civakê de xwedîgotin in. Yek ji wan lehengên jin jî Zînêya agronom¹⁵⁰ e. Zînê hêja heft sal temam nekirî diçe dibistanê; Kurdî, Ermenî û Êrisî hîn dibe. Gava ku dibistana navîn xilas dike, Para Ronahiyê ya Nehiyê wê dişîne Yêrêvanê, Înstîtûta Malhebûna Gundîtiyê. Zînê li wir jî xwendina xwe baş dixwîne û dibe agronomeke baş û serkeftî. Zînê ji bo jiyana nû modeleke ciwan e û jineke xwenda ye. Cil û bergên ji yê jin mîletê xwe cuda li xwe nake; bi gotina profesorê wî Xaçatriyan kincên xwe modernîze dike. Zînê “keçeke baqil e, serwext e. Mîna hinek cahilên mayîn ne keçeke kubar û qure ye.” (r. 46). Lewra gundî hemû jê hez dikin û ji wê serbilind in. Hertim dibêjin ku “Kê bawer dikir wekî keça Kurdan wê bibe ulumdareke wisa, giş jê hez bikin.” (r. 47).

Xebatên Zînê bi xwendineke baş berhemên xwe dide. Profesorê wî jî gelek jê razî ye. Profesor Xaçatriyan bi Sehîd re tê gundê Zîne, ji bo kontrola çandiniyê û gava dibîne ku Zînê di karê xwe de serkeftiyê, kêfxweş dibe û pesna wê dide:

“Qîza min, rastiye bibêjim, ezî zehf şa me, ezî kubar im, wekî şagirda min wisa rind û bi aqilî ew ilmê ku min ew hîn dikir hîn bûye, wê li vir, li serê vî çiyayî genim şîn kir... Ez zehf şa me wekî xebata min li ber bê neçû. Ez ji te re xweşbextiyê û açixiyêd êdî bilind dixwazim.” (r.105).

Zînê her daîm difikire ka “Çawa bike ku halê gundiyan wisa bike, ku qet yek hewceyî tiştêkî nebe?” (r. 111). Ew hertim ji dapîra xwe guhdariya demên derbasbûyî dike, lewra dizane ka mîletê wê çi kesîbî û belengazî dîtîye. Lewra karê xwe jî her gav bi van fikaran dike “çawa bike wekî wî nanê ku sal û zemanan mexlûqetê wê wisa bi zelûlî

¹⁵⁰Endezyara/ê zîreatê, çandiniyê.

bi dest dixistin, wekî wî nanî gelekî zêde bikin.” (r.114). Wisa ye ku kar û xebatên Zînê di rojnameyan de jî derdikeve û pesna keçeke kurd, di nava civakê de belav dibe: “Hanê vê miqaleya di gazetê de bixwîne, derheqa qîzeke Kurdan de, ew jî agronom e, navê wê Zînê ye, nivîsîne, wê çî kar da mexlûqetê me hemûyan.” (r.115).

Hesenê hezkiriyê Zînê jî lehengekî erênî ye û hertim bi xebat û karên xwe yê partîzanî û komsomolî derdikeve pêş. Gava ku soz dide bi sozê komsomolîyê (r. 73) dide û teqez tîne cih. Hesen jî wekî Zînê endezyariya çandiniyê dixwîne û vedigere tê li gundê xwe dixebite. Tiştêkî balkêş ew e ku, nivîskar di afirandina vî lehengî de hertim behsa dilsoziya wî dike. Hesen xwendekarekî baş e û herkes jê hêvî dike ku ew bi xwendîneke bilind dewam bike û here Lenîngradê. Lê Hesen qet wisa nafikire û vedigere gundê xwe. Elbet ev veqer bi armançê ye. Hesen nameyeke xwe de dibêje Zînê: “Ez çawa komsomol im, wekî gazîya Partîyê neqedînim, neçim gundêd me kurdan, li kê derê zanîna, ku min bi saya Partî û Dîwana Sovêtê standîye, niha gelekî lazim e, bidime gundê me.” (r. 74). Hesen ji bo berjewendîya gundê xwe, ji bo dîwan û Partîyê dixwaze vegere gundê xwe û hemû zanînên xwe ji bo wan bi kar bîne. Ew naxwaze wekî hinek ciwanan biçê bajêr û li wir bimîne. Hevalê wî yê Letîf çend caran nameyan dişîne ku Hesen jî wekî wî here xwendina bilind, lê Hesen qebûl nake. Sedrê Nehîyê jî wî pîroz dike ku ew ji bo gundê xwe dixebite. “Xortê delal, we tiştêkî zehf rind kiriye, wekî hûn li pey kutakirina xwendina bilind hatine gund, bixebitin.” (r. 115).

Hesen û Zînê di heman fikrê de ne; lewra welatê wan, partiya wan hewcedarî keç û xortên xwenda û şoreşger in. Ji ber wê ye ku gava soza zewacê jî didin hev, difikirin ku xebatên kolxozê biqedînin û paşê daweta xwe bikin.

Êdî sal derbas bûne, sîstema sosyalîst–komûnîst rûniştiye. Herkes bi dil û can, bi eşqekî ji bo berdewamiya Dîwana Sovyet û Partîyê dixebitin û her daîm minetdariya xwe bi lêv dikin. Kurd jî êdî adapteyî civaka Sovyetê bûne û ji bo vê yekê jî hertim spasdar in: “Şukir ji partiya Lénîn re; kê bawer dikir wê wexteke wisa bê, wekî kurê kurdan jî hînî maşîneke wisa bibê, a ku xwe bi xwe di rîyan de here û ji ga, hespan, deveyan jî zûtir here, şukir...” (r. 27). Di bîranînên xwe de dewleta Roman reş dikin û pesna Sovyetê didin. “Ew sala 1918an bû. Dîsa eskerê Roma Reş li wan qesidîn û dîsa dest bi qirkirina

Ermaniyan û Kurdan kirin. Mîna gurê devbixwîn, şev û roj, jin û zarok, kal û pîr qir dikirin. Her eskerên sor Dîwana Sovêtê Ermenî û Kurd xilas kirin.” (r. 64)

Di vê romanê de hertim danberhevek heye. Nivîskar dema berê û niha dide ber hev û behsa guhertinan dike. Gund wekî berê nîn in. Gava ku behsa guhertinên gundan dibe, tê bîra wan ku ewil xaniyên wan binê erdê bûn, lê niha xaniyên wan mîna xaniyên bajêr li ser erdê ne. Sehîd hertim ji bo van guhertinan dibêje ku “ Bi saya Dîwana Sovêtiyêem ji binê erdê derketin roniyê.” (r. 107).

Dîsa di romanê de nivîskar axa û dewlemendên berê ji bîr nekiriye û nêrînên wan xwestiye ku nîşan bide. Gundî û kesîb hertim dibêjin ku “Bi rastî ew dîwan dîwana kesîban e”. (r.92). Lê kulak¹⁵¹ bi nêrîneke xirab û çavnebarî wiha şîrove dikin: “ Ev dîwan dîwana reş û rûtan e.” (r. 93).

Elbet Lenîn û hevrêyên wî jî hertim di romanê de wekî rizgarker cih digirin. Baweriya wan bi wî heye û Lenîn li kû be û çi bike ji bo wan xweş û baş e. “ Kî der dîwana Lenîn be, ew der wetenê min e. Ji vir her ez êdî tu bi ciyan de naçim.” (r. 93). Şerê li hember faşîzmê û emperyalîzmê jî para xwe ji van pesnan distîne. Gava ku behsa Filîtê bavê Zînê dibe: “ Filîtê Emo, eskerê Ordiya Sovêtê, wî bê qusûr li miqabilî zeftçiyên û faşîstan şer dikir. Bi mêranî emrê xwe bona wetenê xwe yê aza...” (r.95). Gundî, jin û mêr kengî sond dixwin, bi serê Lenîn sond dixwin û xwe qurbana wî dikin: “Her wexta ku Lenîn, serê min bi qurbana wî be, hate hewariya me, eskerê xwe şande welatê me, em ji wan xwînxuran xilas bûn.” (r.114).

Di vê romanê de jî hêmanên folklorê kurdan gelek caran hatiye nîşandan. Lê hêjayî gotinê ye ku bikaranîna folklorê di romanên kurdî yê Sovyetê de, bi baweriya me ji bo nasandina gelê kurd e. Lewra gelek caran gotinên wekî “edetên me kurdan”, “bi qeydê eşîra kurdan” tînin bikaranîn. Yanê mudaxeleyeke ji bo asîmîlasyonê nîn e. Tê zanîn ku li Sovyetê folklor gelek caran ji vî karî hatiye bikaranîn. Lê di van romanên de herî zêde ji bo rexneya edetên nexweş hatine bikaranîn.

Nivîskar gelek caran stran û kilamên kurdî bi kar tîne û edetên bav û kalan û dîroka wan tîne ziman:

“Eskerê faşîsta giran e, ser me da têye lemelem e

¹⁵¹ Axayên dewra Êris ên xwedî erd û mal.

.....

Semendê bavê Tîtal, mêrxasê dewletê, kire gazî:

Wele nabe, bile nabe, alçaxiya faşîsta komunîsta ra qe nabe!

De hûn bavê min kiribin lê xin, hev ra lê xin....” (r. 50)

“Xortan bi edetê kevin kurmedêgir lê kirin, wekî berfê hê zûtir bihele.” (r.39). Di her edetekê de dide zanîn ku ev yek ji mezinan maye û ew jî bi kar tînin. Ji bo kurdan ezimandina mêvanan û mazûvaniyeke baş gelek girîng e û nivîskar jî vê yekê gelek caran bi bîr xistiye: “Lawo, tu dizanî edetên me kurdan, mêvan bêyî nanxwarin nabe.” (r. 79) û “Tu edetên me kurdan dizanî, her dijmin di mala me de nênanaxwe.” (r. 106).

Edeta beranberdanê û şahiyên pey wê, di vê berhemê de jî cih digire û nivîskar çîrok û destanên kevin bi bîr dixê: “Tu hela beyta *Mem û Zînê*, an *Kerr û Kulik* pak guhê xwe bide ser, tu yê bizanibî çawa bedewiya merivan di wan beytan de tê gotin.” (r.163).

Wekî berê jî hatibû gotin ku, edetên bav û kalan carinan bi awayekî rexneyî di van berheman de cih digire. Li Sovyetê, bi avakirina jiyaneke nû re êdî bîr û baweriyên kevin û edetên nebaş bi rêya lehengan tê rexnekirin. Gava ku hesen diçe gundê Zînê û ew bi hev re heta binê gund bi hev re dimeşin. Ev yek di nava gund de dibe meseleyeke mezin û Zînê jî pê dihesê: “Zînê dizanibû edetên kevin di gund de hê berk in û hê zehf şerm û kiret e, wekî xortekî xerîb bi ser keçikan de bê.” (r.82) û Hesên re dibêje ku:

“ - Hesên tu dibînî gelek guhestin ketine gundê me, lê hê gelek edetên kevin jî di gundan de mane, em nikarin di wexteke kin de wan edetên sal û zemanan bidin hildanê.

- Na Zînê, gerek em cahil wan edetên kevin bidin hildanê.
- Tu rast dibêjî, Hesên, lê ew yek di derbekî de nabe. Xwe ew ne xaniyek e tu bihedimînî û yekî din li dewsa wî çêkî.” (r. 83).

Bi van diyalogan nivîskar jî armanca xwe diyar dike ku divê edetên kevin yê nebaş divê bê rakirin lê ji bo vê jî dem dixwaze, carekê de nabe. Dîsa edeta qelenê de jî heman helwest xuya dike: “Na xwîşka Nênanê, min qe deremek pere qelen nedaye. Niha kê bide, alçaxiyeke mezin dike. Ne qelên mala me Kurmancan biriye devê kulê! Gelekan ji

timabûnê mala xwe xerab kirine, mirazên gelek teribandine, qîzên xwe dane kalên heftê heştê salî û nehiştine, wekî mirazê wan bi dilê wan bibe!” (r. 248)

Meseleyên dînî di vê romanê de zêde cih nagire. Tenê bi çend gotinan û diyalogan ‘şêx û tereq’ hatine rexnekirin, lê tişteki balkêş e ku ev kesên olî tu car bi gotinên xweş nehatine şayesandin: “Ew şêx çi merivekî bê însaf e, wî ji payîz de hebek debir nedaye vê heywanê, hema wisa berî nava gund dabû; heywan rojê an li ber dirûngeha yekî, an jî li ser loda yekî bû. Hela dibêjin, em tereq in û xwedênas in.” (r.35)

Kedwarin û îstîsmara axa, beg û dewlemendan yan jî yên dewletê tenê bi rêya bîranînan di vê pirtûkê de cih digire. Kal û pîrên ku zilm û tehdeyî dîtine hertim vedibêjin: “Hûn cahilên niha ji kû dizanin me çawa bi belengazî û çetinyayî emrê xwe derbas dikir. Heke berê merivekî ahil diçû rehmetê, rast e, li ser wî digiriyan, şîn dikirin; lê di dilê xwe de digotin: ‘Bextê wî girt ji derd, kul û ezabetên began xilas bû.’ Lê zarêd wî ji derd û kulêd began xilas nedibûn.” (r. 56). Ji bo axa û dewlemendan û ketxudayên wan jî hertim rexne hene: “Berê ew jî dihatine kewşen¹⁵², lê ew dihatin ji xwe re digiriyan, lê wekî kî ne bi dilê wan dixebitî, ew didane nava qamçiyên, dikutan. Rehmetî xezûrê min ev yek ji me re gilî dikir û axîn dikişand, digot: ‘Gelo rojeke wisa hebe wekî em jî ji destên van bêînsafan xilas bibin?’ û dewam dike, “Belengazî ev roj nedît, ev rojêd aza yî bextewar...” (r. 57). Dîsa dapîra Zînê: “Gelek salêd wisa hebûn, wekî me kesîban nanê ceh têr nedixwar. Nanê merivê dewletî pîrr bû, gelek pezê wan hebû; ga, hesp û guhdirêj... Wexta ku nanê me xilas dibû, an jî nanê kê kêmbû, timî buhayekî pîrr mezin ji me distandin.” (r. 111).

Kolxoz êdî di nava vê sîstema nû de cihê girîng digire. Jiyana rojane, kar û emelên gundiyan li dor van dimeşin. Kolxoz malê herkesî ye û divê herkes karê kolxozan bikin. Ji ber wê ye ku êdî di vê sîstemê de kedxwarin û îstîsmar tune. Partî û dîwana nû vê îstîsmara kedê ji holê rakiriye.

Kolxozan de hemû gundî wekî kolxozvan dixebitin û destheqê xwe jî li gorî xebata xwe distînin. Di van kolxozan de serokê kolxozê heye û serkarên karkerên zeviyan

¹⁵² sînor, tixub

jî brîgadir in. Brîgadir xebatên van karkeran kontrol dikin û bi rê ve dibin. Di van kolxozan de xwarinxane, pirtûkxane û baxçeyên zarokan hene. Kolxozan bi awayekî partîzan dixemilînin û saz dikin: “Klûbeke zehf rind bû, dîwarên hundirê klûbê teze siwax kiribûn, li dîwaran sifetên Marks, Engels, Lenîn dardakiribûn.” (r. 183). Di pirtûkxaneyên kolxozê de pirtûkên sîstema sosyalîst- komûnîst tê xwendin. Bi vî awayî em pê dihesin ku rojnameya *Riya Teze* heta van gundan diçe, gundî bi hev re nûçeyan dixwînin (r. 38), *Radyoya Yêrêvanê* guhdar dikin (r.39).

Di vê romanê de dîsa buyêrên dîrokî li gorî jiyana lehengan hatiye vegotin. Êdî Şoreşa Cotmehê pêk hatiye heta Şerê Cîhanê yê Duyemîn jî derbas bûye. Nivîskar cih cih ji eniya şer behs dike û agahiyên dîrokî dide. Dîsa em dikarin bibêjin ku nivîskar, bi awayekî gelparêz piştî xwe daye çîna karker û gundiyan û romana xwe li ser van hîman ava kiriye.

Di navbera destpêk û encamê de em dikarin bibêjin ku halê kurdan û nêrînên wan, gotinên Şehîd (lehengê romanê) xulase dike: “ Ez ê vê fincanê vexwimbi eşqa Partîya Komûnîstan, ya ku azayî da me, Kurdêd belengaz ên ku timî nuxsan û bindest bûn; bi eşqa xebatçiyên me kolxozvanan, hûn niha êdî xebata me ya aza û xebata me ya bitifaq dibînin. Sal bi sal halê me hê pak dibe, hûn li xaniyên xwe binihêrin, hûn ê bi dest xwe re bibînin halê xwe yê berê û halê niha. Gelo begêd me, an axayêd me, wexta ku hemû mecal di destên wan de bû, di xaniyên wiha de qe dijiyan? Komûnîstan ev yek da me...” (r. 162).

3.1.5. Dimdim

Romana pêncemîn a Erebê Şemo *Dimdim*¹⁵³ di sala 1965an de li Yêrêvanê çap dibe. Ev romana ku mijara xwe ji destana Kela Dimdimê girtiye, romana duyemîn a dîrokî ya kurdî- kurmancî ye. Romanên dîrokî bi xwe re gelek pirsgerêk jî ava dikin û nakokiyekê derdixin. Nivîskar gava ku bûyereke dîrokî di nava romanekê de bi kar bînin,

¹⁵³Ereb Şemo, **Dimdim**, weş. Lîs, Diyarbekir 2016.^[153]

du xalên girîng derdikevin li ber wan; yanê hem derheqê rabirdûyê de vegotîneke nû ava dikin û hem jî di dîroka nivîsandîna de yanê peywendîke hemdem de midaxaleyekê çêdikin.¹⁵⁴ Ji ber ku nivîskar êdî van bûyerên dîrokî li gorî dema xwe jî teswîr dike û belkî nikare xwe ji vê xilas bike. Em dikarin ji bo *Dimdimê* û ji bo nivîskarê wê jî heman tiştî bibêjin. Lewra wekî “avakirîneke düyem” Erebe Şemo jî nikare xwe ji vê nakokiyê dûr bixe. Em ê bibînin ku ji dîrokeke feodal serokekî dadmend û gelparêz wê derkeve û ji dewra mîrekiyan lehengên neteweperwer û şoreşger bibin mêvanê xwendina me.

Ev destana ku ji zargotin û çanda Kurdî re bûye çavkanî, di nava gel de bi çend navan tê zanîn û bi gelek varyantan ve gihiştîye roja me: *Dimdim*, *Dimdim Xanê Kurda*, *Beyta Xanê Kurda*, *Xanê Çengzêrîn*, *Xanê Lepzêrîn*, *Xanê Destzêrîn* û hwd.¹⁵⁵ Ev çîroka destanê êdî dibe paşxaneyê romaneke dîrokî. Wekî Alan jî gotî, rabirdû ji bo edebiyatê laboratuwareke çandî ye.¹⁵⁶ Erebe Şemo jî bi bikaranîna vê rabirdûyê, zargotîneke kurdî dike mijara romana xwe û ji nû ve dinivîse.

Di *pêşxêbera* romanê de, nivîskar bi xwendevanan dide zanîn ku ev romaneke dîrokî ye û ji “rojên tarîxa kurdan” (r.11) hatiye girtin. Dîsa di dewama wê de diyar dike ku: “Em her didin nexşekî wan şerên kurdan, ên ku wan gelek qurnan, sal û zemanan dikir ji bo azadbûna xwe ji zulma dagirkeran û ew nasekinin, niha jî şer dikin ji bo azadbûna xwe.” (r.12).

Roman wekî bûyereke dîrokî, di sedsala 17an de derbas dibe û behsa şerê navbera kurdan (Kela Dimdimê û Xanoyê Çengzêrîn) û Şah Abbasê düyemîn de dike. Di tevahiya romanê de û beşa ewil de jî tê dîtin ku Kela Dimdimê ne tenê kelehekê ye, wekî welatekî azad, serbixwe, wekhev û demokrat e. Belê ev peyvên dawî anegorî serdema eşîrtî û mîrekiyan peyveke ji hedê xwe zêde modern e û ji xwe nakokiya vê berhema dîrokî jî ji

¹⁵⁴ Ji bo agahiyên berfireh bnr. Fatih Altug, “İstinat Duvarı Olarak Cezmi: ‘Tarihe Müstenit Hikaye.’” Di nav, Zeynep Uysal (ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek*, İletişim, İstanbul 2011, r. 149.

¹⁵⁵ Ordîxanê Celîl, *Kürt Kahramanlık Destanı Dimdim*, İbrahim Kale (wer.), weş. Avesta, İstanbul 2001, r. 37.^{[1][SEP]}

¹⁵⁶ Bnr. Remezan Alan, *Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn Folklor û Roman*, weş. Peywend, İstanbul 2013, r. 95.^{[1][SEP]}

vir peyda dibe. Li gorî Ahmedzade ji xeynê *Dimdimê* pênc romanên Erebe Şemo li gorî rêzikên realîzma sosyalîst, bêtir li ser şert û mercên civakî-siyasî yên hemdemî yên kurdên Yekitiya Sovyetê disekine.¹⁵⁷ Lê li aliyekî din, hin nivîskar û lêkolêr jî angaşt dikin ku *Dimdima* ku binyada xwe ji zargotinê girtiye, ew jî di çarçoveya realîzma sosyalîst de hatiye afirandin.¹⁵⁸ Lê gava ku em bi hûrgilî bala xwe didin tevahiya romanê, dibînin ku nêrîna duyemîn êdî muteber e. Çima? Yek bi yek li gorî rêgezên realîzma sosyalîst lê binêrin, em ê bibînin ku di bin siya romaneke dîrokî de, nivîskar welatekî îdeal afirandiye. Heta belkî em dikarin bibêjin ku Erebe Şemo di vê romanê de utopyaya xwe afirandiye.

Di beşa “Serê Ewlîn” de roman bi şayesandina sûka Kela Dimdimê dest pê dike. Li Kela Dimdimê, li sûka wê her cure danûstandin pêk tê, gelek gundî û koçer li wir in; miletên ji Adirbacanê, ji Wanê heta ji Seraya Mexînan (Asorî) bazirganên tîn li vir. “Xano qedexê kiribû, kesekî tu bac, an gumrik ji bazirganên dereke nedistand, wî nedihîşt li sînoren wî tu kes dengê xwe ji bazirganên re bike, bazirhan serfiraz dihatin û eşyayê xwe difirotin.” (r. 26). Ji ber wê bi dilekî rehet bazara xwe dikin. “Xanoyê Çengzêrîn mêrekî maqûl e, zehf zane ye û bi rehm e, ji bazirganên hez dike.” (r. 27). Lewra li kelehê hertim bazareke geş heye û millet belengazî nabîne.

Li vir li Kela Dimdimê “xwarinxaneyên ji bo kesîban hebûn... Di van xwarinxaneyan de, timî tijî mirovên kesîb û fiqare bûn.” (r. 24). Ne tenê kesîb û feqîr gelek kesên din jî xwe diavêjin bexta Xano û kelehê: “...ên ku ji zindanan, an jî ji ber xeniqandina Şahê Îranê û Padişahê Romê bi tehrekî xilas bûbûn û reviyabûn, hatibûn. Di nava wan mirovan de, hebûn ulumdar, xwendekar û aqilbend... Li vir, li bajarê kelê, di binê bandora Xano de, kesekî zor li wan nedikir, ji çî miletî jî bûbûya.” (r.24). Herçiqaq keleh warê kurdan be jî, li wir tu kes ne zilm dibîne ne jî tehdeyî.

Gava em bêne ser lehengan, lehengê sereke yê vê romanê elbet Xanoyê Çengzêrîn e. Xano avaker û serokê Kela Dimdimê ye. Xwedî feraseteke mezin e, ne tenê piştevanê xelkê Kela Dimdimê ye, ê her kurdekî/ê ye. Xano her biryara xwe li dîwanxaneyê bi

¹⁵⁷Haşim Ahmedzade, **Romana Kurdî û Nasname**, Avesta, İstanbul 2011, r.19.

¹⁵⁸Remezan Alan, **Bendname Li Ser Rûhê Edebiyatekê**, Avesta, İstanbul 2009, r. 197

giregir û rûspiyên eşîran re digire. Ji bo her karî bi wan giregiran re dişêwire. Xwedî xîret e, li hember dijminên xwe bê minet e. Xaleke balkêş jî ew e ku, gava nivîskar lehengê xwe yê Xano dide naskirin dibêje ku: “Serkarê wî şerî ne mîr bû, ne beg bû, ne jî axa bû, ew Kurdek bû, navê wî Xano bû. Wî Kela Dimdimê çê kir, mexlûqet jê re digot, Xanoyê Çengzerîn.” (r. 12). Ev xaleke girîng e; lewra nivîskarê vê romanê li hember sîstema axatî û begtiyê ye. “Li cem wî hemû axa, beg, serekeşîr, dîndarên êlan tev zulimkar, talanker, neheq, merivkuj û bêwîjdan in.”¹⁵⁹ Di vê berhema xwe de jî vê yekê parastiye û serlehengê xwe ji serdema wî wêdetir teswîr dike. Lewra serokekî wiha dadmend, fedakar û gelparêz di wê serdemê de ne mimkun e, ji ber ku ev taybetiyên lehengekî îdealîst e. Di şayesandina Xano de tiştê balkêş ew e ku Xano ji hemû van hemû çînen serdest dût e. Lê ev yek di wê dewrê de tiştêkî ne mimkun e. Lewra em dikarin bibêjin ku li vir jiyana nivîskêr ya hemdemî roleke girîng dilîze. Ji ber ku Erebe Şemo wekî bi xwe jî gofî, sosyalîst û realîstekî bawermend e. Li Sovyetê, di nava sîstemeke sosyalîst de jiyana xwe berdewam dike. Bivênevê ev yeka ha di vê berhemê de bandora xwe nîşan daye.

Xano rojekê di dîwanê de behsa serboriya xwe dike. Xano xortaniya xwe de li cem Nasir Beg ‘revoçî’ ye. Revoyê wî pirr mezin e, çar sed hespên wî hene. Rojekê nanê wî xilas dibe û du roj birçî dimîne. Roja sisiyan diçe mala xwe ku nan bîne, lê vegeê de dibîne ku hesp wînda bûne. Nasir Beg pê dihesse ku revoyê wî wînda bûye. Gazî Xano dike û jê re du roj molet dide ku revoyê bibîne bîne, heke ne dê Nasir Beg “postê wî bigurre”. (r.105). Li vir Xano dîsa dubare dike ku: “Bi rastî jî, Nasir Beg merivekî zulimkar î bê însaf bû. Wî gelek rêncberên xwe bi kutan û lêdanê kuştibû.” (r. 105). Xano bi vî awayî çend roj û şev revoyê digere, nabîne. Di dawiyê de bilûra xwe derdixe, lêdixe. Demeke şûn de hesp tev tîn li cem Xano. Ew jî dibe revoyê teslîmî Nasir Beg dike û dev ji karê xwe berdide. Di wê navberê de eşîra Beroderan û Şikakan dikevîne şêr. Li pey şêr, giregirên eşîra Beroderan û Meclîsa Rûspiyan kom dibin û gazî Xano dikin:

“Xano, hê wexta ku Nasir Beg sax bû, rast e ew begê me bû, lê wê çaxê jî te bi mêrxasî eşîra me ji hemû qewimandinêd çetin û şeran xweyî dikir. Em dixwazin were tu bibe mezinê eşîra me.” (r.108).

¹⁵⁹ Eskerê Boyik, “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewîlîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî Erebe Şemo (1897-1978)”, *Kovara W*, j 15, İstanbul 2007, r. 21.

Bi van gotinan re, ew serokatiya eşîra xwe hildide ser xwe. Ji xwe re keleh çêdikin û li wir cih dibin. Nivîskar bi vî awayî bi me dide zanîn ka Xanoyê kesekî ji rêze çawa bûye serokê Kela Dimdimê. Elbet ev yek li gorî çand û edetên kurdan nîn e; lê çawa ku me berê jî gotibû, nivîskar li gorî şert û mercên roja xwe, çîrokê ji nû ve nivîsiye. Heke ne, lê binêrin ka di navbera serpêhatiya Xano û Ereba de, yan jî di navbera Xano û Sehîd (lehengê Jiyana Bextewar û Hopo) de çi cudahî heye. Yan jî di navbera Nasîr Beg û Usîv Beg (lehengê Şivanê Kurmanca) de çi ferq heye? Çawa ku Sehîd piştî zîlm û tehdeyiyan dixwîne û dibe dîrektorê dibistanê, Xano jî bi hîlbijartina giregiran dibe serokê eşîra xwe.

Wekî berê jî me gotibû ku, Xano mêrxasekî neteweperwer e û piştgirê hemû kurdan e. Gava ku xortên ji eşîra Şikakan tên dîwana wî û rewşa xwe ya dawî dibêjin Xano bi baldarî guhdariya wan dike:

“... ev çend roj e serbazên Şah Ebas ketine nava me, xercê kom dikin, lê ev ne xerc e hema talan dikin, çi li ber wan dikeve rapêç dikin diwin, heke nan be, heke hasil be, heke dewar be, heta nivînên malan jî diwin. Wekî yek li ber wan xeber bide, an bibêje ku ezî kesîb im, tiştêkî min tune, wekî ez xercê bidim, serbazên Şah Ebas wî davêjin nava qamçiyê û zopeyan, wisa dikutin, wekî êdî ji erdê ranebe.” (r. 39).

Bi dû re Xano piçek xwe aciz dike û nêrînên xwe yê derheqa eşîrên din de eşkere dike. Lewra çend caran Şah Ebas artêşa xwe dişîne li ser Kela Dimdimê, eşîrên din jî ji bo vê yekê kêfxweş dibin û qet aliyê Xano nakin. Xano bi vî awayî bersiva wan xortan dide:

“Li alîyekî hûn ne heq in, mezinên we ne heq in. Wexta ku Şah Ebas eskerê xwe şande nava we, we qet dengê xwe nekir, we hê bi ser de qurban şerjêdikirin. Lê gava ku Şah Ebas esker dişandine ser me, we qet dîsa dengê xwe nekir. Lê kerem bikin em herin dîwanxaneyê.” (r. 40).

Lê dîsa jî xwe nagire û alîkarî dişîne; hema wê rojê pênc sed xortên Eşîra Berodoran ji Kela Dimdimê derdikevin, diçin hewariya Êla Şikakan.

Xano û meclîsa wî, ji bo silametiya kelehê qanûnan datînin. Bo nimûne gava ku yekî dizî bike, destê wî jê dikin ku careke din dizî neke û nava xelkê de bê zanîn ku ew kes wextekî dizî kiriye.

Yek ji lehengên vê romanê jî Hemze Çawiş e. Rojekê, qerewîlên kelê merivek digirin tînin li cem Xano, navê wî Hemze ye û ji Diyarbekirê, ji eşîra Xalta ye. Di artêşa Padîşahê Romê de, di nava *Yênîçerîyan* de çawiştî (serkarî) kiriye û xortên cahil hînî telîmê kiriye. Hemze Çawiş bi leşkerên Romê re diçe gelek şeran, lê gava ku artêşa wan berê xwe didin ber bi welatê wî, ew êdî tehemûl nake; gotînen kal û bavê wî yên “Sultanêd Romê, paşayêd wan dijminêd milletê Kurd in.” (r. 47) tên bîra wî û direve, ji wan dûr dikeve. Berê de bihîstiye ku Xanoyê Çengzêrîn hêvî û mirada kurdan e, welatê kal û bavan ji Şahê Îranê û ji Padîşahê Romê diparêze; ew jî dixwaze xwe bigihîne Xano, da ku ji bo welatê xwe bixebite, heyfa jin û zarên kurdan, kal û pîran hilde. Xano di cih de daxwaza wî qebûl dike, wî wekî kurê xwe dihesibîne. Ji wê rojê pê ve, Hemze Çawiş dest pê dike û xortên kurdan hînî telîma leşkeriyê dike. Di wan telîman de Hemze Çawiş xortên kurdan û zilamên tirkan dide ber hev û dibêje ku ew newêrin nêzikî hespan bibin û zîn bikin, nivê emrê wan bi van dersan re derbas dibe; lê xortên kurdan wisa nîn in, dersên xwe di cih de digirin. Hemze Çawiş piştî van dersan, çend şagirtên xwe dişîne gundan ku ew xortên li wan gundan hînî telîmê bikin. Bi van hestên netewî, Hemze Çawiş di gelek şeran de mêrxasî û camêriya xwe bide nîşanî xwendevanan.

Wekî din ji xeynî çend kesan lehengên kurd yên vê romanê tev baş in, welatperwer in, erd û welatê xwe nadin dijminan. Wekî Sêvdîn û Ebdilrezaqê kurên Xano, Şebabê kurê Adî û hema bêje hemû xortên din jî bi vî awayî, şervan in, şoreşger in û mêrxas in.

Li hember van lehengan elbet yên neyînî jî hene ku di pirtûkê de hertim bi awayekî xirab hatine şayesandin. Qurşûtê Bazarbaşî û Mehmûdê Merkanî, mîr û begên ku xwe bi dijminên kurdan ve girê didin, Şah Ebasê Ecem û hwd... Wekî tê zanîn ku şayesandineke wiha bi awayekî reş û spî di realîzma sosyalîst de heye ku em bi derûniya lehengan nahesin; yên baş baş in, yên xirab xirab in.

Di romanê de gelek caran sedema pevçûnên di navbera kurdan û Şah Ebasê de yan jî di navbera Padişahê Romê de tê destnîşankirin. Di beşa “Serê Çaran” de çend derwêşên xerîb li Kela Dimdimê peyda dibin. Xano li şikeftan hostexaneyekê daye çêkirin û hosteyekî ermenî jî daniye serê karê û ew li wir, li şikeftan topan çêdikin. Ev derwêşên xerîb jî dikevin nava bajêr û dixwazin çend tiştan derheqa van şikeftan de hîn bibin; ji ber ku têtetina wan şikeftan qedexe ye, tenê xebatkar dikarin li wir bibînin. Gava ku Xano pê dihese, wan dide girtin. Ji ber ku çend caran Şah Ebas bi rêya sîxuran dixwaze hîn bibe ka Xano li kelehê çi çekan dide çêkirin. Xano wan qazî dîwana xwe dike û ji wan re behsa sîxurên berê dike. Heke ew jî li xwe mikur bibin, dikarin bên bexşîn û jiyana baş li Kela Dimdimê derbas bikin. Bi van gotinan re, em tê derdixin ku berê jî bi dirûvên derwêş, parsek û melayan gelek sîxurên Şah hatine kelehê. Wê çaxê gazî Mele Qadir dikin ku ew jî berê sîxurê Şah bûye, niha li xwe mikur bûye û jiyaneke pak dijî. Di dawiyê de derwêşê xort li xwe mikur dibe, her tiştî dibêje ku ew ji bo sîxurî hatine. Xano derwêşê xort dibexşîne, lê yên din tînen cezakirin. Bi vî awayî fêla Şah Ebas hertim di romanê de tê gotin. Armanca Şah ew e ku, “...esker bişîne ser wî şêr, kel’e zeft bike, Xano û eşîra wî têke binê destê xwe, xercên giran, olamê jê bistîne û xezîneya xwe tijî bike.” (r. 85).

Bi awayekî din jî tê nimandin ku “Şah Ebas Şî ye, ew ji me Sunîyan hez nake.” (r.35), ji ber wê ye hertim di ser kurdan de digire. Armanca Padişahê Romê jî ew e ku “Bila Kurd hev du qir bikin, ew yek ji me re xêr e...” (r.19). Ev gotin gelek caran di vî berhemê de cih digire wekî ku xwendevanan derheqê wan de agahdar bike: “Sultanê Romê, Şahê Îranê me Kurdan berî hev didin, em hev du qir dikin, paşê ew li stûyê me siwar dibin û me talan dikin. Demek neheqî di me de ye jî.” (r. 40). Gelek caran jî Padişahê Romê leşkerên xwe bi van hincetan dişîne şer: “Ev millet ne Îslam in, gawir in, dijminên Îslamê ne, divê em jinan, kalan, pîran û zaran qir bikin, malên wan jî talan bikin, ne guneh e, helal e.” (r. 46).

Ev berhem herçiqas ji eslê xwe yê dîrokî dûr ketibe jî, di hundirê xwe de gelek hêmanên folklorîk dihundurîne. Li vir bikaranîna van hîmên folklorîk kêr jî bibe, bi awayekî berhemê nêzîkî dewra xwe dike û derheqê edetên kevin ên kurdan de nimûneyan

dide destê me. Cejna Serê Salê ku kurd jê re dibêjin *Nevroj* bi coşeke mezin di nava kurdan de tê pîrozkirin:

“ Ehlên Kela Dimdimê karê xwe dikin, wekî roja ezîz bi eşq derbas bikin. Pez şerjêdikirin, qelî, helîse, kifte û xwarinên mayîn çê dikirin, fêkî amade dikirin, kuloçên Serê Salê dipehtin, nîşanek, gustîl, an morî, an jî pereyê zîv dikirine nava kuloç, dema ku kulo. Parvekirin, wekî ew nîşan ji neferên malê ji kê re ket, dêmek dewleta wê malê di serê wî de ye.” (r.43)

Dîsa beriya vê cejnê de, biçûk mezin herkes diçe hemamê, serê xwe dişûn ku paqij têkevîne sala nû. Hinekan jî kincên nû dikirin ku her gav û her sal kincên wan ên nû hebî. Di nava gel de jî, li dîwana giregiran de jî ev cejn bi awayekî coş û kelecânî tê pêşvazîkirin:

“Bûbû edet, her sal, wê roja 21ê meha Adarê, meclîsa Eşîra Berodoran li dîwanxaneyê Xano rûdinişt, cejn dikirin. Wê rojê dewlemendên kelê, dukandar, bazirgan, çewdar û ên mayîn dihatine dîwanxaneyê, li hafa Xano bimbarekiya eydê dikirin û hevdayî didan.” (r. 44)

“ Kî dihat dîwanxaneyê Xano rûdinişt, kêf dikir. Qehwe, xwarin, fîncanên şerbetê, pilaw, qelîya sêlê, kivav û fêkî tijî li ser textê bû. Li sazê dixistin, dengbêjan û aşiqan kilamên mêranîyê û rojên çûyî digotin, hinekan beytên Feqîyê Teyran digotin, hinekan jî, ji Ehmedê Xanî, ji *Mem û Zînê* digotin.” (r. 45).

Gava ku bi awayekî dîrokî em li berhemê binêrin, ev roman piştî xwe spartiyê bûyereke dîrokî û bi vegotinekê xwe ava kiriye; lê belê para xwe jî ji nivîskarê xwe yê sosyalîst girtiye. Me berê ji xwe derheqê serokbûna Xano de behs kiribû. Yanê Xano ne kurê began e ku ciyê xwe ji bavê xwe standibe. Ew jî wekî xortên din, têra xwe ji rêzê ye û heta li cem begekî jî xebitiye. Nivîskar li vir careke din Xano ji dewlemendî û begtiya wî dûr dixê û sedema leqeba wî ya Çengzêrîn wiha şîrove dike:

“ Navê wî Xano bû, lê wexta ku wî ev kela da çêkirin, wê çaxê wî ji bo çêkirina vê kelê bi çengan zêr da serhoste û paleyan. Ji wê rojê şûn de, navê wî danîn Xanoyê Çengzêrîn. Xên ji vê yekê li welatê Îranê, ji merivên dewletî re, ji milkdaran û began re dibêjin Xan. Lewma hinekî, dibêjine wî Xanê Kurdan.” (r. 123).

Tiştêkî balkêş jî ew e ku di varyantên orjînal de navê wî Xanê Çengzêrîn (Emir Xan) e, yanê ew bi xwe xan e. Le nivîskar hewleke wisa de ye ku bi tu awayî lehengê xwe bi çîna serdest re girê nade. Lewra navê lehengê xwe jî kiriye Xano, Xanoyê Çengzêrîn û çîroka navê wî jî bi vî awayî rave kiriye.

Şah Ebas cara dawî ku bi artêşeke mezin li ser Kela Dimdimê digire, lehengên jin ên vê romanê jî bi awayekî dilêr dixwazin di eniya şêr de cih bigirin. Dîlbera hezkiriya Şebab jê re dibêje ku: “ Li vir, di nava bajêr de, gelek keç û bûk diçûne nava texbûra jinan şer bikin, ez jî dixwazim herim.” (r. 210). Şah Ebas di vê şerê dawî û giran de mirovekî xwe dişîne li cem Xano ku ew teslîmî Şah bibe. Şah Ebas bi sonda Quranê soz dide ku dengê xwe jê re neke, wî sax bihêle. Gava ku Xano van gotinan seh dike, hêrs dibe û dibêje:

“ Here bibêje Şah Ebas, ez ne xan im, naxwazim bibim xan, lê navê min Xano, navê kurdan e, ez naxwazim rutbeya xantîyê, ez her dixwazim, wekî Şah Ebas ji me vegere, neyê ser me şêr, vî pirtî erdê kal û bavên meb ji me nestîne. Yekê jî, ez ne ew kurd im, ê xayîniyê ji milletê xwe re dike seba zêran. Bibêje Şah Ebas, heke ew van gilîyên mim qebûl neke û ji me venegere, ez ê şer bikim heta ku merivekî min jî sax be.” (r. 233).

Bi bêbextiya Mehmûdê Merikanî artêşa Şah Ebas dizanin ka ava Kela Dimdimê ji ku tê, diçin ava kelehê dibirin. Piştî hefteyekê Xano êdî dibîne ku leşkerên wî bêavbûnê sist bûne, qet nikarin bi dijminan re şer bikin. Xano gazî meclîsa xwe dike û ji wan re dibêje:

“ Ez ji wegişan razî me, we sozên ku dabû cimaetê, wekî hûn ê şer bikin, we bi namûs qedand û bi mêrxasî şer kir. Hûn dibînin, gelek emrê xwe da ji bo erdê kal û bavan, ji bo dîn û namûsê. Lê îcar ez teslîm nabim. Em gerek barûtê têkine binê kelê û biteqînin. Hûn dibînin, kesek ji me bê av taqet nake şer bike. Heke kî ji we dixwaze here teslîmî dijmin bibe, hema îşev herin. Lê ez teslîm nabim, ez ê kelê hilweşînim. Bila nebêjin Xanoyê Kurd teslîmî dijmin bû, erdê xwe da Şahê Îranê, erz û xeyalên xwe jî bê namûs kir.” (r. 256)

Li pey van gotinan, Xano fikra wan dipirse ka ew çi dibêjin; lê kes qebûl nake ku teslîmî dijmin bibin. “Li sê ciyan barût kirin binê hîmê kelê û teqandin.” (r. 257). Li gorî vegotinê ev yek wekî têkçûnekê xuya dike lê gava ku bi çavê lehengan em li romanê binêrin, ev yek jî berdewama têkoşîna wan e. Ji xwe nivîskar bi xwe jî di dawîya pirtûkê de wekî epîlogêkê vê rewşê şîrove dike:

“...Ew şer vala neçû, wexteke ne zehf dûr dîsa dest pê kir şer ji bo azadiya kurdan. Îcar Talorîk serarî li vî şerî kir. Lewma jî, kurdan navê wî şerî danî, şerê Talorîk. Di pey wî re, Bedir Xan, Êzdînşêr, Şêx Evdilal, Şêx Ubeydulah û Şex Mehmûdê Berzencî ji bo azadî û serbestiya welatê xwe şer kirin (r. 262).”

Wekî gotineke dawî “Xanê Çengzêrîn” çîroka têkoşîna gelê kurd a li hember feodalên zalim vedibêje. Ji ber vê ye ku Erebe Şemo jî, ji nava rûpelên dîrokê Xanê Çengzêrîn qazî hewara xwe dike û wî ji nû ve diafirîne ku xwendevanên xwe qanîh bike, wekî hêja jî ew têkoşîna li hember zilm û tehdeyîyan berdewam e.

Dîsa wekî romaneke dîrokî, îdeolojî û partîzaniya realîzma sosyalîst di nava van rûpelan de rastî me naye. Lê îdealîzekirina serokekî kurd û fikr û ramanên wî li vir jî xwe dide der. Wekî din lehengên erênî, me berê jî gotibû ku hemû taybetiyên wan li vir jî eşkere ne. Mijara dîne di vê romanê de dibe ku bibe mijara sereke, lê nivîskar vê yekê tercîh nekiriye. Tenê çend ciyan destnîşan kiriye ku “ Şah Ebas Şîî ye, ew ji me Sunîyan hez nake.” (r. 35). Bi nêrîneke gelparêzî em li pirtûkê binêrin, Xano têra xwe ji gelê xwe hez dike, ji bo wan dixebite, naxwaze kes bindest bibe û ji bo wan her fidakariyê dike. Yanê em dikarin bibêjin ku serlehengê vê romanê yekê gelparêz e. Elbet bi paşxane û mekanên xwe yê dîrokî, mekanên modern wekî kolxoxan li vir cih nagire.

3.2. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Sehîdê Îbo de

3.2.1. Kurdê Rêwî

*Kurdê Rêwî*¹⁶⁰ bi awayî ku destpêkê de hatiye destnîşankirin, di 1959an de tê nivîsîn û di 1979an de li Yêrêvanê tê çapkirin. Ev navbera dirêj û sedema wê jî nayê

¹⁶⁰Sehîdê Îbo, **Kurdê Rêwî**, Xanna Omerxalî (Trans.), Avesta, İstanbul 2009.

gotin. Tenê dawiya pirtûkê de nivîskar diyar dike ku “kitêba ewlîn kuta bû” ye. Nivîskar Sehidê Îbo ji êla Ortila ye û di destpêkê de jî diyar kiriye ku vê romanê bi saya bîranînên diya xwe dinivîse (r. 16). Di vê xalê de armanca wî ya nivîsînê jî em dikarin di beşa “Sivte”yê de bibînin: “Merivekî wexta tasa ava sar ji kanîkê vexwar gotî wê tucar bîr neke. Ew kanî bona me Oktyabra azadar e. Ewê li ber me dergê emrekî teze vekirin. Ewê da destê min qelema hana, ji ji wê jî ev nêtana dirijine ser kaxezê.” (r.16)

Ev yek tena serê xwe dikare mîsyona nivîskêr eşkere bike lê minetdariya wî li vir xilas nabe. Ew bi awayekî kronolojîk behsa çûyina êla xwe ya Êrisêtê dike û dide zanîn ku ev ciyê şanaziyê ye: “Şûrê Romêyî neheq gundiyê me’rûm li serê riya xistin. Sala 1920, wexta Êrisêtê da beyreqa dimilmilî, tevî ermeniyê gundê cînar Ortila jî ji qetla Romê azabûn pê danîne ser şemîka emrekî teze. Roja îro jî, şikir ji erdê heta ezmîn, têr û tijî derbaz dikin.” (r.15)

Gava ku em bîna li ser romanê, nivîskar bi jiyana êleke kurdan, Ortiliyan, zilm û tehdeyiya axa û began vedibêje û rewşa sosyo-polîtîk jî bi riya lehengên xwe nîşanî xwendevanan dike. Li gundê Sînekê êleke kurdan bi jiyana û baweriyaya xwe dibin mêvanê xwendina me. Hemîd Begê kurd li vir xwediyê gund û gundiyan e. Wekî hemû lehengên neyînî ew jî ji çîna serdest e û hertim bi zilm û tehdeyiyên xwe û bi fêlbaziya xwe tê dîtîn. Hemîd Beg tu carî nahêle ku gundiyan wî li ser xwe ve bîna. Hergav bi hincetekê li ser gundiyan digire û pêşkêşiya xwe dixwaze:

“Kêf kêfa Hemîd Begê bû. Qet xema wî nînbû, wekî neferê konê ova wî ye payê pirê hisretê perî nanê rojê ne, tefekûrê kodike dew. Carna beg nava êla xwe digeriya... Wextê ewî li ber derê malekê berdîrek yanê nogineke pak didît, emir dikire ser xulama:

- Kuro, lao, evê pezkinga han bivine mala agê xwe.” (r. 19)

Helbet Hemîd Beg di van kirinên xwe yên xirab de tenê nîna e. Li gund gelek dewlemendên zilmar û xayîn jî hene û ew jî wekî lehengên din ên neyînî hatine şayesandin. Tê zanîn ku di berhemên realist- sosyalîst de leheng bi awayekî reş û spî tîna şayesandin. Lehengên girêdayî çîna serdest ji kîjan milletê bibin jî bi gotinên nexweş tîna

nasandin. Ew ji aliyê fîzîkî ve sik in, ar in. Hertim bi keda gundiyan li ser piyan dimînin; zilmkar in, tima ne û fêlbaz in. Yek ji wan jî di nava vê romanê de Keleşê rûspî ye. “Keleşê rispî merivekî çirûk î tima yî, bêfesal e. Lê malê dinê, ku qirêca destan e, ew jî kiribûne giregirekî hêle-hêl. ” (r. 20). Keleş belê rûspî ye, dewlemend e lê bi cil û bergên xwe li dijî vê rastiyê xuya dike: “ Lê Keleşê rispî kapekî xezevê yî usa avîtibû qirka xwe, ku te digot fiqare ye, bîna bişkulekê li ber derê wê nayê. Çoxê pînekiriyî, ku ewî xwe dikir meriva nizanibû ji çi pirtî ye, te têlek jê bikişanda, sed pîneyê jê biweriyana.” (r. 21)

Di vê romanê de lehengekî din ê neyînî jî Pîr Mîrzo ye. Ew ji tereqê ye, yekî navsere ye û “timê tizmiyê xwe va mijûl dibe.” (r. 22). Pîr Mîrzo yekî fêlbaz e, hertim derewan dike û dubendî dixê nav gundiyan. Lê vê yekê bi hostetî dike ku kes jê nehese. Di tevahiya romanê de bi dek û dolbên xwe ve xwe nîşan dide. Keça wê ya Zînê jî wekî bavê xwe ye.

Çawa me gotibû ku lehengên neyînî bi peyvên neyînî tên şayesandin; li hember vê jî kesên ji çîna bindest herçiqas gundî bin, yan jî belengaz, kesîb bin, dîsa jî bi awayekî xweşik û erênî tên şayesandin. Di realîzma sosyalîst de, derûniya lehengan tune. Ew ji bo armancên nivîskêr di nav kontekstekê detên bi kar anîn. Lewra her lehengekî bindest, belengaz yan jî şoreşger ji bo ravekirina îdeolojî û fikran hene. Kerem jî yek ji wan e, kurê Eliyê şivan e. Gava ku bavê wî dimire ew ciyê bavê xwe de li mala Hemît Begê şivantî dike. “Ew xortekî cahilî, kemalî ser xwe bû. Bejna wî mîna dara spîndarê bû... Perîşanê badilhewa çok nedabû erdê. Kerem rewşa xorta bû.” (r. 23). Paşê Kerem jî bi riya rencber û şivanan dê ji Partiyê û Lenînî haydar bibe. Ew jî dê bizanibe ku Lenîn hevalê kesîb û belengazan e.

Di vê romanê de lehengekî cuda heye ku şayesandina wî bala xwendevanan dikêşe. Zurbe çima cuda ye? Lewra hem dewlemend hem jî kesekî qenc e û baş hatiye şayesandin. Ev başbûna wî jî ji rabirdûya wî ya rêncberbûnê tê:

“Zurbe bi eslê xwe va merivekî rêncber bû... Lê bextê Zurbe hinekî bi teherekî dinê lêxistibû. Ewî kirîn-firodana beg kiribû, xwe ra êpêce mal qazanc kiribû. Derê mala wî ber her kesîbekî vekirî bû. Sifra wî timê raxistî bû, ewî tasê ava sarjî bêy cînara venedixar.” (r. 31)

Nivîskar meyla xwe ya vî lehengî bi vî rênçberiyê ve girê dide. Lewra em ê paşê bibîn ku Zurbe dê tevî şoreşgeran bibe û bixebite. Heta Hemîd Beg û giregirên dewlemend ji vê yekê zehf aciz dibin û difikirin ka bi çi awayî Zurbê ji gundiyan biqetînin. Ji bo vê jî Meyana keça Zurbe ji kurê Keleşê rûspî re dixwazin. Bi vî awayî dixwazin ku têkiliya wî ya kesîban qut bikin. Lê Zurbe vê yekê qebûl nake û ji ber fêl û hileyên Hemîd Beg, Keleş û Pîr Mîrzoî terka gundê dike û diçe gundekî ermenyan. Li vir dostê kal û bavan, Sûrênê ermenî aliyê wî dike û li wan xwedî derdikeve. Bi vî awayî Zurbe jî dikeve nava karên Partiyê û doza dîwaneke nû dike ku ew dîwan, dîwana kesîb û belengazan e.

Sûrênê ermenî ji Îdirê ye, hêj di zarokatiya xwe de diçe Bakûyê li wir dixebite û êvaran diçe dibistanê, dixwîne. “Ewî vira tevî palê ûris, ermenî, adirbêcan gele cara ce’ dand bû, wekî hal û wextê wana xweş kin. Hema wira jî sala 1904 ew ketibû cergê Partiya Bolşevîka.” (r. 36). Sûrên gava ku xwendina xwe xilas dike wî dişînin Îdirê ku “di nava cim’etê da fikrê ulmê marksîzmê belake.” (r. 36). Bi vî awayî diçe gundê kurdan, li wir dursa zimanê ûrisî dide û derheqê marksîzmê de miletê hişyar dike.

“Ewî cim’eta amine-tamin ra derheqe qewimandinê, ku Êrisêtê da bûbûn şirove dikir, mesele danîn, kanê çewa pale û gundî bûne yek, textê padşê dewremîş kirine, zûrî, milkedar dane hildanê, dewleta xwe dane sazîkirinê.” (r. 48)

Hemzeyê kurd jî li wir Sûrênî nas dike. Hemze birayê Şiblî ye biçûk e, “xortekî giran î, kemal bû, beşera wî timê xweş bû, simêlê wî ye çûr mîna du simlê gênim li ser lêva wî ye jorîn, çît girtibûn. Dilê wî rehm bû, mîna dilê her merivekî xevatçî.” (r. 47). Wekî tê dîtîn jî, lehengên ji miletên cuda cuda, ji çînen bindest bi dilê nivîskêr in û ew bi awayekî nêzîkatiya xwe jî eşkere dike.

Di vê berhemê de jî, pesna Lenîn û komûnîzmê, pesna partî û îdeolojiya wî xwe eşkere dike. Lenîn ji bo van lehengan û ji bo kesîb û hêjaran ‘rizgarker’ e; dîwana ku ew dê bîne ji bo çîna bindest hêviyeke mezin e. Zurbe cara ewil navê Lenîn dibihîze û pirs dike ka ew kî ye. Êmnov bersiva wî dide dibêje ku “Arxanî be, hevalê Lenînê kêrî we jî

bê.” (r. 63). Baweriya wan a bi Lenînî, gelek caran bi dubareyan tê nîşandan: “Ez ji giliyê Lênîn zef bawer dikim, teva Rêvolyûsiya Sosyalîstiyê jî wê wira şemal bide. Ew şemalê te’riya qurna betreng bike.” (r. 92). Bi vê baweriyê bi dil û can xebatên xwe dikin û xwedî li doza xwe derdikevin: “Niha dewraneke teze destpê dibe, em nikarin û îzna me ji tune, ku mîna berê derbaz bikin.” (r. 37).

Di qewimandinên romanê de, rûpelên dîrokê hêja neçûye li ser şoreşê. Lewra dewran dewrana axa û began e, a dewlemendan e. Bi kêfa dilên xwe keda gundiyan îstîsmar dikin, bi hincetan kesîb û belengazan dizêrînin. Hemze ji van bûyeran aciz e û kengî derfet bibîne ji gundiyan re, ji rêncberan re behsa kedxwarin û îstîsmara wan dewlemendan dike:

“Cim’eta me ye feqîr jî bêfesa ji destê axa diçe, tê çûremîşkirinê. Ew dubare tê zerandinê. Alîkî da axa, beg, şêx û pîr wê dixapînin. Nahêlin kesek here bixûne, belkî usa nava te’riyê da bimînin, hacê dinyayê tune vin. Aliyê dinê jî xerc û xeracê dewletê wê qepece dike.” (r. 48)

Ev kedxwarin û îstîsmar jî ne tenê ji aliyê axa, beg û dewlemendan pêk tê. Dîwana serdest, yanê dewlet jî bi awayekî sîstematîk mefera gundiyan dibire: “Qet salek tunebû, wekî cerdê navîta ser êlê... Cim’eta fiqare çend kulek qazanc dikir, talançiya dadikuta ser ova hebûna wana top dikir û dibir. Îdî mefera cim’etê hatibû birînê.” (r. 29)

Hemzeyê birayê Şiblî rojekê biryar dide ku here bal oranîk şikiyat, lê venegeriya. Eva du salê wî tamam bûn, ku deng, hisê wî tunene.” (r. 29). Hemîd Beg gava ku vê yekê dibihîze, ji kêfxweşiyên dibêje: “Mişk çiqas xwelî bikole, wê ewqasî serê xwe ke. Çi kula Hemze tiştê usa ketibû, ew ku, şikiyat ku?” (r. 29)

Ev îstîsmar ne tenê ji bo kedê, di warê xwendinê de jî xwe eşkere dike. Gava ku Sûrênê ermenî ji bajarê Îdirê diçe gundê kurmancan, dixwaze çend zilamên kurd bibe li dibistana Zoreyê ku hînê ûrisî bibin û bi kêrî gundiyan bîn. Wê çaxê Hemîd Beg, Pîr Mîrzo û çend giregirên dewlemend ji vê yekê aciz dibin, naxwazin gundî hînê xwendinê bibin. Pîr Mîrzo acizîya xwe û ya axa û began ji Sûrên re dibêje: “Kirîvê min, tu çî ji me dixwazî, tu çima dixwazî cim’eta me ya belengaz ji rêya wê derxî, kal û bavê me xwendine, wekî em bixûnin, em ku, xwendin ku?” (r. 30)

Li vir em dikarin bibêjin ku nivîskar di warê xwedinê de pir hesas e. Lewra di pêşgotina xwe ya romanê de jî diyar dike ku “Ez, ewledê êla Ortila, îdî mîna pêşê xwe ber bi dar û gopalê rencberiyê nabezim...” (r.16). Nivîskar di jiyana xwe de rast ê, demekê rênçberî dike lê paşê diçe mektebê. Ji bo vê yekê ye ku xwendin û pêşveçûna zarokên kurd de nêrînên xwe nanixumîne. Her daîm jî minetdariya xwe pêşkêş dike: “Bira ewlêd zanibin, kanê em çiqasî pêş da çûne, çîqa kurd ji ku gihîştine kê derê, wekî ewledekî êla Ortila terka firotina qatix daye, îro derheqa hal û wextê pêşê xwe da dinivîse.” (r. 16)

Lê wekî berê jî me gotî, çawa ku lehengên erênî ji her miletî berhev bûne, li hev dişewirin, dixwazin ku dîwaneke nû û dadperwer ava bikin; wisa jî dewlemendên romanê ji her miletî hene. Karapêt axayê ermenî ji ber karên Sûrên aciz dibe û gazî li cem dike, acizîya xwe vedibêje. Yanê ew jî bi qasî axayên kurd zilmkar e û tehdeyî li miletî dikan. Ev jî bi me dide zanîn ku ji bo nivîskêr, neteweya miletan ne lê çîna wan girîng e.

Di romanê de meseleyên dîni gelek caran di şexsiyeta Pîr Mîrzo de tê rojevê û hertim bi çavekî rexneyî tê vegotin. Wisa xuya ye ku nivîskar ji edetên kevin ne lê ji bo bikaranîna wan aciz e û ev jî di tevahiya pirtûkê de tê rexnekirin. Zîna keça Pîr, miletê dixapîne, xwe wekî bijîjkan dihesibîne û ji miletî pere distîne. Folkora kurdan jî di vê pirtûkê de gelek caran ji bo rexnekirina edet û baweriyên de derdikeve pêş. Lê wekî berê jî hatibû gotin, folklor ji bo asîmîlasyona qewmekî nayê bikaranîn.

Nivîkarê romanê piştî xwe dide gelên bindest, karker û gundiyan, jiyana wan a rojane wek mijar hildibijêre û dinivîse. Ew xwe ji kesên belengaz dûr naxe û wan diparêze. Rastiyên dîrokî jî bûye paşxaneyekê ji bo bûyer û qewimandinan. Em dizanin ku hêja sîstema Sovyetê nehatiye. Ji ber wê ye ku di vê romanê de mijara kolxozan qet nakeve rojevê.

3.3. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Egîdê Xudo de

3.3.1. Dê û Dêmarî

Egîdê Xudo romana xwe ya *Dê û Dêmarî*¹⁶¹ di 1986an de diweşîne. Di 1995an de Nacî Kutlay vê romanê ji Krîlî vediguheze û li Stokholmê bi kurmanciya latînî çap dike. Ev roman ji aliyê serlehenga xwe ve ji yê din cuda dibe. Di vê romanê de serleheng jineke kurd e ku destgirtiyê wî ji bo şerekî li hember burjuvazî û faşîzmê çûye û venegeriyaye. Cara ewil e ku bi destê nivîskarekî zilam jiyana û derûniya jineke kurd tê nivîsîn. Di vê romanê de ne tenê pesindayîna sîstema Sovyetê lê belê hewldana fêmkirina derûniya jinekê jî cih digire.

Karêya serlehenga romanê, destgirtiya Cemal e. Cemal bi artêşa Êrisan re diçe şerê li hember burjuvaziyê û bi salan jê xeber nayê. Nivîskar gelek caran navê şerê wekî “şerê li hember burjuvaziyê” yan jî “şerê li hember faşîzmê” bi nav dixe lê xwendevan pê haydar dibin ku ev Şerê Cîhanê ye. Ji ber ku gelek caran navê Hîtler û Elmanyayê jî derbas dibe. Şevê jineke Êris ku navê wê Evdokiya ye, ji gundê Karê derbas dibe û teqeta wê tune ku şev li derve bimîne. Singê wê de zarokê biçûk heye û zivistana sar jî rê nade ku ew şev bimeşin. Di tariya şevê de deriyê Karê didin û dibin mevana wê. Evdokiya bi eslê xwe ji Krasnodarê ye, wê şevê serboriya xwe û bavê zarokê xwe ji Karê re vedibêje. Ew jî wekî Cemal çûye Êkraynayê û li hember faşîzmê şer dixe: Nîkolayê mêrê Evdokiya, “di şerekî bo azakirina Êkraynayê yî giran da hatibû kuştinê.” (r. 49). Ew gava ku behsa jiyana xwe dixe gelek caran qedera xwe û ya Karê dişibîne hev: “Karê xîşka min e ezîz, qedera me gişkan di van rojên giran de mîna hev e.” (r. 7). Wê şevê heta dereng behsa xwe û qedera xwe dikin û Karê ciyê wan amade dixe. Li vir nivîskar sînyalekê dide derheqê zarokê de ku Karê demeke dirêj lê dinêre û difikire: “Berî razanê, bi xwe jî nizanibû çima, ser zarê mêvanê xwe de mêl bû, êpêce wext wî tîfalê bêşûc nihêrî.” (r. 7). Rojtira din Evdokiya nameye dinivîse, kurê xwe li wir dihêle û diçe şerî. Evdokiya di nameya xwe de gelek caran sedema çûyîna xwe dixe û kurê xwe

¹⁶¹Egîdê Xudo, *Dê û Dêmarî*, Nacî Kutlay (Trans.), Nûbihar, İstanbul 2016.

emanetî wê dike: “Rast e hûn dûrî pêşeniya şer in, lê telaya nenerên faşîzmê hûn jî te’ m dikin. Ez ewledê xwe li ba te dihêlim bona vê yekê, wekî herime pêşenyê, sîlahê hildim, tevî Nîkolayê xwe û Cemalê te şer bikim, bi destê xwe heyfê ji wan xwînxuran hildim!” (r. 9)

Karê di serî de nizane ka çawa bike, bi ku de here, bi kê bişêwire. Lê paşê biryar dide ku li wî zarokî xwedî derkeve. Bi vî awayî em dikarin behsa serlehenga xwe bikin ka ew kê ye, çawa dikare bêzewac zarokê xwedî bike? Karê jineke kurd e û bi xwendinê dizane, li sêwîxaneyê gundê Mergesorê de dixebite. Ew jî bi qasî Cemal wêrek e, dilêr e û heta dixwaze bi Cemal re here eniya şerrî. Wekî berê jî hat gotin ku dema sosyalîstiyê ye, jina kurd jî bi xwendinê dizane. Ew hertim rast diaxive û jineke azad e. Gundî jî ji wê û gotinên wê bawer dikin: “Dema here çetin da wê timê riya here rast didît, şêwra here baqil dida.” (r. 11).

Cemalê destgirtiyê Karê, yekî şoreşger e û gava ku derfet dikeve destan ji bo azadiya Sovyetê, li hember burjûvayê şerr dike. Gava ku behsa şerrî dibe Cemal ji Karê re dibêje ku: “Ez li hêviyê nasekinim ku gazî min bikin, bê gazîkirin jî ez zef rind zanim ku van rojên giran weten li hêviya ewledên xwe ye.” (r.5). Bi vî awayî, bi dilekî xweş, bi dil û can diçe şerr dike.

Piştî çend salan gava ku xebara mirina Cemal ji eniyê tê, Karê bi saya kurê xwe li ser xwe dimîne û bêtir xwe bi karên xwe ve mijûl dike. Li vir nivîskar zêde li ser sehneyên şerrî nasekine. Ew bêtir bandora wî ya civakî bi xwendevanan dide zanîn. Li vir sekna Karê jî vê yekê nîşanî me dide. Karê piştî mirina Cemal xwe nakuje û jiyana xwe berdewam dike. Ev yek jî wekî tê zanîn ku bi saya zarokê wê çêdibe. Karê xwe bi hesta dayîkbûnê ve girê dide û kul û derdên xwe sivik dike.¹⁶²

Yek ji lehengên romanê jî Êsiv e. Êsiv hevalê Cemal e û ew jî di kolxozê de şofêr e. Wekî lehengên din ew jî şoreşger e, di xebatên Partiyê de cih digire. Êsiv piştî mirina

¹⁶² ji şiroveyeke berfirehtir derheqê derûniya Karê de, hûn dikarin binêrin: Îbrahîm Seydo Aydoğan, **Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî**, weş. Rûpel, İstanbul 2014, r. 223.

Cemal bi Karê re dizewice û ew jî zû diçe ser dilovaniya xwe. Di daweta Ûsiv û Karê de Badalyanê dîrektorê sêwîxaneyê axaftinekê dike û ji hemû gundiyan re dibêje ku şerê mezin belkî li eniyê ye, lê xebatên di nav civatê de jî muhîm e. Bi vî awayî em dibînin ku bi hişmendiyeke tund girêdayî xebatên xwe ne:

“Li vira jî şer e, min ê bigota şerê hê mezin û tu bi xebata xwe, bi şixulê xwe, bi nehêvşandina xwe didî kivşê, wekî şer tenê pêşê mêran nîne. Ev zarên em niha xweyî dikin û bê dê û bav mane, ji ruyê Almanya faşist e, ku îro dihedime. Serketina me nêzîk e û rojên bextewar û xweş hêviya me ne.” (r. 34)

Di vê pirtûkê de jî îdeolojiya Lenîn û partîzanî bi awayekî eşkere xwe dide der. Hertim danberhevekê heye di navbera rabirdû û dahatûyê de. Derfetên ku hatine bidestxistin bi awayekî minetdar ji devê lehengan tê bihîstin: “Salên dirêj derbas dibin. Gundê Mêrgesorê hatiye guhastinê. Hukumatê û daîrên curbicure mal û xaniyên nû çêkirine. Hemû tişt bi tevayî hatine guhastinê, cahilên gund pir bûne, dixwînin, bi jiyaneka nû dijîn û dixebitin.” (r.41)

Şerê li hember burjûva û faşîzmê bi reşkirina Hîtlerê di romanê de gelek caran derbas dibe: “Belkî kilîta reş bi devê Hîtler bikeve, di rûyê vî şerî da ev xelqa hemû çawa dizêre!” (r.21)

“Hîtlerê merivxur nehîşt em bi mirazê xwe şa bibin. “ (r. 7)

“Mala Hîtler wêran bibe, çawa warê me sar kir, mirazê cahilan di çavan da hîşt...” (r. 17)

Piştî mirina Ûsiv jî, Karê tena serê xwe dimîne lê dîsa sebra xwe bi Saşa tîne. Saşa yanê Aleksandr, bi navê xwe yê kurdî Îskender li ba Karê mezin dibe. Bi dû re haja wî jê çêdibe ku ew ne kurê Karê ye, lê hezkirina wî ya Karê kêmbê. Piştî 19 salan diya Saşayê ya ûris tê gund ku kurê xwe bibîne. Li vir tê dîtin ku nivîskar bi armanceke nêzîkkirinê tevdigere û dide zanîn ku Evdokiya derheqê Kurdan de gelek tişt hîn bûye û ji bo vê yekê jî kêfxweş e:

“Karê, hingê ku ez bi te ra bûme nas, bi pirs-pirsyara, ji kitêb û rojnaman gelek tiştî derheqê milletê we da pê hesşyam. Ew milletekî rojhilatê ye here kevn e ku niha bi mîrxasî şer dike ji bo azayî û serbestiya xwe. Min di kitêbên xwe cure bi cure da rabûn-

rûnitandina xelqê Kurd xwend û ez gelekî kêfxweş im, wekî jinên wî milletî di nav temamiya rojhilatê da yê here aza û mêranî ne û Saşayê min ber destê jineka usa mezin û terbiye dibe.” (r.51)

Li pey van gotinan Evdokiya serboriya xwe ya şerî vedibêje û xebereke ecêb jî dide wan ku “Cemalê wê û bavê Saşa di cîkî da şer kirine, li cîkî hatine kuştinê, di gorekê da hatine definkirinê...” (r. 52). Miletên din jî gava vê yekê dibihîsin şaş dimînin û baweriya xwe bi qederê tînin: “Gelî cimaetê, bi ocaxa Sorê Soran bikim, qedera van cahilan ji qudretê ye... We bi guhên xwe bihîst ji ku ji kê derê qedera wan her du malan hatiye bi hev aliye...” (r. 82). Ev qedera ecêb wan nêzîktir dike û Saşa bi jina xwe re ji bo demeke kurt diçe Ûkraynayê li ser gora her du bavê xwe.

Di vê romanê de xaleke girîng a ku derdikeve pêş ew e ku dînê Saşa dibe mesele. Saşa yanê bi navê xwe yê kurmancî Îskender (Îsko) ji keça Efo hez dike ku ew jî êzdî ne. Dê û bavê Sîsê vê meseleyê mezin dikin û qebûl nakin ku keça wan bi Îsko re bizewice. Gundî dixwazin ku wan qaneh bikin ku Îsko bi edet û baweriya kurdan mezin bûye û tînin bîra wan ku ûris çiqas miletekî baş in: “Hema em milletê Ûris hildin pêş çavan, axir ev miletekî dinyayê yî here birehm û qenc e, Xudênas! Qedera wî xortî jî rûyê vî şerî, awha li hev hatiye.” (r. 60). Li vir nivîskar dîsa bi zimanekî rexneyî bîr û baweriyên kevin tîne rojevê: “Ev edetên me, Xudê kambax bike, hebekî xuşûşiyê dike dilê me, niha çi qusûra Îskender heye?” (r. 65). Dîsa ciwanên kurd ên xwenda êdî qebûl nakin ku bi edetên kevin tev bigerin û jiyana xwe bi vî awayî bixin tengasiyê: “... lê bo wê yekê ku merî usa bûne qûl-bendeyê edetan.” (r. 68). Sîsêya destgirtiya Îsko jî keçeke xwenda ye û ji edetên xwe aciz e, lê naxwaze ku dilê dê û bavê xwe jî bihêle:

“Wan bi qîza xwe bawer dikir, lê di dawiyê da usa didane xuyanê ku qîza wan Kurmanc e, gere qedir û qîmetê edetê xwe yê miletiyê bigre. Sîsê ku awha bi aqilanî şîrove dikir û dixwest edetên miletiyê goreyî jiyana nû û vê dewra nû bike, zanîbû ku tenê bi vî tehrî dikare dê û bavê xwe bide bawerkirinê, usa nebe, nabe.” (r. 69)

Sîsê bi diya xwe re diaxive û jê re behsa edetên kurdan ên qenc dike û tîne zimên ku ev yek di nava milletên din de tune ne:

“Rojê eydê gundî hemû diçine malên hev, eyda hev pîroz dikin. Yên ku bi hev ra ne xweş bin jî wê rojê li hev du tîn... Paşê, waxtê ku yek dimre, gund hemû şînê dikin, hewariyê mala mirî dibine mala xwe, wextê dawetan jî gund gişk şadibe, mêvanan di nav hev da belav dikin.” (r. 70)

Lê dîsa meseleyê tîne ser edetên xirab û dibêje ku: “Heyf, dayê can, li rex tiştên ha yê rind, yê xirab jî hene. Behsa xeberê, qelendê qîzan. Ew tiştêkî sosretî ye, dê û bavê qîzê û xort rûdinin, bazarê dikin, qey bêjî dewar yan jî tiştêkî din dikirin, difiroşin.” (r. 70)

Di van meseleyan de meqamê girîng Şêx Sefo ye. Eger ew bikeve nava meseleyê dibe ku malbata Sîsê razî bibin. Lê ew di serî de naxwaze bikeve nava meseleyê. Ji ber vê jî gundî jî xwe aciz dikin. Hinekê dibêjin ku Îsko bînin li ser baweriya xwe lê dîzanin ku “... di nav ilmê Şêx Adî da tiştên usa tunin, wekî ji miletekî din nînine ser dîne me...” (r. 79). Dîsa berê xwe didin Şêx Sefo, vê carê Şêx bi malbata Sîsê re diaxive, şîretan dike “giliyê Şêx Sefoyê axiriyê tesîreke mezin li ser Efo û kulfeta wî kiribû.” (r. 79) û ew jî rê dabûn ji bo zewacê. Ji ber vê yekê gundî dîsa xwe aciz dikin ka çima di serî de vê meseleyê çareser nake û mesele dirêj dibe: “Berê da gotine, wekî serkanî timê ji şêx pîra diherime. Kekê Sefo, nexeyîde. Eger şeva dinê tu bi me ra bihatayî, awqas tişt jî nedibû.” (r. 78). Girîngiya Şêx Sefo ji oldariya wî tê ku kurdên êzîdî rêzê li hember Şêxên xwe digirin û li ser wan sond dixwin: “Serê min qurbana ocaxa şêx be!” (r. 79)

Dîsa di romanê de gelek caran nivîskar bi devê lehengên xwe yê biyanî pesna kurdan dide. Evêlîna Rubênovna ku ew jî bi salan li sêwîxaneyê dixebite:

“ Ev deh salan in ez li vî gundî dixebitim. Bawer bikin îdî ez bûme yeka ji vir. Hûn gişt min rind nas dikin. Di serî da, li vî gundî ez xeyset, rabûn, rûniştin, edet bi miletekî rojhilatî yî kevm û dewlemend va bûme nas. Edetên we yî miletiyê û kultura bilind haye û ya sereke, fikra demokrasiyê kûr û mezin e li nav we.” (r. 81)

Di romanê de çend xalên girîng jî derdikevin holê ku êdî serdema Sovyetê ye, millet hemû li kolxozan dixebitin. Kedxwarin an jî îstismara kedan êdî qet tune û ev yek jî pirtûkê de qet cih negirtiye. Di nava sîstema kolxozan de herkes wekî hev e, serdestiya çînî tune û millet bi eşqêkî xebata xwe dike. Nivîskar bi nêrîneke gelparêz vê romanê

nivîsandiye û dîrok jî tenê bi çend nimûneyan xwe nîşan dide; lê dîsa jî em ji dîrokê haydar dibin ka çî qewimiye û çî bandor li ser miletî kiriye.

3.4. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romanên Eliyê Evdilrehman de

3.4.1. Gundê Mêrxasan

Romana Eliyê Evdilrehman a bi navê *Gundê Mêrxasan*¹⁶³, cara ewil di 1968an de li Yêrêvanê, ji aliyê weşanxaneya Hayastan ve tê weşandin. Eliyê Evdilrehman bi xwe jî destnîşan dike ku ev romana wî ya pêşîn e û di 1959an de dest bi nivîsînê kiriye û di 1965an de tamam kiriye.¹⁶⁴ Dîsa şeweya xwe ya nivîsînê jî êşkere dike ku wî “îsbatên tarîxî yên qewmî” berhev kiriye û li ser wan hîman vê romanê nivîsiye.

Gundê Mêrxasan bi çîroka her sê êlên kurdên Romê dest pê dike. Wê demê li welatê Romê “zilma zevtçîyan” nahêle ku tu kes jiyanekê aram derbas bike. Êlên Banokan, Hêcimkan û Qirmiskan di salên 1920î de ji ber van zilm û tehdeyîyan direvin, diçin li cem eşîreta Şikakiyan. Li vir gelek namînin, ji ber ku halê vê eşîrê jî ne baş e. Giregirên her sê êlan biryar digirin ku ber bi Îranê ve biçin û li wir bi cih bibin. Bi xwestina giregiran, Çoloyê serkarê wan û çend rûspî diçin bajarê Xoyê, li cem Riza Efendî, jê daxwaza *qışleyên* wî dikin ku ev her sê êl li wir bi cih bibin. Riza Efendî bi xerc û bertîleke mezin biryara wan qebûl dike û ew tîni li wir bi cih dibin. Riza Efendî piştî deman hem bertîl û bacan zêde dike û hem jî nav tê dide ku serkarê bajarê Xoyê mêrên wan tîxe zindanê. Serkar jî ya wî dike û çend kesên ji êle dide girtin û diavêje zindanan. Riza Efendî dibîne ku serî pê nikare, diçe bi hîle û fêlan serkarê bajêr dide bawerkirin ku divê êla Çolo bê tarûmarkirin. Ji ber ku ew ne bacên xwe didin, ne jî Tehranê nas dikin. Riza Efendî ji Tehranê destvala venagere. Fermandarê leşkerê Tehranê hêzeke mezin dide wî ku ew êla Çolo “bîne ser qanûnan”.

Celoyê seyîsê Riza Efendî, di êrîşekî de ji camêriya Çolo heyirî dimîne, ji ber ku Çolo wan ji mirinê xilas dike û wan efû dike. Celoyê dibîne ku Riza Efendî hêja jî nasekine

¹⁶³Eliyê Evdilrehman, *Gundê Mêrxasan*, weş. Lîs, Amed, 2012.

¹⁶⁴Eliyê Evdilrehman, *hb*, r. 10

û dixwaze ku dawiya wan êlan bîne, kurê xwe dişîne û xeber dide wan ku Riza Efendî wê bi leşkerên Tehranê re êrîşî ser wan bike. Çolo gava ku pê dihese tedbîra xwe digirin û amadekariya şerî dibînin. Çolo û fedaiyên xort dê êla xwe biparêzin û hinekî jî jinan, zarokan, kal û pîran ber bi Çiyayê Girîdaxê ve bibin, ew jî paşê bigihîjine wan. Riza Efendî bi leşkeran ve êrîşî ser wan dike lê dibîne ku li gund tu kes nemaye. Paşê haja wan çêdibe ku êla Çolo tedbîra xwe girtiye û ber bi çiyayan ve vekişaye. Ev şer bi mehan didome û êla kurdan li ber xwe dide. Jinên kurd jî êdî çek hildigirin û tevî şerî dibin. Çolo dibîne ku şer wê dirêj bikişîne, hewara xwe digihîne êla Şikakiyan, Heyderan û Celaliyan. Gava ku şer girantir dibe, ji her sê êlên kurdan, bi hejmareke mezin fedaiyên tînan digihêjin êla Çolo. Şahtiya Îranê piştî şereke giran hêzên xwe vedikêşe û êla Çolo jî miriyên xwe bi edetên kurdan vedişêrin. Li gorî gotinan, sedema bipaşdevekişandina Îranê ji ber paleyên niftê û kurdên Mihabadê ne. Paleyên niftê yê Îranê li hember qanûnên Îranê şer dikin û kurdên Mihabadê jî ji bo azabûna xwe li hemberî Şahtiya Îranê ketine şerekî giran.

Piştî vî şerê giran, ji êlên kurdan bi sedan millet tînan ji bo serxweşiyê. Pey van ezimandinan êla Çolo bi giregirên xwe ve dicivin, li hev dişewirin û biryarakê digirin ku ew bi tenê li welatê Êrisêtê dikarin milletê xwe xwedî bikin. Dizanin ku welatê Êrisêtê welatekî baş e, padişahê wê qanûneke wisa daniye, kesek ji xatirê kesekî nakeve, mîna bira dijîn. Li wir “niha dest pê kirine xweliyê ji dewlemendan, ji axa û begleran distînin, didine gundiyan kesîb. Karxaneyan û fabriqeyan didine paleyan. Kêf kêfa gundî û paleyan e.” (r. 72). Ji bo vê yekê jî çend merivan heta Çemê Erezê dişînin ku rêyan hîn bibin û bibin rêberê êlê.

Piştî vegera kaşîfan, biryar didin ku derkevîne rê, ji ber ku nexweşên wan, birîndarên wan roj bi roj giran dibin. Payîzeke dereng êla Çolo, bi nexweş û birîndarên xwe ve ber bi Êrisêtê ve bi rê dikevin. Piştî rêwitiyeke dûr û zehmetî ji çemê Erez derbas dibin û digihêjin Şahtextê. Li vir hidûdvanên Êrisêtê bi dilekî xweş pêşwaziya wan dikin. Ji vir û pê ve em dikarin bibêjin ku jiyanekê nû û pê re jî pesna Dîwana Sovyetê û sîstema Partiyê dest pê dike. Vegêr hestên xwe eşkere tîne zimên ku, gava ku hidûdvanên Êrisêtê wan dibînin ji zimanê wan fam nakin lê bi hewldana xwe nîşan didin ku bi hatina wan kêfxweş in.

Li ser tixûbê, fermandarê hidûdvanan gazî Çolo û çend rûspiyan dike û xerhatina wan dide. Ev yek bi awayekî eşkere nêrina erênî ya derheqa Sovyet de nîşanî me dide:

“Cimaet, dewleta me timî îmdadê bide wê cimaetê û vî miletî, kijan ji bo azabûn û serbestiya miletiyê li miqabilî zilmkaran, kedxuran, miftexuran şer dike. Gelî birayên me yên Kurd, siyaseta dewleta me ji me wiha dixwaze û em borcdar in wê bi ziyarefî biqedînin, cimaeta zêrandî jî li ser seran û li ser çavan hatine welatê me!” (r.77)

Êla Çolo daxwaza gundê Sûsê yê nêzikî Nexçivanê dikin ji cîwarbûnê û ji aliyê Dîwanê ve jî tê pejirandin. Nexweş û brîndarên êlê bi alîkariya leşker û xebatkarên nexweşxaneyê dişînin Nexweşxaneya Nexçivanê. Mihacirên êla Çolo tên li Sûsê, bi alîkariya Dîwanê ji xwe re xaniyan çêdikin û li vir bi cih dibin. Di vê jiyana dûyem a bextewar de kolxozên xwe amade dikin, Dîwana Sovyetê ji bo zarokên wan dibistanan vedikin. Êla Çolo êdî li vir li Sovyetê bi bextewariyekê tevî xebatên kolxozê dibin. Zarokên xwe dişînin dibistanan ku hînî xwendinê bibin. Egît û fedaiyîyên ewil êdî li vir dibin *komsomol* û *fırqecîyên* nû. Pirtûkên Lenîn tên xwendin, di civatan de ji bo pêşvebirina gundê xwe xebatan dikin û li gorî daxwazên Partiyê û Dîwanê karên xwe yên kolxozê diqedînin. Îdeolojî û partîzanî ji bo wan her tişt e. Jiyan xwe li gorî şoreşgeriya xwe dijîn û li hemberî berjewendiya Partiyê çî hebe wan ji holê radikin. Şoreşgerên vê pirtûkê hertim tînin zimên ku ew *komsomolên* partiyê ne û komûnîst in. Ev dubarekirin di nava pirtûkê de gelek caran cih digire û xwendevanan dide bawerkirin ku lehengên wî yên baş hemû komûnîst in, şoreşgerê partiyê ne: “Em komûnîst in, xên ji kara cimaeta xebatkar û mehkembûna hikûmeta me, çavê me ne li tu tiştî ye.” (r. 139). Ev îdeolojiya xurt elbet lehengên erênî yên şoreşger jî li gel xwe daxilî romanê dike.

Wekî piraniya romanên kurdî yên Sovyeta berê, *Gundê Mêrxasan* jî ji bo danberhevekê, berhemeke nimûne ye. Di vê romanê de jî em dibînin ku axa û beg bi zilm û tehdeyiyên xwe cih digirin. Hertim gundiyan dizêrin, ked û xebata wan dişêlin. Ev têrê nake, dewletên serdest jî bi bac û xeracan, gundiyan dubare dizêrin. Em dikarin bi devê lehengan vê yekê bibihîzin ka wekî îmajê ke kedxwir dewlet çawa tê nimandin:

“Zevtçiyên Romê bûbûne Ruhstîn, ruh distand û kêrendûya jehrdadayî hildabû destê xwe, heyfa xwe li çûk û mezinan nedianî, mîna pincarê însan xeza dikir.” (r. 16).

Ev taybetiya romanên sosyalîst-realîst, di vê romanê de jî bi rêya lehengên xwe bi xwendevanan dide zanîn ku, çînên serdest ji kîjan milletê be bibe, zilmkar in, tehdeyî li milletê dikin, keda gundiyan û paleyan dixwin. Çi ji Romê be çi ji Îranê be, çînên serdest hertim gundiyan bêpere didin xebatê û di ser de jî bi xeracên mezin nahêlin ku gundiyan kesîb û belengaz nefesekê hildin. Yanê ew şayesandina reş û spî dîsa xwe dide der. Yek ji wan jî Riza Efendî ye. Riza Efendî kurdekî dewlemend e, li ser tixûba Îranê axatiya çend gundan dike. Fend û fêlên wî ewqas zêde ne ku, ji bo bac û xeraceke zêde li gel artêşa Îranê bi êlên kurdan re şer dike. “Riza Efendî bûbû gur û agir” û hertim diavêta li ser gundan ku baca xwe bista.

Çawa ku berê kedxwarin û îstîsmara axa û begên dewlemend û heta dewletên serdest hene, di vê jiyana nû de jî kulakên Sovyetê hene. Ev dewlemendên berê ne û ji kirinên Sovyetê aciz in, ji ber ku êdî li vir hiyerarşiyê çînî tune ye. Axatî û begtiya wan li Sovyetê bi gotineke din pere nake. Piştî şoreşê hinek ji wan wekî Heso Beg direvin diçin Îranê û carinan bi qaçaqçiyên re tînan kolxozan talan dikin. Hinek ji wan jî wekî Teyar Beg bi Daşnak û Musafatîstan re, êrişî komsomolên şoreşger dikin û wan dikujin. Heso Beg, cara dawî bi dizîka tê gundê xwe, dixwaze ku talaneke mezin pêk bîne û hemû komsomol û *firqeyên* şoreşger bikuje. Ji bo vê jî bi cerdeke giran ji Erezê derbas dibe û tê li Sûsê axayên berê jî li cem xwe bi keys dike û planeke mezin û giran çêdike. Jina Heso Beg tevî wî naçe Îranê, niha li kolxozê dixebite û xebatkareke baş e. Xezala keça wî jî bi xwendineke baş bûye komsomoleke hêja, karên jinan dimeşîne. Haja Xezal ji vê planê çêdibe û ew jî planeke din çêdike û bavê xwe dide bawerkirin ku ew ji bo bavê xwe tevî xebatên Partiyê bûye. Heso Beg ji keça xwe bawer dike û hemû hûrgiliyên plana xwe ji keça xwe re dibêje ku Xezal jî aliyê wî bike. Lê Xezal vê planê Qasimê sedrê kolxozê re û Çolo re dibêje. Bi vî awayî *firqeyê* kolxozê xwe ji talanake mezin xilas dikin. Li vir sekna Xezal tam li gorî dilê Partiyê ye. Lewra Partî dixwaze ku merivên îdealîst biafirîne. Xezal pêwendiyên xwe yê malbatî ne lê yê şoreşgerî berî her tiştî digire. Gava ku vê planê jî çêdike, bi baweriyeke xurt dixebite û tu caran nakeve dudiliyê. Ev yek jî dijî

şexsiyeta mirovahiye ye. Lê berê jî me gotibû ku, li gorî berhemên realîst- sosyalîst tenê reş û spî hene.

Li hember van lehengen neyînî (yên ji refa reş), elbet lehengen erênî yên şoreşger jî hene. Çoloyê Têmûr jî yek ji wan e. Çolo serkarê her sê êlan (Banokan, Hêcimkan û Qirmiskan) e. Emrê wî ne zêde ye lê ji aliyê zanîn û tecrûbeyê ve “hay ji bayê dinyayê” heye. Emrê xwe de gelek tehdeyî û zillm dîtiye, çend caran ji destê Romê ketiye zindanê û jê reviyê. Çolo hertim aliyê feqîr û belengazan dike. Di şerê navbera wan û Îranê de serkêşiya êla xwe dike. Hem serleşkerekî baş e û hem jî bi giregirên êla xwe re hertim dişewire. Ev Çoloyê ewil e; Çoloyê duduyan jî bi hatina Sovyet re, li gel van xesletên baş, taybetiyên nû jî qezenc dike. Çolo çawa ku berê serkarê êla xwe bû, li vir jî dibe şoreşgerekî Partiyê û li hember kedxwir û serdestan şer dike. Propagandaya Partiyê di nava gundê xwe de belav dike û bi komsomolên civan re, rêberiya kolxoza gundê xwe dike. Li vir tiştêkî balkêş e ku Çolo berê di dewsa serokeşîrekî de bû, lê niha wekî herkesî tevdigere û tu dudiliyên wî jî tune. Ji xwe nivîskar naxwaze analîzên karakterîstîk ava bike. Ev yek ji bo lehengekî îdeal ne hewce ye. Li ku başî û qencî hebe, lehengên me yên şoreşger li wir amade ne. “Em firqêçî mîna we (axa û began) ji rêya heqiyê derneketine, em terefdarên heqiyê û rastiye ne.” (r. 139).

Wekî Çolo, gelek lehengên şoreşger di vê romanê de cih digirin. Qasim kurê şoreşgerekî navdar e. Bavê wî Reşoyê Şamilê Kurdoxlî ye û “ji bo mehkemkirina qaydeyê Sovyetiyê, xweşjiyina cîmaetê” (r. 141) emrê xwe dide. Reşo endamê Firqeya Bolşevîkan e û bi mîrxasî li hember “dijminê sinifê” şer dike û tê kuştin. Qasim jî wekî bavê xwe, di refên Bolşevîkan de li hember çînên serdest şer dike. Qasim û Çolo bi hev re xebatên kolxozê bi rê ve dibin. Qasim gava ku xwendina xwe xilas dike, wekî civanên din naçe xwendina bilind, dixwaze ku ji bo miletê xwe û ji Partiyê bixebite. Demekê xwe ji Xezal dûr dixê, ji ber ku Xezal keça Heso Beg e. Le bi dû re ku bi partîzaniya Xezalê dihese, hezkirina xwe eyan dike.

Ji xeynî van Gogêya keça kurd jî di vê romanê de derdikeve pêş ku hezkiriya Evdilmecît e û Evdilmecît jî wekî gelek *firqeçiyekî* baş û Bolşevîkekî xurt e. Gogê

wêrekiya xwe di şerê ewil de nîşan dide, Riza Efendî bi kêrekî birîndar dike û tîne li ber êla xwe. Çolo û giregirên êlê hemû wê pîroz dikin û gotina bi nav û deng ji bo Gogê jî dinehwirînin: “Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e.” (r. 45).

Di vê romanê de jî bikaranîna folklorê bi heman helwestê dimeşe. Nivîskar hema hema hemû cureyên folklorîk di berhema xwe de bi cih dike û bi vî awayî jî dixwaze ku çanda devkî ya kurdan biparêze. Di realîzma sosyalîst û berhemên wê yên edebî de folklor ji bo xizmeta çanda Sovyetê tê bikaranîn lê ev yek di romanên Eliyê Evdilrehman de cih nagire. Ew folklorê bêtir ji bo nasandin û parastina çandekê bi kar tîne. Mijara dînê jî di vê pirtûkê de ji xwe re cih nedîtiye û nehatiye bikaranîn.

Nivîskarê vê romanê di pêşgotinê de diyar dike ku ev roman bi “îsbatên tarîxî yên qewmî” hatiye nivîsîn. Ev jî rêyekê li ber xwendevanan vedike ku Eliyê Evdilrehman piştî xwe spartiyê rastiyên dîrokî û çîroka êlên kurdan nivîsiye. Ew êlên ku koçî Sovyet kirine, bi dîroka xwe ya êş û azar bûne mêvanê romanê nivîskêr. Li gel vê aliyê dîrokîbûnê ve li aliyekî xwe yê gelparêz ve jî bala xwendevanan dikişe ku di romanê de, gelên bindest hertim bi vegotîneke dilsoz nêzikî hev bûne. Gava ku kurdên koçber nû tîne gundê Sûsê, azerî, qazax û ermenî li gel hev aliyê kurdan dikin û ji wan re avahiyên nû çêdikin. Nivîskar ji bo jiyaneke adilane û dadperwer hemû çînen serdest û berjewendiyên wan binpê dike û berjewendiyê gelan derdixe pêş.

3.4.2. Xatê Xanim

*Xatê Xanim*¹⁶⁵ romana Eliyê Evdilrehman a pêşîn e ku di sala 1958an de li Yêrêvanê çap dibe. Ev roman ku ji aliyê hin kesan ve wek novelê tê binavkirin, qala jineke kurd dike ku piştî mirina mêrê xweyê serokeşîr, ciyê wî digire û xwedî li eşîra xwe derdikeve. Eliyê Evdilrehman bi qasî ku di hevpeyvîn xwe û nivîsên xwe de diyar dike ku “çar sala di nava desta partîzana da li dijî almanên şerbaz berxedaye, tevî birayên xwe li

¹⁶⁵Eliyê Evdilrehman, *Xatê Xanim*, weş. Lîs, Amed, 2012.

dijî faşîstan cengajiyîn- mirinê daniye.”¹⁶⁶ Wekî gelek nivîskarên din, ev serborî rêyeke li ber wî vedike ku E. Evdilrehman berhemên xwe bi girêdayî sosyalîzmê dinivîse û bi xwe jî nivîskarekî realîst- sosyalîst e. Li hemberî van agahiyan nimûneyên li ber destê me nahêle ku em heman agahiyê li gorî *Xatê Xanim* jî bi kar bînin.

Ji bo vê romanê nivîskar di hevpeyvîneke xwe de, armanca xwe ya nivîsînê bi polîtîkayên tirkan yê li ser kurdan ve girê dide û dide zanîn ku hewla wî jî ji bo pûçkirina vê yekê ye. Bi vî awayî dixwaze ku li hember vê rewşê bisekine û derheqa berhema xwe de jî van agahiyan dide:

“Aha hema mêrxasê vê pirtûka min jina kurd a mêrxas e. Dema mêrê wê dimire, ew serkariyê li êla xwe dike, bona azadî û serbestiyê li Dêrsimê li dijî zevtkaran...”¹⁶⁷ şer dike. Li gel van agahiyan, şopên realîzma sosyalîst di vê romanê de çiqasî rastî me tê? Bersiva vê pirsê di nava rûpelên pirtûkê de û di binhişê nivîskêr de cih digire ku em ê bidin li pey van şopan.

Roman bi beşa “Jina Kurd” dest pê dike û derheqa *Xatê Xanima Dêrsimî* de agahiyan dide xwendevanan. Di destpêka romanê de şayesandina derdorê qezaya Dêrsimê dibe elameta bûyerên dahatûyê:

“Tu yê bibêjî tebiyetê qestana li dora wê qezayê hesarên çiya yê bi hev ve girêdayî xuliqandine... Tê bibêjî tebiyetê qestana ew zincîr qetandiyê û bi tenê li çend çiyên îmkânê dide rêwiyan, ku ji qezayeke mayîn bêne wê qezayê. Aha seba wê yekê jî Kurd jê re dibêjin, Dergehê Kurdistanê, yanê jî Dergehê Zîn.” (r. 10).

Ev çiyayên asê ku rê nade tu kesî dibe sedema xilasbûna eşîreke kurd ji destê dewleta Romê. Temûrê Eliyê Îsa, li li gundê Sincanê serokê eşîra xwe ye û ji aliyê kurdan ve jî tê hezkirin. Li vir derheqê Têmûrê Elî de nivîskar bi mudaxeleyeke sosyalîst, dide zanîn ku ew “ji aliyê hebûnê de kesîb nîn bû, lê dewletî jî nîn bû. Xwedanê keda xwe bû.” (r. 12). Li vir çima peyva mudaxeleyê hat bikaranîn? Lewra em dizanin ku di hemû berhemên realîst- sosyalîst ên Sovyetê de (mebesta me elbet romanên kurdî ne), axa û begên dewlemend kesên xirab in, kedxwir in, li dijî sosyalîzmê ne û gelek caran jî xayîn in. Li vir ev mudaxelaya biçûk bi me dide zanîn ku Têmûrê Elî yê axa û serokeşîr kesekî

¹⁶⁶ Hevpeyvîna Temûrê Xelîl bi E. Evdilrehman re dnd. **Antolojiya Edebiyata Kurdî**, Mehmet Uzun (Amd.), Weş.Aram, İstanbul, 2003, r.304

¹⁶⁷ Temûrê Xelîl, **hb**, r.303.

xwînmij nîn e. Wekî lehengên erênî yên Sovyetê bi xemleke xweş tê şayesandin ku xwendevan tam pê qayîl dibe ku ew yekî nedîtiye. Dewleta Romê ji Têmûr hez nake; hertim dixwaze ku wî ji kurdan biqetîne, sirgûn bike yan jî bikujîne ku bikaribe “Kurdên Dêrsimê bîne ser qanûnê û di wextê de xerc û xeracên xwe ji cimaetê berhev bike.” (r. 13).

Têmûr hertim şîret li kurê xwe yê Sultan re dike, gava ku mezin bibe mîna kal û bavên xwe xwîna xwe bide ji bo “serbestiya Kurdistan.” Têmûr li ber sekeratê jî temiyên dide kurê xwe ku “bo miyaserkirina her wesiyetekê min şêwrê ji diya xwe hilde.” (r. 16). Piştî Têmûr, Dewleta Romê dixwaze ku tifaqa kurdan sist bike, xerc û xeracên zêde bike. Êlên kurdan vê yekê qebûl nakin û li cem Xatê Xanim û kurê wî yê Sultan dişêwirin ka bi çi awayî ji vê rewşê xilas bibin. Di dawiyê de biryar didin ku Sultan û çend siwar biçin li cem milazimê Dewleta Romê û vê nerazîbûnê bidin zanîn. Sultan û hevalên xwe gava ku digihêjin bajêr, Sultan diçe li cem milazimê Îskender û rewşa gelê xwe vedibêje ku millet ji ber zivistana derbasbûyî di halekî dijwar de ne, “sefil û stûxwar li ber dîwaran rûniştî ne”. Bi vî awayî dixwaze ku xerc û xeracên gundiyan sivik bike. Milazim ji van gotinan aciz dibe û piştî gelek gengeşî û bûyeran Sultan milazim dakuje. Ji vir pê ve jineke kurd di tevna romanê de, bi temsîla xwe ya erênî, bi rabûn rûniştina xwe, bi rêvebirina êlekê dê cih bigire. Di tevahiya romanê de ev temsîla jina kurd dibe mijara sereke ku Xatê Xanim bi çi awayî êla xwe re serokeşîrî dike, bi rêyeke aqilmend û bi ferasetê mezin hem kurê xwe yê Sultan ji destê Romê xilas dike û rê nade ku şerekî mezin derkeve.

Belê di vê berhemê de ew îdeolojî û partizaniya realîzma sosyalîst tune. Lehengên şoreşger di vê romanê de ciyê xwe didin lehengên mêrxas ku ji bo gelê xwe dikarin xwe biavêjin destê mirinê. Temsîla jina kurd jî herçiqas derkeve pêş jî, nivîskar ji aliyê mêrxasî û lehengiyê ve her tim jinan dişibîne mêran. Xislet û xûyên mêran li jinan bar dike. Jin di şeran de wekî mêran şer dikin, wekî wan li ber xwe didin. “Canîm dilê vê jinîkê kevir e. Ev du roj in kurê wê û lawîk nehatine, xwe wisa xweyî dike, çawa mêr xwe di nava şeran de xweyî dike.” (r. 26). Dîsa Zeynebê jina Sultan, gava ku biryara şerê derdikeve ji bo piştgiriya Xatê Xanimê li hember bavê xwe disekine û wêrekiya xwe wiha şîrove dike ku “... ez ne jin im, ez mêr im, li piştê wê sekinîme.” (r. 62).

Eliyê Evdilrehman, wekî piraniya berhemên xwe *Xatê Xanim* de jî giringî dide tifaqa kurdan û bi îdealîzekirinê hertim kurdan di nav yekîtiyê de nîşan dide. Xatê Xanim dizane ku kengî gazî êlên kurdan bike dê ew bigihêjin hewara wê: “Wexta ku kêr ghişte hestî, ez bi guman im ku ez li Kurdistanê têkime hewar, gişk jî wê rabin û di nava çend seetan de Ezirganê hildine destê xwe û Sultên ji kelê bidin azakirin.” (r. 46).

Di dawiyê de ji bo amadekariya şerekî mezin temamiya kurdên Dêrsimê û êlên din, dora Ezirganê digirin. Padişahê Romê naxwaze ku seba qeymaqamekî “koka eskerên xwe bîne” û ji aliyê xerc û xeracê ve zîyanê bide dewletê. Lewra têl dişînin Dêrsimê û Sultên efu dikin, bi vî awayî şer çênabe. Herkes pesna mêrxasiya kurdan pîroz dike û ji hev re dibêje ku “Eferim, ji Xatê Xanimê re! Eferim ji tifaqa kurdan re!” (r. 75).

Hewce ye bê gotin ku nivîskar di vê berhemê de qala netewperwerî û nasnameya kurdan jî kiriye. Bûyerên romanê bi nerazîbûna zêdekirina bac û xeracên dest pê dike lê bi dû re diqulube li ser şerê du neteweyan. Dewleta Romê dixwaze ku serê kurdan bitewîne û kurd jî dixwazin ku tifaqa xwe û nerazîbûna xwe nîşanî wan bidin. Li vir em dikarin bibêjin ku ev yek bi daxwaz û hesreta nivîskarê romanê ve girêdayî ye. Lewra em dizanin ku E. Evdilrehman gelek caran di hevpeyvînên xwe de eşkere dike ku ew li hember îdiaya li ser tunebûna nasname, ziman û hebûna kurdan dinivîse.¹⁶⁸ Bi van daxwazan jî, di nava vê romanê de kurdan wekî biserketî û Dewleta Romê jî wekî têkçûyî nimandiye.

Bi xwendineke realîst- sosyalîst ev berhem daneyên vê rêbazê nade destê me lê em dikarin bibêjin ku nivîskar dîsa bi vê hewldanê lehengên şoreşger afirandiye û bi nîşaneyên neteweyî dil kiriye ku tifaqa kurdan û encamên wê yên serkeftî raxe li ber çavan.

3.4.3. Şer Li Çiya

¹⁶⁸ Temûrê Xelîl, **hb**, r.303

Romana Evdilrehmana *Şer Li Çiya*¹⁶⁹ ku di sala 1989î de li Êrîwanê tê çapkirin, mijara xwe ji Serhildana Agiriyê digire. Wekî tê zanîn ku Serhildana Agiriyê di sala 1927an de bi rêvebirîya rêxistina Xoybûnê dest pê dike. Pêşengiya serhildanê Îhsan Nûrî Paşa, Biroyê Heskî Têllî û Ferzende Beg dikin. Gelek serokeşîr, siyasetmedar û rewşenbîrên kurd jî tevî vê serhildanê dibin.¹⁷⁰ Piştî têkçûyîna serhildanê, gelek ji serhildêran tîndarî û eşîrên kurdan jî tîndarî kirin.

Şêx Zayir yek ji lehengên vê serhildanê ye Şêx Zayir di sala 1896an de tê dinyayê¹⁷¹, di salên 1920î de jî ber zextên dewletê dijberî wan dibe û tevî refên serhildanê dibe. Bi demê re di nava gel de tê naskirin, li ser wî kilam tîndarî û dibe pêşengekî efsaneyî. Di vê romanê de jî jiyan û serpêhatiyên wî yê Serhildana Agiriyê tê vegotin. Rola wî ya di serhildanê de, şexsiyet û kurdperweriya wî bi zîmanekî îdealîst tê nexşandin. Şêx Zayir jî xeynî vê romanê, di bîranînên Îhsan Nûrî Paşa¹⁷² de û di pirtûka Mustafa Balbal¹⁷³ de û di bîranînên efserekî tirk¹⁷⁴ de jî derbas dibe.

Gava ku em bêne li ser vê berhemê, roman bi prologekî dest pê dike û xeber dide xwendevanan ku dîsa çiyayên Kurdistanê dê lehengên xwe biparêze û bibe piştevanên wan. Dîsa komkujiya Ermenîyan tîndarî bîra xwendevanan û dixwaze bide zanîn ku “Çawa ku ji xwîna Ermenîyan tîndarî bûn, îcar vegeyîyan ser birayên wan ên Kurd.” (r. 19). Nivîskar li ser netewebûnê û yekitiyê radiweste, Serhildana 1925 an a Şêx Seîd jî bi bîr dixê ku “kurdên mêrxas” jî bo azadiya xwe li hemberî dagirkeran şer dikin û jî ber îxaneta “kurdîroşan” tîndarî dîçin. Ji dîrokê heta bi Şêx Zayir behsa lehengên azadîxwaz dike û dide zanîn ku yekbûna êl û eşîretên kurdan jî bo serkeftinê hêzeke tekaneye.

¹⁶⁹ Eliyê Evdilrehman, *Şer Li Çiya*, Hejarê Şamîl (Trans.), weş. Pêrî, İstanbul 2011.

¹⁷⁰ Derbarê Serhildana Agirî de hûn dikarin ji, Rohat Alakom, *Xoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması*, weş. Avesta, İstanbul 2011 û Îhsan Nûrî Paşa, *Ağrı Dağı İsyanı*, weş. Med, İstanbul 1992 istifade bikin.

¹⁷¹ Rohat Alakom, *hb*, r. 150.

¹⁷² Îhsan Nûrî Paşa, *hb*, r. 74

¹⁷³ Mustafa Balbal, *Ararattaki Esir Generalden Kan Çiçekleri*, weş. Doz, İstanbul 2002, r. 130.

¹⁷⁴ Rohat Alakom, *Bir Türk Subayının Ağrı İsyanı Anıları*, weş. Avesta, İstanbul 2011, r.33.

Şêx Zayir ji eşîreta Qadiriyan e ku ew “ji bona nav û namûs û fireqatîya neteweya xwe, bi Tirk, Erebb û Farisên dagirker re şer kirine.” (r.35). Niha serkarê eşîreta Qadiriyan Şêx Emerê bavê Şêx Zayir e. Şêx Emer, hem serkarê eşîra xwe ye û hem jî li hember dewletê gelê xwe yê belengaz diparêze. Axa, beg û leşkerên dewletê kengî zilmî li wan bikin, Şêx Emer li wan xwedî derdikeve. Ji xeynê Şêx Zayir çar kurên wî hene: Şêx Êsiv, Şêx Evdilrehman, Şêx Tahir û Şêx Hebib.

Şêx Zayir li vir wekî xortekî xwendekar derdikeve hemberî xwendevanan. Şêx Emer dixwaze kurekî xwe bişîne Wanê medreseyê, ji ber ku derfeta wî tune ku her du kurên xwe bi hev re bişîne. Êsiv û Zayir li hev tîne û biryar didin ku Zayir êdî baş dixwîne, bila ew biçê. Şêx Emer bi bertîleke mezin kurê xwe li medreseya Wanê dide qebûlkin. Li wir dibînin ku Edoyê Hesên Axa jî keça xwe tîne wê medreseyê. Edoyê Hesên yekî “kurdîroş”e û bi dewletê re dişixule; ecêban tîne serê mîletê xwe, bi sedan kesan dane kuştin û girtin, bi hezaran malên kurdan sirgûnî Îzmîrê kirine. Şêx Zayir li wir bi xortaniya xwe teqet nake, dixwaze wî bikuje lê bavê wî nahêle û şîretan dike ku lez neke, niha tenê xwendin lazim e.

Şêx Zayir li medreseyê ji hemû xwendekaran baştir dixwîne û ev yek jî ji serok û seydayên medreseyê aciz dike. Di vê navberê de jî Şêx Zayir hertim çavê xwe li Edoyê Hesên Axa digêrîne ku wî li ciyekî bitêlîne. Lê tiştêkî balkêş çêdibe ku Simbîla keça Edoyê Hesên nameyekê ji Şêx Zayir re dişîne. Simbil dixwaze Şêx Zayir bide bawerkin ku ew ne wekî bavê xwe yekê “kurdîroş”e lê “keça neteweya xwe ye” (r. 63). Di vê nameyê de ne daxwazeke evîndariyê ne jî alîkariyekê heye. Tenê bi wî dide zanîn ku ew jî ji mîletê xwe hez dike û wekî bavê xwe nafikire. Li vir û tevahiya romanê de em tê dernaxin ka çî serpêhatiya Simbilê çêbûye ku ew bi fikr û ramanên neteweyî hizran dike, bi coşeke şoreşger tevdiqere û heta li hemberî bavê xwe disekine. Ev name Şêx Zayir dixê gumanê ji ber ku ew baweriya xwe bi keça wî nayîne; dibe ku ew jî wekî bavê xwe mîletê xwe dixapîne. Lê paşê bi tevgerên wê bawer dike ku ew jî keçeke neteweperwer e û dixwaze aliyê mîletê xwe bike.

Şêx Zayir hem li medreseyê dixwîne û hem jî bi dizîka ji bo neteweya xwe dixebite ku kes ji wî şikê nebe. Kesên ji Şêx Zayir hez nakin, giliyê dersdaran û serkarê bajêr dikin ku “têkiliya wî bi kurdên şerkar ên çiyayê Girîdaxê re heye.” (r. 69). Bi gotineke din ew ji bo wan şervanan dixebite û xeberên Dîwana tirkan ji wan re dibe. Şêx Zayir naxwaze zûzûka xwe eşkere bike, wan dide bawerkerin ku tu têkiliya wî bi wan re tune. Lê di rastiye de, Şêx Zayir û çend hevalên wî yên welatperwer “desteya tolhildanê” saz dikin, ji gundan xortên neteweperwer û şoreşger di vê desteyê de perwerde dikin û li hember dagirkeran bi dizîka şer dikin. Simbil ji derdorê bavê xwe agahiyan digire û xeber dişîne desteya Şêx Zayir, ew jî bi vî awayî tola xwe ji dagirkeran distînin, “cendirmeyan dikujînin, girtî û sirgûnan azad dikin.” (r. 104)

Di vê romanê de jî lehengên baş û xirab wekî reş û spiyê ji hev cûda dibin. Edoyê Hesên û Îsa Begê Qotî jî ji refên reş in û hertim ji bo neteweya xwe xirabiyên dikin. Bi destê Dîwana tirkan zilm û zorî didin gelê xwe û wan dizêrin. Bi sedan kesan dişînin girtîgehan, malbatên neteweperwer sirgûnî bajarên dûr dikin. Elbet ji bo vî qasî xelata xwe jî werdigirin. Waliyê Diyarbekirê gazî wan dike û ji xebatên wan pesna wan dide, wan pîroz dike û nîşana “Paşatî”yê dide wan. Ji vir pê ve ew û serokeşîrên “kurdîroş” ji bo xezeba neteweperweran dixebitin. Mal û warên wan talan dikin ku wan desteyên tolhildanan desteser bikin. Lê di vê navberê de desteyên tolhildanê hejmara şervanên xwe roj bi roj zêde dikin û zora dewletê dibin. Elbet dewlet jî li hember van bûyeran zêdetir êrişî xelkê dikin, kal û pîran dikujin, gundan talan dikin û dawîya bêqanûniya xwe nayînin. Şêx Zayir dibîne ku êdî mayîna wî ya li Wanê ji bo wî xetere ye, bi şev û rojan wî dişopînin, li pey wî digerin. Şêx Zayir ji wir pê ve xwendîna xwe ya medreseyê betal dike û diçe digihe desteyên xwe yên tolhildanê. Êdî roj bi roj navê wî û yên hevalên wî li Kurdistanê belav dibe û bi pêşengiya wî li gelek ciyan hişmendiyeke neteweperwer rû dide. Di sala 1927an de, Şêx Zayir tevî serhildanê dibe, pêşengiya milletê xwe dike. Heta dawiyê jî bi dilekî şoreşger, bi hişmendiyeke neteweperwer têdikoşe. Di vê serhildanê de ew bi Nûrî Ehsanî (Îhsan Nûrî Paşa) û Birahîm Axa (Biroyê Heskî Têlî) re femandariya keç û xortên şervan dikin, serhildanê bi rê ve dibin û heta dawiyê jî bi ser dikevin. Lê dewlet bi balafirên şerî êrişî ser wan dikin û li Zaga Bizinê zora wan dibin û ew dîl digirin û bi îdamê ceza dikin. Roja dardakirinê Şêx Zayir li hember gelê xwe axaftineke

dîrokî dike û bi van gotinan jî dawî lê tîne: “Gelî xwîşk û birayan! Bila bijî neteweya Kurd a mêrxas! Serxwebûn ji Kurdistana me ya ezîz re!... Bila Kurdistan bibe meskenê azadîyê, serbestîyê, biratîyê û kenên zarokan!” (r. 346).

Li pey van gotinan gelê berhevbûyî û desteyên kurdan ên siwarî û sîlehkirî gule bi serê leşkerên Dîwanê de direşînin, Şêx Zayir û hevalên wî di wê navberê de winda dibin û heta niha jî kes nizane ka bi ku de çûne, lê yê ku tê zanîn mêrxasî û lehengiya wan e.

Ji xeynî Şêx Zayir, em dikarin bibêjin ku Simbila keça Edoyê Hesên jî bi wêrekî û feraseta xwe hêjayî pesinandinê ye. Wekî berê jî hatibû gotin ku Simbil wekî bavê xwe “kurdîroş” û “xwefîroş” nîn e. Ew jî li medresaya Şêx Zayir de dixwîne û haja wê ji fikr û ramanên neteweyî heye. Bi nameyên xwe Şêx Zayir dide bawerkerin ku ew jî di rêya azadîyê de dixwaze bi wan re be. Gotin û agahiyên ku ji bavê xwe seh dike, dişîne Şêx Zayir û ew jî bi desteyên xwe yê tolhildanê wan planan xirab dike. Di dawiyê de gava ku şer geş dibe, Şêx Zayir rojekê bi hevalên xwe re diavêje li ser medreseyê û Simbilê direvîne. Simbil jî êdî wekî jinên din tevî refên şerî dibe û li hember “dagirkeriyê” ji bo neteweya xwe şer dike. Di romanên Eliyê Evdilerehman de lehengên wekî Simbil gelek in ku li hember bavê xwe neteweya xwe diparêzin û xwedî lê derdikevin.

Di vê romana dîrokî de em zêde rastî nîşaneyên realîzma sosyalîst nayên lê tiştêkî balkêş heye ku di tevahiya romanê de, li gel daxwaza netewebûn û yekitiya kurdan, hin gotinên lehengan bêtir ên Şêx Zayir bala me dikêşe. Lewra tê zanîn ku Serhildana Agiriyê bi hişmendiyê neteweperwer li hember dagirkerên kurdan pêk hatiye û tevahiya romanê de jî ev yek tê parastin. Lê hin ciyan, nivîskar nikare xwe ji aliyekî xwe yê realîst-sosyalîst dûr bixe û bi mafên kurdan ên neteweyî re, behsa parastina mafên kedkarên tirkan jî dike. Ev çiqas bi rastiya serhildanê re têkildar e? Elbet ev yek ciyê nîqaşê ye. Heta di romanê de Tewfîq Begê ku di serhildana Şêx Seîd de cih digire, wexta dardakirinê de wiha dibêje:

“ Cenazeyê min nîşanî neteweya Kurd û Tirkên kedkar bikin, bila herkes bizanibe wekî min ne bona azadîya nefsa canê xwe û wezîfeyê, lê ji bona azadî û bextewarîya neteweya xwe, kedkarên Tirkan û neteweyên mayîn şer kirîye û îro jiyana xwe didim! Bila bijî Kurdistan û serbestîya neteweyan.” (r. 27).

Li vir pirseke viha xwendevanan mijûl dike ka gelo heqeten ewqasî kurd ji bo daxwazên neteweya xwe serî hildan, şer kirin û hatin kuştin; yane ji bo bextewariya kedkarên tirkan û neteweyên mayîn. Divê bê gotin ku li gorî agahiyên dîrokî, serhildanên Şêx Seîd û Agiriyê bi daxwazên sosyalîzmê pêk nehatine. Ev yek dibe ku bi nêrînên şexsî yên nivîskêr ve girêdayî be. Lewra di romanê de, ev yek defaten bi gotinên wekî “tirkên resen û kedkar”, “zarokên me kurdan û zarokên kedkarên tirkan” tê nîşandan. Gava ku li hember dijminê taybetiya kurdan tê vegotin, herwiha kedkarên tirkan jî nayên jibîrkirin: “Neteweya Kurd û Tirkên kedkar tu wextan xweyîkirê xwe, mêrxasê xwe nedikuştin.” (r. 135). Nivîskar bi nêrîneke sosyalîst tirkên kedkar jî wekî kurdan dihesibîne. Heta, Simbil di nameyekê xwe de, derheqê bavê xwe de ji Şêx Zayir re dibêje ku ew “ne ku tenê dijminê neteweya xwe ye, lê wisa jî miqabilî Tirkên kedkar e...” (r. 77). Tê dît ku ev nimûneyên ha derheqê sosyalîstiya nivîskarê de daneyan dide destê me ku ew bi hewldanekî, naxwaze ku çînen bindest ji bîr bike. Lê di romaneke wiha dîrokî û bi lehengên neteweperwer re tijî de em nikarin zêde behsa çînen civakî û bindestiya wan bikin. Ji ber ku li vir armanca sereke netewebûn, yekîti, azadî û serbestiya kurdan û vegotina wan e.

3.5. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Heciyê Cindî de

3.5.1. Hewarî

Yek ji romanên kurdî ya Sovyeta berê, yê ku qonaxeke dîrokî dike mijara xwe ya sereke jî *Hewariya*¹⁷⁵ Heciyê Cindî ye. Ev roman jî wekî yên din pesna sosyalîzmê dide û minetdariya xwe ya ji bo Lenîn û Sovyetê jî ji bîr nake. Heciyê Cindî di 1967an de vê romana xwe ya dîrokî-folklorîk diweşîne. *Hewarî*, ji du paran pêk tê û li ser jiyana kurdên êzidî radiweste û ji vegotina wê jî diyar dibe ku aliyeke wê ya didaktîk jî heye. Roman, di van du beşan de, em dikarin bibêjin ku bi awayekî kronolojîk behsa du sed salan dike.

¹⁷⁵Heciyê Cindî, *Hewarî*, weş. Lîs, Amed, 2008.^[1]

Di beşa ewil de, vegêrê ku xwe eyan dike ku ew nivîskarê romanê bi xwe ye lê navê Kamilê Xelîl bi kar tîne, bi *flashback*ê dest bi romana dike û behsa xwe û ya Nûrêya xwîşka Fêrîk Egîd Polatbekovî tîne zimên. Cinarê vegêr Profesor Êrêmyan, wekî em pê dihesin ku yekî ermenî ye, ji Kamil dipirse bê ka ew yekî bi navê Fyodor Lîtkîn, bi navê xwe yê kurdî jî Fêrîk Egîd Polatbekov nas dike yan na. Fêrîk, paşê em ê bizanin ku şoreşgerê mezî e û li Sovyetê, ji bo “pale û gundiyan”, ji bo azabûna welatê xwe şer kiriye. Xwîşka wî Nûrê jî yekê xwenda û zana ye, li Yêrêvanê dimîne. Bi gotina Profesor Êrêmyan, ji Moskovayê komûnîstekî kevin Ryabîkov nameyekê dişîne û pîrsa gundê Dîgorê û Fêrîkê Egîd dike, ji ber ku dixwaze derheqê wî de pirtûkekê binivîse. Kamil jî bi kelecaneke, dibêje qey Fêrîk hêja sax e, baz dide mizgîniya xwe ji Nûrê dixwaze û her du bi hev re diçin mala Babayanê cabdar. Li wir Babayan xebera reş a Fêrîk Polatbekov dide ku ew “bi mêrxasî şer kiriye li pêşiya Bêlogvardêysan, dijminên Hukimeta Sovêtiyê û bi mêrxasî şehîd bûye.” (r. 30). Nûrê berê ji hişê xwe diçe lê gava ku bi xwe dihesê, dilmînî dide ber dilê xwe û ji wan re dibêje ku “... îro birayê min, wekî ji bo azadiya welatê me, ji bo rêspûblîka me Ermenîstanê, cimaeta me Sovêtiyê, Rêvolyûsiya Oktyabrê şer kiriye û bi mêrxasî hatiye kuştin, tu bizanibe kuştî nîn e, sax e... Ew êdî birayê min bi tenê nîn e, ew bû birayekî cimeata me.” (r. 32). Ev xeber ji bo wê dîsa wekî mizgîniyekê ye, ji ber ku birayê wî ji bo dozeke giran û mezî, ji bo armançeke bilind hatiye kuştin û ew mirî nayê hesibandin.

Nivîskar vê lêgerînê wekî hincetekê bi kar tîne û bi vî awayî serboriya êleke kurd wekî paşxane hildibijêre û xwendevanan jî dike mêvana/ê vê serencamê. Bi vî awayî ji sedsala 19an heta bi sedsala 20an, çî ku hatiye serê wan, çend koçberî û sirgûnî bûye para van êlan, hatiye vegotin. Kurdên li ser sînorên Êris û Osmanîyan bi çî awayî ji ciyê xwe bûne, çûne li welatê Êrisan xwe girtine û li wir cîwar bûne? Çend ferman li ser wan rabûne? Ji Çiyayê Şingalê heta bi Sovyetê çawa sirgûn bûne û çî hatiye serê wan? Bersivên van pirsan, bi vegotinan û bîranînan di nava vê romanê de cih girtine. Di van sirgûn û koçan de bi hezaran mirov li serê rê û dirban tîn kuştin, ji xelayîyan dimirin; bi hezaran zarok sêwî dimînin û ew zarok li Ermenîstanê di sêwîxaneyan de mezî dibin û nifşeke xwenda, zana û rewşenbîr ji wan derdikeve.

Di beşa ewil de, Kamilê vegêr ji bo xebatekî diçe li gundê Kûrekendê û li wir rastî Moskovê Selîm, bi gotina wan Apê Moskovî tê. Ew li kolxozê şivantî dike û wextekî li sêwîxaneyê jî xebitiye. Gava ku êla wan ji Bazîdê, ji aliyê Romê ber bi Êrisêtê ve direvin, Selîm wê şevê çêdibe. Ji ber vê yekê navê wî Moskov datînin. Kamil li wir ji Apê Moskov derheqa sêwîxaneyê de çend tiştan dipirse, ew jî diçe nava kûrahiya bîranînên xwe û bi vî awayî çîroka nêzîkî sed salan dest pê dike. Dema ku şerê Romê û Daşnakan çêdibe, gelek ji êlên wan li ser rê û dirban dimirin, tên kuştin û gelek di Ava Reş de dixeniqin. Dibe zarezara birçiyar; kal, pîr û zarokên bê xwedî li ber dîwaran zarezar dikin. Demeke ewqasî xerab e ku ji ber xelayiyê “dê weledê xwe diavêje.”

Wekî romanên din, yên ku li Sovyet hatine nivîsîn, *Hewarî* jî gelek caran bi gotin û pesinan Lenîn bi bîr dixê ka çawa li kurdan xwedî derketiye, çawa welatê Sovyetê ji bo van kesîb û belengazan bûye sitargeheke aram û wekhev. Apê Moskov qala sêwîxaneyan dike û wî dide bawerkirin ku heke ew sêwîxane nebûna, zarokên ji ber xelayî xilasbuyî jî wê ji destê wan biçûya. Li vir navê gelek zarokan jî bi lêv dike ku îro em wan kesan wekî damezrînerên ekola Sovyetê nas dikin. Wezîrê Nadîrî, Xalitê Celalzade, Emînê Evdal... Cerdoyê Genco jî yek ji wan e ku demekê redaktoriya *Riya Teze* dike. Kamil jî derheqê vê yekê de dibêje ku “Dîwana me per û bask da wan û hezaran, hezarên mîna wan bi fire xist.” (r. 44). Di nava axaftinê de Apê Moskov navê Hakob Gazaran (Hakob Xazaryan) jî dide û dibêje ku kurd ji ber hurmet û hezkirinê jê re dibêjin Lazo an jî Apo. Lazo çendekê diçe nava wan, li sêwîxaneyê dimîne, bi zarokan ve mijûl dibe û hertim temî dide wan ku bixwînin û hîn bibin. Li gundê wan dimîne, ji wan derheqê kurdan de tiştan hîn dibe û li wir mizgîniya *Şemsê* jî dide. Wekî tê zanîn ku Hakob Xazaryan (Lazo) amadekarê elfabeya kurdî ya bi tîpên ermenî ye û herwiha ji bo hînîkirinê jî, di 1921ê de pirtûkeke elfabeyê bi navê ‘*Şems*’ amade kiriye.

Di vê romanê de jî gelek caran kedxwarina axa û began, dewlemendan û herwiha ya dewletê tê vegotin. Wekî me berê jî gotibû ku kedxwarin û îstîsmara çînen serdest mijara sereke ya berhemên sosyalîst-realîst in. Çi ji mirovên serdest bînin çî ji dewletên serdest, ferq nake. Di romanê de her du jî xwe didin der. Axa û begên dewlemend hertim bi xerc û bertîlan, çî di destê kesîban de hebe distînin. Em dikarin ji devê lehengan vê

yekê bibihîzin: “Paşayê Romê me dizêrîne, zabîtê Romê me dizêrîne, mele me dizêrîne, axa me dizêrîne.” (r. 118). Dîsa di nava berhemê de bi rêya bibîrxistin, kedxwarina wan serdestan, zilm û tehdeyiyên wan em dikarin bibînin: “Hafiz Paşa û Reşîd Paşa, wan mirovên divbixwîn î har, ên ku salên 1830yan, 1834an avêtin ser Kurdên Cizîrê û Mûsilê, dikirin ku bînine rayê, herçî teslîm nedibûn, qir dikirin. Gund û zozanan tarmitax kirin, agirdadayî kirin.” (r. 69).

Di romanê de çiqas babet bê ser dewleta Romê zilm û tehdeyiyên wan û axayên dewlemend dubare tê vegotin: “Roma bêbext çî tîne serê me, malên me, bi destê axa û begên me çî ecêban tîne serê me.” (r. 93). Ev dubare vegotin ji bo nîşandayîna jiyaneke bindest gelek caran tê bikaranîn.

Hewarî, di pesna Lenînîzm û partîzanî de ji romanên din kêr namîne. Heciyê Cindî yê ku bi xwe jî şahidiya serboriya miletekî kiriye ku ew millet ji ber zilm û tehdeyiyên direve û li welatekî din dihêwire, vê şahidiyê çiqas ji destê wî hatiye nivîsiye. Ji ber wê ye ku gelek caran ev pesindayîna diçe heta minetdariyêke bêhempa û xwe eşkere dike. Berê jî me gotibû ku pirtûk ji du beşan pêk tê. Ev her du beş, em dikarin bibêjin ku di tevahiya romanê de wekî danberheveke xwe dide der. Li aliyekî zilm û tehdeyîya axa û began, dewlemendan û piştevanê wan dewleta serdest; li aliyekî jî xwedîderketina Sovyetê, derfetên ku didin kurdan. Ev yek bivênevê ji aliyê nivîskêr ve tê nirxandin. Apê Moskov gava ku serboriya xwe ji Kamîlê vegêr re vedibêje, tîne bîra xwe ku wan salan “em ê li rûyê dinyayê wînda bûna heke Lenîn hewara xwe bi me re negihanda. Wan çaxan ji me re gotin, ku dinya êdî ya me ye, ya pale û gundiyan, welat êdî ji destê kedxuran azad bû.” (r. 41). Di vegotina van bîranînan de em dikarin hal û tevgerên Hikûmeta Sovyetê jî bibînin ka bi çî awayî li wan zarokan xwedî derketine, ji nexweşiyên û mirinê xilas kirine. Apê Moskov dîsa bi minetdariyêke vê alîkariyê tîne zimên ku “Dîwana Sovyetê em xilas kirin ji birçîbûne, ji xolor û mirinê. Herçî hukimetê xweyî kirin, givrik bûn, derketin nava emir, bûn xweyî mal û nav.” (r. 42). Di nava rûpelên romanê de em dikarin bikevin li pey nêrîna nivîskêr jî; ji ber ku Kamîlê vegêr jî gelek caran dengê xwe di romanê de bilind dike û dibêje ku “... di orta bajêr de we heykelê Lênîn bidîta, heykelê pêşîkarê cîmaetan, bavê cîmaetan.” (r. 189).

Li Sovyêtê, kurd tenê ji mirin û nexweşiyên xilas nabin, herwiha jiyaneke nû jî nas dikin. Di vê jiyana bextewar û aram de, Dîwana Sovyetê ji bo kurdan dibistan dide vekirin, pirtûkên dersê dide amadekirin û elfabeya kurdî diyariya wan dike. Keç û xortên kurdan êdî bi derewên wekî “xwendin guneh e” naxapin û dixwînin. Serokê êlan bi gundiyan didin bawerkirin ku ew jî zarokên xwe dişînin mekteban û dixazin ku bi xwendinê xwe pêş bibin.

Zarokên kurd ên xwenda bi dû re tevî rêxistinên Partiyê dibin, wekî komsomol xwendina xwe pêş de dibin, partîzaniya xwe xurt dikin û vedigerin tîni li gundê xwe, di kolxozan de dixebitin û xizmetî gelê xwe dikin. Di nava lehengên Heciyê Cindî de navekî derdikeve pêş. Em dikarin bibêjin ku roman bi vegotina serboriya êla vî lehengî dixwaze ku serencama hemû kurdan raxe li ber me xwendevanan. Ev leheng Fêrîk Egîd Poletbekov e û di arşîvên Rusan de wekî Fyodor Litkîn derbas dibe. Wekî tê zanîn ku Fêrîk yekem Bolşevîkê Dîgorî¹⁷⁶ ye û neviyê Emerîkê Polatbekov û kurê Egîdê Emerîk e. Diya wî yekê rus e û navê wê jî Anna Kartaşova ye. Gava ku Egîdê Emerîk keçeke kurd direvîne û yek ne bi dilê keçikê ye. Diçin li ber Dîwana Sovyetê û Egîdê Emerîk û du hevrêyên wî tîni ceza kirin û sirgûnî Sibîrê dibin. Ji ber ku li Sovyetê bûyerên wiha nayê pejiirandin û ev yek jî di romanê de gelek caran tê nîmandin. Li Sibîrê, li sirgûniyê Egîd bi nexweşiyekê dikeve û Anna Kartaşova li wî xwedî derdikeve û dizewicin. Ji vê zewacê çar zarokên wan çêdibin. Fêrîk, Nûrê (jina rewşenbîr ku di destpêka romanê de dikeve li pey şopa birayê xwe), Marûsya û Baso. Li gorî romanê Litkîn paşnavê hevjinê Anna ye ewil e û navê kurê xwe jî bi rusî viha daniye. Yanê Egîdê kurd û Annaya rus zarokê xwe cuda cuda bi nav dikin. Piştî salan vedigerin tîni nava êla xwe.

Lehengên vê romanê ji bo çîroksaziya wê bi awayekî reş û spî hatine şayesandin. Ev jî nîşanî me dide ku derûniya karakteran ne lê armanca wan derdikeve pêş. Lehengên neyînî, yanê temsîlkarên çîna serdest hertim bi nêrîneke neyînî tîni şayesandin. Leheng axa, beg yan jî dewlemend bin ew tim xerab in, bêrehm in, xerc û xeracan berhev dikin, kesîb û belengazan dizêrin. Lehengên erênî jî li hember vê rewşê; qenc in, baş in, dilsoz

¹⁷⁶Candan Badem û Rohat Alakom, “Karşlı Bir Kürdün Digor’dan Sibirya’ya Uzanan Öyküsü”, *Kürt Tarihi*, j. 3, Cotmeh- Mijdar 2012, r. 11.

û dilpak in; bi hesteke partîzanî xwedî li doza xwe derdikevin; ji bo armancên bilind dikarin bi rehetî canê xwe feda bikin. Em dikarin bibêjin ku di vê romanê de, ji aliyê şayesandinê ve lehengê herî xurt Fêrîk e. Di vê tabloya jorîn de qisma spî sedî sed temsîl dike. Neviyê Emerîk Axa ye lê şoreşgerekî Partiyê ye. Di nava ciwanan de propagandaya Partiyê û Lenînî dike. Di refên Bolşevîkan de cih figure û li aliyekî ve jî helbest û nivîsan dinivîse, di kovar û rojnameyan de diweşîne. Yanê lehengekî tam li gorî nivîskarên sosyalîst-realist e. Ew hertim gundiyan hişyar dike ku “li Êrisêtê niha Lenîn bi pêş de hatiye, dibêje dinyayeke wisa bê çekirin, wekî axa lê tunebin.” (r. 360). Gundî jî ji Fêrîkê zehf hez dikirin, “pîrs didanê, pê şa dibûn, pesnê wî didan, pesnê wî didan wekî di ber me de xebitiye, ku dewlet bibe ya paleyan û gundiyan.” (r. 53). Wekî din lehengên din jî wekî sîlûetan ji nava rûpelên romanê derbas dibin diçin; yên neyînî ber bi refa reş, yên erênî ber bi refa spî.

Di vê romanê de xeteke sor heye ku di nava romanên din de em zêde rastî vê yekê nayên ku ew jî dîn, dîndijminî û dutîretî¹⁷⁷ ye. Li gorî romanê di sedsala 19an de gelek eşîrên kurdan bi “dara zorê” û “bi şûrê” dibin misilman. Piştî vê dînguhertinê Dewleta Osmaniyan ku di pirtûkê de gelek caran bi navê Dewleta Îslamê tê binavkirin, bi rêya şêx û meleyan, bi rişwet û bertîlan, bi axa û began bêtifaqî dixe nava eşîrên kurdan. Gelek caran diavêjin ser gundên eşîrên ezidî ku ew jî bînan ser dînê Îslamê, lê ew vê yekê qebûl nakin. Di van êrîşan de carinan axayên kurd ên misilman jî tevî artêşa dewletê dibin, heta bi devê melayên kurd gelek caran fetwayan derdixin ku “heke nehatin ser dînê Mihemediyê, hemîn lê xin. Kî ku zarokên wan kafiran jî bikuje, wê di ber dînê Mihemed ve bibe şehîd.” (r. 152). Elbet yên zana û dinyadîtî dizanin ku ev yek “lîstika dewleta Romê” ye û divê bê eyankirin. Acizîya xwe ya ji vê rewşê jî tînin zimên ku “Gelo şerm nîn e, wekî dutîretiyê dikin nava me. Zehf jî, Xwedê ji me standiye, em du dîn in, xwe du millet jî nîn in? Eşîr in û eşîr bavê eşîra ye” (r. 202). Dîsa yekî misilman û navsere yê ku gelek qewimandinên dinyayê dîtine, radibe dibêje:“... welleh biraziyê min rast e, bileh rast e, heyrano, xelq me berî hev dide, wekî sibehê bi destê me em koka hev bînin.” (r. 89).

¹⁷⁷ Bêtifaqî, wexta ku êlek yan jî eşîrek dibe du par vê peyvê bi kar tînin.

Nivîskar dût û dirêj li ser vê bêtifaqiyê disekine û dide zanîn ku piştî vê dînguhertinê kurmamên wan ên misilman di tevgerên xwe de diguherin. Keç nadin nastînin, xwarina bi destê wan naxwin û hwd... “Xelqê tê derxist, wekî birazê û kurapên wan ên Surman hêdî hêdî ji wan sar dibin, durî wan diçin, nayên ser nanê wan.” (r. 87).

Bedoyê şivan di xêra diya xwe de xwarin çêdike lê dêhna xwe dide ku kes naçe li ser nanê wî. Cînarekî wî dibêje ku: “Hey Xwedê mala te xirabnekiro, lê tu nizanî, wekî Surman nanê Êzdiyan naxwin? Mele Evdilrehîm ji wan re gotiye, wekî nanê me heram e, kî bixwe ji dîne Mihemediyê dertê.” (r. 87). Bi vê yekê re Bedo aciz dibe: “Dêmek wisa? De bibêje me ji hev du başçe dikin êdî? Miletê, du dîn; xweş xeber e!” (r. 87).

Nivîskar li hember vê rewşê bi devê lehengan nêrînên xwe jî wiha eşkere dike ku em dikarin wek encamgirtinekê bibînin:

“Romê gava ku dît, wekî bi me nikare, wê çaxê axa û begên me me ruşet kir, mele anîn tijî nava me kirin, wekî em bi hev de bikevin, em hev du qir bikin, wekî şuxulên xwe yê reş bi pêş de bibe. Lewma xanim xelat kirin. An telaşa Romê ye êla Sîpkan, Kurd û Kurdistan...Te niha derz kir çî ka çîma dîndijminî kire orta me...” (r. 90)

Çend eşîrên kurdan li hember zilma Romê biryar digirin ku herin xwe li Êrisêtê girê bidin. Çend nûnerên xwe hildibijêrin û dişînin li wî welatî ku bizanin ka li wir rewş çawa ye. Kurdên ku di ewil de li ser tixûba Êrisêtê bi cih bûne, van pirsgirêkên dîni di jiyana xwe ya rojane de qet nabînin û vê yekê jî birayên xwe yê kurd re dibêjin. Ew li wir qet ji aliyê dîne ve zirar ji miletên din nabînin. Dîwana Sovyetê li wan xwedî derdikeve: “Tu bibêjî yekî heta niha dîne me dabe rûyê me, me hê nedîtiye. Tu bibêjî yekî pez û dewarê me talan kiribe, tune. Wellehî navê Xwedê ye, em wiha dijîn. Lê em û kurmancên din jî, dêmelî ên Surman, bi xwe bûne bira.” (r. 100). Ev yek jî gumaneke viha tîne bîra me ku dewletên serdest di polîtîkayên xwe de dîne bi kar tînin û vê yekê ji bo dîndijminatîyê jî dikin fersend ji xwe re.

Di vê romanê de gelek cureyên berhemên folklorîk jî hene ku bi helwesta Heciyê Cindî ji bayê jibîrkirinê xilas bûne. H. Cindî di berhema xwe de nîşan daye ku folklorê kurdan bi her awayî dewlemend û serkeftî ye. Em dikarin bibêjin ku hêmanên folklorîk

yên vê romanê bingeha wê ava kiriye. Ji ber wê ye ku li gorî lêkolera û nivîskaran *Hewarî* berhemeke folklorîk- dîrokî¹⁷⁸ ye. Wekî tê zanîn ku H. Cindî bi xwe jî zargotinaneke hêja û berhevkarê folklorê kurdan e. Eskerê Boyîk¹⁷⁹ derheqa berhevkarîya wî de, ji bîranînên xwe çend dîdeman rabeî xwendevanan dike û dide zanîn ku H. Cindî havînan diçe gundê wan ê li pala çiyayê Elegezê, ji devê kal û pîran, ji çîrokbêjan zargotinan dinivîse. Elbet em dikarin bi rehetî bibêjin ku bikaranîna folklorê di vê berhemê de, li gorî daxwazên Sovyetê nîn e; berewajî wê, nivîskar hewl dide ku çand û folklorê kurdan bilind û bîra neteweyî xurt bike.

Di romanê de her gava ku bûyereke sosret diqewime nivîskar bi qalibên “lewma pêşiyên me gotine” bi kar tîne û mînakeke folklorîk dide. Bo nimûne gava ku Nûrê dizewice, tam nêzikî dawetê Fêrîk ji Sîbîrê vedigere, haja wî jê çêdibe ku Nûrê bi kurê axayekî re dizewice, mudaxele dike û nahêle ku bizewice. Ev bûyer jî di nava gundiyan de belav dibe û acizîya xwe bi gotineke pêşiyên tînin zimên:

“Çolî û çolistan
Berrî û berristan,
Hêja serê min
Ket nav xaxê giran.” (r. 66)

Kamilê vegêr carinan ji xewê radibe kilamekê tê bîra wî û di ber xwe de dibêje. Carinan rojên borî, serpêhatiya êlên kurdan difikire û bi riya çîrokan dixwaze ku bi awayekî hestiyar vebêje. Şeroyê lehengê romanê, li civatekê rûdine, Kamil û Apê Moskov jî li wir hazir in. Şero dest bi stranekê dike û “wê lehzeyê mirov digot, zarezara wan belengazan, di nava wê beytê de dihat digihişte me.” (r. 69). Strana Şero di eslê xwe de çîroka kurdan û dîroka wan vedibêje. Hemû êş û kedera dilê wan di nava vê stranê de ye.

¹⁷⁸ Kawa Nemir destnîşan dike ku Heciyê Cindiyê zargotinan û berhevkarê mezin, heya ku jê hatiye, romana xwe bi gencineya peyv, biwêj, metelok, gotinên pêşiyên û stranên Kurdî dewlemend kiriye. Bi vî awayî, ji aliyê vê taybetiyê ve di dîroka romana Kurdî de dewlemendtirîn roman *Hewarî* ye, ku gelek refleks, baneşan û tebeqeyên Kurdî ji mirinê *rizgar* kiriye. Heciyê Cindî, **Hewarî**, weş. Lîs, Amed 2008, r. 21.

¹⁷⁹ Eskerê Boyîk, **Çanda Kurdên Sovyetê**, weş. Deng, İstanbul 2012, r. 127.

Eskerên Romê diavêjin li ser gundê kurdan û keçên kurdan dîl digirin. Keç xwe nadin destên wan, hey direvin û pê re jî dibêjin:

“Weleh nabe, bileh nabe
Qîza Êzdî tu car tu car
Hêsîr nabe...” (r. 71).

Gava ku Romê, Ozmanê Cezo dikuje, jinên êlê dibînin ku ji mala Silêman Axa, Îbrahîm û Şemdîn Axa kesek dengê xwe nake, dibe qêrîna van jinan û kilam derdixin:

“Dîdema wêran wê sî ye
Tilî pêçingên Ozmanê Cezo
Ser serê rimê diçûrise
Ozmanê Cezo ça kuştine bê kes û kûs e
Kul ketiye torina mala Sêrxûn
Ne deng e, ne tu behs e.” (r. 82).

Bi gotina Eskerê Boyîk *Hewarî* ji bûyerên rast hatiye nivîsîn.¹⁸⁰ Yanê H. Cindî bi salan malzeme berhev kiriye, dîroka kurdan xwendiyê û vê romanê jî diyariya miletê xwe kiriye ku neyê jibîrkin. Gava ku xwendevan di nava rûpelên romanê de derkeve rêwîtiyê, ew helwesta parastina folklor û çandê xwe bi awayekî eşkere dide der. Dewlemendiya çanda devkî jî ji bo dahatûyê xwe li wir vedişêre. Nivîskar jî dizane ku çanda devkî ya miletekî, hemû êş û azaran yan jî serkeftinan di nava xwe de dihundirîne û ew sûretên bîra neteweyî ne.

Di serî de de jî hatibû gotin ku roman bi du beşan pêk tê û xwendevanan ji sedsaleke bi êş û azar derdixê û tîne sedsaleke “bextewar”. Êdî Dîwana Sovyetê ava bûye, hemû sazî û dezgeh amade bûne; zarokên kurdan li dibistanan bi zimanê xwe dixwînin û tevî refên Partiyê dibin. Keç û xort, xwendekar, kal û pîr herkes di kolxozan de dixebite û jiyaneke nû ava dike. Lehengên vê romanê jî li Sovyetê, li kolxozan,

¹⁸⁰Eskerê Boyîk, **hb**, r. 18.

“pembû, tiriyan, bax û rezan, bostan û pincarê bêcer diken, onceyê hiltînin datînin.” (r. 34). Yên wekî Apê Moskov, şivantiya kolxozê dikin û tevî jiyana kolektîf dibin. Herkes, di kolxozan de li gorî xebata xwe rojheqa xwe distîne. Li vir civîn pêk tînin û biryaran ji bo kolxozan distînin. Propaganda û xebatên Partiyê ji vir bi rê ve dibin. Şînî û şahî hemû di kolxozan de pêk tên. Kesên ku xebateke xirab bikin ji aliyê kolxozê ve tên cezakirin. Yanê hemû dînamîkên jiyana rojane li vir diqewimin.

Di vê romana H. Cindî de rêgeza dîrokîtiyê têra xwe cih digire. Nivîskar bi taybetî li ser sedsalê disekine û jiyana kurdên wê sedsalê radixe li ber xwendevanên xwe. Car caran xwe dispêre agahiyên dîrokî û dil dike ku ev dîrok neyê jibîrkirin. Bi qasî ku tê zanîn, piraniya bûyer û lehengên wî kesên rast in. Ji xwe berê jî hatibû gotin ku Fêrik Polatbekovê lehengê romanê, di arşîvên Rûsan de jî cih girtiye ku şoreşgerekî Partiya Komûnîst e û ji bo Sovyetê şer kiriye û şehîd ketiye. Dîsa gelparêzî li vir jî xwe dide der ku nivîskar di nava van bûyeran de ji bo parastina gel hewl dide û dixwaze ku guherîna vê nêrînê nîşan bide. Ji bo wî dahatûya gelan û pêşveçûna wan armanceke girîng e.

3.6. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Ahmedê Hepo de

3.6.1. Bawerî

*Bawerî*¹⁸¹ ya Ahmedê Hepo cara ewil di sala 1990an de li Azerbaycanê tê çapkirin. Di nivîsîna vê romanê de nivîskar hewl daye ku li ser pîrsgirêkên eşîrtî û qebîletiyê raweste. Ji dîroka kurdan mînanan hildigire, fen û fêlên neyarên wan di tevna romanê de radixe li ber çavan û herwiha baweriya dahatûyê jî ji bîr nake. Nivîskarê romanê di pêşgotinê de jî diyar dike ku ev berhem bi ruhekî welatparêziyê hatiye nivîsîn lê dîsa jî bêhna Yekîtiya Sovyeta berê jê tê (r.5). Ev jî nîşanî me dide ku bi lehengên xwe yên şoreşger û bi ruhekî partîzan ev roman hatiye honandin.

¹⁸¹Ahmedê Hepo, *Bawerî – Dengê Ji Rêzeçiyayên Elegezê-*, weş. Aram, İstanbul 2013.

Roman bi vegeza Sulhedînî dest pê dike û paşê bi *flasbackê* me dibe salên borî. Sulhedîn ji otobûsê peya dibe, ber bi gundê xwe ve diçe û gava ku malbata wî dibîne ku Sulhedîn hatiye, herkes matmayî dimîne. Ji ber ku Sulhedîn piştî şerî venagere û herkes dizane ku ew hatiye kuştin. Bi vî awayî di nava gund de dibe hawar û mizgîniya hatina wî û paşê çîrok me dibe çend sal berê. Ji vir pê ve em tevî serboriya êla Mankan û serkarê wî Hilo dibin. Êla Mankan û êla Qirmaiskan Ên ku ji kal û bavan de bi hev re cîrantî û biratî kirine, ji bo çolê, ji bo cî û war bi hev dikevin. Hilo ji ber vê yekê aciz e û dixwaze ku vê dijminatîyê ji holê rake. Ji ber ku dizan ku yê vê dijminatîyê dixwe nava kurdan, dewleta serdest û berdestiyên wan ên axa û beg in. Hilo, hinde aciz dibe û serekê zozanan bi zorî dide axaftin û ev diyalog bi me dide zanîn ku serdestên kurdan hertim bi hîle û xapandinan, dixwazin ku wan bidin ber hev. Bi vê diyalogê, nivîskar armanca xwe ya nivîsînê jî xurt dike. Yekitiya kurdan û sekna wan a li hember serdestan ji bo wî gelek girîng e û hewce ye:

Wî (serekê zozanê) got:

-Jorê ferman da me, wekî em bi her alî Kurdan berdin hev, bi hev bidine qirê, yê mîna we yê bokebaran ji holê rakin, yê din jî bikin berdestiyên xwe.

Min tûyî wî kir û jê re wiha got:

- Hûn tolazên dewletê, rind bizanibin, wekî rojekê zû dereng dê kurd bi fen û fêlên we bihesin, rojekê dê gel we fahm bike, ev parçebûn kê kiriye nava wan, ev birîna kûr çi birîn e? Wê gavê wê dest bidine destê hev û wek şivêta zinarê hej lêketî wê jor de bê û we bihejîne, ricaf wê têkeve dilê yê mîna te yê durû. (r. 14- 15).

Hilo bi hîleyên dewletê dihese û bi giregirên êlê xwe re dişewire, bi wan dide bawerkirin ku birîna kurdan ne yekbûn e. Piştî şewrê biryar didin ku bi êla Qirmiskan re li hev bên. Serkara êla Qirmiskan Hezare Xanim e, piştî mêrê xwe ew li êla xwe xwedî derdikeve. Hezare Xanim jî wekî Hilo difikire û ew li hev tên. Di wê civîna lihevhatinê de neviyê Hilo çêdibe û navê wî jî Hezare Xanim datîne: Sulhedîn. Wê şevê, di civîna her du êlan de Hezare Xanim, Hilo û giregirên wan zordarî û tehdeyiya dewletê, kedxwarina axa û began tînin zimên. Hilo dibêje ku “li wî alî Erezê, hukumeta nû tu cudatîyê nake

nava gelan” û biryara êla xwe ya çûyînê eşkere dike. Hezare Xanim û giregirên wê jî vê biryarê pîroz dikan û dixwazin ku ew jî tevî wan bibin.

Ji vir pê ve vegotina romanê diqulibe li ser Perîşana keça hilo. Memedê kurê Osman Axa wê direvîne, Hilo û çend xortên êlê jî birîndar dike. Êla Hilo dikevin pey keça xwe lê Osman Axa xeber dişîne leşkerên dewletê re û ew derdorê gundan girtine da ku kes neçe ser wan. Perîşan li mala Osman Axa bi alikariya keçeke xizmetkar, roja dawetê Memed dike û winda dibe.

Di vê romanê de zordariya axa û began û ya dewletê tim û tim tê vegotin ku ev yek jî gundiyan bêçare dihêle. Leşkerên dewletê bi ser şivanan de digirin û keriyên pezan talan dikan. Axa û beg bi zorî gundiyan didin xebatê. Kurê axayekî bi alikariya leşkeran keça êleke din direvîne û kes dengê xwe nake. Nivîskar di pêşgotina xwe de eşkere dike ku me berê jî qala wê kiribû, dixwaze romaneke neteweperver binivîse lê bivênevê roman vediguheze li ser romaneke Sovyetîk. Ev yek hin daneyên romanê de xwe didin der. Gava ku behsa axa û began yanê bi wateyêke din behsa çîsa serdest dibe ew dibin dijminê gelan, dijminê yekitiya kurdan. Hiloyê lehengê romanê dide zanîn ku ew axa û beg bi alîkariya dewletê gundiyan dizêrînin û tehdeyî li wan dikan: “Niha we bihîst ev axa û beg çî tînê serê me. Niha rind bizanibin ku dijminê gelan kî ye. Ew ji bo kara xwe hewl didin mirovan rakin rûyê hev.” (r. 15).

Roman li ser du sehneyan diqewime û ev yek jî danberhevekê radixe li ber çavan. Kurd li Romê hem ji destê dewleta serdest û hem ji çîna serdest gelek êş û azar dibînin. Lê kengî sehneya romanê ber bi Sovyetê ve diguhere, rewş jî diguhere. Li vir bi qeydê kolxozan gund tînan sazînin, binelîyên gund mîna birayan dest didin destê hev, dixebitin. Êdî keç û xortên kurdan dixwînin, di kolxozan de dixebitin. Dîwana Sovyetê û Partiyê wekî welatekî hez dikan û ji bo wî û ji bo azabûna xwe li hember çînan serdest û “faşîstan” şer dikan, heta canê feda dikan. Li vir, li Sovyetê bi “saya serê Lenîn” ew êdî xwedî welatekî aram û serbest in. Kes bi navê eşîr û êlan nayê naskirin, herkes wekî bira jiyaneke bextewar derbas dike.

Di destpêka romanê de, serlehengê romanê Sulhedîn çend sal piştî şerî vedigere gundê xwe. Em ji rêzebûyerên romanê fêhmî dikin ku ev Şerê Cîhanê yê Duyemîn e. Gava ku girmegirma şerî li welatê Sovyetê deng dide, wekî Sulhedîn bi sedan xortên kurd di eniya şer de ji welatê xwe şerî dikin. Lehengên şoreşger, ji bo partiya xwe canê xwe feda dikin. Li hember Lenîn û Stalîn rêzeke mezin û baweriyeke xurt heye. Di 1937an de gava ku ji bo kurdan fermana ‘nefikirinê’ derdikeve, gundî bawer nakin ku haja Stalîn pê hebe, ji leşkeran dipirsin: “Gelo, bavê me gişkan Stalîn dizane ku em tene nefikirin?” (r.91). Ev baweriya xurt pîrsekê tîne bîra me ka gelo ev sirgûn an jî nefikirina mezin çima bi çend hevokên biçûk tê bibîrxistin? Ev sirgûna mezin qet di dilê mirovan de şikestinekê peyda nekiriye? Bersiva wî rasterast nebe jî bi awayekî di nava romanê de veşartî ye. Piştî vê sirgûnê dîsa herkes li gundê xwe di kolxozan de bi dilekî şa, bi eşqekî partîzanî dixebitin. Ev yek çiqas bi rastîyan ve girêdayî ye ew çiyê nîqaşê ye; lê li vir, di nava romanê de hîsiyata ku derbasî xwendevanan dibe, ne hêvîşikestinek e.

Di vê romanê de, lehengên şoreşger bi ruhekî partîzan tevdigerin. Lehengên wekî Sulhedîn, ji bo Dîwana Sovyetê û ji bo Partiya xwe dixebitin. Piştî xwendina xwe tevî refên Partiyê dibin û xebatên kolxozê bi rê ve dibin. Sulhedîn gava ku ji şerê sax vedigere, ji ber mîrxasiya xwe ji aliyê Partî û Dîwanê ve bi “Stêrka Sor” tê xelatkirin ku ev ji bo wî asteke pîroz e. Hemû gundî wî pîroz dikin. Bavê wî Esed li gund şahîyan datîne. Ji xeynî Sulhedîn lehengên şoreşger jî hene û ew jî wekî wî tevdigerin. Hemû jiyana wan ji bo xebata Partiyê û ji bo pêşvebirina kolxozê û herwiha Sovyetê ye. Miraz, Mîrsevdîn û hwd. Hemû lehengên erênî yê şoreşger di tevgerên xwe yê partîzanî de wekî hev in û armanca wan jî herwiha yek e: pêşvebirina Dîwana Sovyetê û biratiya gelan. Li hember vê yekê jî elbet lehengên neyînî yê romanê jî hene ku ew di serî de axa û begên berê ne û herwiha dewletên serdest in. Li Sovyetê jî kesên ku li hember Partiyê tevdigerin, qanûnên kolxozan binpê dikin, wekî dijminê gelan tîne hesibandin û cezakirin.

Di vê romanê de jî gelek caran hêmanên folklorîk hatiye bikaranîn û bi gotinên “qeydê eşîran”, “edetên bav û kalan” hatine bibîrxistin. Rabûnrûniştina gelê kurd bi pesnan hatiye vegotin û çand û edetên wan tê nîşandan. Wekî pîraniya romannivîsên Sovyetê (mebesta me di çarçoveya teze de ye, yanê nivîskarên kurd yê Sovyeta berê)

Ahmedê Hepo jî li hember îdeolojiya Sovyetê, folklorê ji bo bilindkirina çanda kurda tîne zimên. Li gel vê yekê jî hin çand û edetên kurdan jî rexne dike ku qelen jî yek ji wan e. Bi devê lehengên xwe yên ciwan, dixwaze ku vê edetê rexne bike. Ji ber ku qelenji bo wî jî biçûkxistina keçên ciwan e û divê ev edet ji nava kurdan rabe. Piştgiriya xwe jî ji qanûna Sovyetê digire ku li wir destûra tu kesî tune, bi zorê keçan bizewicînin û qelen bistînin. (r. 54).

Di tevahiya romanê de mijara dîne nakeve rojeva nivîskêr. Li gel vê jî biratî û yekbûna kurdan, piştirî û hevgerîna wan wekî daxwazeke ji dil cih digire û girîngiya wê tê nîşandan. Dîsa biratiya miletan bi awayekî gelparêz tê nivîsîn û zilm û tehdeyiyên çînen serdest li hember gundî û palyan tê rexnekirin. Ji rûpelên dîrokê gelek bûyer bi awayekî rasteqîn tê bikaranîn. Elbet ev yek ji bo sirgûna 1937an nikare bê gotin lê dîsa jî piştî şêrê cîhanê, jiyana û serboriya kurdan bi ku de diçe, kêma zêde xwendevanan jî agahdar dike.

3.7. Şopên Realîzma Sosyalîst Di Romana Ezîzê Gerdenzerî de

3.7.1. Fincana Ferfûrî

Romana Ezîzê Gerdenzerî *Fincana Ferfûrî*¹⁸² di 1990an de tê çapkirin. Ev berhem li hember romanên din ên ku li Sovyeta berê hatine nivîsîn, danberheveke wekî du welatan nahundirîne. Mekana romanê tenê welatê Sovyetê yanê Yêrêvan e. Bûyerên romanê eletexmînî meriv dikare bibêje ku salên 1970- 1980î de derbas dibe û vê yekê jî em dikarin ji hevoka “ew pêncî-şêst sal bû, hem Baku hem jî Yêrêvan hêlînên biratîya gelan bû...” (r.58) tê derxin. Roman ji vegotina dîrokekê zêdetir li ser evîniya du ciwanên kurd radiweste û vê yekê jî di destpêkê de bi straneke gelêrî xeber dide:

“Evîna dila ji derdan derdekî pir giran e,

¹⁸²Ezîzê Gerdenzerî, *Fincana Ferfûrî*, weş. Lîs, Diyarbekir 2015.

*Mîna fîncaneke ferfûrî terk pê keve
Mirov bibe li cem hekîman û doktoran,
Mirov bike neke, tu car tu car necebire.” (r. 7).*

Ev romana evîniyê bi sehneyeke dramatîk dest pê dike ku serlehengê wê Têmûr di trêne de ye, ewqasî dilteng e û xemgîn e ku kulma xwe li ser masê dixê û dibe şinginiya amanên xwarin û vexwarinê. Ev xortê kurd ji ber bîranên xwe dikeve axûzarekê, heqê xwarina xwe dide û restorana trêne derdikeve. Her carî du salên borî tîne bîra xwe û heyfa xwe tîne “Yazix, heyfa wê, çima wiha heram bû?...” (r. 10).

Têmûr xortekî kurd e û li Yêrêvanê di “înstîtûta doktoriyê” de dixwîne. Di şahiya pîrozkirina cejna Newrozê de keçeke kurd dibîne û dilê wî dikeve wê. Ev rastfêvhatina her du ciwanên kurd ku di govendê de jî dikevin milê hev, evîna Mem û Zînê tîne bîra me. Wekî tê zanîn ku ew jî di şahiyê Newrozê de hev dibînin û ji hev hez dikin. Nivîskar herçiqas vê çîrokê eşkere neke jî em dikarin bibêjin ku hinartina bi vî awayî xwendevanan dibe heta wê dewrê. Du ciwanên modern di şahiyê çandî ya kurdan de hev dibînin. Meyr keça profesorekî ye, teze dibistanê xilas kiriye û dixwaze ku di beşa Tirkî de xwendina xwe berdewam bike. Ev her du ciwan piştî hin bûyeran destûra bavê Meyrê distînin û wekî heval hev dibînin ku heta xwendina wan xilas bibe. Meyr gava ku dest bi xwendina bilind dike, êdî dikeve nava civata Têmûr û bi hevalên wî re dikeve têkiliyê. Sertîv û Miraz jî wekî Têmûr di beşa “doktoriyê” de dixwînin û Selîm jî di beşa Kurdzaniyê de dixwîne. Miraz ji aliyê malbata xwe ve dewlemend e û vê yekê hertim bikartîne. Bi riya aboriya malbata wî, di romanê de behsa newekhevbûna civakê tê nîşandan. Malbata Miraz bi bertîlan xwendina wî bi rê ve dibin, ji ber ku ew wekî hevalên xwe baş naxwîne û naxwaze ku bibe doktor. Ew di wê fikrê de ye ku bi riya keçeke bajarî li bajêr bimîne û bi perê malbata xwe jiyana xwe derbas bike. Ev yek li gorî Têmûr û hevalên wî nîn e; ew dixwazin ku bi keda xwe di nava civakê de pêş ve biçin û ji bol milletê xwe bixebitin.

Têmûr û hevalên wî di refên Partiyê de cih digirin û wekî partîzan û komsomolan, xebatên Partiyê di nava xwendekaran de belav dikin. Havînan jî bi xwendekarên partîzan

re ji bo xebatê diçin gundan û aliyê pale û gundiyan dikin. Di vegerê de Têmûr nexweş dikeve û bi mehan di nexweşxaneyekê de radize. Di wê navberê de Mirazê ku berê de dilê wî ketiye Meyrê, bi hîle û lîstikan wê dixapîne û dudiliyan dixwe nava wê. Meyr qet naçe serdana Têmûr û navbera wan xirab dibe. Hêjayî gotinê ye ku di nivîskar di vê romanê de derûniya lehengekê bi diyalog û monologan radixe li ber xwendevanan. Meyr li aliyekî îdealên Têmûr û bêperebûna wî difikire û li aliyekî ve jî xweşgotin, kêfxweşî û dewlemendbûna Miraz tîne bîra xwe. Bavê wê jî wekî Têmûr yekê îdealîst e; ji bo milletê xwe dixebite, pirtûkan bi zimanê xwe dinivîse û hey difikire ka çawa milletê xwe bi pêş ve bibe. Lê diya wê bi salan bavê wî re şer dike, bêperebûna wî dike mesele û ev yek jî li mala wan gengeşe derdixe. Ev danberheva Meyrê nîşanî me dide ku ew di dilê xwe de dikeve dudiliyan:

“Meyr, bi seyr guh da li ser filozofîya Miraz. Fikirên wî û Têmûr ji hev du pir cuda bûn. Di fikirên wî de jî rastî pir bûn. Ji bo Têmûr pere û hebûna dinê ‘qirêja destan’ bû, ew ‘qirêj, gemar’ jî di destê wî de tune bû. Ji bo Têmûr jî wekî Sertîv, a sereke exlaq, moral bû; pêşiyê erk û wezîfe, xwendin û xebat, helbet nav û deng, paşê jiyan. Wê Têmûr û bavê xwe danî li rex hev du. Fikir, adet û xeysetê wan yek derdiket, te yê bigota ne tenê ew, lê Têmûr jî zarokê bavê wê bû. Wê teze fam kir, ku çima dayika wê jina feqîr di emrjiyîna xwe de çî ditîye, çî bîne bîra xwe, ji çî eşq û kêfxweş bibe.” (r. 112).

Meyr di dawî de, li pey “qirêja destan” diçe, bi Miraz re direve. Piştî dawetê ew di rojê de poşman dibe lê êdî Têmûr ji destê wê diçe. Ji xwe gava ku Têmûr xebera zewaca wan distîne, qeyda xwe dibe bajarekî din; ji ber ku êdî terk li “fincana ferfurî” ketiye.

Eger em bêne li ser mijara xwe, di vê romanê de rasterast propagandayêke partîzanî an jî pesindayîna sîstema Sovyetê tune. Lê dîsa jî em bi riya lehengan pê dihesin ku li bajarê Yêrêvanê, xwendekar tevî karên Partiya Komûnist dibin û xwe wekî komsomol bi nav dikin. Têmûr jî yek ji wan e ku xwe li hember welatê xwe deyndar hîs dike û wiha dibêje: “Em komsomol û welatperwer in, borc û wezîfeya welat datîne li ser milê me, em nikarin cîbicî neynin.” (r. 54). Ev ciwanên komsomol di enstîtûyan de şahî li dar dixin û bi rêve dibin. Lê tiştêkî balkêş jî heye, bandora Partiyê li ser saziyên dewletê heye û ev yek jî di pirtûkê de tê nîşandan. Mirazê hevalê Têmûr li gorî daxwaza wan

tevnagere û Têmûr jî difikire ku “Heger komsomol an desthilatdarên xwendegêhê, bêexlaqîya wî îsbat bikirana, wê ew ji înstîtûtê der bikirana.” (r.32).

Di romanê de, cara ewil e ku em derheqê Stalîn de gotineke xirab dibînin. Dewra wî bi terorîzmê tê binavkirin û ew jî wekî dijminê gelan tê nîşandan (r. 41). Lê dîsa jî em di tevahiya romanê de li hember vê gotinê tevgerê an jî gotineke din nabînin. Dibe ku partîzanî û baweriya nivîskêr jî rê nade ku tevahiya sîstemê rexne bike, ew jî kirinên Stalîn wek “şexsî” dibîne û dinirxîne.

Li hember vê yekê em pê agahdar dibin ku lehengên romanê bi kurdên parçeyên din re di têkiliyê de ne, haja wan jî xebat û berhemên kurdên mayîn hene. Têmûr ji hertim qala pirtûkên kurdî dike, pesna wan dide û xeber dide ku Emîn Bozarslan destana Ehmedê Xanî “Mem û Zîn” wergerandiye tirkî û çap kiriye (r. 43). Heta Têmûr sûreta Mistefa Barzanî û çend pêşmergeyan li dîwara mala xwe ya gund de aliqandiye û bi wan agahdar û serfiraz e. (r. 141).

Wekî me berê jî gotibû ku, di vê romanê de rasterast pesindayînek tune, li hember çînen serdest şerekî naxwiyê lê dîsa jî lehengên xwendekar di refên Partiyê de cih digirin, tevgerên xwe de an jî di fikr û ramanên xwe de wekî şoreşgeran wezîfeyên xwe tînin cih û minetdariya xwe jî nîşanî dewletê didin.

ENCAM

Ev teza bi navê “Şopên Realîzma Sosyalîst di Romanên Kurdî ya Sovyeta Berê de”, li ser romanên di navbera 1935-1991 an de sekinî û bi sêzdeh romanên bandora reealîzma sosyalîst a li ser romana kurdî ya Sovyeta berê analîz kir.

Di 1934an de, bi biryara Kongreya Yekitiya Nivîskarên Sovyetê, dewlet polîtîkaya hûnerê bi awayekî fermî dide zanîn ku realîzma sosyalîst e. Yanê ev nêrîn ji endîşeya hûnerê wêdetir, bi hişmendiyêke îdeolojîk derdikeve qada hûnerê û çavkaniya wê jî Marksîzm e. Armanca wan jî ew e ku civak û hûnerê bi teoriya marksîst binirxîne. Nivîskarên realîst-sosyalîst jî hunera xwe didin bin fermana îdeolojî û doktrînekê, pênuşa xwe jî ji bo armanekê bi kar tînin. Bi biryara YNSyê, di romanên realîst-sosyalîst de hêmanên wekî îdeolojî, partîzanî, romantîzma şoreşger, gelparêzî, ked û kedxwarin derketin holê. Li gel van jî folklor, dîn û dîrokî jî para xwe ji van berhemana wergirtin. Lewra em jî ketin li pey van hêmanan ka di nava van sêzdeh romanên de çi çiqas û bi çi awayî hatine bikaranîn û em gihiştin van encaman:

Romana kurdî ya Sovyeta berê, helwesteke îdeolojîk û partîzanî nîşanî me dide. Ev helwest carinan bi pesnandina Lenîn, carinan bi îdeoljîya Bolşevîkan û carinan jî bi minetdariya sîstema Sovyet derdikeve pêş. Ji xeynî çend romanên, di nava van berhemana de bi şeweyeke berawirdî rabirdû tê rexnekirin û sîstema nû ya Sovyetîk tê pesndan. *Dimdim, Xatê Xanim û Şer Li Çiya* li derweyî vê hewldanê dimîne; lê belê *Dimdim* ji xeynî pesna sîstema Sovyetê, bi awayekî ûtopîk cîhaneke çêkirî ya derweyî rastiyên dîrokî û nêzikî sîstema sosyalîst radixe li ber xwendevanan.

Romana kurdî ya Sovyeta berê, bi lehengên erênî li ser piyan e. Di van romanên de lehengên erênî hertim li dijî çîna serdest, li hember axa, beg û dewlemendan têdikoşin. Lehengên erênî ne bi hestên xwe yê mirovane lê belê bi hişmendiyêke îdeolojîk tevdigerin. Di rewşên tarî û bêhêvî de cesaretê didin gelê xwe; herçiqas êş bikişînin û tenê bimînin dîsa jî tu carî ji armanca xwe û ji îdeala xwe ya mezin dûr nakevin û dev jê

bernadin. Ev leheng ji bo wezîfeyên xwe û armancên xwe dijîn, hakimî nefsê xwe ne; xwe baş perwerde dikin, baş dixwînin û ji bo gelê xwe dibin mînakên baş û rizgarker. Ev rewş *Dimdim, Xatê Xanim û Şer Li Çiya* diguhere. Lehengên van romanên dîrokî rengê lehengên erênî didin lê di van de têkoşîna wan li hember çînên polî nîn e. Têkoşîna wan diqulibe li ser dewletên serdest. Li hember hikûmetên serdest û neheqiyên wan, zilmên wan şer dikin.

Rêgeza romantîzma şoreşger ji xeynê *Dimdim, Xatê Xanim û Şer Li Çiya* di romanên kurdî ya Sovyeta berê de cih digire. Realîzma sosyalîst li hemberî romantîzmê ye lê belê ev romantîzma şoreşger e. Yanî lehengên romanê ji bo dahatûyê, ji bo jiyaneke îdeal û sosyalîst têdikoşin.

Di tevahiya van romanên de ked û kedxwarin bi awayekî berfireh tê behskirin. Ji xwe ked bingeha sîstema sosyalîst e û ev yek jî di romanên de xwe eşkere dike. Ked ji bo lehengan tiştêkî pîroz e û ew dikarin ji bo vê pîrozahiyê bi hemû qeweta xwe bixebitin û li hember kedxwiran şer bikin. Axa, beg û dewlemendên serdest hertim keda gundî û paleyan dixwin. Lê serlehengên romanên li hember wan disekinin û mizginiya sîstema nû didin gelê xwe. Di van romanên de hertim kedkar û kedxwir li hember hev disekinin. *Dimdim* û *Xatê Xanim* li derweyî vê gelemperiyê dimînin. Lê di *Şer Li Çiya* de car caran nivîskar bê hemdî xwe, di gel ku romaneke dîrokî ye, dîsa jî behsa ked û kedxwarinê dike û têkoşîna li hember wan jî tîne zimên.

Bikaranîna folklorê di realîzma sosyalîst de, ji bo tunekirina hestên neteweyî ye. Ev teorî dixwaze ku bi rêya folklorê dilsozî û girêdana ji bo rejîmê bi hêz bike û miroveke nû ava bike. Lê ev yek di romanên kurdî ya Sovyeta berê de derbasdar nîn e. Belê têra xwe bi hêmanên folklorîk re dagirtî ne lê ev bikaranîn ne ji bo daxwaza rejîma Sovyetê ye, berewajî wê ji bo bilindkirina çanda kurdî ye. Bi rêya folklorê nivîskarên kurd ên Sovyetê dixwazin ku çanda xwe bidin nasîn û ji bayê jibîrkinê xilas bikin. Heta hin ji wan ewqasî zêde bi kar tînin ku wekî *Hewarî* navê “romana dîrokî- folklorîk” werdigirin.

Daxwaza sîstema Sovyetê ew e ku neteweyên di bin riyaseta xwe de ji hemû dînan dûr bike û “ateîzma zanistî” bike nêrîna dînî. Lê ev yek di nava van romanên de tune. Di romanên *Şivanê Kurmanca*, *Berbang*, *Jiyana Bextewar*, *Hopo*, *Kurdê Rêwî*, *Gundê Mêrxasan*, *Dê û Dêmarî* de mijara dînê bi rêya kedxwarina şêx û meleyan tê bikaranîn. Yanê daxwaza rejîma Sovyetê ji bo dînê jî nayê bikaranîn. Lê bi rêya nîşandayîna kedxwarina şêx û melayan û car caran a keşîşan, ev nivîskar dixwazin ku hişmendiyeke ava bikin li hember îstîsmara dînê. Di *Hewarî* de jî li gel van nîşaneyan, hin nîqaşên Misilmanî û Êzdiyatî jî cih digire û heta yek ji sedema koça kurdan jî bi serdestiya Misilmaniyê ve tê girêdan.

Rêgezeke din a realîzma sosyalîst jî dîrokîtiyê. Nivîskarên van romanên kêm zêde bi girêdayî dîroka kurdan berhemên xwe afirandine. *Dimdim*, *Xatê Xanim û Şer Li Çiya* romanên dîrokî ne, lê romanên din jî kêm zêde qala dîroka kurdan dikin; salên ku di şeran de derbas dibin, carinan li êniya şerî carinan jî ji cepheya paşî xwe nîşan dide, di jwariyên wî tîn nimandî. Giraniya romanên de şopên jiyana nivîskaran jî xwe dide der. Di *Gundê Mêrxasan* de jî lehengekî rast rastî me tê û em ji belgeyên rusan dizanin ku yekî wisa heye. Nivîskarên vê serdemê di berhemên xwe de dîroka xwe yê bi êş û azar ji bîr nakin.

Romanên kurdî ya Sovyeta berê bi hewldaneke gelparêz hatine nivîsandin. Nivîskar ji bo pêşveçûna gelê xwe dixwazin ku şert û mercên guncav ava bikin. Ev yek jî di romanên de xwe eşkere dike. Nivîskar hertim li bal gelan e, ji bo wan tevdigere, berjewendiya wan diparêze.

Rejîma Sovyetê di gundan de sîstema kolxozan û li bajaran jî sovkozên ava dike. Di romanên kurdî ya Sovyeta berê de jî ev sîstem gelek caran hatiye bikaranîn. *Jiyana Bextewar*, *Hopo*, *Hewarî*, *Kurdê Rêwî*, *Gundê Mêrxasan*, *Dê û Dêmarî* û *Bawerî* de pesna sîstema Sovyetê tê dîtin. Jiyana kolxozan wekî jiyaneke îdeal tê nîşandan; gundî li wir jiyaneke bextewar dijîn, kes keda kesî naxwe, hîyerarşiyeye çînî tune, herkes wekî hev e. Di kolxozan de gundî bi hev re dixebitin, kolxozên xwe û gundê xwe pêş ve dibin. Sovkoz di gel ku sîstemeke bajarî ye, di van romanên de cih negirtiye.

Tevahiya romanên kurdî yên Sovyeta berê (1935-1991), gava ku bi van rêgezan

tên nirxandin, tê dîtin ku hêmanên realîzma sosyalîst di hemû romanên de cih girtine û bi awayekî biîstikrar hatine bikaranîn. Nivîskarên kurd jî ji derfetên Sovyetê bêpar nemane û piraniya wan berhemên xwe li ser şopa realîzma sosyalîst ava kirine. Ev jî nîşanê me dide ku romana kurdî ya Sovyeta berê, di gel hin îstîsnayên xwe ve, romaneke bi tez e, realîst û sosyalîst e.



ÇAVKANÎ

AHMEDZADE, Haşim, **Romana Kurdî û Nasname**, Fahriye Adsay (wer.), Avesta, İstanbul 2011.

AHMEDZADE, Haşim, **Ulus ve Roman**,Azad Zana Gündoğan (wer.), weş. Pêrî, İstanbul 2004.

AKÇAY, Cihaner, “**Hannâ Mine’nin Romanlarında Toplumcu Gerçekçilik**” (Teza Doktorayê ya Neçapkirî, Zanîngeha Gazîyê Enstitûya Zanistên Civakî), Ankara 1998

AKRAMOVA, Dilaram, “Kırgızistan’da Din Eğitimi Srunları ve Çözüm Arayışları”, **II. Uluslararası Sosyal Bilimciler Kongresi**, Bişkek 2008, rr. 493-503.

ALAKOM, Rohat, **Bir Türk Subayının Ağrı İsyanı Anıları**, Avesta, İstanbul 2011.

ALAKOM, Rohat, **Xoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması**,Avesta, İstanbul 2011.

ALAN, Remezan, **Bendname Li Ser Ruhê Edebiyatekê**, Avesta, İstanbul 2009.

[[[
[SEP]

ALAN, Remezan, **Li Dor Texeyyulên Berê Rêçên Îroyîn Folklor û Roman**, weş. Peywend, İstanbul 2013.

ALİNİA, Mino, **Diyaspora Mekanları**,Fahriye Adsay (wer.),Avesta, İstanbul 2007.

ALİYEVA, Gönül, “**Sscb Döneminde Azerbaycan Dil Planlaması**”, (Teza Doktorayê ya Neçapkirî, Zanîngeha Ankarayê Enstitûya Zanistên Siyasî), Enqere 2005. [[[
[SEP]

ALLISON, Christine, “Otobiyografi, Serborî û Romana Kurdî: Erebe Şemo û Peyrewên Wî”, **Wêje û Rexne**, j.2 Gulan- Hezîran- Tîrmeh- Tebax, Diyarbekir 2014, rr. 133- 152.

ALTUG, Fatih, “İstinat Duvarı Olarak Cezmi: ‘Tarihe Müstenit Hikaye.’” **Edebiyatın Omzundaki Melek**, weş. İletişim, İstanbul 2011, rr. 149- 206.

ANDERSON, Benedict, **Hayali Cemaatler**, İskender Savaşır (wer.), Metis, İstanbul 2011.

AYDOĞAN, İbrahim Seydo, **Guman 1**, weş. Rûpel, Enqere 2013.

AYDOĞAN, İbrahim Seydo, **Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî**, weş. Rûpel, İstanbul 2014.

AYIK, Burçîn, “**Cengiz Dağcı ve Cengiz Aytmatov’un Bazı Romanlarında Ruslaştırma ve Sömürü Politikası olarak Kolhoz**”, (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Zanîngeha Celal Bayarê Enstîtûya Zanistên Cîvakî), Manîsa 2015.

BADEM Candan û Rohat, ALAKOM, “Karşlı Bir Kürdün Digor’dan Sibiryaya Uzanan Öyküsü”, **Kürt Tarihi**, j. 3 Cotmeh- Mijdar 2012.

BALBAL, Mustafa, **Ararattaki Esir Generalden Kan Çiçekleri**, weş. Doz, İstanbul 2002.

BOIS, Thomas, “Folklor ve Edebiyat”, **Kürt Milliyetçiliği**, weş. Örgün, İstanbul 2008.

BOYİK, Eskerê, **Çanda Kurdên Sovêtê**, weş. Deng, İstanbul 2012.

BOYİK, Eskerê “Hîmdarê Edebiyata Kurdî yê Ewilîn Nivîskarê Eyan Bavê Romana Kurdî Erebe Şemo (1897-1978)”, **Kovara W**, j 15, İstanbul 2007.

BRECHT, Bertolt, **Sosyalist Gerçekçilik ve Toplum**, Ahmet Cemal û Kayahan Güven (wer.), weş. Kitaplar, İstanbul 1980.

CARR, E.H., **A History of Soviet Russia, Socialism in One Country 1924-1926**, weş. Macmillan, London 1976.

CELÎL, Ordîxanê, **Kürt Kahramanlık Destanı Dımdım**, İbrahim Kale (wer.), weş. Avesta, İstanbul 2001.

CHIKHLADZE, Iraklii , Giga CHIKHLADZE , “The Yezidi Kurds and Assyrians of Georgia^[1]The Problem of Diasporas and Integration into Contemporary Society”, **Journal of the Central Asia & the Caucasus** j. 3/21, Sweden 2003.

CILIZOĞLU, Seçkin, **Sanatta Sosyalist Gerçekçilik**, weş. Yeni Dünya, İstanbul 1976.

CINDÎ, Heciyê, **Hewarî**, weş. Lîs, Amed 2008.^[1]

EAGLETON, Terry, **Eleştiri ve İdeoloji, Marksist Edebiyat Teorisi Üzerine Bir Çalışma**, Savaş Kılıç (wer.), İletişim, İstanbul 2009.

EMERSON, Caryl **The Cambridge Introduction to Russian Literature**, Cambridge University, USA 2008.

EVDILREHMAN, Eliyê, **Gundê Mêrxasan**, weş. Lîs, Amed 2012.

EVDILREHMAN, Eliyê, **Xatê Xanim**, weş. Lîs, Amed 2012.

EVDILREHMAN, Eliyê, **Şer Li Çiya**, Hejarê Şamîl (Trans.), weş. Pêrî, İstanbul 2011.

GERDENZERÎ, Ezîzê, **Fîncana Ferfûrî**, weş. Lîs, Diyarbekir 2015.

GORKI, Maksîm, **Edebiyat Yaşamım**, Şemsa Yeğîn (wer.), weş. Payel, İstanbul 2007.

GORKI, Maksim, **Sanatta Sosyalist Gerçekçilik**, Feyyaz Şahin, (wer.), weş. Parşömen, İstanbul 2011.

GRENOBLE, L.A., **Language Policy in Soviet Union**, Dodrecht, 2003.

HEPO, Ahmedê, **Bawerî –Dengek Ji Rêzeçiyayên Elegezê-**, weş. Aram, İstanbul 2013.

ÎBO, Sehîdê, **Kurdê Rêwî**, Xanna Omerxalî (Trans.), weş. Avesta, İstanbul 2009.

KAGAN, Moisici, **Sanatta Sosyalist Gerçekçilik**, Feyyaz Şahin (wer.), weş. Parşömen, İstanbul 2011.

KALENDEROĞLU, İhsan, “Sovyetler Birliği Döneminde Bolşevik Rejiminin Türkmen Folkloruna Etkileri”, **Turkbilig**, j. 2008/16, rr. 113-123.

KHAYATÎ, Khaled, **Mağdur Diyasporadan Sınır-ötesi Vatandaşlığa mı?**, weş. Avesta, İstanbul 2009.

KINACI, Yusuf Ziya, “Kolhozlar, Sovhozlar ve Kibutzlar: Kolektif Örgüt Yapılarının İncelenmesi Üzerine Bir Deneme”, https://www.academia.edu/10079148/Kolhozlar_Sovhozlar_ve_Kibutzlar_Kolektif_Orgut_Yapilarinin_Incelenmesi_Uzerine_Bir_Deneme, 10.02.2017.

KURTULMUŞ, Akif, **Politika ve Sanat**, weş. Avesta, İstanbul 1996.

LEEZENBERG, Michiel, “‘A People Forgotten by History’: Soviet Studies of the Kurds”, **Iranian Studies**, c. 48:5, rr. 747- 767.

MATHEWSON, Jr. W. Rufus, **The Positive Hero in Russian Literature**, Columbia University, USA 2000.

MCDOWALL, David, **Modern Kürt Tarihi**, weş. Doruk, İstanbul 2004.

MATVEEVA , Anna, **The South Caucasus Nationalism Conflict and Minorities**, Minority Rights Group International, UK 2002.

MIXOYÎ, Ş.X., “Rewşa Kurdan Li Azerbêcana Sovyetê”, Bavê Nazê (wer.), **Berbang**, j. 59, rr. 5-6.^[L]_[SEP]

MORAN Berna, **Edebiyat Kuramları ve Eleştiri**, İletişim, İstanbul 2005.

MÜLLER ,Daniel, “The Kurds of Soviet Azerbaijan, 1920-91” **Central Asian Survey**, c. 19:1, rr. 41-77.

OKTAY, Ahmet, **Toplumcu Gerçekçiliğin Kaynakları Sosyalist Realizm Üzerine Eleştirel Bir Çalışma**, İthakî, İstanbul 2008, r. 75.

OMARKHALI, Khanna, “The Kurds in the Former Soviet States from the Historical and Cultural Perspectives”, **The Copernicus Journal of Political Studies**, c. 2, 2013, rr. 128-142.

ÖZKAN, İsa, “Sovyetler Birliği Döneminde Türkmenistan’da Folklor Çalışmaları”, **VI. Milletlerarası Türk Halk Kültürü Kongresi, Son Elli Yılda Türkiye Dışındaki Türk Halk Kültürü Çalışmaları Seksiyon Bildirileri**, Ankara 2002, rr. 225- 233.

ÖZTAŞ, Özkan, **Sovyetler Birliğinde Kürt Sanatı**, weş. Yazılama, İstanbul, 2016.

PAŞA, İhsan Nurî, **Ağrı Dağı İsyanı**, Weş. Med, İstanbul 1992.

POSPELOV, Gennadiy, **Edebiyat Bilimi**, Yılmaz Onay (wer.), weş. Evrensel, İstanbul 2005.

REŞÎD, Tosinê, “Sovyetler Birliđi’nde Krt Edebiyatı”, **İnatçı Bir Bahar Krtçe ve Krtçe Edebiyat**, weş. Ayrıntı, İstanbul 2012, rr. 202-212.

SHAKELY, Ferhad Modern Krt Ökü Sanatı, Rohat Alakom (wer.), weş. Avesta, İstanbul 1998.

SİNİAVSKİ, Andre, **Sosyalist Realizm**, S. Türker (wer.), weş. Habora Kitabevî, İstanbul 1967.

SZAKONYI, David, “Ethnic Mobilization in Post-Soviet Georgia: The Case of the Yezidi-Kurds”, **Jemie- European Centre for Minority Issues**, c. 6, h. 2, rr. 2-19.

ŞAMİL, Hejarê, **Diyaspora Krtleri**, weş. Pêrî, İstanbul 2005.

ŞEMO, Erebe, **Şivanê Kurmanca**, weş. Lîs, İstanbul, 2015

ŞEMO, Erebe, **Berbang**, Rêber Dilşêr (Trans.), weş. Kurdistan, Stockholm 1988.

ŞEMO, Erebe, **Jiyana Bextewar**, weş. Lîs, Diyarbekir 2015.

ŞEMO, Erebe, **Hopo**, weş. Lîs, İstanbul 2007.^[L]_[SEP]

ŞEMO, Erebe, **Dimdim**, weş. Lîs, Diyarbekir 2016.^[L]_[SEP]

TAELS, Herman, **Eski Sovyetler Birliđi’nde Krtler**, Nadîre Işık (wer.), weş. Pêrî, İstanbul 2001.

TAGIZADE, Leyla, “Sosyalist Realizm: Kökeni, Oluşum Süreci ve Kavramı”, **Modern Türklük Araştırmaları Dergisi**, c. 3, j. 4, Enqere 2006, rr. 7-24.

TEMUR, Nezîr, “Folklor- İdeoloji Bağlamında Sovyetler Birliđi Dönemi Folklor Politikaları Ve Bu Politikaların Kırgız Folkloruma Etkileri”, **Bilig**, j. 53, Enqere 2010, rr. 219-232.

TROÇKÎ, Leon, **Edebiyat ve Devrim**, Hüsen Portakal (wer.), weş. Köz,İstanbul 1976.

TUNALI, İsmail, **Marksîst Estefîk**, weş. Altın Kitaplar, İstanbul 1993.

UZUN, Mehmet, **Antolojiya Edebiyata Kurdî**, weş. Aram, İstanbul 2003.

ÜLKEN, Hilmi Ziya, **Uyanış Devirlerinde Tercümenin Rolü**, weş. Ülken, İstanbul 1997.

VANLI, İsmet Şerif, “The Kurds in the Soviet Union”, **The Kurds^[L]A Contemporary Overview**, Taylor & Francis, UK 2005, rr. 152-173.

van BRUÏNESSEN, Martin, “Behind the Iron Curtain”, **Kurdistan in the Shadow of History**, Chicago-London 1997, rr. 214

WELLEK, René, Austin Warren, **Edebiyat Teorisi**,Ö. Faruk Huyugüzel (wer.), weş. Dergah, İstanbul 2005.

XELÎL, Têmûrê, **Antolojiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyeta Berê**, Weş. Na, İzmîr 2014.

XUDO, Egîdê, **Dê û Dêmarî**, Nacî Kutlay (Trans.), weş. Nûbihar, İstanbul, 2016.^[L]_[SEP]

YAMAN, Ali, “Sovyet Siyasi Tarihinde İslam ve Ateizm Mücadelesi: Sovyet Dönemi Kazak, Özbek ve Kırgız Ateizm Literatütünün Analizi”, **II. Uluslararası Sosyal Bilimciler Kongresi**, Bişkek 2008, rr. 477-492.

YILMAZ, Harun, “The Rise of Red Kurdistan”, **Iranian Studies**, c. 47, j. 5, 2014, rr. 799-822.

ZHUMASHOV, Yerkebulan, “**Kazakistan Cumhuriyeti’nde Yerel Yönetim Reformları: Kolhoz ve Sovhoz Sisteminin Çözülmesi ve Yeni Yapılanma**”, (Teza Mastirê ya Neçapkirî, Zanîngeha Ankarayê Enstîtûya Zanistên Siyasî), Enqere 2010.

